

Îkram Oğuz

Nivîsên li Dîwar

Weşanên NavKurd: 3

Nivîsên li Dîwar

Îkram Oğuz

Berg: NavKurd
Çapa yekem: Berfanbar 2024

Weşanên NavKurd
Goerdelerstr. 16
70806 Kornwestheim

Tel: (0049) 0152 33 52 08 06
Mail: navkurd@gmail.com
[facebook:www.facebook.com/navkurd/](https://www.facebook.com/navkurd/)

İkram Oğuz

Nivîsên
li
Dîwar

Naverok

Pêşgotin	11
Rêwîtiya bi prtûkan ra	13
Jîyana di bin desthilatiya Go-vîte da	17
Şer û wêje	20
Kitêba min a pîroz!	24
Şivanê Zimanê Kurdî: Erebi Şemo	29
Pênc pirtûk û nivîskarek	33
„Evîn sînoran nasnake“	42
Dojeh	46
Şikestî	49
Nado kurê xwe firot.	52
Pejnên Riza Çolpan û pêşgotina min	55
Sê pirtûk û nivîskarek.	59
Mîrzayê Reben	63
Koçberîya ji bo wareke nû!	67
Sêwîyê Dêrsimê	71
Yar û Mirad	76
Kedkarê sê karên pîroz!	80
Sîyarên Deşti Anatoliyê	83
„Guldestyek Ji Edebîyata Cîhanê“	85
„27 Nivîskarên Edebîyata Cîhanê“	89
Ulysses	92
Milan Kundera jî mir	97
Jîyana evînî ya Karl Marx	100
Dersên Kurdîtiyê	103

Lawê Pîrê	108
Gurên Devbixwîn.....	113
Sînem a Sehîdê Îbo	117
„Rû û Kûr“	121
Çar Yek û Dublinî... ..	124
Sêxiştîyên Kurmancî	127
„Babam Şeyh Said – Bavê min Şêx Said“	130
Ji Heysivê heta Stockholmê.....	133
Tebinî ya ji bo dîrokê	139
„Lepên Tarî...“	143
20 Nameyên Keça Stalîn	147
Welatê Aslikê: Kurdistan.....	150
„Kurd – Merivên Royê“	155
Kurd û Gul.....	158
Jinên Kurd di Serdema Osmanî de.....	163
„Nasnameya Kurdî û Tekoşîna min.....	166
Gotinên Zêrîn	171
Jan, li koka xwe ya veşartî digere.....	174
Dil Leyla.....	178
Atlantic Crossing û xewna min	180
Belgeya dîrokî: Mîro.....	185
Pirtûkek nû: Rêwî	188
„Dengbêjên bavê min“	192
Mîro	196
Nivîsandina bi Kurdî Şoreşgerî ye!	199
Rêwî – “Romana zimanê bê xwedî!?”	203

Îkram Oğuz

Di sala 1962an da li gundeki Tatosê, Xanbegiya Jêrin, ji dayîk bûye.

Mekteba ewil li gund, ya navîn û lîse jî li Erzîrumê xwendîye.

Di xortanîya xwe da, di nav sîyaseta Kurd da cihê xwe digre û dema 12ê Îlonê da tê binçavkirin.

Di navbera salên 1984-88an da li Zanîngeha Îstebolê Fakulta Îktisadê dixwîne.

Çend salan li Îstebolê di firmayeka taybet da wek rêvebir dixebite.

Bi destpêka sala 1991an da dest bi karê çapemeniyê dike. Di navbera salên 1992-94an da dibe xwedî û berpirsiyarê giştî yê Rojname ya Azadî û Kovara Deng.

Sedem nivîsê û karê wî yên sîyasî, di derheqê wî da bi sedan doz ve-dibûn û tê cezakirin...

Di sala 1995an da derdikeve dervayî welat û karên xwe yên sîyasî li Ewropayê didomîne.

Di dawîya salên 90î da dest ji sîyaseta hizbî berdide û di firmayek taybeti da wek rêvebir dixebit.

Di sala 2004'an malpera <http://www.navkurd.net> dadimezrîne û ji wê demê vir da berpirsiyariya malperê dike û di malperê da bi Kurdî dinivîsîne.

Li bajarê Kornwestheimê diji û bi navê Şevîn û Kejal du qîzên wî hene...

Berhemên wî:

Mîro, Roman, Weşanên Do, 2014

Rêwî, Roman, Weşanên Doz, 2017

Jîyan bi kurdî xweş e, Weşanên NavKurd, 2019

Dengbêjên bavê min, Weşanên NavKurd, 2022

Ji Kawayê min ra...

Pêşgotin

Nivîsên li dîwar...

Ev dîwar, diwarê kurd û kurdayetîyê ye...

Ji çep û rast va hatîye dorpeçkirin...

Bi êrîşên dagirkeran va diêşe û dilerize...

Lê dîsa jî ji hîmê xwe yê dîrokî naqete...

Ber xwe dide û hilnaweşe...

Jiber ku ew bi kilam û stranên dengbêjan va xemilî...

Bi çîrokên çîrokvanan va dewlemend...

Bi lorîyên dayikan va bilind...

Bi temîyên bav û kalan va bi hêz bû ye.

Ji ba û bahozê...

Ji berf û bagerê naxurufe...

Ji koka xwe dûr nakeve...

Di her têkçûyîna xwedîyên xwe da...

Di bin destên dagirkeran da bimîne û binala jî...

Ber xwe dide û hilnaweşe...

Min li vî dîwarî nivîsî...

Bi zimanê ku ew jê fam dike û pê ra ji nû va jîndar dibe...

Nivîsen li dîwar ji 50 nivîsan pêk tê. Ji wan 44 heb nivîsên min ên wê-jeyî ne, ku mijara her nivîse jî roman, çîrok ya jî pirtûkeka ku bi kurdî hatîye nivîsandin e. Ez wan pirtûkan bi kurtayî didim nasîn û gor nêrîn û zanebûna xwe jî dinirxînim.

Şeş nivîsên ku di dawîya pirtûkê da cîh digrin. Ew jî nîrxandinên di derbarê berhemên min, “Rêwî”, “Mîro” û “Dengbêjên bavê min” da ne. Ji wan sê nivîs jî alî nivîskar Memo Şahin hatine nivîsandin, ku ew her sê berhemên min dinîrxîne. Nivîskar û siyasetvan Bayram Ayaz, nivîsakar Welî Sebrî, Akademîsyen û Nivîskar Dr. Celalettin Kartal jî di nivîsên xwe da herdu romanên min dinîrxînin, ku ez ji wan ra spasdar im.

Ev pirtûk, Nivîsên li dîwar jî, di nav weşanên NavKurd da û wek e-pirtûk tê weşandin.

Çima e-pirtûk?

Di nav kurdan da xwendin û nivîsandina bi kurdî hê jî kêr e.

Sedem wê jî ne yek ne jî yek alî ye. Gor dem û demsalên berê, bêguman derfetên xwendin û nivîsandina bi kurdî îro zêde ne.

Lêbelê kurdên ku li zimanê xwe xwedî derdikevin û bi kar tînin kêr in û her diçe jî kêr dibin. Pirtûkên ku tên nivîsandin û çapkirin, ew li Tirkîyê, bi taybetî jî li her bajar û bajarokên Bakûrê Kurdistanê nayên firotan. Ev yek jî bi tena serê xwe astengeke mezin e.

Dema ku pirtûkek di her pirtûkxaneyê da neyê dîtin, ew cîhê xwe nagre û nagihîje ber destê xwendevanan. Herçiqas di bazara înternetê da cîh bigrin û werin firotinê jî, ev yek barê nivîskar û weşanxaneyan sivik nake. Kurdên ku îro jî xwendina zimanê xwe yê şîrîn tamê digrin û dixwînin, piraniya wan bi teknolojiya hevdem û medyaya civakî ra têkildar in.

Ger ku ew bixwazin, her gav dikarin e-pirtûkên kurdî daxînin ser komputer ya jî telefonên xwe û bi hêsanî bixwînin. Herwiha bê pere û bê bahane...

Loma heta ku bazara pirtûkên kurdî dewlemend û firotana wan jî zêde nebe, ez berhemên xwe tenê wek e-pirtûk amade dikim û diweşînim.

Dû ra bi bangewazîyek jî evîndarên kurdî ra dibêjim, pêşkêşkirin ji min, xwendin jî ji we...

Îkram Oğuz

Kornwestheim, 15.12.2024

Rêwîtiya bi pirtûkan ra...

Di navenda salên 70yî da diçûm dibistana navîn, pileya sisîyan. Di rojên şemî û yekşemê û betlana havînê da jî dixebitîm. Di wan salên min ên zarokatîyê da hevalê min ê herî nêzik birayê min ê ji min çar sal mezintir bû, ku hevaltîya me îro jî wek hevaltîya wan salan didome.

Wê demê di hefteyek carê da filmeke nû dihat sînemaya bajêr. Me bi hev ra biryar dida, ku em herin sînemayê û li wê filmê temaşe bikin. Em ji mal derdikevin û me berê xwe dida avahîya sînemayê. Em di rê da di ber derê kîtapxaneyê ra derdas dibûn, ku wê demê di bajarê ku em tê da dijîyan jixwe yek kîtapxaneyek tenê hebû.

Bêhemdî em li ber derê pirtûkxaneyê disekinîn û me berê xwe vedigerand ser camekana pirtûkxaneyê û li pirtûkên di refê camekanê da li kêleka hev rêzkirî temaşe dikir. Dûr a jî me yekî biryarek nû dida û ji yê din ra digot, „heta ku em diçin sînemayê û saetek û nîv li filmekê temaşe dikin, bi bihayê du bilêtên sînemayê em dikarin ji xwe ra romanekek bikin, bi rojan bixwînin û dema xwe pê derbas bikin...”

Ev pêşniyar bihata pejirandin, em diketin hundurê kîtapxaneyê, di nav pirtûkan da digeriyan, me ji xwe ra romanekek dikirî û berê xwe dida malê. Bêguman, di rêya her vegeerê da şer derdiket, ji bo ku kî berê pirtûke me şer dikir.

Min digot; „ez berê dixwînim...”

Wî digot; „na, ez mezin im û ezê berê bixwînim...”

Me bihev, şer ji pirsgirêka me çareser nedikir. Di encama şer da, weke hercarê me di navbera xwe da listikek dilîst û kê qezenç bikira, wî berê roman dixwend.

Bi wî awayî, di mala me da zêde dewlemend nebe jî, pirtûkxaneyek ava bibû. Dema ku ap û xalanên me ji gund bihatana û li mala me bibûna

mêvan, pirtûken me bala wan dikişand. Li me û li pirtûkan mêze dikrin û ji me ra digotin; “hûn van hemû pirtûkan dixwînin, yan dikirin û difroşin?”

Dem û demsal derbasbûn, di darbeya 12ê Îlonê da em herdu bihev ra hatin girtin.

Çend meh şûnda ez ji girtûgehê derketim û vegeyîyam malê. Xêncî Qurana bavê min di mal da ti pirtûkek nema bû. Ji qedera pirtûkan ketim şikê û di derbarê aqîbeta wan da ji dîya xwe pirsî; „Dayê, ka pirtûken me li kû ne, we ew veşartin, ya jî we tiştêk anî serê wan?”

Dîya min rûyê xwe ji min guhart û bi dileke xemgîn got; „Kurê min, her roj min pirtûkek mîna ardû kir ber komirê, pê sobe vêxist û we jî ji belaya wan pirtûkan xilas kir. Jixwe ew pirtûk nebana, hûn nedihatîn girtin û birayê te jî hê di girtûgehê da nedima...”

Di ser derbeya leşkerî ra sê-çar sal derbas bibû. Ez li Stenbolê û xwendekarê zanîngehê bûm. Li wargeha xwendekaran (AÖS) dimam. Em şeş xwendekar di odeyeka piçûk ta bicîh bibûn. Di odeyê da tenê şeş ranzayên nivînan û şeş dolabên piçûk û ji tenekeyan hatibûn çêkirin, hebûn, ku dolab têra kincên me yên rojane jî nedikir. Me her yekî kinc û pirtûk û qelem û defterên xwe dida ser hev û dikurisand hundurê dolaba xwe.

Ji me şeş xwendekaran, ez û sê kesên din, zêde nêzîkî hev bûn. Qasî ku pirtûkên dersê, me roman û pirtûkên din jî, bi pelên rojnameyên kevn dinixamt û dixwend. Mixabin jibo kirîna pirtûkan perê me nedibû, di pirtûkxaneya zanîngeh û wargehê da jî pirtûkên gor dilê me, tunebûn. Loma jibo bidestxistina pirtûkan me ji xwe ra rêyek dîtûbû. Em bibûn dizên pirtûkan...

Di dema vebûna pêşangeha pirtûkan da em derdiketin nêçîrê, ku me nave dizîya xwe jî lêkiribû nêçîra pirtûkan...

Wê demê pêşangeha TUYAPê ya pirtûkan li Tepebaşıyê vedibû, bi sedan weşanxane di pêşangehê da standên xwe vedikirin. Bi hezaran kes di nav standên weşanxaneyan da digeriyan, li pirtûkan dinihêrîn û pirtûkên gor dilê xwe, jixwe ra dikirin.

Em çar heval jî bi tûrikê vala diçûn û bi yê tijî vedigeriyan. Ji me sê kes li ber standekê û li kêleka hev disikinîn, yê çaran jî di navbera wan ra

destê xwe dirêj dikir, ji ser dezgehê standê pirtûk dikişind û davêt nav tûrikê hevpar. Tûrik tijî dibû, me berê xwe dida wargehê û em bi ken û henek diçûn, diketin oda xwe û serkeftina xwe pîroz, nêçîra xwe ji di navbera xwe da parve dikir.

Di nêçîra rojekê da ji tûrikê me yê tijî, ji pirtûka Georg Pulitzer, ya binavê „Rêgezên Bingehîn ên Felsefe yê“, sê heb derketibûn. Sê pirtûk û çar şîrk. Ji kî ra bikeve û nekeve, em di navbera xwe da ketibûn nav gengeşiyê, ku ji me yekî, ji nêçîrvanê wê rojê ra gotibû, „te yan yek ya jî çar heb bigirta, çima sisê...?“

Nêçîrvan jî wek bersiv wiha gotibû, „ger ku heba minê çar heb bigirta, lê li ser dezgehê standê tenê sê heb hebûn û min ew her sê jî girtin...“

Li ser gotina wî, hevelekî me yê henekbaz jî kenîya û got; “Hûn di navbera xwe da parve bikin, ev pirtûk jixwe pir qalind e û ez jî ji pirtûkên qalind hez nakim û naxwînim...”

Dawîya salên 80yî, zanîngeh qedîya bû. Ez li Teleteknîk a ji koma şîrketên Kavalayê dixebitîm. Qezenca min di cîh da û jibo kirîna pirtûkan jî tu pirsgirêkeke min êdî nema bû. Lê li wir jî ez carek din dîsa bûm nêçîrvanê pirtûkan.

Ez li Teleteknîkê, di beşa muhasebeyê da, berpirsiyarê stokan bûm. Mehê da carê diçûm ambara firmayê û computer û parçeyên wan ên di desta da mayî, dijmart û rapora mehane amade dikir.

Rojek di kuncikekê ambarê da, ez rastî çend kolîyên mezin û ji kolîyên computeran cûda, hatim. Di derbarê kolîyan da ez ketim şikê û min gazî berpirsiyarê ambarê kir, jê pirsî ku, ev kolî çi ne û ji kû hatine?

Berpirsiyarê ambarê; „Ev kolîyên filankesê ne û tê da pirtûkên wî yên şexsî cîh digrin“ got û dest bi qilûlika li ser xwediyê pirtûkan kir.

Xwediyê pirtûkan jî nivîskarekî bi nav û deng û bi Weşanxane ya Îletîşîmê ra jî têkildar bû. Gor qilûlikên berpirsiyarê ambarê, nivîskar cara duyem dizewice û hevîna wî ya nû jî zêde ji pirtûkan hez nake. Ji mêrê xwe yê nivîskar ra dibêje, ew nikare di nav ewqas pirtûkan da her roj bijî û ji toza wan xwe biparêze.

Sedem wê yekê, nivîskar jî pirtûkên xwe di nav kolîyan da bicîh dike û dişîne ambara Teleteknîkê...

Piştî agahî û qilûlikên berpirsiyarê ambarê, min karê xwe da alîkî û di nav kolîyan da ketim nêçîra pirtûkên nivîskarê bi nav û deng, ew pirtûkên ku di bazarê da nemabûn û di pirtûkxaneyan da jî nedihatin dîtin...

Di nav kolîyan da min dûzîneyek pirtûk hilbijart û nêçîra xwe ya herî dawîyê jî bi serkeftî qedand.

Çend sal şûnda ez bi karê weşangerîyê ra mijûl bûm. Ji pirtûkên ku di weşand û dikirî, pirtûkxaneya min roj bi roj mezin û dewlemend dibû.

Lêbelê roj hat, sedem weşana rojname û kovar û pirtûkên bi kurdî, hemû rê li ber min hatin girtin. Ez neçar mam û min piştî xwe da pirtûkxaneya xwe ya dewlemend û welatê xwe yê qedîm...

Bi rev û derketina min va, pirtûkxaneya min jî weke welatê min, careke din dîsa ma di nav dest û lepan da...

Min berê xwe da Ewropayê û çûm li welateke xerîb dest bi jîyanê nû kir.

Di mala xwe ya piçûk ta, bi kirîn û dîyarîyan jî nû va hîm avêt û cara sêyem jî xwe pirtûkxaneyek, ji pirtûkên qalind û pirrzimanî, ava kir.

Pirtûk û pirtûkxaneyên min hatin guhartin, lê hinek pirsên di derbarê wan da, di cîhê xwe da man.

Mîna ap û xalanên min, niha jî hinek nas û dostên ku tên li mala min dibin mêvan, li pirtûkên min ên qalind û rengîn mêze dikin û dipirsin:

„Te ev hemû pirtûkên qalind çawa xwend ya jî çawa dikarî bixwînî?“

27.04.2020

Jîyana di bin desthilatîya Go-vîtê da...

Mîna herkesên ku xwe ji Korona, ya jî wek navlêkirina min ji Go-vîtê diparêzên, ez jî xwe diparêzim.

Şev û rojên min, di nav malê da derbas dibin.

Jinederketina malê jî ne eciz im.

Jiber ku vala nasekinim.

Dema xwe bi çêkirina xwarinê...

Bi guhdarîya muzîkê...

Bi xwendina pirtûkan, li temeşekirina film û rêzefilman va dixemilînim û derbas dikim.

Xwarin û şîranîyên nû dicêribînim û li tamên nû digirim.

Di nav kar û xebata xwe da jî, ji guhdarîkirina muzîkê nabim.

Ji xwe qala dengbêjan nekin, ew parçeyek ji jîyana min in.

Bê dengê Sakiro rojên min derbas nabin.

Rojên ku bi dengbêjan ra derbas nebin, wan ji emre xwe derdixim û nejiyayî dihesibînim.

Lê carcaran li deng û avazên nû jî digirim.

Rastî hunermendên ku ji kûrahîya dil deng didin û distirên, werim, bi destê wan digirim û wan jî di nav civata dengbêjên xwe da bicîh dikim.

Bi destpêka ev sala bêyom va hunermenda Kurd, Rewşen Çelîker bala min kişandibû.

Di van rojên di bin desthilatîya Go-vîtê da jî li albûma wê ya bi navê “Tov” guhdarî dikim. Deng û avazên wê yê otantik, destê min digrin û dibin dema zaroktîya min.

Ew demên ku bi guhdarîkirina kilam û stranên ji Rewanê derdiketin û bi bayê êvarê ra li seranserê Serhedê belav dibûn...

Di dengê Rewşenê da jî ços û geş a wê deme dibinim.

Dema ku xemgînî derkeve pêş, bere xwe didim “Mala Minê” û li listika keç û xortên Kurd temaşê dikim.

Bi hebûn û hûnera wan ra şa dibim û bi listik û henekên wan ra dike-nim...

Êvaran bere xwe didim pîrtûkan û dikevim wêje ya Kurdî, gera xwe li wir bi çîrok û romanên dixemilînim.

Di “Dilname” ya Newaf Mîro da dengê nalîna evîna yekalî dibihîsim.

Di kurahîya nalînên wî da bi sêwîtîya xwe dihesim û di berxwe da dinalim.

Dema ku Dilname diqede, nalîn jî tê birîn.

Serê xwe bilind dikim û li derdora xwe digerim.

Di bêdengîya şevê da rastî “Lehengê Tazî” tîm.

Bi lehengê Tazî, Keleşê Reş, ra derdikevim serê çol û çîyan.

Di nav gelî û newalan ra derbas dibim.

Dikevim nav civata mîr û began û li kêleka Keleşê Rêş rûdinê.

Di civatê da „Gotinên Gunehkar“ dibihîzim.

Li pey Gotinên Gunehkar dikevim û li şopa wan digerim.

Derdikevim serê rê û dirban.

Di dawîya her rêyekê da şiverêyên nû derdikevin peşîya min.

Di rêwîtîya min a dirêj da, rê lihev, şiverê jî li rê zêde dibin.

Di nav welatên bîyanî da û di sînorên xerîb ra derbas dibim.

Jibo jîyaneke aram...

Di şeverêşa şevê da li çirûska hîvê, di ronahîya rojê da jî li sîya darekê digerim.

Ne rêwîtîya min diqede, ne jî eş û jana dilê min kêr dibe.

99 Morîkên Belavbûyî li ber çavên min peyda dibin.

Morîyên sor ên jî tayê sipî pekyayî...

Bi tovkirina morîyan ra roj diqede...

Ro careke din û hêdî hêdî bilind dibe û diçe ava.

Tarî dikeve erdê.

Êvar dest pê dike...

Ji dûr va, di nav Tov a Rewşenê da dengê Gulizerê tê...

Dikişim kuncikê xwe tarî û weke mirîşka ku li ser pûnika xwe bimeli-se, ez jî di şûna xwe da bêdeng û bêtevger disekinim, li deng û avazên Rewşenê guhdarî dikim.

Stran diqede, ez li pey bejn û bala Gulizerê dikevim...

Bi ken û henekên ku ji Mala Minê tên, ji xewn û xeyalên xwe şîyar dibim.

Gulizer wenda dibe, komek keç û xortên Kurd derdikevin ser ekranê televîzyonê.

Ew diaxifin û distirên...

Dilîzin û qîlf û henekên xwe bihev dikan.

Ez bi kirin û kiryarên wan dikanim.

Kenên ji dil û bi Kurdi...

Ne Go-vît derdikeve pêşîya min...

Ne ji vîrûs tê bîra min...

Jiber ku guhê xwe didim kilam û stranên hunermend û dengbêjan, bi xwendina çîrok û romanên Kurdî şev û rojên xwe dixemilînim û ji wan tama şîrê dayîka xwe digrim.

Dû ra piştî xwe didim paldankê û bi temaşekirina Mala Minê va jî dikanim...

Kenên ji dil û bi kurdî...

28.03-2020

Şer û wêje

Şer û şîn, du peyvên wekhev û bi hev ra girêdayî.

Du peyvên reş û tarî.

Bi xwîn û girî...

Bi êş û derd...

Jiber ku şer komkujî ye.

Kuştin û mirin e...

Şer terbiyekirina bi tîbûn û birçîbûnê ye.

Talankirina mal û milk e...

Koçberî ye...

Trajediya mirovahîyê ye.

Şer, wêrankirina gund û bajaran, xerabkirin û şewitandina xwezayê ye.

Jiber ku di bin kavlê şer da jinên bî û zarokên sêwî, kal û pîrên stûxwar dimînin.

Di encama şer da ne tene mirov, mirovahî jî dimire.

Nivîskara Belarûsî Svetlana Aleksiyeviç ku xwedîyê xelata Nobelê ya 2015an, di merasima xelatdayînê da wiha dibêje:

„Di zarokatîya xwe da li gund dijîyam. Min jî lîstika di nav kuçeyan da dihat lîstin, pirr hez dikir. Êvaran, jinbîyên gund, jinebîyên westayî yên li ser sedirên dar rûniştî, me weke mîqnatis ber bi xwe dikişandin.

Ne bav û ne bira ne jî mêr ên wan hebûn. Piştî şer nayê bîra min ku, di gundê me da jî mêr hebin. Di dema şer da jî her çar mêr ên Belarûsî yek, li enîya şer, yan jî di şerê partîzanan da dihatin kuştin.

Dinya me ya piştî şer, tenê dinyayek jinan bû. Tiştên ku zêde di bîra

min da ma ne, jinan qet qala mirinê nedikirin, tenê qala hezkinê diki-
rin. Roja dawîyê, çawa ji hezkiyên xwe qetîyabûn, çiqas û bi hesteke
çawa li benda wan sekinîbûn, çawa hê disekinîn... Sal û zeman derbas
bibûn, hê jî li benda bav û bira û mêrên xwe bûn.

Digotin: ‘Bila bêdest û pî vegere. Ez wî li ser piştê xwe digerinim, bê
dest û bê pî...’”

Wek gotinên nivîskara Belarûsî, wêje, ya jî wêjekar neynûkê li rûyê şer,
rûyê wî yê qirêj ê bi xwîn û lêm digre û nîşan dide.

Heger ku xwedî tesir be rê li ber mirina mirovahîyê digre.

Di jîyana wêjekar da şer cîh nagre.

Jiber ku wêjekar, xeyala dinyayek bê şer û bê kuştin dike.

Wêjekar ji bo vê yeke difikire û diafirîne.

Karê wêjekar afirandina jîyeneke bextewar e.

Loma, wêjekar li rê û dirban digere, ji gul û sosinan gulîstanek ava dike.

Wê gulîstanê, bi peyvên di hemahengîya jîyana rojane da hatine jibîrki-
rin, dixemilîne û jîndar dike.

Ji bo jîyaneke watedar, rê û rêbazên evîndarî û bextewariyê nîşan dide.

Sedema vê yeke ye ku weke hemû kesên hunermend û zanyar, weke
hemû kesên hilberînêr û afirînêr, weke hemû kesên mirovhiz, wêjekar jî
dijberê şer û pevçûnê, dijberê kuştin û mirinê ye.

Di jîyana wêjekar da hovîti, di meclîsa hovîyan da jî wêje û wêjekar cîh
nagre.

Dengê wêjekar naçe guhê tîran û zordaran.

Ji sûr û çeperên ku li çarnikalên koşk û serayên zordar û tîranan hatine
çikandin, derbas nabe.

Li diwarê wan sûr û çeperan dikeve û şûnda vedigere.

Sedema vê yeke ye ku di welatê di bin desthilatîya tîran û zordaran da,
warê wêjekar pîrrîcaran heps û zindan, sirgûn û koçberî ye.

Lê li ku dibe bila bibe, wêjekar di bin tu şert û mercan da bêdeng
namîne.

Jiber ku amûrên wî/wê peyv, kare wî/we ji afirandina jîyanek bi pey-
van e.

Heta ku di berika wî/wê da peyv û di sere wî/wê da jî hiş hebe, afirandina xwe didomîne...

Mixabin îtiraz û dijberîyên ku wêjekaran li dijberê şerên borî kirine û li yên ku diqewime, dikin, ji şerê Efrînê ra nekirin û nakin.

Hinek nerazîbûnên bi dengê nivz hatine kirin û tên kirin jî, di civatên herêmê da nehatin bihistin.

Sedema bêdengîyê jî ji taybetmendîya Efrînê tê.

Jiber ku Efrîn Kurd û Kurdistan e.

Efrîn bêxwedî û bêxwedan e.

Efrîn sewî ye.

Efrîn bîra bêbinî ye.

Ji bo ku lingên wan neşiqite û di bin bîr a bêbinî da wunda nebin, wêjekar bere xwe nadin Efrînê.

Rûyê xwe li Efrînê diguherînin û ji bajarê sêwî dûr disekinin.

Wêjekarên Tirk û Erebiyên Ecem bi çavê desthiladarên xwe li Efrînê dinihêrin û şerê Efrînê jî bi wî cavî dinirxînin.

Kurdên li Efrînê dijîn terorîst, Efrînê jî hêlîna terorîzmê dibinin.

Wêjekarên dine, ji çepera ku dewletên dagirker li dora Kurd û Kurdistanê, bi şer û kuştin û bi amûrên medyayê çikandine, belengazî û bêçaretîya gele Efrînê nabînin.

Ji dûr va jî gazî û hawara Kurdên Efrînê jî nabihîzin.

Wêjekarên Kurd hebin jî kem in. Ew jî wek welat û gelen xwe parçe parçe bûne û ji xwe û ji welatê xwe dûr in.

Hinekên wan ji zimanê xwe, hinekên wan jî di bin tesîra dagirkerên xwe da mane û ji Kurd û Kurdayetîyê dûr disekinin.

Yên ku bi ziman û bi ruhê kurdayetîyê tevdigerin, kêman in.

Ew bi hawar û gazî diqêrin û digirîn, dixwînin û inivîsînin...

Mixabin dengê wan jî lawaz e.

Ne zordar û tîran hawara wan dibihîzin, ne jî Kurd...

Kurdên dibihîzin jî fam nakin...

Jiber ku ew bi zimanê sêwîyan dinivîsînin û qedera gele xwe dijîn.

Efrîn piştî berxwedana xwe ya 58 rojan ji nişkava ket...

Dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê îro bajarê Efrînê talan dikin.

Dest didin ser mal û milken Kurdan û dizî û çilpizîyê dikin.

Darên Zeytûnê ku, ew li seranserî dine nîşana aşîtiyê tên qebûlkin, dişewîtînin.

Li ber çavê dine li ser Peykerên Kawa yê Hesinkar guleyan dibarînin û ji cîhê wî radikin.

Ji niha da bi demografiya Efrînê ra dilîzin û gele Kurd ji axa bav û kalan dûr dixînin.

Wêjekar û hunermendên Tirk çi dikin?

Ew ji bo kirin û kiryarên dewleta xwe ya dagirker, destanan dinivîsînin û bi helbest û stranan pîrozbahîyê li leşker û çeteyên girêdayî wan dikin.

Şer û encama şerê Efrînê jî carekî din dide xuyakirinê ku, gerdûnîya wêjeyî li seranserî dine nebe jî, li Rojhilata Navîn hê dereweke bi boçik e.

Li vir wêjekar berdevkê desthilatdarê xwe, wêje jî di xizmeta dewleta wî da ye...

23.03.2018

Kitêba min a pêroz!

Ez di pênc salîya xwe da bibûm feqîyê bavê xwe û min dest bi xwendina Quranê kiribû.

Bavê min ne mele bû.

Lêbelê sofîyekî bawermend û evîndarê xwendina Quranê bû.

Di demsala payîz û zivistanê da dersa zarokên malbatê dida û wan fêrî xwendina Quranê dikir, xwendina bi alfabeya erebî û ezber.

Min di nav kîjan demsal, meh ya jî rojê da dest pê û di çiqas demê da Quran xetm kiribû, nayê bîra min.

Lê kîngê qala xwendina min a Quranê bihata kirin, bavê min pesnê min dida û digot, „Îkramê min di nav çil rojan da Quran ser û binê hev kir.“

Lê qasî ku tê bîra min çend feqîyên bavê min ên din jî hebûn, ku ji wan yê herî piçûk jî ez bûm. Piştî xetmkirina Quranê jî bi salan, bi taybetî rojên payîz û zivistanê li oda mala kalikê xwe, ku jê ra digotin oda mêran, ez li kêleka bavê xwe rûdiniştim û min bi wî ra Quran dixwend.

Kîngê li odê civata gund kom biba, meleyê gund ya jî sofîyek daxwaza bidengxwendina Quranê li min dikir, min jî bi kelecana û bi tewna ku ez ji bavê xwe hîn bibûm, çend rûpel dixwend. Dû ra herkesî ji min ra „aferim“ digot û pesnê xwendina min dida.

Di wan salên xwe yên piçûk ta min jî Quranê tişteke fam nekiriba jî, ji xwendina xwe ya ezber kêf digirt. Çawa ku bavê min di destpêka hîn-kirinê da jî me ra gotibû, min jî bi xwendina Quranê gotinên Xwedê, gotinên Wî yên bi erebî dubare dikir. Dubarekirineke ezber, lêbelê bi kêf û kelecana...

Di her salê da, bi kêmasî bi carîyên 7, 12 ya jî 15an min dest bi xwen-

dina Quranê dikir û ji serî heta dawîyê dixwend. Wateya gotinên ku di Quranê da cîh digirtin, nizanibîya jî, ew kêf û kêlecana ku min jê digirt kêm nedibû, berevajî bêtir zêde dibû.

Ji destpêka xetinkirina Quranê salek şûnda, bavê min xwendina du kitêbên din jî fêrî min kiribû. Gor Quranê du kitêbên piçûk û zirav... Mîna Quranê ew jî bi tîp û xetên erebî, lêbelê bi wateya xwe gotinên tê da gotinên zelal û nas, gotinên bi zimanê min û zimanê bavê û kalên min...

Ji wan yek Nûbara Mele Ehmedê Xanî ya din jî Mewlûda Mele Ehmedê Batê bû.

Dema ku min dest bi xwendina wan kiribû, ne haya min ji Ehmedê Xanî ne jî ji Ehmedê Bate hebû.

Bi aqilê xwe yê wê demê, min ew herdu Ehmedan jî wek Xwedayên ku bi zimanê me diaxifin, dihesiband û wan ji xwe ra ji Xwedayê ku Quran nivîsiye, nêziktir didît.

Loma êdî ji Quranê zêdetir Nûbar û Mewlûd dixwend. Ev helwesta min carcaran bala bavê min dikişand, bavê min li min vedigerîya û digot; „kurê min xwe bi wan zêde nexapîne, min bizanibîya tu bi xwendina wan dest ji xwendina Quranê berdidî, min ew nedidan ber te û te hînî wan nedikir...”

Ji rexneyên wî ez kelogirî dibûm, min bi dengeke hestîyar xwe diparast û ji bavê xwe ra digot; „Ez ji xwendina Nûbar û Mewlûdê hertiştî fam dikim û vegotinên ku di wan da cîh digrin jî bêtir li min xweş tên. Loma ez ji Quranê zêdetir ji xwendina wan zêde hezdikim û dixwînim...”

Bi gotinên min ra bavê min di ber xwe da dikenîya û digot; „Çawa ku min bi dorê te hînî xwendinê kir, tu jî bi dorê wan bixwîne. Berê dest bi Quranê bike û heta dawîyê biqedîne, dû ra jî berê xwe bide Nûbar û Mewlûdê...”

Min jî bi salan wusa kir.

Di salê da çend caran Quran dubare bikiraba, ewqas jî pirtûkên her Ehmedan, Nûbar û Mewlûd, dixwend û dubare dikir.

Bi destpêkirina dibistanê ra jî min navber neda xwendina her sê kitêbên xwe yên pîroz. Di mehên payîz û zivistanê da danê sibê diçûm

dibistanê, danê esrê jî diçûm oda mêran. Bi awayeke din, danê sibê xwendekarê dibistanê, danê esrê jî feqîyê bavê xwe bûm.

Di dibistanê da jî xwendekarekî serkeftî bûm. Bavê min û mezinên civata oda mêran, serkeftina min a li dibistanê jî bi xwendina min a Quranê va girê didan û digotin; „Quran gotinên Xwedê ne, kî û kê wan dubare bike, Xwedê jî zêna wan bihêz, fam û feraseta wan jî zêde dike...”

Ev gotina mezinan jî bibû sedemeke din, ku min jî xwendina Quranê tu tiştek fam nekiriba jî, jî bo xatirê dubarekirina gotinên Xwedê û serkeftina xwe ya li dibistanê, her roj Quran digirt destê xwe û dixwend. Lêbelê êdî ne bi kêf û kelecana jî salên ewil...

Bi dubarekirinê ew ayetên kin ên ku li dawîya Quranê cîh digrin, jî Qulwela heta Yasînê min ew hemû ezber kiribûn. Dema ku dor dihat wan, min çavên xwe digirt û ew bi ezber dixwend.

Lê kêfa ku jî xendina Nûbar û Mewlûdê digirt, her diçû zêde dibû. Dema ku min ev beytên ku di Nûbarê da cîh digrin, dixwend, min digot qey lingên min jî erdê radibîn û ez ber bi ezmanên çîksayî difirim.

„Ji paş hemd û selewatan

Ev çend kelîmene jî luxatan

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê Nûbara Biçûkan‘ lê danî

Ne jî bo sahib rewacan

Belkî jî bo biçûkên Kurmancan“

Piştî salan şûnda ez têgihîştim, ku herdu Ehmedên ku min jî xwe ra wek Xwedayên nêzikî dîtibûn, ew jî mîna min kurd in û pirtûkên xwe jî bi zimanê me yê şîrîn, bi kurdî nivîsîne.

Bi vê têgihîştinê ra, min bêtir xwe nêzikî wan dît û jî wan hezkir.

Di dema xortaniya xwe da jî bûm şopînerên wan û li şopa wan gerîyam.

Mixabin we demê min jî bilî Mewlûd û Nûbara ku bi xetên erebî ha-

tibûn nivîsandin, tu tişteke din nedît.

Di dawîya salên heftêyê da, dema ku min xwe di nav sîyaseta kurd da dît, bi wê dîtîne ra jî ji hebûna Mem û Zîna Ehemdê Xanî hayîdar bûm.

Ew jî salên 1960î da, jî alî M. Emîn Bozarslan va, li Stenbolê û bi tîpên latînî hatibû çapkirin. Lêbelê li tu derekê nedihat firotin û dîtîn.

Nav û hebûna Mem û Zînê bihata zanîn jî, wê demê ew pirtûkeka veşartî û binerd bû.

Bi salan şûnda Mem û Zîn a Ehmedê Xanî kete destê min û weke kitêbeke pîroz di nav pirtûkxaneya min da cihê herî sereke girt.

Bi xwendina Mem û Zînê va mirov têdigihîje, ku Ehmedê Xanî çawa ku Nûbar diyarî „Piçûkên Kurmancan“ kiribe, Mem û Zîn a xwe jî diyarî mezinan kirîye.

Bi van beytên xwe bang li mezinan dike, sedema bindestî û belengazîya kurdan nîşanî wan dide û dibêje:

„Kurmanc ne pir di bê kemal in

Ema yetîm û bê mecal in,

Fîl cumle ne cahil û nezan in

Belkî sêfîl û bê xwedan in.“

Dû ra jî bo xilasbûna ji bindestîyê jî şîretên xwe li kurdan dike û wiha dibêje:

“Ger dê hebûya me ittîfaqek

Vêk ra bikira me înqiyadek

Rûm û ,ereb û ,ecem tamamî

Hemîyan jî me ra fikir xulamî

Tekmîl fikir me dîn û dewlet

Tehsîl fikir me ,ilm û hîkmet“

Çawa ku min di dema zarokatîya xwe da Nûbar û Mewlûd wek kitêbên pîroz didît, iro jî Mem û Zîn jî bo min kitêbeke pîroz e.

Kîngê bîr û bawerîyên min kêmbibin, berê xwe didim Mem û Zîn a Xanî û gotinên wî yên pîroz dubare dikim, dubarekirina bi kêf û kelecana û bi fam û feraset...

Dû ra difikirim û bi xwe jî xwe ra dibêjim, gelo ew kurdên ku Quran xwendine/dixwînin û di emrê xwe da bi hezar caran dubare kirin/dikin, tenê yekcar Mem û Zîn bixwendana...

Şîretên ku Xanî di Mem û Zînê da li wan kirîye, lê xwedî derbiketana, gelo ew hê bindest, Kurdistan jî hê di bin lepên Tirk û Ereba û Ecemana da dinalîya?..

12.10.2022

Şivanê Zimanê Kurdî: Erebo Şemo

Dema ku qala edebîyata Kurdî were kirin, bêguman navê Erebo Şemo û roman wî ya yekemîn Şivanê Kurd derdikeve pêş û cîhê xwe yê girîng digre.

Jiber ku Erebo Şemo ne tenê nivîskarekî Kurd e.

Wî bi nivîsandina romana Kurdî ya yekemîn, Şivanê Kurd va hîmê edebîyata Kurdî ya modern jî avêtîye. Ew hîm bi nivîsandina Jîyana Bextewar va bi hêz û fireh, bi Hopo û Kela Dimdimê va derket rû erdê û bilind bû.

Edebîyata Kurdî ya modern îro li ser hîmê ku Erebo Şemo avêtîye, bi dewlemendî dixemile û bilind dibe.

Ez bawer im gelek nivîskarên Kurdên ku îro bi edebîyata Kurdî ra mijûl dibin, roman, çîrok û helbestan dinivîsînin, piranîya wan bi pirtûkên Erebo Şemo dest bi xwendina Kurdî kirine û bi dubarekirina xwendina pirtûkên wî va kurdîya xwe pêşda birine.

Erebo Şemo di sala 1935an da romana xwe ya yekemîn, Şivanê Kurd, dinivîsîne, ku Şivanê Kurd di heman demê da romana Kurdî ya yekemîn e. Piştî weşana Kurdî, Şivanê Kurd bi zimanê Rûsî û Fransî jî tê çapkirin. Çapa Fransî jî alî Bazîl Nîkîtin va hatîye wergerandin, ku Nîkîtin di derbarê jîyan û dîroka Kurdan da kar û xebateke balkêş kirî ye.

Maksim Gorkî dema ku wergera Şivanê Kurd ya Rûsî dixwîne, di derbarê Erebo Şemo û Şivanê Kurd da wiha dibêje; „Gelê Kurd êdî bi zimanê nivîskarê xwe, Erebo Şemo, diaxife!“

Erebo Şemo yê ku hîmê edebîyata Kurdî ya modern avêtîye, gelo kî ye, jîyana wî li kû û bi çi awayî derbas bûye?

Bi rastî, qasî ku mirov bi berhemên wî yê giranbuha dilşa û serbilind

dibe, ewqas ji bi jîyana wî ya ku di nav feqîrîyê da dest pê kirîye û li sirgûnîyê derbas bûye, xemgîn dibe.

Ereb Şemo di sala 1897an da li gundê Sûsîz a girêdayî bajarê Qersê, hatiye dinyayê. Susîz wê demê gundekî Kurdên Êzdî ye û Qers û Erzurum jî di bin desthilatîya Rûsyayê da ne.

Ereb Şemo di xortanîya xwe da li bajarê Erzîrumê di rîya trêne da weke karker dixebite. Di wê demê da bi Bolşevîkan ra hev dinase û bi wan ra li dijberî rejîma Çar dest bi kar û xebata sîyasî dike. Sedem karû xebata xwe ya sîyasî Erebb Şemo, di sala 1916an da ji alî rejîma Çar va tê girtin û di girtîgeha Sarîqamişê da dimîne.

Pîştî derketina ji girtîgehê vedigere gundê xwe, bi Bolşevîkan ra têkilîya xwe xurt dike û di nav gundên derdorê da karên xwe yên sîyasî didomîne. Berîya Şoreşa 1917an ji Qersê derbasî bajarê Stravopolê dibe. Bi êrişa li bajarê Petrogradê ya li ser Qesra Çar va, di nav şerê navxweyî da cîh digre.

Tê gotin ku Erebb Şemo, li pey Fêrikê Egît Polatbekov Kurd ê duyemin e, ku di nav Artêşa Sor da cîh girtiye.

Pîştî Şoreşa 1917an Erebb Şemo, li Moskovayê di Enstîtûya Lazaryan, ku ew enstîtû wê demê di kar û xebata li ser zimanên Rojhilatî da navendeke girîng e, qeyda xwe çêdike. Jiber ku Erebb Şemo ji bilî zimanê Kurdî, gelek zimanan dizane, bi Tirkî, Gurcî, Azerî, Rûsî û Ermenîkî ji weke zimanê xwe yê zîmkakî diaxife û dinivîsîne.

Mixabin ew di sala 1937an da ji alî rejîma Stalîn va tê girtin û ji bo Sibîryayê tê sirgûnkirin. Erebb Şemo di kamiliya emrê xwe da careke din xwe di nav karê çêkirina rêya ji bo trêne da dibîne û sirgûnîya wî ya li Sibîryayê bi wî rengî 19 sal dikudîne.

Pîştî mirina Stalîn, di sala 1954an da weke hemû kesên sirgûn kirî cezayê Erebb Şemo jî diqede û ew ji wir vedigere Erîwanê. Nivîskarê Kurd Emerîkê Serdar di derbarê vegera Erebb Şemo da wiha dibêje:

„Me di rojnameya Sovetakan Hayastan ê da nûçeyek xwend ku, Nivîskarê Kurd ê Bolşevîkê kevn Erebb Şamîlov vegerîyaye Erîwanê. Heta wê demê me navê Erebb Şemo qet nebihîstibû. Ji bo ku navê wî neyê bihîstin, neyarên wî vala nesekinibûn. Sedem wê yekê emsalên me Erebb Şemo nas nedikirin.“

Erebb Şemo, piştî vegera xwe ya ji Sibîryayê nivîskarîya xwe didomîne.

Di sala 1959an da romana xwe ya duyemîn, Jîyana Bewxtewar, di sala 1966an da Kela Dimdimê, di sala 1969an da jî Hopo dinivîsîne. Hemû berhemên Erebb Şemodî nav Kurdan da belav dibin û tîn xwendin, bi gelek zimanên din jî tîn çapkirin û di nav edebiyata cihanê da cîhê xwe digrin.

Mirov dikare bi hêsanî bibêje, di warê edebiyat û romana Kurdî da keda Erebb Şemo pir û pir zêde ye.

Bi berhemên wî yê granbuha va zimanê Kurdî pêşda çû, pirtûkxaneya Kurdî rengîn û dewlemend bû.

Erebê Şemo jî vir 41 sal berê û di 81 saliya xwe de, roja 21ê Gulanê di sala 1978an da xatirê xwe jî dinyayê xwest û koça xwe ya dawî kir.

Lêbelê berhemên wî û tesîra wî ya li ser ziman û edebiyata Kurdî payîdar ma û wê bi wî rengî jî bimîne...

Ereb Şemo di dîroka min a şexsî da jî xwedî cîhekî girîng e.

Ez hê xortekî 15 salî bûm, romana wî ya yekmîn, Şivanê Kurd, jî alî weşanxaneya Rîya Azadî (Özgürlük Yolu) li Tirkîyê hatibû çapkirin û di heman salê da ketibû destê min.

Cara yekemin bû, ku min romaneka bi zimanê xwe yê zikmakî, ew zimanê ku di heft salîya min da jî min hatibû dizîn û jî min dûrketibû, dixwend.

Di xwendina xwe ya cara yekemîn da çiqas sedî sed jî romanê fam nekiriba jî, rojekî jî êvarê va dest pê kiribû, bêxew û bênavber xwendibû, bi destpêka sibê ra jî dawî lê anîbû.

Bi dubarekirin û sêbarekirina Şivanê Kurd va zimanê min ê ku jî min hatibû dizin, li min vegeyabû. Bi famkirina naveroka wê va jî dilê min geş, rûyê min jî kenîya bû.

Di destpêka salên 80yî da jî Jîyana Bextewar û Hopo li Stenbolê û bi awayekî veşartî ketin destên min.

Min ew herdu pirtûk jî weke Şivanê Kurd xwendin û dûbare û sêbare kirin.

Bi xwendina berhemên wî yê giranbuha va êdî zimanê min dilivîya û roj bi roj pêşda diçû...

Bi pêşveçûna zimanê xwe va bextewar û serbilind dibûm.

Jiber ku bi xwendina Şivanê Kurd ra, li ser welatê bav û kalên xwe vegeŕiyabûm..

Bi xwendina Jîyana Bextewar ra li pey koka xwe ketibûm...

Bi Hopo ra çûbûm Kela Dimdimê, li wir, bi mêrxasî û dîroka dewlemend a gelê xwe dihesîyam.

Di bin sîya bircên Kela Dimdimê da, min jî xwe ra warekî nû ava dikir û tê da bi zimanê xwe yê şîrîn diaxifim...

Di kûrahîya dilê xwe da şa dibûm, bi dengê bilind dikenîyam û dû ra bêdeng dimam û digirîyam...

Bi xwendina pirtûkên Ereba Şemo ra di jîyana min da rûpelek nû vebibû.

Rêyeke nû dereketibû pêşîya min û îro jî di wê rê da, bi dilekî şa û bi rûken dimeşim...

Bi mêjûyekî zelal û bi zimanê xwe yê şîrîn, ew zimanê ku dayîka min bi lorîyên xwe min mêjandibû û mezin kiribû...

Ji dil va difikirim û diaxifim...

Dixwînim û dinivîsim...

Bi dewlemendîya zimanê min...

Dilê min geş...

Hestên min azad...

Jîyana min xweş û rengîn dibe...

Loma ez îro xwe deyndarê Ereba Şemo dibînim û wî tu car jîbîr nakim.

Di her bîranînê da jî dil û can dibêjim, bila ruhê te şad û cihê ku gulistanêke rengîn be!

21.05.2019

Pênc pirtûk û nivîskarek

Nivîskar Wezîrê Eşo, pirtûk ji Îtbarî, Tosinê Êşan, Sîber, Qirme û Hosta Hovannes e...

Dîrok, bi rûyê xwe yê fermî çîroka serdestan e û di wê çîrokê da bindest ji, mirovahî ji cîh nagre.

Lêbelê rûyekî wê yê din ji heye, ku ew ji çîroka rastîya jîyanê ye. Di wê dîrokê da êş û jan, xwîn û girî, komkuji û koçberî, ken û henek, şahî û serkeftî ji cîh digrin.

Lehengên wê dîrokê zêde û bênav in. Ew, dê û bav, xwişk û bira, xal û xwarzî, ap û birazî ne.

Loma di zarê dengbêjan da dibe stranên mêranî û mêrxasîyê û diherike...

Di vegotina çîrokvanan da dibe destanên li ser evîn û evîndariya keç û xortan...

Di nav rûpelên defterên helbestvan û nivîskaran da dixemile, dibe helbest û roman.

Dîrokzan bi çavên xwe, li rût û tazîbûna bûyerên di dîrokê da qewimîne, dinîhêre, wêjekar rûyê neynûkê dide dîrokê û êş û jan a dîrokê, bi evîn û evîndariya lehengên xwe va dityêşîne.

Jiber ku, dîrokzan bi jimar û bûyerê ra, wêjekar bi xemla jîyanê ra mijûl e.

Ji wan kesên ku çîroka bav û kalên xwe, herwiha dîroka gelê xwe bi xemla jîyanê va xemilandinê û nivîşîne, ji wan yek ji Wezîrê Eşo ye.

Loma, berî pênc pirtûkên wî, divê mirov berê Wezîrê Eşo nas bike, ku ew kî ye?

Nivîskar, lêkolîner û rewşenbîrê Kurd Wezîrê Eşo, di sala 1934 li

Tiblîsa paytextê Gurcîstanê hatîye dinyayê. Bav û kalên wî di destpêka sedsala 20an da ji Zêdka koçber bûne, ku Zêdka niha bi navê Eleşgirtê navçeyeke girêdayî bajarê Agirîyê ye...

Wezîrê Eşo di sala 1953an da li paytextê Êrmenîstanê li Zanîngeha Erîvanê dest bi xwendina fakulteya dîrokê dike. Di navbera salên 1958-61ê da wek rêvebirê dibistana Gundê Pampê dixebite. Di navbera salên 1961-63an da li bajarê St. Petersburgê, li Enstîtûya Rojhilatzanîyê li ser dîroka Kurdistanê lêkolînê dike.

Ji sala 1964an heta sala 1983ê wek redaktör, di radyo, televizyon û çapemenîya Ermenîstanê da dixebite. Di navbera salên 1983-94an da jî karê redaktorî û wergerîyê di Radyoya Êrîvanê da tîne cîh. Bi hezaran gotarên wî di rojnameya Rîya Teze û di rojname û kovarên Ermenîstan û Rusyayê da hatine weşandin.

Wezîrê Eşo di sala 1991î da bi xelata Yekîtîya Nivîskarên Ermenî û Seksîyona nivîskarên Kurd ya bi navê Erebê Şemo tê xelatkirin.

Piştî hilweşandina Sowyetê Wezîrê Eşo jî mîna bav û kalên xwe, ji cîh û warên ku lê mezin bûye, koçber dibe. Mixabin di roja 23ê Berfanbar a 2015an da jî li welatek xerîb, li bajarê Brûkselê koça xwe ya dawîyê dike.

Pirtûka Yekemîn: Îtbarî

Mijara pirtûkê koçberî ye, çîroka koçberîya Kurdên Êzdî yên li Gurcîstan û Ermenîstanê.

Dem, destpêka sedsala 20an e. Du dewletên mezin, Osmanî û Rûs di nav şereke demdirêj da ne û qada şer jî Kurdistan e. Gor encama şer, gund û bajarên kurdan bi caran dest diguherînin, ger dikevin bin desthilatîya Rûsan, ger dikevin bi desthilatîya Osmanîyan. Herdu dewlet şerê hev dîkin, mixabin Kurd di nav xwînê da dimînin, tên kuştin û birîndar dibin.

Ji bêçaretîyê, mal û milkê xwe li paş xwe dihêlin û ji warê bav û kalên xwe koçber dibin.

Nivîskar jî di vê pirtûkê da rabirdûya hemû Kurdên Êzdî yên ku di destpêka salên 1900î da ji gundên derdora Qersê revîyane û xwe avêtinê Ermenîstan û Gurcîstanê dike mijar û vedibêje.

Ji devê meta bavê xwe Meyane, çîroka koçberîya mala Hûtî Begê tîne ziman, ku Hûtî Beg kalikê nivîskar e. Meyane jî di dema koçberîyê da keçikeka piçûk e û bi malbata xwe ra dikeve serê rê û dirban. Rûbirû tî û birçîbûnê dibe, zarokên ku di Ava Reş da dixeniqin, bi çavên serê xwe dibine, ku di derbarê wê demê da wiha dibêje:

„Welat çetin e, destê merîya jê nabe. Li ser axa me şer û pevçûn kêr nedibû. Em bêçare man û me xwe avêt serê çol û çîyan. Li pêşberî me Ava Reş rê li ber me digirt, li paş me jî Roma Reş berî me dida. Ava Reş jî mîna qedera me reş diherikî. Di derbasbûna ji avê da gelek zarok, jin û kalemêr di Ava Reş da xeniqin û di ro da çûn.”

Yên ku ji Roma Reş xilas dibin û ji Ava Reş derbas dibin, berê xwe diavêjin bajarê Gumrî yê, ji wir jî derbasî Axbaranê dibin, ku wê demê li Axbaranê 12 gundên Êzdîyan hebûne û ew jî ji berê da hatine li wir bicîh bûne.

Malbata Hûtî begê jî li Axbaranê bicîh dibe û ji nû va dest bi jîyana xwe ya li koçberîyê dike. Di derbarê jîyana xwe ya nû da vebijêrê çîrokê Meyane wuha dibêje; „Koçber ne tenê welatên xwe, di dema koçberîyê da hemû tiştên xwe jî wenda dîkin... Mîna Hûtî Begê bavê Eşo û sîwarê Têro...”

Pirtûka Duyemîn: Tosinê Êşan

Mijara pirtûkê, di kesayetiya Tosinê Êşan da nîrxandina pergala kolxozîya li Sowyeta berê ye.

Lehengê romanê Tosinê Êşan, mirovekî navsele, kesekî bêxwedî, gundîyekî bê mal û bê milk e. Jiyana Tosin û jina wî Zeynê bi şivantî û xizmetkarîya li gundên kurdan yê li ser bajarê Rewanê derbas dibe.

Li wî gundî edî çî tê serê wan, Tosinê Êşan û jina xwe Zeynê, rojek ji rojên germa havînê, di meha Hezîranê da radibin, berê xwe didin gundekî din û ji xwe ra li cîh û wareke din digerin.

Di germa havînê da dimişin û bi dane nivroyê ra digihîjin gundekî.

Gund, gundê kurdan e, Apê Êsiv jî dewlemendê gund, xwedî kerîyên pez û dewar e. Dema ku Tosin û Zeynê tî nava gund û halê xwe jî gundîyan ra vedibêjin, gunehê Apê Êsiv bi Tosin û Zeynê tê û derê mala xwe ji wan ra vedike. Cil û nivîn, nan û av dide wan û wan di me-

reka xwe da bicîh dike. Tosin herçiqas Kurd be jî, kes nizane ji kûderê û ji kîjan êl û eşîrê ye. Jiber ku Tosin bixwe jî nizane ew kî ye. Tene dizane, ku nave bavê wî Êşan, loma ji wî ra jî Tosinê Êşan gotine.

Hemû sermîyanê Tosin çoyê destê wî ye û ew bi saya Apê Êsiv li gund bi cîh dibe. Tosin dibe şivanê gund, jina wî Zeynê jî di nav malên gundîyan da karê xulam û xizmetkarîyê dike.

Çend sal şûnda, rojek ji bo damezrandina pergala kolxozîyê, ji bajarê Rewanê heyetek tê gund. Bi hatina heyetê ra pergala gund ser û binê hev dibe, rewşa gund û gundîyan ji binî va tê guhartin.

Heyet, berê bi gundîyan ra dicive, rewşa gundîyan gor sê xalan tasnîf dike. Gor wê tasnîfê Apê Êsiv dewlemend, Tosinê Êşan feqîr û xizan, gundîyên din jî di hale xwe da ne.

Heyet, gor pergala nû, Tosin wekî batrak (feqîr û xizan) binav dike û li hizûra gundîyan jê ra dibêje; “Tu ji îro şûn va di vî gundi da çav û guhên dewleta Sowyetê yî, ji ber ku dewleta Sowyetê dewleta karker û xebatkaran, dewleta feqîr û xizanan e...”

Pergala kolxozîyê li gund saz dibe, Tosin jî ji wê rojê şûn va ne tenê çav û guh, dibe hertîstê dewletê û serenca wî ya bi gundîyan ra dest pê dike.

Ji bilî çoyê Tosin, êdî sermîyaneke wî yê din jî heye, ku ew jî, Heval Stalîn e...

Şev û roj, radibe û rûdinê, ji gundîyan ra pesnê Stalîn dide; “Bijî bavê me heval Stalîn...” dibêje û vê hevokê bi gundîyan dide ezberkirin.

Rojek ji rojan gundîyek ji Tosin ra dibêje; “ger ez jî yekî mîna te dîn bim, bi saya Stalîn bibim çav û guhên dewletê, sere min bilind bibe û li ezmanan bikeve... Ez dê Stalîn bikim bav ji bira jî...” Piştî danîna pergala kolxozê û bi fen û fûtên Tosin va, Apê Êsiv ê ku Tosin di xaniyê xwe da bicîh û starî lê kiribû, wek kulak tê tawanbarkirin û bi malbata xwe ra jî bo Sibirîyê tê sirgûnkin.

Tosin jî di gund da dibe çav û guhê dewletê û bi qedera gundîyan ra dilîze. Ji kê biqahire, gîlîyê wî dike û dide sirgûnkirine.

Tirs û xofa ku ji Tosin tê kirin, di dilê gundîyan cîh digre, ku sedem wê tirsê gundî jî jinên xwe jî dikevin şikê û li cem wan jî di derheqê Tosin da gotineke xirab nakin...

Gundî herçiqas ji pergala kolxozîyê razî nebin jî, ji tirsê Tosin û de-

wletê dengê xwe bilind nakin. Tenê di nav xwe da, gilî û gazine xwe di guhê xwe da dipispisin û ji hev ra wiha dibêjin; “tenê maye ji me ra bibêjin, ka em çava herin nav cîh û nivînên xwe û bi çî rengî bi jinên xwe ra razên...”

Nivîskar di vê pirtûkê da pergala kolxozîyê, bi bûyerên jiyayî dinirxîne û nirxandina xwe jî bi qirf û henekên va dixemilîne.

Pirtûka Sêyem: Sîber

Mijara pirtûkê, jiyana civakî ya Kurdên Êzdî yên li Gurcîstan û Ermenîstanê ye.

Lehenga romanê qîzeke bedew û nazenîn, Sîber e.

Nivîskar, di kesayetî û kurtejiyana Sîberê da adet û tore, şîn û şahî, cil û berg û nêrînên kurdan li ber çavan radixîne û bi tomarkirina di nav vê pirtûkê da wan jî wendabûnê xilas dike û diparêze. Sîber qîzeke bedew û nîvbajarî ye. Zarokatîya wê li bajarê Tîblîsê û bi xwendina dibistanê derbas bûye. Rojek ji rojan rêya xortekî ji gundên nêzîk, bi gundê mala bavê Sîberê dikeve. Navê xort Temir, Temir jî xortekî perwerdekirî û di kolxozê gundê xwe da xebatkar e. Dema ku Sîberê dibîne, bi bedewîya wê ra heyr û hijmekar dimîne. Vêgere gund, ji dîya xwe ra qala Sîberê dike û demek şûnda jî bavê wi wek xwezgînî berê xwe dide mala bavê Sîberê. Bavê Sîberê mirovekî nîvbajêrî û zana, bavê Temir jî mirovekî gundî, kesekî kevneperest û çavnebar e.

Bavê Temir, Xudo, herçiqas bibe xwezgînî jî, bêdil e û li dijberî zewaca Temir a bi Sîberê ra ye. Ew, sedem xwendin û nîvbajêriya Sîberê, wê layiqî mala xwe nabîne. Jibo ku Temir û Sîber negihîjin mirazê xwe, çî ji destê wî were, ji xwe şûnda nahêle û dike. Lêbelê ew çî bike jî dîsa bi ser nakeve, gor nerazibûna wî Temir û Sîber diziwecin û daweta wan tê kirin.

Edeetê kurdan e. Xînamîtiya kurdan, bi hezkirin û kêfxweşîyek jî dest pê bike, heta roja dawetê bi qîlûlikên kêr û zêde ya jî bi pîrsgîrêkên piçûk didome. Piştî roja dawetê, dawî li hezkirin û kêfxweşîyê tê û nayartî dest pê dike. Ew neyartîya ku bi taybetî malbata zavê bi yekalî didomîne, heta bûk û zava jî mal cihê nebin, ti car naqede...

Xido yê bavê Temir jî wusa dike. Piştî dawetê jî nêrîna xwe naguherîne û pêşîra Sîberê bernade. Jibo ku Sîber, ji Temir veqete û vegere mala

bavê xwe, hemû kar û barê malê bi Sîberê dide kirin. Şîrê ku Sîberê ji dîya xwe mijîyaye, di pozê wê ra tîne.

Xido bi tade û zilma ku li Sîberê dikie jî nasekine, di her firsendê da li ser bûka xwe qîlûlikan derdixe û wan bi der û cînarên xwe ra jî parva dike. Dema ku cînar pesnê bedewî û zanebûna Sîberê didin, wê gavê jî hêrs dibe û jî wan ra dibêje; „Bedewî û zanebûna wê ji min ra çi, ger ku nizanibe mîh û çêlekan ji min ra bidoşe...”

Sîber xirabîya ku jî xezûr û xwesîya xwe dibîne, roj bi roj dihele û jî jîyana xwe bêzar dibe. Lêbelê ew jî xwe zêdetir, rewşa dê û bavê xwe difikire, jibo ku navê wan xirab neke û di ser wan da venagere. Mixabin bîr û baweriyên wê kêm, jîyan li ber çavên wê reş dibe, roj tê, jî bêçarêtîya xwe, di nîvê şevekê da radibe, di kuncikê axur da weris davêje qîrika xwe û xwe dixeniqîne. Bi mirina Sîberê ra daxwaza Xido yê xezûr tê cih, lêbelê mirazê bûk û zavayê dest bi hine di nîvî da dimîne...

Pirtûka Çaran: Qirme

Mijara vê pirtûkê, di destpêka avakirina pergala sosyalîzmê da, civaka Kurdên Êzdî ye.

Lehengê romanê xortekî Kurd, nave wî jî Tîtal e.

Tîtal mîna navê xwe xortekî bedew, xortekî perwerdekirî û zana, serokê komsomola gund, evîndarê sosyalîzmê û heyr û hijmekarê Stalîn e.

Şev û rojên Tîtal bi kar û xebatê jî bo serkftina komsomolê derbas dibe. Bi zanebûn û serkeftîya xwe, di navçeyê da nav û dengê wî belav dibe. Ji bilî xebata jî bo serkeftina sosyalîzmê ew ne zewacê difikire, ne jî qîzên derdora xwe dibîne û li wan dinihêre.

Heval û hemsalên wî di dizewicin, dibin xwedî zar û zêç, lê gor der û cînaran Tîtal hê di malda mayî ye. Heta sedem wê yekê hinek di derbarê mêraniya wî da qîlûlikan jî derdixin, ku ew qîlûlikên di nav gund da belav dibin, heta guhê wî jî tên.

Rojek bi çûyîna xwe ya Tîblîsê ra çavê Tîtal li qîzeka bajarî dikeve û pê ra jî jîyana wî tê guhartin. Navê keçikê Gezo ye. Bi dîtina yekamcar va xwîna Gezo û Tîtal li hev dikele. Bejn û bal û bedewîya Gezo hiş û aqilê Tîtal jî serê wî dibe û sermest dike.

Gezo jî qasî bedewîya xwe keçikeka xwenda û zana ye. Tîtal bi alî-

karîya dotmameke xwe Gezo nas dike û di hevdişina xwe ya ewil da daxwaza zewacê lê dike. Bi erênîya Gezo ra, dê û bavê Tital dibin xwazgînîyê Gezo û wê ji Tital ra dixwazin. Piştî xwestinê, di demeke kin da daweta wan tê kirin û ew bi şahîyeke kurdewarî dizewicin. Gezo ya li bajarê Tîblîsê mezin bûye û xwendîye, dibe bûka gund û di demeke kin da wek keçîkeka di gund da mezin bibûye, hemû kar û barê gundîyê hîn dibe û dike. Qasî nav û dengê Tital, bedewî û jêhatîbûna Gezo jî di gund û herêmê da belav dide.

Dema ku gundî qala Gezo dikin, bi heyr û hijmekar pesnê wê didin û dibêjin; „Bukeka pê û par e, li bajêr mezin bûye, lê hemû karê gundîyê jî qîzên gundan baştir dike. Ev hemû huner û jêhatîbûna wê jî ji xwendina wê ye...”

Bedewîya Gezo û serkeftîya Tital a di xebata komsomolê da li navçeyê jî dibe mijar û tê axaftin. Rojek jî rojan Koçaryan ê serokê partî û saloxgerî ya navçeyê tê gund û di dawetekê da Gezo dibîne, bi dîtina wê ra jî matmayî dibe. Jibo ku Gezo jî nêzîk va bibîne û pê ra biaxîfe, Koçaryan destê Tital û Gezo digre, bi wan ra dikeve govendê û direqîse.

Govend diqede, lê bedewî û bejn û bala Gezo jî ber çavê Koçaryan naçe. Loma Koçaryan jî wê rojê pê va, li wendakirina serê Tital digere.

Titalê ku jî bo serkeftina sosyalîzmê û Stalîn serê xwe dide, Koçaryan bi fen û fût, berê Tital bi dijminatîya rejimê va tawanbar, dû ra jî sirgûnê Sibîryayê dike.

Gezo ducanîye, piştî wendakirina Tital diwelide û lawek jê ra dibe. Ji bo bîranîna mêrê xwe, navê lawê xwe jî Tital lê dike.

Ji bo ku nêzîkî Gezo be, Koçaryan wê jî bo serokatîya kolxozê gund pêşnîyar dike. Gezo dibe serokê kolxozê, lêbelê Koçaryan nagihîje mirazê xwe. Jiber ku Gezo heta dawîya emrê xwe, wek jineka bî, li ser Titalê lawê xwe disekine û bi keda enîya xwe wî mezin dike...

Pirtûka Pêncan: Hosta Havannes

Mijara pirtûkê, çîroka li ser hevaltîya Ermenîyekî û Kurdekî Êzdi ye.

Kurd, bavê nivîskar Eşo yê Hûtî, Ermenî jî hosta û çêkerên diwaran Hovannes e.

Eşo yê Hûtî, Kurd û koçberekî ji herêma Serhedê, Hosta Hovannes ji Ermenî û koçberekî ji Ermenîyên Îranê ye. Eşoyê Hûtî li gundê Pampê, Hosta Hovannes ji li Humamlîyê, ku nuha jê ra Spîtak dibêjin, bicîh bûye.

Cara yekem ew di sala 1934an da hevdu nas dikin. Hosta Hovannes ji malbata Eşo ra du odeyên bi pace û pencere çê dike, hevaltî û dostanîya wan jî ji wê demê va dest pê dike û didome.

Dem tê Eşo ji gund koçberî Tîblîsê dibe, xanî yê ku jî alî gundîyan va wek îstasyon tê binav kirin, jihev da dikevin û xirab dibin. Zarokên Eşo mezin dibin û dizevicin, dû ra dixwazin ji xwe ra li gund havîngehan çê bikin. Ji bo vê yekê Eşo vedigere gund û hevalê xwe yê Ermenî Hosta Hovannes dibîne. Jê dixwaze, ku ew ji wî ra bi destê xwe xanîyeke nû çê bike.

Mixabin Hovannes êdî kale û jî zû va dest ji çêkirina xanîyan berda ye. Ji lawên Eşo yek Şîralî li Spîtakê doxtor e û ew Hovannes ji nêzik va nas dike. Şîralî li dijberî daxwaza bavê xwe derdikeve û jê ra dibje, “Bavo, ew êdî nikare ji cîhê xwe ra be, lê ewê çawa kevirên giran ji erdê rake û pê dîwar çê bike...”

Eşo, “kuro tû wî qasî min nas nakî, ew birayê min e, daxwaza min naşkîne û ew ê were dîwarê mala min bi destê xwe çê bike...” dibêje û bersiva lawê xwe dide.

Di encamê da gotina Eşo rast derdikeve û Hosta Hovannes bi wê kaltîya xwe tê û xanîyê birayê xwe jê ra bi destê xwe çê dike...

Ji bo pîrsa Şîralî yê ku lawê Eşo û doxtorê wî ye, bersiveke wiha dide; “Şîralîyê min Eşo yê birayê min ji rêyeke dûr hatîye û daxwaza çêkirina xanî li min kirî ye, ez ê çawa wî bişkînim û daxwaza wî di cîh da bihêlim...”

Nivîskar, bi hevaltîya bavê xwe û Hosta Hovannes rava dide ku, mirov bi kesên ji heft bavan dûr, heta bi kesên ji mileteke cûda ra jî dikare bibe heval û bira, bes ku ji hev ra durust û dilsoz be...

Hevaltîya Eşo yê Hûtî û Hosta Hovannes ji hevaltîyeke ji biratîyê ji nêzîktir bûye û dibe ku ji sedemên wê hevaltî û dostanîya ji dîl, yek jî ev hevparîya wan, koçberî, be.

Wek gotina dawîyê ez dikarim bibêjim, her sê roman û du novelên Wezîrê Eşo ji hêjayî xwendinê ne.

Jiber ku mirov di her pênc pirtûkan da jî, hemû xalên jîyana Kurdên Êzdî yên ku, li Gurcîstan û Ermenîstanê jîya ne, dibîne. Nivîskar ew jîyan bi hostayî û hunera xwe va li ber çavan radixîne. Ew jîyana ku bi koçberîya ji herêma Serhedê dest pê kirîye û di nav welatên Sowyetê û 70 sal di bin pergala sosaylîzmê da derbas bûye, piştî hilweşandina sosyalîzmê jî careke din rû bi rû koçberîyê maye, di pirtûkên Wezîrê Eşo da, bi berfirehî dibîne...

Jiber ku zimanê nivîskar zelal û paqij, vegotina wî jî bi qalibên Kurdî xemilandî û herikbar e.

Loma, mirov ji dewlemendî û ahengîya ziman tahma xwendinê digre û bi lehengên pirtûkan ra dibe heval û hevpar.

Bi êş û jana ku wan di jîyana xwe da kişandiye ra xemgîn, bi serkeftinên wan ra jî dîlşa û bextewar dibe...

26.02.2021

„Evîn sînoran nasnake“

Evîna qedexe, navê romana nivîskar û helbestvanê Kurd Eskerê Boyîk e.

Wek ji navê romanê jî tê zanîn, ku mijara romanê ji evîna xortekî Êzdî û keçikeka Asûrî pêk tê û lehengên romanê yên sereke Wezîr û Asîya ne.

Wezîr xortekî Êzdî, Asîye jî keçikeka Asûrî ye.

Wek tê zanîn, Êzdî jî, Asûrî jî bi kesên ji derveyî civaka xwe ra naze-wicin. Bi taybetî keç ya jî xortekî Êzdî dema ku bi keseke ji derveyî civaka xwe ra bizewice, jî Êzdayetîyê derdikeve û zarokên wan jî êdî wek Êzdî nayên qebûlkin.

Loma pismam û dotmam, qîz û lawxaltî, keç û xortên cînar bi hev ra dizewicin. Ev zewaca navxweyî herçiqas bi taybetmendîya olî va hatibe girêdanê jî, ev teybetmendîyeke hemû kêmayetîyan ya jibo xwepara-stinê ye.

Dema ku mirov li dîrokê dinêre, dibîne ku hemû kêmayetîyên olî ya jî neteweyî jî bo ku xwe biparêzin, derîyên xwe jî kesên ji derveyî xwe ra girtine û wek civakên xwedorpeçkirî jîyana xwe domandine.

Taybetmendîya Êzdiyan yek jî ev e, ku Êzdî di nav netewa xwe da jî kêmayetîyên olî ne. Bi awayeke din ew kêmayetîyên kêmayetîyan e.

Ew sedem nasnmayên xwe yên neteweyîyê jî dagirkeran, sedem nas-nameyên xwe yên olî jî ji Kurdên biryaên xwe yên Misilman zilm û zordarî dîtine û jî du alî va rû bi rû piştaftinê bûne.

Nivîskar Eskerê Boyîk di Evîna Qedexe da, evîna xortê Êzdî Wezîr û keçikeka Asûrî, Asîyayê kirîye mijar û gor şert û mercên Êzdayetîyê, bi hevokên kin, bi zimanê zelal û herikbar hunandîye.

Dema ku mirov dest bi xwendina pirtûkê dike, xwe li Rewanê, li gundên quntara Çîyayê Elegezê, di nav civaka Kurdên Êzdî, ku bi erf û edetên xwe, bi xwerin û vexwerinên xwe, bi ziman û ola xwe jîyane, bi van taybetmendîyan xwe parastine û heta roja îro Kurd ma ne, dibîne.

Sedema qedexebûna evîna Wezîr û Asîyayê jî ev parastin e.

Di romanê da Apê Kerem, ku bavê Wezîr e, nerazîbûna xwe ya li dijberî evîna qedexe da, ji hevalêkî lawê xwe ra wiha dibêje: „Ez dizanim ew gura te dike, birê apo, jê ra bêje bira terka wê kecikê bide. Ez nabêjim keçik xirab e, na, lê zêr be jî, horî be jî, milayket be jî ew jî wî ra nabe. Tu dizanî zewaca me tev mîletekî din qedexe ye. Çi dixwaze ez ê jê ra bikim, ez ê jê ra Volgakê nû bikirim, ez ê jê ra maleke rind di nav Rewanê da çêkim, hebûna xwe gişkî ez ê di bin pîyê wî da raxêlim, tenê bila vegere... Destê xwe dirêjî kîjan keça Êzdî bike ez ê jê ra bînim... Em Êzdî ne, Êzdî ne, Êzdî! Ew kirina wî jî min ra mirin e...”

Li aliyê din dîya Asîyayê jî jinikeka xwende û mamosteyê zimanê Rûsî ye. Ew jî zewaca keça xwe ya bi xortekî Êzdî ra qebûl nake, jiber ku Asûrî ye.

Asya jî Wezîr jî, keç û xortên xama û xwendekarên zanîngehê, ji erf û edetên civaka xwe hayîdar û zana ne. Ew jî dizanin ku evîna wan, evîneke qedexe ye. Lê evîn e û evîn jî şinoran nas nake. Loma ew jî ji bo zewac û jîyaneke bextewar ne dikarin riza dê û bavên xwe bigrin, ne jî dikarin jihev biqetin.

Ji heval û hogirên xwe ra gilî û gazinek xwe tînin ziman, mixabin gilî û gazinek jî pere nakin.

Asîya di derbarê erf û edetên herdu aliyan da ji hevaleke xwe ra dibêje:

“Di vî halê xwe yê giran da ez him girîyam û him jî min ji xwe ra rastîyek eyan kir. Civak, ol, erf û edetên hişk romantîzmê, evînê, hestên nazik û paqîş nas nakin, edet wek kevir giran û bê wijdan in...”

Nivîskar di nav evîna qedexekirî û kevneşopîyên civakê da bêalî ye.

Li alîkî, di kesayetîya Wezîr û Asîyayê da romantîzm û paqîşîya evînê derdixe pêş, li aliyê din jî sosyolojîya Civaka Êzdî ya sedsala 20an radixîne ber çavan. Bi vegotina xwe da bala xwendevan dikişîne ser dîrok û jîyana Êzdîyan, ew dîrok û jîyana ku bi komkuji û koçberîyê derbas bûye...

Gelo Êzdî çima du bavên xwe li cîhekî çal (binax) nekirine?

Çima bi kesên ji derveyî civaka xwe ra nazewicin?

Bi zewaca navxweyî va çiqasî xwe parastine û li ser koka xwe mane?

Bersiva van pirs û pirsgirêkan jî, nivîskar di kesayetîya Apê Kerem da tîne ziman û bi mînakên ji jîyanê û bi berfirehî dibersivîne.

Apê Kerem, ji hevalê lawê xwe ra wiha dibêje:

“Vê payîzê gereke we herduyan jî bizewicînim, ji xwe ra du keçên baş bibînin, keçên Êzdîyan. Tenê keçên Êzdîyan! Em Êzdî gunê ne, hindikin, bêpişt in, li dinyayê bela bûne, gerek zêde bibin, divê zarên we gelek bin...”

Apê Kerem çima wusa difikire û di nêrîna xwe da çima evqas serhişk e. Sedema vê serhişkbûnê jî nivîskar dîsa bi van gotinên wî wiha tîne ziman:

“Lawo kal û bavê xwe bîra nekin, pêşîyên xwe bîra nekin. We ew bîr kirin hûn ê xwe û Êzdîtîya xwe jî jibîr bikin. Pêşîyan gotine, Êzdîyan du bavên xwe li cîhekî çal nekirine...”

Mirov di romanê da nakokîya kevneşopî û zanistîyê jî dibîne. Nivîskar di kesayetîya Apê Kerem da kevneşopîyê, di kesayetîya xwedîyê evîna qedexê Wezîr û Asîyayê da jî zanistîyê dinirxîne. Di encamê da nivîskar jî nîşan dide, ku kevneşopî herçiqas rê li ber helandina civakê bigre jî, di şert û mercên îroyîn da rola wê jî parastina bi zanistî kêmîr e.

Di warê pevxistin û tewna romanê da jî gotinên ku mirov bike, hene û zêde ne.

Bêguman, wek hemû romanên Kurdî, di vê romanê da jî hinek kêmasî hene. Jiber ku diroka romannivîsîya Kurdî dirokeke dirêj nîne û hê di destpêke da ye.

Di wêjeya Kurdî da pêşveçûna vê beşê jî, dîsa bi xwendin û nirxandina bi çavê rexnegirîyê va girêdayî ye.

Din av kurdan da xwendin kêm, rexnekar jî hê peyda nebûne. Loma romannivîsî jî hê di asta livandinê da ye û mîna zaroka ku bi çaplûkan bikeve, li rêya xwe ya rast digere...

Ji bo ku romana Kurdî jî di nav romanên cîhanê da cîhê xwe bigre, qasî nivîsê, xwendin û nirxandin jî pêwîst e.

Hûn jî romanên Kurdî, bi taybetî Evîna Qedexê bixwînin û jî tama zimanê xwe yê şîrîn bêpar nemînin...

25.12.2020

Dojeh

Dojeha li rû dinê...

Dojeha ku her carê li derekî ji bo kurdan ava dikin û wan tê da dişewitînin...

Dojeha Receb Dildar ji di salên 80yî da jî li Amedê hatibû avakirin.

Heta roja îro min ji kesên ku ji wê dojhê xilasbibûn, gelek tişt bihîstin...

Ew pirtûkên ku di wê dojhê da hatibûn nivîsandin, xwendin.

Kesên ku ji wê dojhê flitibûn û di derbarê wê da pirtûk nivîsibûn, her yekî bi rengê dojeha xwe tarîf dikir.

Lêbelê di her pirtûkekê da parçeyê dojhê derdiket pêş.

Di hinekan da kirin û kiryarên zebanîyan...

Di hinekan da jî mêranî û mêrxasîya kesên di dojhê da berxwe dabûn...

Çend roj berê jî pirtûka Nivîskarê Kurd Receb Dildar kete destê min.

Min bi kelecana dest bi xwendina pirtûkê kir û bi derbekî da xwend û xilas kir.

Îşkencexaneyê Erzîrumê ya li ser rêya Qersê û dojeha ku dê û bavê min tarîf dikirin û min pê ditirsandin, wek şerîda fimekî di ber çavên min ra derbas bûn. Dû ra bi xwe jixwe ra got; „xwezî bi wan dojehan...”

Receb Dildar dojeha Amedê, bi zimanê xwe yê zikmakî û bi tewneke wêjeyî tarîf dike û dibêje;

„Dojeha ku di kitêbên pîroz da dihat tarîfkirin li vê dinyê ava kiribûn Pîsporiya Îşkencekaran, jî pîsporiya zebanîyên dojhên îlahî zêdetir bû. Dojeha ji dojhê dojhtir, li navenda Amedê, ji bo me ava kiribûn...”

Dildar pisporîya zebanîyên dojecha Amedê jî bi hûrgulî vedibêje û sedemê avakirina wê jî bi gotineke sivik û zelal di serê merîyan da bi cîh dike. Wiha dibêje;

„(...) (Zebanîyan) bi dorê zimanê min girtin û kişandin, çawa ji kokê va hilneqetîya ez jî nizamim. Bi rojan ziman di nav devê min da wek berateyekî, werimî ma. Min wê çaxê fam kir ku ew baş dizanin wê derba xwe li ku derê bixin.

Lê em?

Em ne wusa bûn. Piştî min dît ku ew çawa dijminatîya zimanê me dikin, ez hîn nû bi xwe hesîyam. Ez tê gihîştim ku kakilê meselê ziman e...”

Gelo çima Kurd li ser axa xwe jî bihûşteke rengîn bêpar man û hercarê rûbirû dogehên dagirkerên xwebûn. Ez bawer im bersiva vê pirsê jî di pirtûkê da bi zelalî hatîye dayîn, ku nivîskar di derbarê vê yekê da wiha dibêje;

„(...) Dîroka me bi hêşiran hatîye avdan. Ji bo kêmkirina hêşiran em her carê, kirasekî li xwe dikin. Em kirasekî nû li xwe dikin ku hêşiran jî bîr bikin; lê her carê dest davêjin kirasê me û em dîsa ripîrût li meydanê dimînin...”

Bêguman yên ku ji kurdan ra dojehan ava dikin û wan di sîtlên qetranê da dişewitînin ne tenê Tirk in. Faris û Erebi jî ji tirkên şûnda namînin û neman jî. Receb Dildar di navbera dojehan da jî qiyasek dike û dibêje:

„(...) Gava li cîyekî zordarî û îşkence bibe karê rojane, ew der dibe dojehe. Îcar rêya rebenên wek me, her tim pê dikeve. Niha rebenên vê dinyayê kurd ma ne. Ji çar alî va, dixwazin me bihêrin. Destdarên wan ê herî mezin jî zîndanên wan in. Silav li te dojecha Evînê! Niha dojecha Amedê jî te mezintir e...”

Sedem vê yekê mirov meraq dike û dipirse, gelo dojehe jî parçeyek ji qedera kurdan e! Ger ku qeder be jî, mirov dikare wê qederê jî bi destê xwe bigûherîne.

Lê çawa?

Receb Dildar jî bo bersiva vê pirsê, bi hevokeke kin û zelal rêyek nîşan dide û dibêje;

“Mirina bi êlê ra dawet bû!..”

Min Dojeh xwend û qasî para xwe jê sût girt...

Loma ne hewceye êdî gotinê zêde dirêj bikim...

Divê her Kudr vê Dojehê bixwîne...

Bixwîne, ku ji êş û jana dojehê jî tama zimanê xwe bigre...

08.11.2019

Şikestî

Bi xwendina her pirtûkek mirov derîyek li dinayayeke nû vedike, di-nyaya ku bi peyv û hevokên xemilandî...

Ger ku mirov di nav xemla wê dinyayê da parçeyek ji jîyana xwe bi-bîne, kelecana merîya bêtir zede, rewîtîya merîya jî dûr û dirêj dibe.

Jiber ku mirov ne dixwaze kelecana kêr, ne jî dixwaze rêwîti kin bibe. Loma rêwîtîya xwe ya dûr û dirêj, bê navber didomîne û heta dawîyê diçe.

Ez jî bi xwendina romana Receb Dildar, Şikestî ra derketim rêwîtîyê û bi kelecana û bê navber heta dawîyê çûm.

Di wê rêwîtîyê da bi şikestîyên Receb Dildar ra bûm heval.

Bi wan ra gerîyam û bûm hevparê kul û keserên wan...

Li Dêra Qîrê bi Suryanîyan ra hatim kuştin...

Li deşta Bişêrîyê rastî sêwîyên Eremenî hatim û bi wan ra derbasî bin xetê bûm...

Bi kurdên Êzdî re asê mam di nav xelekeke gilover da... Ew xeleka ku ji alî birayên wan ên kurd va li dora wan dihat kişandin.

Bi birînên xwe yên kûr, bi eş û jana xwe ya bê derman ra gund bi gund, bajar bi bajar li stargeheke aram gerîyam.

Ji ax û warê bav û kalan dûrketim.

Li welatên xerîb, bi Îsayê Mîrza ra girîyam.

Îsayê Mîrza ya jî bi navê xwe yê din, Îsayê File...

Îsa lehengê romana Receb Dildar e.

Bi zimanê xwe Kurd...

Bi ola xwe Mesîhî...

Bi qewmê xwe jî Suryanî ye.

Roman bi axîna Îsayê Mîrza va dest pê dike.

Îsa kalekî 85 salî ye û rojên xwe yên mayîn bi hesreta welat, li koçberîyê dijmêre û derbas dike.

Bi axîneke kûr ra xwe li Dêra Qîrê û di nav bîranînên xwe yên ji dema zarokatîyê da dibîne, ew bîranînên ku bi xwîn û hêsirên çavan hatine qeyd kirin.

Îsa bi bîr û hesreta wan rojan Dêra Qîrê û berwarên wê yên rengîn tasvîr dike. Tasvîra wî jî mîna axîna wî, ji kûrahîya dil va dest pê dike û mîna ava kanîya Qîrê zelal diherike.

Rojên ji dema zarokatîyê nayên ji bîr kirin, jiber ku ew her gav merîya ber bi xwe dikişînin û dibin xewnên şevan.

Îsayê Mîrza jî ji bîr nake û di kaltîya xwe da jî zarokatîya xwe dijî. Di nav wan bîranînên xwe da qala evîna xwe ya ji dema xortanîyê dike, ew evîna ku bi şikestîyan ra qetîya ye û yekalî ma ye...

Jiber ku ew jî ji şikestîyan e.

Berê zimanê wî hatiye kuştin, dû ra dor hatiye tiştên din.

Loma di nav malê da û bi dê û bavê xwe ra kurdi, li dibistanê, di nav kûçe kolanên bajêr da jî tirkî axifîye...

Zimanê xwe jibîr kiribe jî, filetî mîna mohreke reş li enîya wî ketiye.

Wek navnûçîkek bi navê wî ra hatiye zeliqandin û di nav kurdan da wek Îsayê File, di nav tirkan da jî wek Gawur Îsa hatiye binavkirin.

Ne tenê wek şikestîyên serdestan, di heman deme da di bin zilm û zor-dariya bindestan da jî ma ye û nalîya ye.

Bi tecrûbeyên xwe yên salan dibêje; “mirov were kuştin, bi derbekî va xilas dibe, lê sax bimîne, her roj dimire...”

Veşartina nav û nasnameyan jî kuştin e, carcaran jî kuştina bi deste xwedîyê xwe ye.

Îsayê Mîrza jî her roj tê kuştin, ya jî xwe dike...

Di bîranîneke xwe yên ji dema dibistanê da Îsa kuştina xwe ya rojane wiha tarif dike:

“Mamoste ji me ra digot, ‘hûn tenê bi tirkîn biaxifin û dê û bavê xwe ji fêrî tirkî bikin. Hûn tirkê lawê tirkan in.’

Berîya wê ji me ji xwe ra digot ‘em kurmanc in’. Nasnameya me ya eslî hertim veşartû bû, dibin perdê da...”

Jiber ku Îsayê Mîrza di nav gundan da filetîya xwe...

Li bajaran jî kurdîya xwe vedişêre.

Li gundan şikestîyê kurdan...

Li bajaran jî bi kurdan ra şikestîyê serdestan e.

Di biranîneke xwe da qala jîyana li Dîyarbekirê dike û di derbarê rewşa Kurd, Suryanî û Ermenîyan da wiha dibêje:

“Me dînê xwe...

Kurdan jî zimanê xwe di nav civata Dîyarbekirê da vedişart...”

Îsa qasî ku di dema zarokatîya xwe da êşîya ye û şikestî ye ewqas jî girêdayî biranînên xwe yên ji wê demê ye û bi wan sebr û tebata xwe tîne, bi hesrata wan rojan dijî nû rojên xwe derbas dike.

Ji şikestîyê filitîye, lê ew ji axa bav û kalên xwe dûr û koçber e, bi hesreta welat axîneke kûr dikîşîne û dibêje:

“Ez bi baholeke dar hatim. Hinek cil û berg û aletên tamîrê tê da bûn. Min hemû alet nû kirin, tene tiştek nû nekir. Ew nedihatîn nû kirin, ew ji zarokatîya min yadîgar mabûn... Heft kapên hinekirî, yek jî deq bû, bavê min gule helandibû berî nav kortika wî dabû... Gencîneya min a zarokatîyê, xeyalên axa bav û kalan, tahma mastê mîyan, mehîra bipûng, tûzika dora kanîyan, lorînên dayîka min... Hemû di nav van kapan da veşartî ne...”

Di romanê da mînakên wusa balkêş û bi êş pir in.

Nivîskar Receb Dildar bi hunereke wêjeyî ew mînak xemilandine û bi vegotina bi zarê lehengê xwe, Îsayê Mîrza wan yekoyek jîndar dike û li ber çavên merîya radixîne.

Herwiha bi zîmaneke zelal û herikbar...

12.08.2022

Nado kurê xwe firot

Nivîskarê Kurd Birêz Riza Çolpan ev pirtûka xwe ji min ra şandibû, ku ez bixwînim û ji bo çapa duyemîn jî pêşgotinek binivîsim. Min careke din bi çavê nîrxandine ev pirtûk xwend û ji bo çapa nû pêşgotineke kin nivîsî.

Çapa nû çend meh berê di nav weşanên DOZ da, li Stenbolê derket û di nav refên pirtûkên kurdî da cîhê xwe girt.

Ger ku we hê ev pirtûk nexwendî be, hûn berê ev pêşgotina kin a ku min ji bo wê nivîsîye, bixwînin, dû ra jî pirtûka ku mirov xwe tê da li Stenbola xopan dibîne û di kûçê û kolanên wê da digere, bikin.

Serpêhatîya Nado ya ku bi vegotinek zelal û zimanek herikbar hatîye nivîsandin, bixwînin ku, mirovê ji koka xwe biqete, çawa xwe wenda dike û ji mirovatîyê jî dûr dikeve, bibînin...

Mirov dema ku çirokek guhdarî bike ya jî pirtûkek bixwîne, xwe ya jî parçeyek ji îyana xwe di wê çîrok û pirtûkê da bibîne, bêtir guh dide gotinên çîrokvan, herwiha pirtûkê digre nav destê xwe û bi kêf û kelecana dixwîne. Bi guhdarîkirina çîrokê ra dibe hevparê çîrokvan, bi xwendina pirtûkê ra jî dibe hevparê nivîskar.

Ev pirtûka Nivîskarê Kurd Riza Çolpan jî pirtûkek wusa ye. Wek navê wê, ev pirtûk her çiqas ji serpêhatîyên Nado pêk were jî, parçeyek ji çîroka kurdan e. Ew kurdên ku di salên 50yî da jibo parîyeke nan, ji dê û bavên xwe, ji gund û bajarên xwe derketine û berê xwe dane Stenbola xopan.

Hinek ji wan di rewşeke dijwar û di bin kar û barên giran da xwe parastine û ji derd û kulên xwe, ji sedemên nezani û xizanîya xwe hayîdar bûne, dû ra li pey jîyanek azad û birûmet ketine... Hinek jî mîna Nado

di nav kûçe û kolanên Stenbolê da xwe wenda kirine û ji mirovatîyê jî dûr ketine.

Nado xortekî kurd e.

Ew li gundekî girêdayî Îdirê çavê xwe li dinyayê vekirîye û heta 22 salîya xwe li gund jîyaye.

Nado, di zarokatîya xwe da zarokekî şerûd e. Sedem vê yekê bavê wî, ew neşandîye dibistanê û heta roja ku jî gund derdikeve, jîyana wî bi berxivanî û şivantîya malbatê va derbas dibe.

Nado di destpêka salên 1950yî da şevêk nivê şevê bi dizî radibe, dikeve rê û bi zor û zehmet xwe digihîne Stenbolê.

Berê li taxa Texteqelê li cem hevalekî xwe yê jî gund bi cîh dibe û dest bi karê barkêşîyê dike. Demeke şûnda ew bi awayekî dibe dergevanê pawyoneke li Beyoxlîyê û di nav jîyana wir da cîhê xwe digre. Jîyana Nado bi karê wî yê nû va jî binî va tê guhartin û çîroka wî ya bi dek û dolab, bi derew û felbazîyê kudîya ye, dest pê dike û bi salan didome.

Dema ku Kek Riza Çolpan ev pirtûka xwe ji min ra şand û min xwend, bîranînên min ên Stenbolê yên di salên 80yî da hatin bîra min. Bi xwendina pirtûkê ra ez careke din çûm Stenbolê û min xwe li ser Pira Galatayê, li Tarlabaşî, Sûka Îstiklalê, li Beyoxlu û kolan û kûçeyên wê yen teng û dirêj da dit...

Sala ku min dest bixwendina zanîngehê kir, li kolana Kûçûkparmakka-pîyê ya li Beyoxlîyê bufeyeke hevalêkî min ê jî Bazîdê hebû. Ez şeva îne û paşîne carcaran diçûm serlêdana wî û alîkarîya wî dikir.

Wê deme jî dergevan û garsonên qîlûb û pawyonan hemû kurd bûn. Navên wan neyên bîra min jî, şikl û şemalên wan yekoyek di ber çavên min ra derbas bûn. Hemû di şert û mercên xirab da dixebitîn, gehra berdoş û serxoşan dikişandin. Bi ked û xwîdana enîya xwe çend quruş qezenç dikirin, mixabin bi qîrpînek çavê jinekê va dixapîyan û di nav çend xulekan da bê pere û pûl diman.

Dema ku me çavdêrî li rewşa wan dikir, hevalekî me yê mamoste gor tecrûbeyên xwe yên jî salan gotinek dianî ziman, ku em wê deme pê dikenîyan. Lêbelê ev çîroka Nado rastîya gotinên wî hevalî jî bi awayek dide îspat kirin.

Hevalê min ê mamoste digot; “kurdên ku cara yekem jî gundê xwe

derdikevin û bere xwe didin Stenbolê, rawestgeha wan a ewil Topkapî ye. Dû ra jî Topkapîyê berê xwe didin Aksarayê, ji Aksarayê jî derbasî Emînonûyê dibin. Dema ku ji Emînonûyê, di ser pira Glatayê ra derbas bibin û derkevin Tepebaşıyê, wê gave êdî pêşî li wan nayê girtin...”

Nado hê Topkapî û Aksaray nedîtîye, rasterast tere Texteqeleyê, ku ew der jî bi Emînonûyê va girêdayî ye û loma ew di demek kinda jî xwe li Tarlabasıyê dibine...

Ev pirtûk herçiqas çîroka Nado be jî, Riza Çolpan di vê pirtûkê da rewşa kurdan ya wê deme, rewşa Stenbolê, rewşa xortên ku jî bo kar koçberî Stenbolê bûne û li wir xebîtûne, bi hostayî tûne ziman.

Bi zîmaneke zelal û bi vegotîneke herikbar qasî tolazîya Nado, jîyana xortên kurdên, ku di wê deme da û di nav kar û barên xwe yên giran da, jîyana xwe bi xewn xeyalên jîbo pêşerojêke pagij û azad dixemilînin jî li ber çavan radixîne.

Wek gotina nivîskar hemû nav û bûyerên ku di pirtûkê da cîh digrin rast bin jî, mirov bi wan kes û bûyeran ra dikeve rêwîtiyeke dirêj û xwe di nav jîyana wê demê da dibîne.

Bi tasvîrkirina bûyeran û bi berfirehî û herikbarîya vegotinê jî mirov tama romaneke civakî jî xwendina vê pirtûkê digre, ku bi kêf û kelecana rûpelên pirtûkê duqulibîne, heta ku dawî li çîroka Nado tê û mirov encama wê dibîne...

Mîna bi xwendina vê pirtûkê ne tenê tama romanek, tama zîmanê xwe yê dewlemend û şîrîn jî qasî têra xwe girt.

Hêvîdarim hûn jî wê tamê bigrin û bextewar bin...

Kornwestheim, 10.08.2020

Pejnên Riza Çolpan û pêşgotina min...

Nivîskarê Kurd Riza Çolpan berî weşanê pirtûka xwe ya dawîyê, “Pejnen Dawîya Jîyanek 90 Salî”, ku ji helbestên wî yên Kurdî û Tirkî pêk tên, ji min ra şandibû.

Mîn bi kêf û kelecana helbest xwendin û ji bo çapa yekemin pêşgotinek jî nivîsî...

Pirtûk ji alî Weşanxaneyê Dozê va li Stenbolê hat çapkirin û rojek berê jî gihîştê destê min.

Hûn dikarin pêşgotina min li vir bixwînin, lêbelê ji bo xwendina helbestên ku bi pejnen Kek Riza xemilîne, ji kerema xwe li cîhên ku pirtûkên Kurdî tên firotin pirtûka wî bikirin...

Pêşgotin

Gotina ku neyê qeydkirin, gotineke çiqas giran û di cîh da be jî, wek kulîlkek ji berfa pûk difirre û bi demê ra wenda dibe.

Bêguman nivîskar û helbestwanê Kurd, xortê 90 salî Riza Çolpan jî vê rastîyê baş dizane, ku loma gotinê qîmê xwe neanîye û nivîsîye, hê jî dinivîse. Ew gotinên wî yên kûr û dirêj hatine nivîsandin, çîrok in, roman in, serpêhatî û bîranînin, ya jî wek pirtûka di destê we da helbestên ji kûrahiya dil in.

Riza Çolpan nivîskar û helbestvanekî berhemdar e, ku di her xalên edebîyatê da berhem daye û jhê jî dide.

Ji bo nivîsê zimanek jî tê ra wî nake, loma bi Kurdî û Tirkî dinivîse, ku ew nivîskarekî duzimanî ye.

Heta roja îro 31 pirtûkên wî hatine çapkirin, ku bi vê pirtûkê va hejmarê wan dibe 32...

Herwiha ji bilî pirtûkên wî, bi sedan gotarên wî jî di rojname, kovar û malperên Kurdî da hatine weşandin, ku ji wan malperan yek jî <https://navkurd.net/> e.

Di nav 15 salen dawîyê da wî ji bo NavKurdê bi sedan gotar nivîsî. Ji gotarên wî kîngê yek bigihîşt a ber destê min, min ew berî herkesî û bi kêf û kelecana dixwend û di kuncikê wî da diweşand, ku ew rewşa me hê jî didome...

Kek Riza, ev pirtûka xwe jî berî çapê ji min ra şandibû, ku ez bixwînim û dû ra ji bo wê pêşgotineke kin û kurt binivîsim.

Din av çend rojan min hemû helbestên wî yekoyek xwend û di hemû helbestan da denge dilê wî bihîst û lê guhdarî kir. Ew dengê ku wek berdevkê êş û jana wî, bîr û bawerîyên wî, bi peyv û hevokan va xemilandi...

Pirtûk ji helbestên wî yên ku bi hest û helwesta 90 salî ya xwe da nivîsîne, pêk te. Loma ez di destpêka vê pêşgotinê da wî wek Xortê 90 salî bi nav dikim, jiber ku ew kalemêrekî çalak û jêhatî, nivîskar û helbestvanekî xwedî hiş û hişmendîyeke pagij û zelal e.

Kek Riza di pêşkêşîya vê pirtûkê da bibêje, ku ev pirtûka wî ya dawîyê ye. Lêbelê qasî ku ez wî nas dikim, xwendin û nivîsandin parçeyek ji jîyana wî ye, ku ew jî bê van herdu tiştan nikare bijî. Loma ji îro da dikarim bi hêsanî bibêjim, ku em dê piştî ve pirtûkê ji nivîs û pirtûkên wî yên nû jî bibinin û bixwînin...

Di vê pirtûkê herçiqas helbestên bi Kurdî zêde bin jî, pirtûk ji du beşan pêk tê û di beşa duyem da jî helbestên wî yên bi Tirkî cih digrin.

Navê pirtûkê bi Kurdî; “Pejnên Dawîya Jîyaneke 90 Salî”, bi Tirkî jî; “90 Yıllık Bir Yaşamın Son Duyguları/Yaşamın Son 90 Yılıının Duyguları” ye.

Naveroka helbestan jî wek navê pirtûkê, jî pejnên wî yên di jîyaneke dirêj û li xerîbîyê, jî axa bav û kalan dûr, bi hesreta war û welatê xwe kemilîye, pêk tên.

Gotineke pêşîyan e, dibêjin; “Êşa can xwe dide ziman...”

Êşa merîya çi be û jî kû were, gilî gazinên merîya jî jî wê dest pê dike û dide ziman. Di helbestên Kek Riza da jî êş û jana wî ya civakî, hêvî û daxwaz, bîr û bawerîyên wî yên pîroz cih digrin.

Gelo ew êş û jan, hêvî û daxwaz, bîr û bawerî çî ne û jî çî tên?

Dema ku mirov dest bi xwendina helbest û çarînan dike, di her çarîn û helbestên wî da bersiva vê pirse bi zelalî dibîne.

Ew jî hesretîya jî bo axa bav û kalan...

Êş û jana jî bindestîya welat e.

Bîr û bawerîya jî bo Kurdistanê azad û serbixwe...

Bi tecrûbeyên jîyaneke dirêj, hosî û temî, daxwaz û hêvîyên jî bo dinyayeke xweş û hevpar e.

Kek Riza sedem bindestî û parçebûna welatê xwe dinale, jî rewş û helwesta civaka Kurd, jî şer û pevçûna navxweyî xemgîn e. Loma di helbesteke xwe da wiha dibêje:

“Bi salan e pevdiçin

Ker hatine ker diçin

Birîn kûr e jan dide

Nizanin ku bipêçin...”

Herwiha ew jî pergala cîhanê jî nerazîyê, ew pergala ku tê da wekhevî cîh nagre, tê da şer û pevçûn kê nabe. Wê rewşê bi jî hest û helwesta insanên çavbirçî va gire dide û jî bo wê yekê di çarîneke xwe da wiha dibêje:

“Tim bûye çavbirçî ew, jibo malê cîhan

Xwastîye bibe zordar, wekî Cengîzخان

Kuştiye hemcîsnên xwe wekî haran

Jibo qesr û konax, jibo elmas û zêran...”

Bi zar û zîmanê wî, ew kalemêrekî 90 salî be jî hê dilgerm û evîndar e. Loma di helbeseteke xwe da dibêje:

“Dilê har bûbû bengî

Şaş metal mam bêdengî...”

Gor gili gazînen jî pergala cîhanê û êş û jana wî ya civakî, bîr û bawerîyên wî yên xurt û pîroz kê nabin. Di helbesteke xwe da bîr û bawerîya xwe ya jî bo rojên li pêş wiha tîne zîman û dibêje:

“Dixwazim navê dostanîyê û evînîyê

Binivîsînim li ser dil û zîkê pitikan

Pitikên ku hêj di zîkê dayîka xwe da ne

Û dûra jî bên cîhan

Gîrs bin, mezin bin

Cîhan geş bibe bi wan pejnan...”

Di beşek helbesta xwe ya “Bangek ji dil” da, wek gotina xwe ya dawîyê ji îro da xatirê xwe ji me dixwaze û dibêje:

“Êdî bi destûra we

Biray minên xoşewîst

Bes e evqas gotin, bang

Lewra min tiştek nehîst...”

Wek gotina dawîyê, min di xwendina helbest û çarînan da denge dilê kekê xwe yê hêja u xortê 90 salî ji nêzik va bihîst û dûr û dirêj lê guhdarî kir. Bi hevparîya eş û jana wî ra xemgînîya min, bi bîr û bawerîyên wî yên pîroz ra jî kêfxweş û bextewarîya min zêde bû.

Bi vê hest û helwestê min jî guh da denge dile xwe û ev çend hevokên kin û kurt li pey hev rêz kir û nivîsî.

Jiber ku ez ne rexnegir ne jî helbestvan im. Loma ev pêşgotina min jî divê wek nirxandina xwendawar û evîndarekî zimanê Kurdî bê dîtin.

Hêvîdar im, ku ev ked û xebata Kek Riza jî wek berhemên wî yên din, di kûrayî dile kurdan cîhê xwe bigre û mayînde bimîne...

Kornwestheim, 10.01.2024

Sê pirtûk û nivîskarek...

Kîngê pirtûkeka bi kurdî bixwînim, kêma ya jî zêde bi awayekê qala wê pirtûkê dikim. Nêrînen xwe carcaran bi heval û hogirên xwe ra, carcaran jî bi çend hevokan bi nas û dostên xwe ra parve dikim.

Armanca qalkirina min ew e, ku dixwazim bala xwendevanên kurd bikişînim ser wê pirtûkê û ew jî jê hayîdar bibin, bikirin û bixwînin, bi zimanê xwe yê şêrîn tahma şîrê dayîka xwe bigrin.

Jiber ku xwendevanên zimanê kurdî kêma in û ji wê tamê jî bêpar in.

Nivîskarekî kurd negota, hêjmara xwendevanên kurd ji ya nivîskaran jî kêmtir e.

Ev gotin herçiqas gotineke bêteşe be jî, mixabin bêbingeh nîne. Gelek kes hene, ku bi kurdî dinivîsînin, lêbelê tenê nivîsên xwe dixwînin. Loma hêjmara nivîskarên kurd zêde, ya xwendevanan jî kêma e.

Ev yek jî, êş û jana nexwaşîyek ji nexwaşîyên me kurdan e.

Dema ku xwendevan kêma be, pêwîstîya nirxandina û nasandina pirtûkan jî namîne.

Nirxandina pirtûkan, karê rexnegirên wêjeyî ne.

Ancax kesên rexnegir dikarin di ware wêjeyî da çîrok ya jî romanek binirxînin û kêmasî û zêdeyîyên wê binin ziman, ku nivîskar jî ji wê nirxandinê sûd bigre û ger ku hebe, kêmasîyên xwe bibîne, careka din wan dubare neke.

Ez bi xwe rexnegîr nînim, lê di ware wêjeya kurdî da xwe wek xwendevaneke baş dihesibînim û pirtûkên ku dixwînim jî bi wî çavî dinirxînim.

Dema ku ez dest bi pirtûkeke kurdî bikim û bixwînim, di wê pirtûkekê da li sê tiştan digirim.

Ew jî ev in:

Mijara pirtûkê...

Taybetmendîya vegotina nivîskar...

Zelalî û herikbarîya ziman...

Her sê xal jî bi hev ra girêdayî ne û kêmasîya yekî sedem lawazîya ya din e. Jiber ku nivîskar berê mijarê kifş dike, bi taybetmendîya xwe vegotinê di serê xwe da dihûnine, dû ra bi peyv û hevokan dixemilîne û jîndar dike.

Mijara pirtûkê, mijareke taybet û balkêş be, qasî ku karê nivîskar sivik bike, ewqas jî bala xwendevan dikişîne û xwe dide xwendinê.

Di vegotina nivîskar da taybetmendîyek hebe, mijar mijareke taybet nebe jî, taybetmendîya vegotinê û zelalî û herikbarîya zimanê nivîskar, xwendevan digre û di nav rûpelên pirtûkê da digerinê.

Di wê gerê da xwendevan parçeyek jî jîyana xwe jî tê da bibîne, dibe hevparê vegotinê û heta rûpela dawîyê gera xwe didomîne.

Jibo ku zû bigihîje rûpela dawîyê û encamê bibîne, lez dike, dema ku dawî lê hat jî, “xwezila hinek dîsa bikudîyaba” dibêje û bi dawîlahatina xwendinê va jî xemgîn dibe.

Di demekê nêzik da min sê pirtûkên nivîskarê kurd, Newaf Mîro, xwend...

Ji wan yek “Dilname”, herduyên din jî “Lehengê Tazî” û “Lehengê Dîl” bûn.

Bi Dilnameyê min dest pê kir û dû ra jî herduyên din li pey hev xwend.

Mijara Dilnameyê, jixwe jî nave wê va jî kifş e.

Nameyên ji dil, nameyên evînî yê, ku jibo her xwendevanek mijareke taybet e.

Min di Dilname ya Mîro da vegotineke taybet dît, ku ez dikarim bibêjim heta niha min ew di vegotina tu nivîskarek kurd da nedît ye.

Vegotina bi hevokên bêdawî û hevdeng...

Mîrov bi nalîna evîna yekalî dest bi xwendinê dike. Bi qulubandina rûpelan va nalîn kêma dibe û mîrov xwe di nav xemla helbestên evînê da dibîne.

Lehengê Tazî û Lehengê Dîl jî, du romanên Mîro ne.

Herçiqas wek du romanên cuda hatibin weşandin jî, Lehengê Dîl du-mahika Lehengê Tazî ye.

Lehengê herdu romanên jî Keleşê Reş e.

Keleş kurdekî Êzidî û sêwî ye.

Di piçûktayîya xwe da bavê xwe wenda dike û li ber destê dîya xwe mezin dibe.

Di zarokatîya xwe da bi şerûdî û dizîya xwe va deng dide.

Di xortaniya xwe da derdikeve hizûra Mîrekî kurd û bi şert û mercên xwe, di nav artêşa Mîr da cîh digre.

Di demekê kin da, mêrxasî û şervaniya wî, di nav sînorê desthilatîya Mîr da olan dide.

Bi şervanî û mêrxasîya xwe, dixwaze bala Pêrî ya qîza Mîr bikişîne. Mixabin evîna Keleş jî evîneke yekalî ye.

Sedem yek e û ew jî Êzdîtîya Keleş e.

Pêrî, herçiqas wî bedew û şervanekî bêhempa bibîne jî, xwe payebilind Keleş jî piçûk û layiqê xwe nabîne.

Perî ya ku mîna navê xwe bedew û nazenîn, berê xwe dide Stenbolê di nav koşk û serayên Sultan da li lehengê dilê xwe digere. Lêbelê li wir jî nabîne, loma berê xwe dide rojava û derbasî Parîsê dibê...

Keleş jî ji kerba Pêrîyê şûrê xwe yê tûj bêtir li ba dike û di xizmeta Mîr û Dewleta Osmanî da bikar tîne.

Pêrî, li Parîsê bi nameyeke dîya xwe, ji koka xwe hayîdar dibe ku ew jî xarziya Êzdîyan e, poşman dibe lêbelê poşmaniya wê kar nake...

Jiber ku Keleş di şerê li hemberî Uris da dil dikeve, di heps û zîndanên da dimîne, dû ra di gundekî serê çiyê da, bi karê şivantîyê jiyana xwe didomîne...

Wek gotina dawîyê dikarim bi hêsanî bibêjîm, nivîskar di kesayetîya Keleşê Reş û Pêrîyê da nakokîyeke di civaka kurd da û bi êş û jan cîh digre, bi zimanekî zelal û vegotîneke herikabar hunandîye.

Mirov dema ku çîroka Keleşê Reş û Pêrîyê dixwîne û dawî lê tîne,

xemgîn dibe û bixwe jixwe ra dibêje; ger ku mirov endamê civateke
bindest be, keça Mîr ya jî sêwîyeke Êzdî be jî, ji qedera xwe ya bêyom
azad nabe.

Deqa ku ji alî desthiladaran va li enîya merîya hatibe zeliqandin, bi
tûjbûna şûr jî, bi nazenîn û bedewîyê jî paqij nabe.

19.05.2020

Mîrzayê Reben

Mîrzayê Reben lehengê romana nivîskara Kurd Suzan Samanci ye.

Di romanê da Mîrza yek e, lêbelê di civaka Kurd da navên wan cuda be jî kesên wek Mîrza zêde û li her derê he ne, bi taybetî jî li Ewropa-ye...

Mîrza bi wateya xwe navekî balkêş e, lêbelê rebenîya ku nivîskar wek paşnav pê va girêdaye, bêtir bala merîya dîkşîne.

Gelo Mîrza kî ye û çi hatîye serê wî, ku nivîskar wî wek lehengê romana xwe afirandîye?

Dema ku mirov dest bi xwendinê pirtûkê dike û çend rûpelan diqulîpîne, bi nasnavên wî yên ku li xwe zêdekirîye va dibîne, ku Mîrza ne xerîb e û bi nav û nasnavên cuda li her derê ye.

Mîrza jî di destpêkê da kurdekî penaber û mirovekî reben e.

Li gundekî Kurdistanê çavê xwe li dinyayê vekirîye, zarokatî û xortanîya wî li heman gund û di nav feqîrîyê da derbas bûye.

Di 17 salîya xwe da, bi jinebîya birayê xwe yê mirî ra hatîye zewicandin, zewicandineke bêdil û toreyî...

Loma Mîrza jî jîyana xwe ya bedbext nerazîye. Dem tê ew jî ji sedem pîrsgîrekên aborî jin û zarokên xwe li gund dihêle û berê xwe dide Ewropayê. Piştî rêwîtiyeke dirêj Mîrza xwe di nav civakeke bîyanî û rengîn da dibîne.

Li welateke dûr û di nav civateke xerîb da li kesên nas û nêzîk digere, di demeke kin da dibîne jî...

Mîrza gor rewşa kesên ku pê ra dikeve têkiliyê, jî xwe ra çîrokek li hev û tîne û xwe bi wan dide nasîn. Wek çîroka hemû kurdên penaber, bêguman Mîrza jî berî her tiştî siyasetvan e, gor wê çîrokê sedema hatina wî

ya Ewropayê ji kar û xebatên wî yên sîyasî bûne. Di çîroka wî ya ku li welat derbas bûye da, ew xwevendekarê zanîgehê ye, birayê wî yê ku ji însîyatê da ketîye û mirîye, ew ji alî faşîstan va hatiye kuştin. Jibo ku he-man tişt neyê serê wî, xwendina xwe ya li zanîngehê di nivî da hîştîye...

Bi wê çîroka bêbingeh va jiyana wî ya nû dest pê dike. Bi demê ra gelek nasnav li paş û pêş navên wî li hev zêde dibin...

Li ba kesên ku wî ji nîzîk va nas nakin, ew mirovekî karsaz û mitehit e...

Rojnamevan û nivîskar e...

Sîyasetmedar û rewşenbîr e...

Rojhilatnas û lêkolînêr e...

Lê ji alî dorhêla wî ya nêzîk va jî ew bi navnûçikên cûda tê bi nav kirin...

Mîrzoyê tirsonek e...

Tolaz û derewçîn e...

Nêçîr û pêlistoka pîrejinên bîyanî yên dewlemend e...

Di bin her nav û nasnavekî wî da rûyekî wî veşartî ye. Ew rû carinan pişoyê di hundurê wî da ye, carinan jî rûyê jî dûr va û li pîşt zinar e...

Pistî van nav û nasnavan ger ku ez qala fêl û fêlbazîya wî jî bikim, êdî jî xwendevanan ra tiştek namîne.

Lê ez dixwazim di derbarê nivîskariya Suzan Samanci da çend gotinan bibêjim.

Suzan Samanci nivîskareke jin a Kurd û pîrzimanî ye.

Nivîskariya wê bi Tirkî dest pê kiribû, bi vê pirtûkê va jî xûya ye ku dê bi kurdî jî bidome...

Di nav nivîskarên Kurd da jin hebin jî hêjmara wan zêde nîne. Suzan Samanci di nav wan jinan da nivîskareke berhemdar û serkeftî ye, ku mirov di vê romanê da jî wê serkeftûyê bi zelalî dibîne.

Mîrzayê ku Samanci di romana xwe da wek leheng afirandîye, di civa-ka Kurd da zêdene û li her derê jî tên dîtin.

Nivîskar jî bi çavdêriyeke rast û realîst hemû xil û xirabîyên ew „Mîrzayên“ ku li her derê tên dîtin, bi peyv û hevokên zelal û bikêrhatî,

bi hunera xwe ya wêjeyî li hev anîye û di kesayetîya Mirzayê Reben da bi cîh kirîye.

Gor kirin û kiryarên wî yên kirêt nivîskar wî wek Mîrzayê Reben bi nav dike, ku sedema wê jî bi nezanîya wî va girêdide.

Di civakên paşdemayî û bindest da zana kêr lêbelê nivzana jî zêde ne. Mîrzayê reben jî ji wan nivzanayan yek e, ku nivîskar jî di kesayetîya wî da jî bo kesên nivzana wiha dibêje; „Mêrê nivzana jixwe nebawer in, ew neyarê serî, dostê qûnê ne!“

Mîrzayên ku li her derê tînin jî jî xwe nebawer in.

Loma di ber derê komeleke çepgir ra derbas bibin, xwe siyasîmedar rewşenbîr...

Kovareke siyasî bigrin destê xwe û heta dawîyê nexwînin jî, xwe rojnamevan û nivîskar...

Bi guhdarîkirina nûçeyek ji welat bibihîzin û tiştek jê fahm nekin jî, xwe lêkolîner û rojhilatnas dihesibînin.

Mîrzayê Reben jî bi van nasnavên ku li pêş û paş navê xwe zêde dike, diji û gelek kesan jî dixapîne...

Di encamê da jî rût û tazîbûna xwe, ji nezanîya xwe hayîdar bibe û xirabîyên ku li kesên derdora xwe kirîye bibîne jî, êdî nikare wan şûnda vegeirîne...

Di çîroka Mîrzayê Reben da mirov serkeftîyeke din jî dibîne, ku ew jî zelalîya ziman û azadiya vegotina nivîskar e.

Suzan Samanci di her mijarê da gotina xwe bi cesaret û azad vedibeje û wek piraniya nivîskarên Kurd ên mîr xwe asteng nake.

Qasî ku bikaribim, pirtûkên Kurdî, bi taybetî ji roman û çîrokan dixwînim. Wek zargotina kurdî, di roman û çîrokên kurdî da jî mêranî û mîrxasîya lehengan cîhekî girîng digre.

Leheng bejndirêj û bedew in...

Bi dest û pê, xwedî hêz û quwet in...

Mêr û mîrxas, bêtirs û dilpola, zana û rûspî ne...

Nivîskarên Kurd di roman çîrokên xwe da, lehengên ku diafirînin, ha jin ha mîr ferq nake, gor mijarê bi taybetmendîyên çê ya jî xirab va dixemilînin.

Lêbelê qala taybetmendîyek wan nakin, ku ew jî rewş têkiliyên wan ên zayendî ye.

Di piranîya berhemên Kurdî da mijara hezkirin û evîndariyê cîh bigre jî, ew hezkirin û evîndariyêke ji dûr va ye.

Di hinekan da qala tekilî û bihevşabûnên zayendî wer kirin jî, ew bi gotineke sergirtî tê qalkirin, ku navê wê jî „ewk kirin“ e. Lêbelê ewk çî ye û çawa tê kirin, li Xwedê li jêr jî tenê nivîskar dizane...

Piranîya nivîskarên Kurd ên mêr, di vegotina têkiliyên zayendî da qasî ew dengbêj û çîrokvanên ku bi sedan salan berê jiyan e, xwedî cesaret û zîmaneke zelal nînin. Di vî warî da da xwe asteng dîkin, ku bi wê yekê jî di berhemên xwe da xaleke jiyanê ya herî bingeîn vala dihêlin.

Di romana Mîrzayê Reben da mirov dibîne, ku Suzan Samanci di mijara têkiliyên zayendî da jî xwe asteng nake. Tekilî û hevşabûna ku di navbera Mîrzayê Reben û pîrejinên dewlemend da, ya jî qîz û jinên ku ketina dafîka wî da çawa derbas bûne, bi peyv û hevokên zelal dixemilîne û bi tewneke azad vedibêje...

Ev taybetî jî wê ji nivîskarên Kurd ên mêr vediqetîne, ku ev jî xalek ji serkeftûbûna nivîskarîya wê ye.

Ev roman di sala 2019an da li Stenbolê û ji alî weşanxaneyê Avestêyê va hatiye çapkirin, ku ji bo kesên ku hê nexwendî be, pirtûkeke nû û hêjayî xwendinê ye...

24.02.2024

Koçberîya ji bo wareke nû!

Koçberî qedera kesên kesîb û bindest e.

Kesîb ji xizaniyê, bindest jî ji zulm û zordariyê direvin û ji xwe ra li stargehek aram û nû digerin.

Ew stargeh carcaran bajareke nêzîk, carcaran jî welateke biyanî û dûr e.

Ger ku bibînin, di wê stargehê da armanca koçberan, bi destpêkirina jîyaneke nû avakirina wareke nû ye.

Bi çi rengî diba bila bibe, weke her despêkek, jîyana li koçberiyê jî bi tengasî û astengîyan va dest pê dîke. Jiber ku koçberî, di naveroka xwe da êş û keserên, xerîbî û xemxwarîyê dihebîne.

Li ser koçberî û jîyana li koçberiyê heta roja îro, bi hezaran pirtûk hatine nivîsandin. Ew êş û keser di roman û çîrokan da, di kilam û stranan da hatine ziman.

Romana Yusuf Kaynak, Warê Nû jî ji wan pirtûkan yek e.

Nivîskar, koçberîya kurd û tirkên ku di salên 60î da bere xwe dane welatên Ewropayê, kirîye mijar û hunandîye. Ew çawa jî gund û bajarên xwe derketine, di rêwîtiya xwe da çi zehmetî kişandine û rastî çi tengasîya hatine, Yusuf Kaynak di kesayetîya Fexroyê lehengê romana xwe da bi hûngulî li ber çavan radixîne.

Lehengê romanê Fexro xortekî kurd û bist salî ye û li gundekî girêdayî bajarê Rihayê, li gundê Bozo, jî dê û bavek kurd çê bûye.

Di dema zarokatîya xwe da, sedem bindestiyê jî perwerdeyîya bi zimanê xwe yê zikmakî, sedem tunebûna dibistanê jî ji perwerdeyîya bi zimanê tirkî bêpar maye.

Jîyana wî ya bist salî, di gund da, bi berxivanî û şivantîyê derbas bû

ye. Heta roja çûyîna xwe ya ji bo leşkerîyê, tu bajar û bajarokeke din nedîtîye.

Fexro di dema leşkerîyê da fêrî zimanê tirkî dibe, ku ew fêrbûna wî ji tenê ji çend peyvan pêk tê. Piştî vegeza ji leşkerîyê jibo jiyanê nû serî li kargeha kar û xebatê dixê, ku berê xwe bide welateke Ewropayê û ji jîyana xwe ya ku bi xizaniyê derbas dibe, bifilite.

Bextê Fexro lêdixê, di demeke kurt da ew bersîveke bixêr digre û jibo çûyîna Holandayê xwe amade dike.

Mixabin di dilê wî da berebazîya tîrs û kelecane, şabûn û xemgîniyê cîh digre. Bi bextê xwe yê vekirî ra dilşa, ji rêwîtiya xwe ya dûr, ku di nav çend welatên biyanî ra derbas dibe, ditirse û xemgîn dibe.

Bi alîkarîya cînareke xwe yê zana ra heta Stenbolê diçe, li Sîrkeciyê li trêna reş sîyar dibe û rêwîtiya wî ya dirêj, bi dilekî xemgîn û bi tîrs dest pê dike. Trên bi şev û rojan di nav bajar û welatên xerîb ra derbas dibe.

Fexro, mîna zarokên ku çavên xwe li dinyayê vedikin, bê ziman û ji dengên derveyî xwe ra ker û lal e.

Çawa ku zarok di destpêka jîyanê da, bi girîyên xwe nan û avê dixwazin û têrbûna xwe bi kenên xwe nîşan didin, bi çaplûkan dikevin û hîni gerê dibin, Fexro jî sedem nezanî û bêzimanîya xwe, di kurahîya dilê xwe da digrî û daxwazên xwe tene bi îşaretan tîne ziman.

Ancax bi alîkarîya kesên ku jê ra dibin alîkar, li ser pîyan disekine û bi saya wan rêwîtiya xwe didomîne.

Trên û rêwî, gund û bajar, çîya û banî hemû jê ra xerîb in. Di nav wê xerîbiyê da Fexro, bê ziman û nezan, ji dengên derdora xwe ra jî ker û lal e. Berîya ku bi rê bikeve, astengîyên ku wî xeyal nekiribûn, derdikevin pêşiya Fexro û ew bi saya wan ji nezanîbûna xwe hayîdar dibe.

Bi dîtina bajar û avahîyên mezin ra matmayî dimîne û ji jîyanê ditirse. Bi êş û kelemên xwe yê nû ra dikewice, ji hebûn û jîyana xwe, ji pêşeroja xwe ya nediyar ditirse, kor û poşman dibe.

Nivîskar, ew bajarên ku trêna Fexro di ber wan ra derbas dibe û avahîyên îstasyonên ku trên lê disekine, bi hûrgulî tasvîr dike û bi zelalî nasîn. Tiştên ku Fexro di jîyana xwe da cara yekemîn dibîne û matmayî dimîne, yekoyek tîne ziman.

Wek mîsal, Fexro di jîyana xwe da pirtûk û rojname nedîtine û ji xwen-

dina wan jî ne hayîdar e. Li îstasyona Wîyana yê bi alîkarîya rêwîyeke tirk ji trêne peya dibe û li yeka din siwar dibe. Rêwîyên trêne bi piranî Ewropî ne û di destê herkesî da pirtûk ya jî rojnameyek heye. Fexro bi tirs û xofa ji wendabûyîne ra, rêwî jî bi xwendina pirtûk û rojnameyan va mijûl in. Rewşa rêwîyan bala Fexro dikişîne û di dilê xwe da jixwe ra dibêje, „gelo tu kar û barên vana tune ne, ku heryekî tiştek kirîye destê xwe û serê xwe di ser wan ra xwar kirine!“

Ev nezaniya Fexro jî mîna koçberiyê, parçeyek ji qedera kesîb û bindestan e. Jiber ku ew di warê bav û kalên xwe da jî ji mafê wekhevîyê, ji mafê perwerdeyîyê bêpar in.

Salan berê, min li filmeke biyanî temaşê kiribû. Fîlm li Parîsê derbas dibû. Xortekî bist salî, mîna Fexro ew jî ji Cezayîrê rabibû, berê xwe dabû Parîsê. Bi pismamekî xwe yê li Psrîsê dijiya ra li metroyê siyar bibû, rêwîyên di metroyê da rûniştibûn, pirtûk dixwendin. Xortê ku ji Cezayîrê hatibû, bi matmayî li rewşa rêwîyan mêze dikir û ji pismamê xwe ra digot: „Gelo ev hemû kes murîdên terîqetê ne, ku bi mîna hev rûniştine û kitêban dixwînin...“

Rêwîtiya Fexro jî bi tirs û kelecana, derbas dibe û piştî çend şev û rojan li bajarê Arnheimê diqede. Di nav çend rojan da, di fabrîqeyeke Hollandî da dest bi kar dike.

Fexro xortekî jîr û bi hêz e, mixabin bê ziman e, ker û lal e. Bi alîkarîya tercûmanan va karê xwe tîne cîh, bi alîkarîya karkerên ku berî wî ji Tirkîyê çûne, ji pansiyonê diçe kar û şûnda vedigere. Jîyana Fexro bi mehan di navbera cîhê kar û pansiyonê da derbas dibe. Nezanîbûna xwe ya ji bo xwendin û nivîsandinê ji hevalên xwe yên tirk jî vedişêre. Ne bixwe dikare nameyek ji dê û bavê xwe ra binivîsîne, ne jî ji şermê alîkarîyê ji kesî dixwaze.

Lêbelê ew di kargehê da bi hêz û quweta xwe dixebite û karê xwe bê qisûr tîne cîh. Helwesta wî bala rêvebirên fabrîqê dikişîne. Bi alîkarîya wan Fexro dest bi qursa xwendin û nivîsandinê dike, dû ra jî bo fêrbûna ziman qursê dibîne. Îmakana ku li warê bav û kalên xwe nedîtibû, li welatekî xerîb, li koçberiyê bi desto dixîne û hîni xwendin û nivîsandinê, hîni zimaneke biyanî dibe. Bi qizeke Hollandî ra dibe heval û bi alîkarîya wê zimanê xwe pêş da dibe. Çend salan şûnda beodari ezmûna tercûmanîyê dibe û bi ser dikeve. Pişt ra di cemiyeta biyanîyan da dest bi karê ku ji roja ewil da li Arnheimê xeyal kiribû, dike.

Fexro yê bê ziman, ew kesê ker û lal, li koçberîyê, mîna zarokeke piçûkê ku dest bi jîyaneke nû bike, fêrî wendin û nivîsandinê dibe. Dû ra dibe dilbend û ji karkerên kurd û tirkên ku li Hollandayê dijîn ra tercûmanîyê dike.

Yusuf Kaynak, di kesayetîya lehengê romana xwe da, rêwîtiya koçberan û bûyerên ku li koçberîyê di serê wan ra derbas bûne û hê jî dibin, bi zimaneke zelal û bi hûrgulî anîye ziman.

Bêguman wek hemû pirtûkên kurdî, di vê pirtûkê da jî gelek kêmasî hene. Bi taybetî, di warê rêziman û rastnivîsînê da...

Lêbelê weke hercarê, dixwazim li vir jî bînim ziman, ku ez wan kêmasîyan jî didim xatirê zimanê pirtûke.

Jiber ku ziman bi kurdî ye, ku kurdî jî îro di malên kurdên bakur da li ber mirine ye û berxwe dide. Loma tê da kêmasî hebin jî, bi saya nivîsandina berhemên wiha, zimanê me yê birîndar ji mirinê difilite û ji nû va jîndar dibe. Loma nivîsandina bi zimanê kurdî, bi tena serê xwe karekî pêroz e. Divê her kurdek rûmetê bide ev karê pêroz, berhemên bi kurdî bixwîne û bide xwendin.

21.10.2020

Sêwîyê Dêrsimê

Xwendin û nivîsandin bi tena serê xwe karên pîroz in.

Ger ku kêşê dixwîne û dinivîsîne kurd, karê xwendin û nivîsandinê jî bi zimanê kurdî be, pîrozî û girîngîya wan jî bêtir zêde dibe.

Nivîskarê vê pirtûkê Yusuf Kaynak jî kurd e û karekî pîroz dike.

Min navê Yusuf Kaynak di salên 1990î da bihîstibû. Ez wê demê li Stenbolê berpirsiyarê giştî yê rojnameya Azadî bûm. Pirtûka wî ya „Bi Kurdî Navê Zarokan“ hatibû weşandin û di wan salan da gelek dê û bavên kurd navê zarokên xwe jî wê pirtûkê hîlbijartibûn.

Çend sal berê romana wî ya bi navê „Warê Nû“, dû ra jî lêkolîneke wî ya ku jî du cildan pêk tê, bi navê „Guldesteyek Ji Edebîyata Cîhanê“ hatin weşandin û di nav pirtûkxaneya kurdî da bi giranî cîhê xwe girtin.

Birêz Yusuf Kaynak piştî weşanê, her sê pirtûkên xwe jî ji min ra wek diyarî şandibûn, min jî ew xwendibûn û di derbarê wan da nêrîna xwe jî nivîsandibû.

Ji bilî van du pirtûkên wî yên hatine çapkirinê jî hene, ku ew jî „Jînenî-garîya Cegerxwîn û berhemên wî“ û „Neteweperestîya kurdan“ ne.

Ev romana wî, „Sêwîyê Dêrsimê“ jî, berî çapê jî min ra şandibû, ku ez bixwînim û binirxînim.

Jibo vê yekê jî divê mirov bi çavê rexnegirîyê lê binêre, bixwîne û bi berfirehî binirxîne, ku ew jî bi tena serê xwe kar û barekî giran e.

Jiber ku nirxandina berhemeke wêjeyî karê rexnegiran e û jê ra pisporî pêwîst e. Ez jî ne rexnegir im. Loma, divê ev nirxandina min jî wek nêrîna xwendekarekî jî rêzê bê dîtin.

Heta roja îro min gelek çîrokên di derheqê „Sêwîyên Dêrsimê“ da hatine nivîsandin, xwend, ku piranîya wan jî serpêhatîyên zarokên qîzîn

pêk dihatin. Bi taybetî li serî navê „Dêrsim’în Kayıp Kızları – Keçên Wenda yên Dêrsimê“ gelek lêkolîn hatine kirin û belgefilm hatine çêkirin.

Di derbarê zarokên lawîn da qasî ku dizanim rojnamevan Yavuz Semerci, di nivîseke xwe da qala serpêhatîya bav û apê xwe kiribû û sêwîtiya wan bi kurtayî nivîsandibû, serpahatîyeke bi êş û kelem, bi kul û derd...

Ez bawer im ev cara yekemîn e, ku Yusuf Kaynak serpêhatîya sêwîyekî Dêrsimê ji xwe ra mijar hilbijartîye û wek roman nivîsîye.

Sêwîyê Dêrsimê...

Lehengê romanê, çar sal berî Komkujîya Dêrsimê, di sala 1934an da çavê xwe li dinyayê vedike. Dîya wî Emoş, bavê wî Huseyînê Pulumurî, bi bûyîna lawê xwe şa dibin û navê wî Hesên lê dikan.

Huseyîn ji malbata Seyîdên Qureyşîyan e, ku ew malbateke ji şer û pêvçûnê dûr e. Lê rojek ji rojan xeberek tê û jiyana malbatê ji bi wê xeberê ra duguhure. Ew ji wek niştecîhên herêmê dibihîsin ku Paşayek bi navê Huseyîn Abdullah Alpdoxan berê xwe da ye Dêrsimê, di nav gundan da digere, ku çek silêhên gundîyan berhev bike. Huseyînê Pulumurî ji mîna her gundîyên xwe diêirse û dixwaze zar û zêçên xwe ji şer û alava şer dûr mezin bike.

Lêbelê tîrsa wî ji xilasbûna wî ra nabe çare û komkujî dest pê dike. Hesên hê çar salên xwe neqedandîye, dê û bavê wî di komkujîyê da tên kuştin û ew bi tena serê xwe, bêxwedî û sêwî dimîne.

Murteza Paşayê ku wek qumandanê alaya 16an di komkujîyê da cîh girtîye, Hesên digre, demeke şûnda ji wî dibe li bajarê Nixdeyê teslimî sêwîxaneyê dike.

Hesên zarokeke çar salî ye û tirkî, Murteza Paşa ji navê wî nizane... Di dema qeydkirinê da Murteza Paşa gor dilê xwe navê wî Kemal, paşnavê wî jî Öztürk lê dike.

Hesênê Pulumurî di çar salîya xwe ne tenê sêwî dimîne, navê wî jî tê guhartin û li ser navê du kesên xerîb tê qeydkirin. Bi wî awayî Hesên di her xalî da ji koka xwe tê qetandin û dibe Kemal Öztürk...

Ew di sêwîxaneyê da, bi 40 zarokên ku ji wî mezintir û bi zimanêkî cûda qise dikin ra, mezin dibe. Ji bûyerên ku li serê wî qewimîne,

bêhayîdar, şev û roj digrî û dinale. Jiber ku, ji kuderê ye, dê û bavê wî kî û kê ne, ew bixwe jî nizane.

Di nasnameya wî da navê wî Kemal, li şûna navê bavê wî navê mudurê sêwîxanê Cafer, şûna navê diya wî da jî navê suxrevan a sêwîxanê Sumbul tê nivîsandin. Ji paşnavê xwe jî roja ku dest bi dibistanê dike, hayîdar dibe.

Kemal di heft salîya xwe dest bi dibistana seretayî dike. Wek hemû sêwîyên li ber destan mezin dibin, jîyana wî jî di nav rîşk û spîyan da û bi tî û birçîbûnê derbas dibe. Rewşa wî di nav hevalên wî da dibe sedema kirina qîlf û henekan. Loma ew jî dibistanê hez nake, jî xwendinê sar dibe û bi zor û zehmet dibistana seretayî diqedîne.

Kemalê sêwî di 12 salîya xwe da jî sêwîxanê teslîmî Sazîya Parastina Zarokan tê kirin. Sazî wî digre jî Nixdeyê dişîne Aksarayê û ew li wir di xanîyeke dewletê da û bi zarên mîna wî sêwî û bêxwedî ma ne ra diji. Heta 18 salîya xwe jî di bin baskê wê Sazîyê da dimîne. Di dibistana çandinîyê da tê qeyd kirin, lêbelê Hesenê ku navê wî bûye Kemal guh nade dersan û naxwîne.

Li ber destê terzîyan çiraxtîyê dike, di otêlan da dixebite, lê li tu derekê nasitir e. Her çiqas xwe veşêre jî, sêwîtiya wî jê ra dibe serhevde û lê vedigere. Loma li herderê jî kesên derdora xwe heqaretê dibîne û nayê hezkirin. Sedem wê yekê ew jî birayara xwe dide, cîhê ku lê neyê hezkirin, nasekine, berê xwe dide bajarê Konyayê û li wir di otelekê da dixebite.

Dem dema serdestîya Partîya Demokratê ye.

Konya jî bajareke mihafazakar e. Rojên Kemal yên ewil li Konyayê baş derbas dibin, dû ra bi kesên berdoş ra dibe heval û rewşa jîyana wî jî duguhure. Şev û rojên wî di bar û meyxaneyan da derbas dibe. Rojek jî rojan tê girtin, sêwîtî û qaçaxîya wî ya jî leşkerîyê eşkere dibe û tê dari-zandin. Çend meh şûnda jî hepsê derdikeve û jî bo leşkerîyê berê xwe dide Stenbolê, piştî sê mehên ecemîtiyê, li Etimesqût a Enqerê leşkerîyê dike. Ji alî hevalên xwe va wek „kîro“ tê bi nav kirin, lê ew nizane wateya wê peyvê çî ye û çima bi wê peyvê tê tawanbarkirin.

Kemalê sêwî mirovekî jî siyasetê dîr û jî jîyanê jî xeyîdiye. Efserên wî çî karî bidin ber, ew wî karî dike. Piştî 20 mehan leşkerîya wî diqede, êdî ew di nav bajarê Enqerê da kesekî bê mal û bê kar e. Di nav çend rojan

da li taxa Ulusê di otelekê piçûk da ji xwe ra cîhê razanê dibîne û karê hemaliyê dike. Piştî demeke şûnda di otêla ku tê da radizê, dest bi kar dike û li wir dixebite. Bi demê ra li Tirkîyê rewşa revebirîyê duguhure, hîlbijartinê tê li dar xistin, dema serdestîya leşkeran diqede û dema serdestîya Demirel dest pê dike.

Dewletên Ewropayî ji bo ku li welatên wan bixebitin ji Tikîyê karkeran dixwazin. Kemal jî ji bo ku xwe bavêje welateke Ewropayê dixebite û pere berhev dike.

Di wê nîyeta xwe da Kemal bi ser dikeve û weke karker diçe Belçîkayê. Li wir di karê derxistina komirê da dixebite. Karê ku dike, karekî giran, derê hemû welatên Ewropayê jî jê ra vekirîne. Loma ji wir xatirê xwe dixwaze û berê xwe dide Hollandayê. Tere li bajarê Den Haqê di nav karkerên Tirk ta bi cîh dibe. Bi çend kesên Tirk ra, di malekê da dimîne, ku ji wan yek jî, Elî Rizayê Dêrsimî ye.

Elî Riza piştî hevnasîna xwe ya bi Kemal ra, nêzikî wî dibe, pê ra hevaltîyê dike û di derbarê pêşeroja wî da pirsan lê dike.

Çawa ku Elî Riza ji pêşeroja Kemal dikeve şikê, Kemal jî ji pirsên Elî Riza yên bêdawî eciz dibe û wan bêbersiv dihêle.

Kemal ji Elî Riza dûr bikeve jî, Elî Riza li şopa jîyana Kemal digere. Bi salan şûnda dema ku Elî Riza ji bo betlanê vedigere Dêrsimê, tere Aksarayê bi awayek şopa Kemal sererast dike, ku ew di sêwîxaneyê da mezin bûye.

Piştî vegeerê her çiqas Elî Riza çîroka Kemal, ku wî ew ji herkesî veşartî ye, yekoyek jê ra vebibêje jî, ew wê çîrokê red dike û lê xwedî dernakeve.

Dem diherike, jîyana Kemal jî bi demê ra derbas dibe û duguhure. Ji xwe ra hevalên nû, keç û jinên Hollandî dibîne, bi wan ra hevaltîyê dike û di nav malekê da dijî. Kar û barê xwe duguherîne û bi wê guhertinê ra, jîyana wî ser û binê hev dibe.

Dem tê şev û rojên wî di bar û pavyonan da derbas dibe, pere qezenc dike, di nav jîyaneke rengîn da dijî, alîkarîya sêwîyan dike û wek bavê sêwîyan tê bi nav kirin. Dem tê bê pûl û pere, bê heval û hogir dimîne û di wî temenê xwe da jî xwe sêwî dihesibîne.

Di jîyana xwe ya li koçberîyê da jî, ji astengîyên ku dibêjî qey li ser rêya wî hatine danîn, kêr nabin. Şevêk jî şevên wî yên rengîn da, bi niv

kîlo haşhaşê va tê girtin. Dikeve hepsê, di hepsê da bi Emoyê Êzdî ra dibe heval û bi wê hevaltîyê ra careke din jîyana wî tê guhartin. Cezayê wî diqede, ji hepsê derdikeve û wek şîrîgê Emoyê Êzdî dibe karmend. Dîsa peran qezenc dike, di bar û pavyonan da vedixwe û dibê tîryakîyê madeyên hişber.

Dem tê Kemal careke din bê pul û pere û bi tena serê xwe dimîne. Ji bo ku dest ji alkol û madeyên hişber berde, biryara xwe dide û tedawî dibe.

Hesenê ku di sêwîtîya xwe da dibe Kemal, bi leqeba Quto nav û dengê wî li seranserê Hollandayê belav dibe û di nav jîyaneke bê pergal da dijî. Ji dema zarokatîya xwe heta dawîya emrê xwe, di dilê xwe da pirsra „ez kî me“ ji xwe dike.

Lêbelê ne bixwe li bersiva wê pirsê digere, ne ji dixwaze ji kesekî din wê bersivê bibihîze.

Hesenê ku wek lawê Emoş û Huseyînê Pulumûrî çavê xwe li dinyayê vekirîye û sêwî maye, piştî jîyaneke tevlihev, li welateke xerîb û di rewşeke xirab da wek Kemal Öztürkê bêkes dimire. Li goristana bêkasan tê binaxkirin û gelek pirsên bê bersiv li pey xwe dihêle...

Yusuf Kaynak di kesayetîya Hesenê sêwî, ya jî Kemal Öztürkê bêkes da, eşa sêwîyên ku piştî komkujîya Dêrsimê bêxwedî û bêxwedan mane, bi hevgirêdaneke baş, bi zîmaneke zelal û herikbar anîye zîman.

Komkujî, wek wateya xwe peyveke sar û tirsnak e.

Kuştin û qelandina ji kokê va ye...

Loma kesên ku komkujîyê difilitin û sêwî dimînin, du car tîna kuştin.

Carek bi kuştina dê û bavê xwe ra, careke din jî bi qetandina ji koka xwe va, du caran dîmin.

Wek mirina Hesenê Emoşê û Kemal Öztürkê koçber...

Sêwîyê Dêrsimê ji alî Weşanxaneyê Na va hatîye çapkirin û ji 254 rûpelan pêk tê. Herçiqas di warê rûpelsazîyê da kêmasî hebin û çavên merîya biêşînin jî, çîroka Sêwîyê Dêrsimê bi naveroka xwe hêjayî xwendinê ye...

Kornwestheim, 20.10.2022

Yar û Mirad...

Yar û Mirad - I, navê romana Welî Sebrî ya yekemîn e.

Ji nava wê jî xûya dike, ku Yar û Mirad, ji rêzeromanê cilda yekemîn e û dê dumahîka wê jî hebe.

Loma nivîskar vê cildê wek “Mîrin xweş e, bi mêranî û mêrxasîyê!” bi nav kirîye.

Salan berê haya min jî vê xebatê bibû. Hevalê min ê ezîz Welî Sebrî, beşek jî xebata xwe jî min ra şandibû. Piştî xwendinê min wê demê jî nivîsek nivîsibû, di wê nivîsê da jî bang li hevalê xwe kiribû û jê ra wuha gotibû:

“Hevalo,

Tu jî baş dizanî...

Jiyan wek xewnek jî xewnên şevên payîzê, kin e!

Wek bayê dere biharê bilez tê û derbas dibe.

Êdî bese, hişyar be jî xewa şêrîn!

Rabe, bike û bilezîne...

Li dere weşanxaneyên kurdan bixîne...

Bila Yar jî te ra be...

Rê li Miradê me negre û êdî derengî nexîne...”

Piştî vê bangwazîyê salan şûnda be jî, Yar û Mirad li Amedê, di nav pirtûkên kurdî da cih xwe girt û jî min ra jî wek dîyari hat.

Bi hatina wê ra min Yar û Mirada ku ez li bendê bûm, girt nav destê xwe, bi kêf û kelecana dest bi xwendinê kir û di nav çend rojan da qedand...

Ez kîngê pirtûkek bi kurdî hatibe nivîsandin, bixwînim, wek xwendewanek qasî ku bikaribim, di derbarê wê pirtûkê da nêrînên xwe bi kurtî be jî tînim ziman û parva dikim.

Vê yekê jî xwe ra wek deyn dibînim, ku bi nivîsandina nivîsek kin jî deynê xwe tînim cih û jê jê difilitim.

Îro jî dor dora Yar û Mirad'a Welî Sebrî ye.

Lê nivîskarê pirtûkê hevalekî merîya yê nêzîk û jî dil be, jî bo nirxandineke bêalî dest û lingên merîya lihev dikeve û karê merîya jî giran dibe.

Kêmasî hebe û bibêjî, derd e...

Nêbêjî û jî xwe ra bihêlî, derdê ser derdan e.

Lê tişta ku min jî vê tengasiyê xilas û karê min hêsan dike jî ew e, ku ez di berhemên kurdî da li kêmasiyan bigerim û bibînim jî, di nirxandina xwe da zêde li ser wan nasekinim û dernaxim pêş.

Loma nivîskarê vê pirtûkê Welî Sebrî jî gelek caran daw û doz li min kirîye, ku çima ez di nirxandinên xwe da tenê pesnê berhemên kurdi didim û qala kêmasiyên wan nakim.

Ne tenê ew, hinek heval û hogirên din jî heman rexne li min girtine, ev helwesta min rexne kirine.

Lêbelê jî bo wan bersiva min doh jî îro jî yek e û ev e:

Bêguman di her kar û xebatê da kêmasî, kêmasî zêde cih digrin, ku di vê romanê da jî hene.

Tew ku ew xebat, xebateka bi zimanê bindestê ku li ber mirinê be û tê da kêmasî cih negre, nabe...

Kêmasî hene û ez jî di hemû xwendinên xwe da qasî serkeftiyan li kêmasiyan digerin û yekoyek jî dibînim.

Lêbelê jî du sedeman ez di nirxandinên xwe da li ser kêmsiyan zêde nasekinim û wan dernaxim pêş.

Ji wan sedeman yek, ez ne rexnegirê edebîyatê me.

Jiber ku, rexnegirî bi tena serê xwe beşek jî edebîyatê ye û pisporîyê dixwaze.

Civaka kurd da jî dema qala rexne û rexnegirîyê were kirin, siyaset û rexneyên siyasetê tê fahmkirin.

Jiber ku her kurd sîyasetvan û di hemandemê da jî rexnegirê sîyasetê ye.

Mixabin di ware edebîyatê da kesên ku karê rexnegirîyê dikin, hebin jî kêr in. Loma berhemên kurdî jî zêde nayên nirxandin û ji nirxandineke pisporî bêpar dimînin.

Ya duyem jî, ez hemû kar û xebatên ku bi zimanê kurdî hatine û tên kirin, hêjayî pesinandinê dibînim.

Jiber ku, îro nivîsandina bi zimanê kurdî kêr, hêjmara xwendewanan jî jî ya nivîskaran kêmtir e. Di rewşek wusa da dilê min rê nade, ku ez bi nirxandina xwe şewqa nivîskaran bêtir kêr, hêjmara xwendewanan jî kêmtir bikim.

Loma di nirxandina Yar û Miradê da jî di ser kêmasîyan ra derbas dibim û bersiva xwe ya ku, heta roja îro bi caran jî hevalê xwe ra jî anîbû ziman, bi vê nivîsê ra careke din dîsa dubare dikim.

Yar û Mirad romanek dîrokî ye û lehengên ku di cilda yekem da cîh digrin ew jî mîr û mîrxasên kurd û kesên naskirî ne.

Ji wan yek Keremê Qolaxasî, yek jî Silêmanê Ehmed e, ku mîranî û mîrxasiya wan di gelek stranên dengbêjan da cîh girtine û heta roja îro hatine.

Mijar mîranî û mîrxasiya Keremê Qolaxasî û Silêmanê Ehmed be, di wê mijarê da qala Zirkîyan û Hesenîyan neyê kirin, nabe. Welî Sebrî jî di pirtûka xwe da kûr û dirêj qala wan dike.

Mirov dema ku dest pê dike û romanê dixwîne, di destpêkê da xwe li Şûşar û Tekmanê, li zozanên Çîyayê Şahwelat dibîne. Dû ra berê xwe dide Çîyayê Qertewînê û bi Keremê Qolaxasî ra dibe heval.

Di demsala payîzê da, di nav çîya û geliyan da digere, di şikeftên tarî da şev û rojên xwe derbas dike. Di berf û bagerê da jî çîya û zozanan dadikeve xwarê, di ser Çemê Mûradê ra derbas dibe û berê xwe dide gund û bajaran.

Piştî rêwîtiyek dûr û dirêj xwe davêje Gundê Kêranlixê û li mala Silêmanê Ehmed dibe mêvan. Di wê mêvantîyê da xweşmerî û camêriya Silêmanê Ehmed bi çavê sere xwe dibîne. Dibe hevparê êş û kelemên Besra û Asya Xanimê...

Roj tê careke din derdikve serê rê û li pey yar û miradê dilê xwe dikeve...

Gor xwendewan pirtûka baş ew e, ku di nav rûpelên wê pirtûkê da xwe ya jî parçeyek ji jiyana xwe dibîne.

Min jî di Yar û Miradê da parçeyek ji dîroka kurdan...

Di wê parçeyê dîrokê da mêranî û merxasîya lehengên kurd...

Şûşar û Tekman, bi heybeta xwe ya taybet va Çîyayê Şahwelat...

Di nav zozan û gelîyên wê da û li ber devê kanîyên wê yên zelal û sar da bîranên xwe yên ji dema zarokatîyê dît.

Lêbelê di wê dîtîne da kêmasîya Çemê Erez bala min kişand, jiber ku mirov qala Şûşar û Tekmanê, qala Çîyayê Şahwelat bike û wan ji xema Çemê Erez bêpar bihêle, nabe...

Bêguman di Yar û Miradê da hinek kêmasîyên din jî hene, ku ew jî bi rewşa ziman va girêdayî ne.

Jiber ku, ziman bêxwedî û li ber mirinê...

Nivîskarê ziman jî ji şewqa nivîsandinê bêpar û sêwî ne...

Di rewşeke wusa da kêmasî jî, dîsa bi xwendin û nivîsandinê kêmtir dibe...

Loma wek gotina dawîyê dikarim bibêjim, ger ku hûn jî dixwazînin bizanibin di romana Welî Sebrî da, „Yar“ kî û „Mirad“ jî çi ye, pirtûkê bigrin nav destê xwe û heta ku we yar û miradê xwe tê da dît, bixwînin...

03.10.2021

Kedkarê sê karên pîroz!

Xwendin û nivîsandin, bi tena serê xwe karên pîroz in.

Ger ku ew kar bi zimanê kurdî bin, pîrozîya wan bêtir zêde dibe.

Jiber ku zimanê kurdî, her çiqas zimanekî qedîm û dewlemend be jî, weke warê xwedîyê xwe bindest û bêxwedî ye.

Loma, kingê mijar ziman û bikaranîna ziman be, ez vê pîrozîya xwendin û nivîsandinê dubare dikim, dibêjim û dinivîsim.

Lokman Polat bi ked û xebata xwe kereke din jî li van herdû karên pîroz dike, ku ew jî nirxandina berhmên kurdî ye.

Ew sê karên pîroz bi hev ra dike.

Nivaîskarekî kurd ê berhemdar e.

Di dema xortanîya xwe da dest bi karê nivîsê kirîye û heta nuha 40 pirtûkên wî hatine weşandin.

Ji wan pirtûkan 12 roman, 11 kurteçîrok, 1 helbest...

16 pirtûkên wî jî ji vegotin û lêkolînên wî pêk tên.

Lokman Polat di hemem demê da xwendevanê herî zêde berhemên kurdî dixwîne ye.

Di van salên dawîyê da her çiqas xwendin û nivîsandina bi kurdî zêde bibe jî, wek îronîyek di nav kurdan da tê gotinê ku, „hêjmara nivîskarên kurdî, jî ya xwendevanên kurdî zêdetir e!“

Bêguman di vê îronîyê da rasîtiyek jî he ye.

Qasî ku kurd jî zimanê xwe dûr, nivîskarên kurd jî ewqas jî xwendina berhemên hev dûr in. Çawa ku jî bo kurdan dibêjin, ew jî xwendinê hez nakin lê bênavber diaxifin, nivîskarên kurd jî kêma dixwînin û zêde dinivîsin...

Nivîskarên ku kurdî dixwînin, ew jî bi gelemperî xwendina xwe ji xwe ra vedişêrin û bi der û dora xwe ra parva nakin.

Lêbelê hêjmara wan kêm be jî, hinek nivîskarên kurd sê karên pîroz bi hev ra dikin, ku ji wan yek jî Lokman Polat e.

Ew dinivîse, dixwîne û dinirxîne...

Berhemên wêjeyî yên ku ew dixwîne, gor nêrîn û zanîna xwe wan li bêjîngê dixe, berhemên ku di bêjînga wî ra derbas bibin, wan yekoyek û bi hûngulî şirove dike û diweşîne. Lokman Polat heta nuha 150 romanên kurdî nirxandiye û nirxandinên wî weke mînakên rexnegirîya wêje ya kurdî di nav çend pirtûkan da hatine weşandin.

Bi vî kar û xebeta xwe ya giranbuha, ew li alîkî va berhemên ku hejayî xwendinê dîtibe, wan bi xwendevanên kurd va dide nasîn...

Li alîyekî din va jî, ger ku kêmasîyên berhemana hebin, nivîskarên wan berhemana sûd ji nirxandina wî digrin û ji dubarekirina kêmasîyên xwe difilitin.

Ez bixwe, ew kar û xebatên ku Lokman Polat di warê ziman da dike, wek karên pîroz dibînim û ji nêzîk va dişopînim.

Min gelek pirtûk û nivîsên wî yên ku di kovar û rojnameyan da hatine weşandin, bi kêfxweşî xwendîye û dixwînim.

Jiber ku ew evîndarê zimanê kurdî ye.

Hemû kar û xebatên wî bi kurdî, kurdîya wî paqij û zelal, vegotina wî jî herikbar e.

Di van demên dawîyê da wî ji min ra du pirtûkên xwe wek dîyarî şandibû.

Ji wan yek, romana wî ya bi navê „Fîlozof“.

Ya din jî xebata wî ya li ser wêje ya kurd a bi nave „Romanên Kurdî, Rexne, Nirxandin û Analîz“ bû.

Min her du pirtûk jî li pey hev xwend û ji xwendina wan jî kêf girt.

Fîlozof, romaneke wî ya kevn e û 20 sal berê hatîye weşandin.

Roman jî du beşan pêk tê.

Polat di beşa yekem da lehengê romanê Fehmîyê Bilal dide nasîn û di derbarê jîyan û tekoşîna wî ya bêhempa da agahîyên berfireh dide.

Di beşa din da jî di kesayetiya lehenge xwe da xewn û xeyalên xwe yên di derbarê civaka kurd, bi taybetî jî siyaseta kurd da dihûne tîne ziman.

Bi xwendina Fîlozof ra qasî ku min Fehmîyê Bîlal ji nêzik va nas kir, tişteki din jî dît, ku ew jî di nav 20 salan da pêşveçûyîna nivîskariya Lokman Polat e.

Pirtûka din, „Romanên Kurdî, Rexne, Nirxandin û Analîz“, jixwe ji navê wê jî tê famkirin, ku ew ji rexne û analîzên wî yên di derbarê wêje ya kurdî da nivîsiye, pêk tê.

Lokman Polat bi çend nivîsên xwe yên ku ew di destpêka pirtûkê da cîh digrin, bersiva hinek pirsên ku di derbarê rexnegirîyê da tên kirin, dide.

Rexnegirî çi ye?

Pîvanên rexnegirîyê çi ne?

Rexnegirîya wêje ya kurdî di asteke çawa da ye?

Û hwd...

Di vê pirtûkê da jî nirxandinên wî yên ku di derbarê 20 romanên kurdî da kirîye, cîh digrin ku, bi pîvanên rexnegirîyê wan pirtûkan bi xwendevanên kurd va dide nasîn.

Bi gotina wî ya pêşîyê, rexnegirî gulîstana zanîne ye!

Edebîyat/wêje jî bi rexne û nirxandinê pêş dikeve, dikemile û dewlemend dibe.

Rexneyên wêjeyî, analîzên îlmî û zanistî edebiyata kurdî jî xurt dike...

Lokman Polat jî bi sê karên xwe yên pîroz, bi berhemdarî û nirxandinên xwe jî bo wêjeya kurdî xizmeteke baş û bi rûmet dike.

30.12.2022

Sîyarên Deşta Anatolîyê

Sîyarên Deşta Anatolîyê, navê pirtûka Muzaffer Ozgur e. Muzaffer Ozgur di dawîya sala derbasbûyî da pirtûka xwe diyarî min kiribû. Di hemahengîya sersalê da min firsenda xwendinê nedît. Dû ra hin tiştên din derketin pêş û heta roja îro ma. Ancax îro min dest pê kir û di derbekî da xwend û xilas kir. Dû ra kûr û dûr li ser naveroka pirtûkê û ziman fikirim, zimanê li ber mirinê...

Ez bixwe nivîsandina bi zimanên li ber mirinê, karekî pîroz û bi rûmet dibînim. Îro zimanê kurdî jî, bi saya kurdên li bakûr û li Kurdistana Bakûr, roj bi roj ber bi mirinê diçe.

Muzaffer Ozgur jî bi pirtûka xwe ya bi navê “Sîyarên Deşta Anatolîyê” karekî pîroz daye ser mile xwe û bi serkeftî aniye cîh.

Nivîskar jî di destpêka pirtûka xwe da gor agahîyên ku Hec Mistefa dide, qala koka kurdên Anatolîyê dike.

Kurdên Anatolîya Navîn çima jî axa xwe koçberbûne û ji kuderê hatine?

Ji kîjan êl û eşîran in û çawa li wir bicîh bûne û heta roja îro xwe parastine?

Nivîskar bi çîroka ku nêzikî sedsal bere qewimîye, çîroka Osê Birê û hevalên wî, jîyana kurdên Anatolîya navîn dide ber çav...

Wek di pirtûkê da jî hatîye vegotin, kurdên Anatolîya Navîn jî derveyî axa Kurdistanê doravêk avakirine û di wê doravê da bi hestên kurd û kurdayetîyê jîyane û dijîn.

Ji sedsalan vir da, gor şert û mercên eşîrtîyê jîyana xwe heta roja îro kudandine û li ziman û çanda xwe xwedî derketine... Wek tê zanîn, ziman û ax herdu jî hîmên netewetîyê yên herîn bingeh in û bi hev ra girêdayî ne...

Milêtê ku ji axa xwe dûrdikeve, ji zimanê xwe jî dûr dikeve û jibîr dike.

Lêbelê rewşa kurdên Anatoliya Navîn îstisnayeke balkeş e. Ew çiqas jî axa bav û kalen xwe dûr ketibin jî, jî kurdên ku hê li ser axa Kurdistanê dijîn, bêtir kurd û Kurdistanî ne...

Bêguman sedemên kurdbûn û kurdmayîna wan gelek in, lê ez bawerim ji wan ya herî girîng, jîyana wan a eşîrtî ye...

Kurdên ku îro li ser axa Kurdistanê dijîn, ji wan yên ku xwe bi enternasyonalîstîyê û omedperestîyê va bi nav nekin, nemane...

Lêbelê kurdên Anatoliya Navîn wek di pirtûkê da jî hatîye ziman, ew hê jî xwe û gundên xwe bi navê eşîretên xwe va gire didin û bi nav dikin...

Weke misal...

Reşî, Celikî, Şêxbizî, Canbegî, Sewedî, Millî, Xelikî û hwd...

Lêbelê di pirtûkê da gelek kêmasî jî hene, bi taybetî di hevoksazî û bikaranîna deman da...

Lê ez jî sedema du tiştan naxwazim zêde li ser kêmasîyên vê pirtûke jî rtawestim û dûr dirêj binirxînim. Jiber ku nivîskar jî di pêşgotina xwe da nivîsandîye, ku pirtûka xwe gor axaftina kurdên Anatoliya Navîn nivîsandî ye.

Ya din jî, nivîsandina wî ya bi kurdî, nivîsandina bi zimanê bindest û birîndar e...

Ev yek bi tena serê xwe karekî pêroz û bi rûmet e, ku tê da kêmasî hebe jî, giranîya wê sivik û erzan nake...

Jibo vê yeke jî ez careke din nivîskarê “Siyarên Deşta Anatoliyê” Muzaffer Ozgur pêroz dikim û di berhemên wî yên nû da serkeftinê dixwazim...

20.01.2018

„Guldestyek Ji Edebîyata Cîhanê“

Ev, navê pirtûka nivîskarê kurd Yusuf Kaynak e û du sal berê hatîye weşandin.

Birêz Kaynak ev pirtûka xwe demek berê ji min ra şandibû.

Qasî navê pirtûkê, naveroka wê ji bala min kişand.

Loma min ew li ber destê xwe zêde nehîşt, bi kêf û kelecana dest pê kir û di nav çend rojan da xwend.

Nav ji, naveroka pirtûkê jî balkêş e.

Jiber ku nivîskar, piştî ked û xebata xwe ya deh salan ev pirtûk amade kirîye.

Kaynak di vê pirtûkê da 32 nivîskarên cîhanê dide nasîn. Kurtejiyana wan û berhemên wan ên bi nav û deng, bi kurdîyeke zelal nivîsiye û di nav pirtûkekê da pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

Nivîskarên ku bûne mijara vê pirtûkê, ji wan 25 nivîskar ji welatên li ser parzemîna Ewropayê ne, 7 nivîskar jî ji çend welatên li Rojhilata Navîn in.

Bê guman, ew nivîskarên ku di pirtûkê da cîh digrin, ji alî gelek xwendevanên kurd va, kêma ya ji zêde tîna nasîn. Jiber ku berhemên hemûyan bi gelek zimanan hatine wergerandin û ew jî bi wan berhemên xwe li seranserê dinê tîna nasînin.

Herwiha di nav wan da nivîskarên ku xelata Nobelê ya Edebîyatê wergirtine jî hene.

Lêbelê xwendevanên kurd ên ku berhemên wan bi zimanek biyanî xwendibin û ew nas kiribin jî, bi xwendina vê pirtûkê va, dikarin kurtejiyan û agahiyên di derbarê berhemen wan da hatine nivîsandin, bi kurdî jî bixwînin û tîna zimanê xwe yê şîrîn jê bigirin.

Nivîskar jî di pêşgotina xwe da qala armanca xwe ya ji bo vê xebatê dike û di derbarê nivîskarên hîlbijartîye da jî wiha dibêje; „armanca min ev e, ku bi vê xebatê nîfşê kurd yên ciwan ji edebîyata cîhanê agahdar bikim. Mebest ji hîlbijartina van nivîskaran, ew li welatê xwe û li cîhanê bi navûdeng in. Berhmên wan zêde hatine/tên xwendinê û bûne klasîkên edebîyata cîhanê...”

Qasî ku mirov ji pêşgotina nivîskar têdigihîje, ev pirtûk cîlda yekam a xebata nivîskare û dê dumahîka wê jî hebe.

Hêvîdar im, guldesteyeka ku nivîskar bi cîlda duyemîn va pêşkêşî me dike, ji ya yekemin xurtir û rengîntir, ji kêmasî û şaşîyên çapê jî azade be.

Kêmasî û şaşîyên di çapê da tên kirin, herçiqas qisûrên nivîskar nebin jî, kêmbûn û zêdebûna wan ya ji piçûkbûn û mezinbûna wan li ser navê nivîskar jî tên qeyd kirin.

Bê guman di her kar û xebatê da, kêma ya jî zêde, şaşî û xeletî cîh digrin. Lêbelê ger ku ew karû xebaz ji alî kurdan va hatibe kirin, kêmasî jî, şaşî û xeletî jî mîna goga ji berfê li ser hev lûr û zêde dibin.

Kêmasîyên ku min di vê pirtûkê da dîtî, piçûk û bi piçûkatîya xwe jî ji alî piranîya xwendevanan neyên ferqkirinê jî, bi wateya xwe qasî bilindîya çîyan mezin in.

Du mînak:

Li ser berga pirtûkê ya pêşîyê navê pirtûkê, li bin navê pirtûkê jî di nav kevanê da agahîyeke wusa, (Jîyan û Berhmên 33 Nivîskarên Cîhanê) cîh digre, ku ev jî parçeyek ji navê pirtûkê ye.

Mixabin di berga pirtûkê ya hundurîn da jî ev agahî bi vî rengî (Jîyan û Berhmên 32 Nivîskarên Cîhanê) tê guhartin. Ji 33 nivîskaran yek di nav rûpela ewil da wenda dibe û 32 nivîskar dimînin...

Xwezila kêmasî ev tenê ba.

Kêmasîya herî mezin di navdanka weşanxaneyê da diqewime.

Nivîskar tê guhartin...

Nivîskar Yusuf Kaynak di navdanka weşanxaneyê da dibe kesî din...

Bi vê şaşîyê ra navbera nivîskar û redaktorê pirtûkê xirab nebe jî, bêşik serê xwendevan tevlihev dibe.

Loma mirov dikare bibêje, ev pirtûk qasî ku di warê xwe da xebateke yekemîn be, di şaşîya ku tê da cîh digre jî pirtûkeke yekemîn e.

Dema ku min ev şaşî dît, nivîsek min a 15-16 sal berê bi tirkî nivîsîbû û di Kovara Tirojê da hatibû weşandin, hate bîra min.

Mijara nivîsê, Edebîyata kurdî...

Sernivîs jî, Pêşketin û Pirsgrîrêkên Wêjeya Kurdî ya li Diyasporayê bû...

Di wê nivîsê da, min qasî zanebûna xwe rewşa edebîyata kurdî ya li derveyî welat nixrandibû, gor çavdêrîyên xwe hinek pirsgrîrêkên nivîskarên kurd û barê wan ê giran li ber çavan raxistibû û bi minakan ew pirsgrêk anîbû ziman.

Ji wan pirsgrîrêkan çend minak wiha li pey hev rêzkiribû:

Nivîskarên kurd, ne tenê nivîskar, di heman demê da redaktor in, jiber ku hem dinivîsin, hem jî redaktorîya nivîsên xwe dikin, ger ku şaşî kêmasîya xwe bibînin...

Nivîskarên kurd, di heman demê da weşanger in, jiber ku mesrafa çapa pirtûkên xwe ji berika xwe didin û bi navê weşanxaneyek diweşînin.

Nivîskarên kurd, di heman demê da pirtûkfiros in, jiber ku pirtûkên xwe li piştî xwe bar dikin, di şî û şahîyan da, di meş û pêşangehan da bi xwe ra digerin û bi xwe difroşin.

Loma barê wan jî qasî karê wan ê nivîsandinê mezin û giran e.

Ger ku min ew nivîs îro binivîsîya, gor tecrûbeyên nivîskarîya xwe, min ê hêjmareke din jî lê zêde bikira û bigota:

Nivîskarên kurd di heman demê da xwendevanên berhmên xwe, bixwe ne jî.

Jiber ku ew kesên ku pirtûkên wan dikirin, roj tê jî wan ra telefonê vedikin û dibêjin; „Heval, te pirtûka xwe, bi destê xwe ji me ra anî û jibo ku em te destvala neşînin, me hebek ji te kirî.

Lêbelê kesê ku ji me ra bixwîne di mal da nîne. Ji kerema xwe, were pirtûka xwe ji me ra bixwîne, ku hem bila perê me badilhewa nece, hem jî em jî bizanibin ka te di pirtûka xwe da qala çi kirîye û pesnê kî û kê daye...”

Ez bawer im, dema ku hûn vê nivîsê bixwînin, dê bixwe ji xwe ra bibêjin, ku evqas jî nabe. Ev tiştên tu qal dikî, qîlf û henekên nivîskaran e...

Bawer bikin, karê kivîskarên kurd evqas zêde nebe jî, barê li ser pişta wan jî van gotinên min jî girantir e.

Jiber ku nivîskarên urd bêxwedî û bêdewlet in...

Zimanê ku di berhemên xwe da bi kar tînin, zimanekî sêwî û bindest e.

Loma redaktorîya nivîsên xwe jî bi xwe nekin, wê gavê jî navê xwe dibin.

Mesrefa çapkirina pirtûkên xwe jî kîsê xwe nedin, ne weşanxaneyek li rûyê wan mêze dike, ne ji bo xêra dê û bavê xwe ne jî ji bo xatirê zimanê bav û kalê xwe berhemên wan çap dike û diweşîne.

Piştî weşanê nivîskar pirtûkên xwe li pişta xwe bar nekin û yekoyek nefroşin, pirtûk di destê nivîskar û di depoya weşanxaneyê da dimîne, ku ew ked û xebat nivîskar jî bo zimanê kurdî kirîye jî di nav pirtûkan da wenda dibe...

Loma dibêjim ger ku nivîskar neçin û jî ew kesên ku pirtûkên wan kirîne ra, pirtûkên xwe nexwînin(!), peyv û gotinên wan ên bi zimanê li ber mirinê hatine nivîsandin, di nav pelên pirtûkan da veşartî dimînin û bi demê ra can didin...

02.07.2021

„27 Nivîskarên Edebîyata Cîhanê“

27 Nivîskarên Edebîyata Cîhanê, navê pirtûka nivîskarê kurd Yusuf Kaynak e.

Kaynak gera xwe ya ku di nav edebîyata cîhanê da dike, di vê pirtûkê da jî didomîne. Di vê pirtûkê da jî li şopa 27 nivîskarên cîhanê gerîyaye, ew nivîskarên ku bi deng û rengên xwe edebîyata cîhanê xemilandine û dewlemend kirine...

Yusuf Kaynak di vê pirtûkê da kurtejiyana hemû nivîskaran bi kurdîyeke zelal wergerandiye kurdî û berhemên wan ên bi nav û deng xwendîye û gor nêrîna xwe bi kurtayî nirxandina wan berheman kirîye.

Ev kar û xebata xwe ya bi salan di nav pirtûkeke qalind û giranbuha da, bi berhevkirineke baş pêşkêşî xwendevanên kurd dike.

Ev pirtûk, kar û xebata Yusuf Kaynak a di vî warî da ya duyemîn e.

Xebata wî ya yekemîn salek berê û bi navê „Guldesteyek ji Edebîyata Cîhanê“ hatibû weşandin.

Kaynak di wê pirtûkê da, ku mirov dikare wê wek cilda yekemîn jî bi nav bike, cîh dabû 32 nivîskarên cîhanê. Ji wan 25 nivîskar jî welatên li ser parezmîna Ewropayê, 7 nivîskar jî ji çend welatên Rojhilata navîn bûn.

Bi kurtejiyan û nirxandina berhemên wan, 32 nivîskarên ku di demên cûda da û bi zimanên cuda mohra xwe li edebîyata cîhanê xistibûn, dabû nasîn. Heval û dostê min ê hêja Yusuf Kaynak cilda yekemîn a ku bi navê „Guldesteyek ji Edebîyata Cîhanê“ salek berê jî ji min ra şandibû.

Min ew guldesteya wî jî bi kêfxweşî xwendibû, di derbarê wê da nêrînên xwe nivîsandibû û bi xwendevanê NavKurdê ra parva kiribû.

Kaynak, di pêşgotina wê cîldê da qala armanca xwe ya ji bo vê xebatê kiribû û gotinên xwe wiha anîbû ziman; „Armanca min ev e, ku bi vê xebatê nîşê kurd yê ciwan ji edebiyata cîhanê agahdar bikim. Mebest ji hîlbijartina van nivîskaran, ew li welatê xwe û li cîhanê bi navûdeng in. Berhmên wan zêde hatine/tên xwendinê û bûne klasîkên edebiyata cîhanê...”

Bi vê armancê Kaynak ji bo cîlda duyem jî 27 nivîskar hîlbijartîye û bi kurtejiyan û nirxandina berhemên wan, bi berfirehî wan daye nasîn.

Di pêşgotina vê cîldê da jî Kaynak ji bo ev xebata xwe wiha dibêje „Cîlda yekem ji nivîskarên ku netew û zimanên wan ji hev cuda, pêk hatibû.

Di vê cîlda duyem da nivîskarên ku tenê bi zmanê Îngilîzî nvîsandine, cîh digrin...”

Ew nivîskarên ku Kaynak di vê cîldê da cîh dane wan ev in:

Ji Avusturyayê Stefan Zweig.

Ji Kanadayê Alice Munro.

Ji Ukraynayê Josph Conrad.

Ji Romanyayê Elie Wiesel.

Ji Zelanda ya Nû Janet Frame.

Ji Afrîka ya Başûr John Maxwell Coetzee, Nadine Gordimer.

Ji Îrlandayê James Joyce, Oscar Wilde, Samuel Beckett, William Blake, William Butler.

Ji Îngilîstanê Charles Dickens, George Eliot, George Orwel, JRR Tolkien, Patrick White, Virginia Woolf, William Shakspeare.

Ji Amerîkayê Edgar Allan Poe, Ernest Hemingway, Jack London, John Steinbeck, Mark Twain, Sinclair Lewis, TS Eliot, William Faulkner.

Bêguman dema ku mirov di nav rûpelên pirtûkê da dikeve rêwîtiyê û rastî nav û berhemên nivîskaran tê, wan hemûyan ji xwe ra nas û nêzik dibîne.

Kêm zêde min jî berhemên piranîya van nivîskaran xwendîye û hemû jî ji bo nivîskarên nas û navdar in. Bi taybetî jî Jack London, Hemingway, Stefan Zweig, Charls Dickens... Tahma ku min ji berhemên wan û yên din girtibû, bi xwendina vê pirtûkê va careke din ew bibîr anîn.

Ew berhemên wan ên ku min bi salan berê xwendibû, ew yekoyek di ber çavên min ra derbas bûn, bi berg û navên xwe va...

Jiber ku ew hemû nivîskarên bi nav û deng û xwedîyê berhemên klasîk in.

Li welatên cuda û di demên cuda da jîyabin û bi kok û esaleta xwe jî hev dût bin jî, di jîyana wan da gelek hevparîyên bingeîn jî cîh digrin.

Ji wan yek nivîskarîya wan a bi nav û deng be, yek jî zimanê nivîskarîya wan e.

Hemûyan berhemên xwe bi zimanê Îngilîzî nivîsîne, bi reng û dengê Îngilîzî edebîyata cîhanê xemilandine û dewlemend kirine.

Kaynak jî di rêwîtiya xwe ya ku di nav edebîyata cîhanê da vala nese-kiniye û karekî pîroz anîye cîh.

Di nav wê dewlemendîyê da nivîskar û berhemên wan ên sereke hilbijartîye û wan yekoyek xwendîye.

Bi xwendinê jî nese-kiniye, bi ked û xebata xwe ya salan di nav du pirtûkên qalind û giranbuha da berhev kirîye.

Ew bi xebata xwe ne tenê nivîskarên cîhanê û berhemên wan ên klasîk dide nasîn, bi nivîs û nirxandina xwe ya bi kurdî, zimanê me yê şîrîn jî dixemilîne û dewlemend dike.

Cilda yekmîn a vê xebatê, „Guldesteyek ji Edebîyata Cîhanê“ bû, ku min ew salek berê xwendibû, cilda duyem, „27 Nivîskarên Edebîyata Cîhanê“ jî çend roj berê dest pê kir û bi kelecana xend û qedand.

Yusuf Kaynak bi vê xebata xwe jî weke navê ya yekemîn, desteyek guldiyarî xwendevanên Kurd dike.

Min gulên wî bihn kir û ji reng û tahma gelek kêf girt.

Loma ji bo ked û xebata wî ya giranbiha careke din Yusuf Kaynak pîroz dikim.

Hêvîdar im, ev ked û xebata pîroz qasî ku di pirtûkxaneyê kurdî da wek arşîveke mayînd cîhê xwe jî niha da girtiye, jî alî xwendevanên kurd va jî were dîtîn û xwendin.

13.05.2022

Ulysses

Di destpêka meha Adarê da min dest bi xwendina Ulyssesa James Joyce kiribû...

Her roj kêm zêde 50-60 rûpel xwend, di nav bîst û çend rojan da dawî lê anî û xwendina wê qedand.

Ji piranîya navên biyanî, bûyerên zêde û axaftinên dirêj, carinan mijar di hişê min da tevlihev dibû û li paş xwe va vedigerîyam.

Carinan jî ji dirêjahî û hurguliya vegotina Joyce westîyam, çavên min qerimîn û di cîhê xwe da xilmaş bûm...

Lê dîsa jî min dest ji xwendina wê berneda, bi sebr û tahamûl berxwe da û heta dawîya pirtûkê hatim...

Pirtûk jî alî Kawa Nemir va hatîye wergerandin, di nav weşanên Avestayê da û li Stenbolê hatîye çapkirin.

Ulyssesa James Joyce romaneke modernîst e û berhemek jî berhemên herî girîng ên edebiyata modernîst tê hesibandin.

Joyce di pirtûkê da tenê qala rojeka ku li Dublînê derbas bûye, dike, ku ew roj jî roja 16ê Hezîrana 1904an e.

Lehengê romanê yê sereke Leopold Bloom e. Bloom wê rojê, jî danê sibê va ji mala xwe derdikeve, di nav kûçê û kolanên Dublînê da rastî heval û hogirên xwe tê. Ew û hevalên xwe bi hev ra digerin, li gelek cîyan rûdinên, diaxifin û roja xwe derbas dikin. Ev bûyerên ku Joyce di vê pirtûkê da kûr û dirêj vedibêje, ew jî ji axaftinên ku wê rojê di navbera Bloom û hevalên wî da derbas bûne, pêk tên. Herwiha çavdêrîyên Bloom ên wê rojê û fikr û nêrînên wî yên di derbarê wan da...

Di van salên dawîyê da heta ku ji destê min were, ez berhemên ku bi

kurdî hatine nivîsandin dixwînîm, ku ew jî bi zêdeyî çîrok û roman in.

Çîrok û romanên ku ji alî kurdan va û bi Kurdî hatine nivîsandin zêde, lêbelê wergerên ji edebîyata cîhanê jî kêm in.

Bê guman berhemên ku bi zimanê merîya hatibin nivîsandin, mijar û lehengên wan nas, vekotina nivîskaran jî li merîya xweş tê.

Ger ku di mijarê da navê Kurd û Kurdistanê derbas be...

Qala mêranî û mêrxasîya kesayetîyên dîrokî were kirin...

Ser da jî mirov xwe ya jî parçeyek ji jîyana xwe tê da bibîne, edî li huner û hostayîya nivîskar jî, li rêkûpêkbûna ziman û vegotina nivîskar jî nanihêre...

Lê kîngê mirov romanek ji edebîyata cîhanê, romaneke klasîk ya jî weke Ulyssesa ku wek modernîst tê binavkirin bixwîne û bi romannivîsîya Kurdî va bide ber hev, wê gavê mirov ji hunera romanê û vegotina nivîskar a hostayî ya ku wê hunerê çawa xemilandîye, bi hêsanî dibîne.

Alîyek wek baxçeyên ku tê da gul û sosinên rengareng û bi ahengek hatine çinandin, xûya dike û bi reng û bedewîya xwe merîya ber bi xwe dikişîne, alîyek jî wek xozanên ku ji avê bêpar mane û zuha bûne, di nav gîhayê palax ta darên merîcekê ku bi rût û tazîbûna xwe tê da dirêj bûne, xuya dike û merîya ji xwe dûrdixîne.

Loma ji bo pêşveçûna zimaneke mîna zimanê Kurdî bindest û bêxwedî ma ye, qasî nivîsandina bi wî zimanî, wergera ji edebîyata cîhanê jî pêwîst e.

Jiber ku nivîsandina kesên ku bi zimanê xwe dinivîsin, peyv û hevokên ku di wan da cîh digrin, gor xewn û xeyalên wan û bi zanbebûna wan va sînordar e.

Lêbelê werger ne wusa ye, berhema ku tê wergerandin, bi peyv û hevokên zimaneke din û bi xewn û xeyalên nivîskareke bîyanî va hatîye xemilandin.

Pêwîst e, wergervan beranberîya wan peyv û hevokên ku bi zimaneke din hatine sazîkirin û hunandin, bibîne û di cîh da jî bi kar bîne.

Ji bo wergereke bi serkeftî jî du tişt pêwîst in:

Yek, dewlemendiya ziman...

Ya din ji huner û zanebûna wergervan e.

Di wergera Ulyssesê da ji mirov dewlemendîya zimanê Kurdî û asta hunera Kawa Nemir ji bi hêsanî dibîne. Herçiqa di hevoksazî û bikaranîna zimanê wergerê da hinek kêmasî hebin, ew ji bi rewş û pirsgrêka zimanê Kurdî va girêdayîne. Jiber ku di bikaranîna zimanê Kurdî da hê yekitîyeke bi rêkûpêk cih nagre. Loma her nivîskar û wergervan gor zanîna xwe û bikaranîna rewşa herêma xwe, ji xwe ra rêyek dîtîye û tê da hespê xwe dibezîne...

Wergera ji zimanên dewlemend û ji berhemên nivîskarên xwedî huner, zimanê ku ew berhem lê tên wergerandin ji dewlemend dike û dixemilîne.

Çend hevokên ji Ulyssesê, ku mirov bitenê di wergerê da dikare bibîne:

„Bi bêvila wî digirt û soz û bext dida wî wek parîyê serê sominê nanê genimî yê dîmsa bi rengê zêrîn têdayî bide wî...”

„Nanê bi kelkel û rûnê nivîşkî û pîrzoleta goştê nerme yê berxan a qelandî ya sosa pamodoran lêkirî dixwarin û qaldikirin...”

Ya ji hevokeke wiha dirêj û watedar; „Ew Gerty bû, ya kû bi bizmarên sertopik va salnameya Goxandê ya Mr Tunneyê xwedîyê dikana feqîyan û zerzevatan bi dîwarê wî cîyê vedikir, ew cîyê ku wê çu caran ji bîr nedikir û herdu hefteyan carekê kloroto kelsê tê dida, da ku paqij bimîne, ew wênêyê serdema zêrîn di kîjanî da camêrekî xort ê di ber kirî cil û bergên ku wê hingê wan li xwe dikirin û şewqeyekî sêgoşeyî dayî serê xwe di pencereya çaxuçatû ra bi hewayê siwarçokîya zemanê berê baqek kulîlk pêşkêşî hezkirîya xwe dikir....”

Herwiha ez di nav rûpelên Ulyssesê da rastî gelek peyv û gotinên ku min di zarokatîya xwe da bihîstibû û ji bîr kiribû, hatim.

Ji wan peyv û gotinan çend mînak, „xirxope, tîmtêl, bizûz, qorzi, wêrtas....”

„Devqîçê devşorbe...”

„Berde binê te erde...”

„Berê gul bû, baranê lê kir şil bû...”

„Babavo te ji qûna xwe şûstibû dabû ser pûngê...”

„Bi salan û mehan careke bû mêvanê xalan, ew ji bi kulzikî û gazin-

an...“

Di vê wergerê da jî mirov bi hêsanî dibîne, ku zimanê Kurdî zimanêke xwezayî û dewlemend e. Ew dewlemendî jî bi saya zargotina kurdîya ku bi kilam û stranên dengbêjan, herwiha bi çîrokên çîrokvanan heta roja îro hatiye û wenda nebû ye.

Mixabin gor vê dewlemendîyê, edebîyata nivîskî, bi taybetî jî romannivîsiya Kurdî hê nû ye û di destpêka xwe da ye.

Ji sedeman yek bindestîbûna ziman be, ya din jî bi hest û helwesta nivîskarên kurd va girêdayî ye.

Dibe ku ji dewlemendîya zargotinê be, Kurd zêde diaxifin û guhdarî dikin, lêbelê zêde naxwînin. Gor nêrîna min pîranîya nivîskarên Kurd jî zêde naxwînin, lêbelê zêde dinivîsin...

Bê guman nivîsandina bi Kurdî bi tena serê xwe kareke pîroz e.

Le divê mirov wî karê pîroz jî bi zanîne va bixemilîne, ku ew jî bi bi xwenîne va gengaz e.

Salan berê min ji rexnegirekî Tirk bihîstibû...

Di axaftineke xwe da qîlf û henekên xwe bi hinek nivîskarên Tirk kiribû û wiha gotibû: „Sê romanên bikirrin û bixwînin. Piştî xwendinê ger ku hûn bibêjin ku ez jî dikarim romanek wisa binivîsim, dest ji xwendinê berdin û romana xwe binivîsin. Bawer bikin, ku romana we ya yekemîn ji her sê romanên ku we xwendîye çêtir nebe, ji wan xirabtir jî nabe...”

Ez kîngê dest bi xwendina romaneke kurdî bikim, ev gotina rexnegirê Tirk tê bîra min. Ez jî hercarê di ber xwe da dikenim û bixwe jixwe ra dibêjim, „camêr ev gotina xwe ji Tirkên ra gotîye, lê xûya ye, Kurd jî ji temîyên wî bêpar neman e...”

Yaşar Kemal jî di daxaftineke xwe da ji bo nivîskariya xwe gotibû, ku ew berî nivîsandina her berhemeke xwe, ji bilî pirtûkên curbicur hercarê sê pirtûkan dixwîne...

Ji wan pirtûkan yek „Îlyada“ ya Homeros, yek jî “Şahname” ya Firdevsî bû ye...

Min ev gotin û navê her sê pirtûkan jî ji devê wî guhdarî kiribû, lêbelê ew pirtûka din kîjan û berhema kî û kê bû, nehat bîra min...

Dîsa bi gotina Yaşar Kemal, „nivîsandina bê xwendin jî, mîna nanê tîsî ye, zik jê têr bibe jî çav birçî dimîne...”

Loma kurdên xwe wek nivîsîkar bi nav dikin û bi taybetî jî romanên dinivîsin, divê ew jî berî nivîsandina her berhemeke xwe, çend romanên sereke yên ji edebîyata cîhanê bixwînin, ku têbigihîjin roman çî ye û bi tewneke çawa tê nivîsandin...

Bê guman Ulyssesa James Joyce jî ji wan çend romanên yek e...

27.03.2024

Milan Kundera jî mir...

Nivîskarê Çek Milan Kundera di 94 salîya xwe da, li Parîsê, xatir ji xwendevanên xwe xwast û ji vê dinê koçber bû.

Peyva mirinê li herderê peyveke sar e.

Loma li hêla me, li Serhedê nedigotin, „filankes mir...”

Digotin, „filankesê dinya xwe guhart...”

Bi wateya ku ji vê dine çû dinya wîyalî.

Dinya wîyalî...

Gelo dinyayeke wisa he ye?

Ya jî hebe dinyayeke çawa û li kû ye?

Ew kêsên ku vî qalibî bi kar tînin, ji hebûn û tunebûna dinya wîyalî sedî sed bawer nebin jî, gumana xwe jê nabirin.

Bi xeyala hebûna dinya wîyalî ya ku tê da jîyaneke bêdawî bikin, hemû eş û kelemên xwe yên li vê dinyayê ji bîr dikin.

Bi gotina bav û kalên me, Milan Kundera jî îro dinya xwe guhart.

Ji viyalî koçberî wîyalî bû.

Ew jî mîna piranîya kurdan, mirovekî koçber bû. Di jîyana xwe ya li vî alî da jî eş û jana koçberîyê tahm kiribû.

Ji zilm û zordariya Stalîn û Stalinperweran welatê xwe li paş xwe hîştibû û revîyabû, di 45 salîya xwe da û wek nivîskarekî bi nav û deng...

Çûbû li Parîsê bi cîh bibû.

Zilm û zordariya ku bi navê gel û karkeran, li gel û karkeran hatibû kirin, bi hûngulî qeyd kiribû.

Peyv û gotinên xwe bi hunera xwe ya wêjeyî xemilandibû û anîbû ziman.

Dema ku pirtûka wî ya ku bi tirkî jê ra dibêjin, „Varolmanın Dayanılmaz Hafifliği – Sivikiya Hebûnê ya Bêtehemûl” li Tirkîye hatibû weşandin, ez wê demê xwendekarê zanîngehê bûm.

Di ser Derbeya 12 Îlonê ra çend sal derbas bibû.

Li zanîngehan û di nav xwendekarên zanîngehan da agirê şoreşgerîyê dîsa û ji nû va gur bibû.

Dema xwendekarên şoreşger li anfiyan zêdetir, li ber derê çayxaneyên zanîngehan û bi bangeşeya şoreşgerîyê derbas dibû, bangeşeya ku bi ruknê Lênînîzm û Stalînîzmê dihat kirin...

Di demeke wisa da pirtûka Milan Kundera bi zimanê tirkî û li Tirkîyê hatibû weşandin û di nav xwendekarên zanîngehê da deng da bû.

Ew kesên ku xwe demokrat dihesibandin li dijberî dîktatorîya proleterayê derdiketin, pesnê pirtûkê didan...

Şoreşger û sosyalîstên tûj û tund jî Milan Kundera xwefiroş û dijberê sosyalîzmê nîşan didan û pirtûka wî jî reş dikirin.

Digotin, „Milan Kundera xulam û xizmetkarê emperyalîstan, dijber û neyarê sosyalîzmê ye. Kesên ku pirtûka wî bikin û bixwînin, ew jî mîna wî dijberên şoreş û sosyalîzmê ne...

Jibo ku bi vî rengî neyên tawanbarkirin, xwendekarên ku ev pirtûk dixwendin, xwendina xwe ji heval û hogirên xwe yên herî nêzîk ji vedîşartin û ji kesî ra nedigotin.

Çawa ku şoreşger û sosyalîstên tûj û tund pirtûken xwe yên siyasî bi rojnameyên kevn dinixamtin û ji polêsan vedîşartin, ew xwendekarên ku pirtûka Milan Kundera dixwendin, wan jî ev pirtûk bi heman tewnê dinaxamtin û ji hevalên xwe yên sosyalist û şoreşger vedîşartin.

Weke mîna îro tê bîra min, hevalekî min ê herî nêzîk, ku me bi hev ra siyaseta hizbî û xwe jî wek sosyalîstên kurd bi nav dikir. Hevalê min rojek dît, ku di destê min da pirtûka Milan Kundera û ez rûniştîme pirtûkê dixwînim. Bi dîtîne ra reng û rûyê wî guherî û bi dîlşikestî ji min ra got:

Tu jî vê pirtûkê dixwîni?

Min tu car bawer nedikir ku tu jî ewqas zû werî xapandin?...

Ew Milan Kundera yê ku di demeka ku li seranserê dinyayê ji Stalîn û Stalînîzmê ra çepik dihat lêxistin, rûyê Stalîn û Stalînîzmê bi mêranî ûmêrxasiya xwe, bi huner û nivîskarîya xwe eşkere dikir.

Di ser xwendina min a wê pirtûkê ra 40 salên dûr û dirêj derbas bûn.

Piştî çil salan xêncî hinek kurdên binerd û kesên wek wan, îro tu kes navê Stalîn ji êdî nayne ser zar û zimanê xwe...

Lê Milan Kundera iro jî tê naskirin û pirtûkên wî tên xwendin.

Ji bilî ev pirtûka Milan Kundera min çend pirtûkên wî yên din jî xwend.

Ji nivîskarîya wî...

Ji cesareta wî...

Ji ziman û vegotina wî hez kir.

Mixabin, îro pêhesîyam, ku wî jî xatir ji vê dinyayê xwestîye û koçberî dinya wîyalî bû ye.

Ger ku li cîhê ku çûye da jîyan hebe, bila konê wî ronî û ji konên Stalîn û Stalînperweran dûr be...

12.07.2023

Jîyana evînî ya Karl Marx

Bi navê xwe yê Tirkî, „Karl Marx’ın Aşk Hayatı- Jîyana Evînî ya Karl Marx“ pirtûka Pierre Durand e.

Min ev pirtûk 40 sal berê, li Stenbolê xwendibû

Di ser darbeya 12ê Îlonê ra çend sal derbas bibû, lê bandora wê ya mayînde, di her xalê jîyanê da bi zelalî dihat dîtin.

Tirkîye bibû zîndaneke servekirî, zanîngeh jî ji derva weke leşkergeh xûya dikirin, ku polês û lesskerên li derdor û berdêrê zanîngehan pîyase dikirin, hêjmara wan jî ya xwendekaran zêdtir bûn.

Xwendekar di bin çavdêriya polês û leşkeran da ji derîyên zanîngehan ra derbas dibûn... Akademîsyen bi tirs û xof dihatin di anfiyan da gotinên xwe yên ezber, ji xwendekaran ra vedigotin û derdiketin.

Ne pirsek dihate kirin, ne jî di navbera xwendekar û akademîsyenan da gengeşîyek derdiket.

Ji tirs û xofa ku sixurek di anfiyan da hebe, xwendekar bêdeng û bê pirs li gotinên akademîsyen guhdarî dikirin û dinivîsîn. Ger ku di derbarê vegotîna akademîsyen da pirsek wan heba, piştî dersê diçûn odeya wî/ wê û li wir jê dipirsîn, ku li wir jî akademîsyen ji bo bersivdayînê dudilî dibû, navê pirtûkek ji xwendekar ra pêşniyar dikir û şûnda dişand.

Pirtûkên ku bêhna siyasî ya jî pîrsgirekên cîvakî jê bihatana, jixwe nedihatîn dîtin. Pîrraniya wan qedexekirî, yên ne qedexekirî jî li herderê nedihatîn firotan.

Jiber ku firoşker ji firotanê, xwendevan ji kirîna ditirsîya...

Di pirtûkxaneyê zanîngehê da jî bi hezaran pirtûk bi navên xwe hebûn, lêbelê di nav refên pirtûkan da nedihatîn dîtin. Dema ku xwendekarek ji wan pirtûkan yek bixwesta, karkerê pirtûkxaneyê bi dengeke nizm

digot; „Qeyda wê heye, lêbele di pirtûkxaneyê da nemaye...”

Li meydana Beyazîdê li alî çepê zanîngehê û li paş mizgeftê dareke çînarê hebû, dareke kevn û mezin.

Li bin alîkî darê çayxaneyê seyar, li alîyê din jî pirtûkfiroşê seyar cîh digirt. Pirtûkfiroş pirtûkên xwe li erdê radixist û bi buhayê erzan difrot. Pirtûkên ku carek hatibûn xwendin, pirtûkên kevn û erzan, lêbele bi naveroka xwe dewlemend giranbûha...

Loma firoşkarên wan pirtûkan jî bikirçiyên wan jî xwendekar bûn.

Di çûyîn û hatina zanîngehê da ez di her rojê da carek di ber wê darê ra derbas dibûm û li pirtûkên li erdêraxistî temaşe dikir.

Roj tavî û germ, di navbera dersan da jî valahîyek heba, em çend heval jî anfiyê derdiketin û me berê xwe dida çayxaneya bin dara Çînarê...

Em diçûn li ser kursiyên li bin darê rûdiniştin, bi vexwarina çayê ra diketin nav sohbetê kûr û dûr. Dû ra em radibûn hinek li derdora pirtûkên li erdêraxistî digerrîyan, pirtûkeka ku bala me bikişanda dikirî ya jî ji bo kirîna ji hev ra pêşnîyar dikir.

Ji rojan rojek, ez di ber pirtûkên li erdêraxistî ra derbas dibûm, pirtûkek bi nav û berga xwe va bala min kişand...

Bi navê xwe yê tirkî, „Karl Marx‘ın Aşk Hayatı- Jîyana Evînî ya Karl Marx“.

Ji dûr va fikirim, ku pirtûk hebe hebe ji alî dijberê Marx va hatiye nivîsîn û weşandin...

Jiber ku wê demê ez jî şoreşgerekî tûj û tund bûm, ku şoreşgerên tûj û tundên wê demê jî tenê bi xewn û xeyalên li ser evîndariya şoreşê va dijiyan...

Evîn û evîndariyê ji bo xwe jî ji bo Marx jî mijûliyeke vala diîn, ku min jî di dilê xwe da gor wê nêrîna pirtûk nixand.

Lê dema ku min pirtûk girt nav destê xwe û li berga wê ya pêşî û paşîyê mêze kir...

Nave nivîskar û kurtejiyana wî xwend, ez çî bibînim...

Nivîskarê pirtûkê Pierre Durand, nebîyê Marx e û jîyana kalikê xwe nivîsiye...

Kalikê wî Marx jîyanê çawa jiya ye?

Bi kê ra û çawa zewicîye?

Piştî zewaca xwe têkilîya wî ya zayendi bi kê ra çê bûye û ew têkilî ji alî kê va hatiye zanîn û bi kîjan rengî hatiye veşartin?

Çend zarokên wî bûne û ji wan çend kes di dema zarokatîya xwe da mirin e?

Jibo ku di mala bavê xwe da li zarokan baş binêre, çawa jina xwe şandîya mala xezûrê xwe?

Bi xizmetkara xwe ra çawa razaye û lawê wî yê ku ji xizmetkara wê dibe, çima wek lawê Engels hatiye qeydkirin?

Marx û Engels kîngê jê ra dibêjin, ku ew ne lawê, Engels lawê Marx e?

Piştî xwendinê wê pirtûkê, qasî teorîyên wî yên civakî, ez ji hûrguliyên ji jîyana wîya taybet ji hayîdar bûm û min kesayetîya Marx jî nas kir.

Ji wê demê va min ji Marxê filozof bêtir ji Marxê însan hez kir.

Jiber ku di wê pirtûkê da propogandayeke sîyasî jî, tanîavêtin û berzki-rinek nedihate kirin.

Nebîyê wî Marxê ku wek mîna me hemûyan li vê dinyayê zarkatî û xortanîyeke çawa derbas kirîye û di navsalîya xwe da, ji bilî karên xwe yên zanyarî jîyaneke çawa jîyaye, nivîsî bû...

Çima îro û careke dîsa ev pirtûk?

Di dema xortanîya xwe da min jî weke her keç û xorteke şorreşger Marx miroveke taybet û ji herkesî mezintir û cuda didît...

Îro li derdora xwe kesên ku xwe ronakbîr û rewşenbîr, zana û têgihîştî dihesibînin, dibînin, ku ew wek murîd û mîlîtanên 16 salî hê li pey şêx û serokan ketine û bi kelecana dibezin...

Di nav kûçe û kolanan da murîd şêxên xwe, mîlîtan jî serokên xwe yên bêbask difirînin...

Dû ra ji ketina wan a devûrû ra jî kerametek dibînin û pê xwe dixapînin...

18.01.2024

Dersên Kurdîtîyê...

Dersên kurdîtîyê di pirtûka Celîlê Celîl da cîh digrin.

Navê pirtûkê „Çima Deve Xeyîdî” ye.

Pirtûk ji 21 Çîrokên kin û kurt, pêk tê, ku ji wan çîrikan yek jî „Çima Deve Xeyîdî ye û navê xwe daye pirtûkê.

Di her çîrokekî da dersek ji dersên kurdayetîyê cîh digre, ku Celîlê Celîl jî ji wan wek dersên kurdîtîyê bi nav dike...

Ders, dersên civakî ne.

Hinek li ser qencî û xirabîyê, hinek li ser heqî û neheqîyê, hinek jî li ser xîret û xebatê ne.

Celîlê Celîl ji bo wan dersan, di pêşgotina pirtûkê da wiha dibêje; „Çima ‚Dersên Kurdîtîyê’ û ne ‚Kurdî’... Gava hûn vê pirtûkê bixwînin, hûn ê xwebixwe serwest bibin çima... De hûn dizanin, wekî naskirina qencî û xirabîya dinyayê, rindî û nerindîya dorberê, xwehisîn û xwenaskirin, parastin û doza gelî, mirov bi xwendinê dest tîne. Xwendin jî li Kurdistanê tenê di medreseyan da bûye. Medrese jî her dibistanên olî bûne.

Xwendin li van dibistanan bi zimanê Erebi, ango bi zimanê Quranê bûye.

(...) Dibistanên Kurdîtîyê, li gundan ode bûne, li zozanan konê xanedanan, ocaxên mirovên nandar û mêvandar bûne. Li odeyan, li bin konan êvar êvar cimaat civîyaye, dengbêjan straye, cîrokvanan çîrok û çîvanokên xwe gotine, xort û ahil guh dane wan û dersên xwe ji wan gotinan girtine...”

Ev çîrok ya jî bi gotina Celîlê Celîl dersên ku di van çîrokan da cîh digrin, ji bo her kurdek gotinên ne xerîb in.

Bi taybetî kurdên ku li gundan mezin bûne û jîyane, ev çîrokên ku tê da dersên kurdîtîyê cîh digrin, bi dehan caran ji dê û bavê xwe ya jî ji mezinên xwe bihistine.

Lêbelê Celîlê Celîl di vê xebata xwe ya giranbuha da ew gotinên xas û zêrîn bi vegotîneke zelal derdixe pêş û wan wek dersên kurdîtîyê bi nav dike.

Herwiha bi ked û xebateke pîroz wan di vê pîrtûkê da pêşkêşî kurdan dike, ku ew ji wan dersên kurdîtîyê hayîdar bibin û sûd bigrin.

Gotîneke pêşîyan e...

„Eşa can davêje ziman!”

Ev dersên kurdîtîyê, ku di vê pîrtûkê da cîh digrin jî, êş û jana civaka kurd e.

Ew êş di deng û awazên dengbêjan da bûye stran...

Di vegotinên çîrokvanan xemilîye û bûye çîrok...

Bi dewlemendîya zargotina kurdî va heta roja îro hatîye û wînda nebûye.

Ez di vê nivîsê da dixwazim tenê qala sê çîrokan bikim, ku ew jî:

“Biratiya Gur û Her Sê Gayan”

„Çima Deve Xeyîdî“

„Aqilê Jina Dêlû Paşa“

Biratiya Gur û Her Sê Gayan

Di daristaneke kûr û mezin da sê ga dijîn. Ji wan yek reş, yek boz, yek jî belek e. Her sê ga jî ji ber nîr û barê giran revîyane û di nav daristaneke mezin da bi cîh bûne. Bi hev ra çêrîyane û ti mineta kesî nekişandine. Ji tifaq û tevgera wan terewilkên derdorê jî nêzikî wan nebûne.

Rojek ji rojan gureke birçî û belengaz, bi hêsir û girî nêzikî wan dibe û daxwaza biratîyê li wan dike. Ew li halê gur dinihêrin, guneyên wan bi gur tê û daxwaza gur dipejirînin û bi pê ra dibin bira.

Gur di destpêkê da gor tewna biratîyê tevdigere û cîhê xwe germ dike. Roj tê bi fêl û fêlbazîya xwe nêzikî gayê boz û beleg dibe, pesnê wan dide û di derbarê gayê reş ta gotinên xirab dike û dibêje; „Ez carna

xwebixwe difikirim, gelo van gayên belek û boz çi başi li ba gayê reş dîtine, ku bûne hevalên wî? Heyfa we nîne, hûn pê ra hevaltîyê dikin? Hema çiqas mêş û moz hene, tèn ser wî datînin...”

Gur bi fêl û fêlbazî tifaqa hersê gayan xirab dike û berê gayê reş, dû ra gayê belek dixwe. Dema ku dor tê gayê boz, gayê boz tédigihîje ku gur dê wî jî bixwe. Bi xemgînî li gur dinihêre û ji hale xwe ra dibêje; „Guro, ez dizanim tu yê min bixwî. Min wê rojê xwelî li serê xwe kir, gava gayên reş û belek ji piştî xwe rakirin...”

Di dawîya vê çîrokê da Celîlê Celîl dibêje, „Dîwaro, ez ji te ra dibêjim, tu ji kê ra?”

Ez jî dibêjim ev dersek ji dersa bêtifaqîyê ye...

Ga Kurd, Gur jî ya Tirk ya Ecem ya jî Erebi...

Çima Deve Xeyîdî

Ev çîroka Xemoyê tucar û deve ya wî ye. Xemo ji deve ya xwe pir hez dike, ku deve bi salan xizmetkar û xêr û berekata mala wî bûye.

Roj tê dema ku Xemo deve ya xwe tîmar dike, dinihêre ku ronahîya çavê wî êdî kêrî bûye, ji quwet da ketîye. Xemo li alîkî va tîmar dike, li alîkî va jî dibêje, “ji Xwedê va eyan e, min çiqas ji te hez dikir. Kalbûn û pîrbûn ne di destê me da ne, di destê Rebê jorîn da ne. Gunchê min çi heye, tu gerek min bibaxşînî.”

Deve hinek bédeng dimîne, dû ra ji bo barê ku Xemo lê kirîye, carinan tî û birçî hîştîye hinek gilî û gazine xwe jê dike. Berê xwe dide Xemo û jê ra dibêje, „ne ji bo bargiranî û westandinê, nê jî ji bo tî û birçîhîştinê ez ji te nexeyîdîm. Lê tenê sedem tiştek ji te xeyîdîm û ji bo wê yekê jî te nabexşînim, ku ew jî, her cara ku te bar li min dikir û berê min dida rêya dûr, te hefsarê min dibir bi qûşa kerê va girê dida. Ker serkêşê min bû. Ez wê rezîliye nikarim ji bîr bikim. Ev xem e, ku ti caran ji dilê min dernayê. Loma te nabexşînim...”

Ev jî dersek ji dersa bêaqilîyê ye...

Serkêşê merîya ker be, barê merîya ti car kêr nabe û her diçe zêde dibe...

Aqilê Jina Dêlû Paşa

Di dema Osmanîyan da paşayek li bajarê Wanê hebûye û navê wî Delû Hesen bûye. Dem tê Axa û Begên Kurd bi hêz dibin û rûmetê nadin paşa. Paş ji rewşê eciz dibe, le tiştê ku bike jî nîne.

Di diwana xwe da bi tena serê xwe dimîne, xemgîn dibê û bi wê xemgîniyê berê xwe dide malê. Jina wî ji malbateke mezin û bi jineka bi aqil bûye. Xemgîniya paşa bala jinikê dikişîne. Jinik ji paşa sedema xemgîniya wî dipirse, paşa jî jina xwe ra qala rewşa xwe dike û dibêje; „Berê nav û dengê min hebû, hemû serokeşîrên Kurdan di bin gura min da bûn. Min çî bigota, gotina min qebûl dikirin. Niha qedrê min li nav Kurdan şikestîye, kes nayê ba min û diwana min vala maye.“

Jinik dikene û dibêje; „hema derdê te ev e, xem neke dermanê wê jî heye.“

Gor pêşniyara jina xwe Delû Hesen Paşa telelên xwe dişîne ba serokeşîrên kurdan, ku ew werin diwana wî û ji wan ra gotineke ferz bike. Carek du car, sê car tu kes qimê xwe bi banga paşa nayne. Cara çaran hinek serokeşîr, ji bo meraqa ku ew gotina paşa ji wan ra bibêje, bibihîzin, diçin li diwana paşa rûdinên.

Paşa jî dice diwanê û li ser kursiyê xwe yê bilind rûdinê. Li alî çepê dinihêre, hemû kurdên bi kum û koloz, li dora kolozên wan şar û şemaqî, ji xwe razî û li ser doşekên qutnî rûniştine. Çawa ku jina wî jê ra gotibe, ew li wan dinihêre û dibêje, “Hûn destê min ê çepê ne.”

Dû ra Delû Paşa dizivire aliyê rastê, li wî alî jî hemû kurdên simêlpalik, bi şal û şepikên xwe yên kesk û xençerên li piştê xwe, rûniştine. Li wan jî dinihêre û dibêje, “hûn jî destê min ê rastê ne.”

Çawa ku jina wî ew temî kiriyê, radibe ji diwanê derdikeve û berê xwe dide alî male.

Bi çûyîna paşa ra Kurdên ku di diwanê da bi tena serê xwe dimînin, gotinên ku paşa ji wan ra gotîye, şirove dikin. Axa û begên li aliyê çepê dibêjin; “Welahî paşa qimeteke zêde da me, ku ji me ra got hûn destê min ê çepê ne. Jiber ku dil nêzikî destê çepê ye...”

Yên aliyê rastê jî gotin, “Ma kî nizane, ku qimeta destê rastê li hemberî destê çepê zêdetir e. Ji ber vê jî paşa qimeta zêde da me û ji me ra got, hûn destê min ê rastê ne...”

Ji wê rojê şûnda ji axayên kurdan her yek xwe bêtir nêzikî Delû Hesên Paşa dibîne... Hesên Paşa ji careke din hikmê xwe li ser wan zêde dike û li kêfa xwe dinihêre...

Ev ders jî dersa nezanîne ye.

Mixabin, em Kurd nezan in û loma her gav û her dem bi gotinên neyarên xwe dixapin...

Bi xwendina vê pirtûkê ra, min ji 21 dersên kurdîtîyê qasî para xwe sût wergirt û ji wan sê heb jî bi we ra parva kir...

Yên mayîn jî, hûn jî kerema xwe ra vê pirtûkê bikirin, çîrokên kin û kurt bixwînin, piştî xwendina her çîrokê jî çavê xwe bigrin û di dilê xwe bêdeng bifikirin.

Ders çî bû, jî bo kî û kê bû?

Dû ra, gor dilê xwe navek bibînin û lê bikin...

05.06.2024

Lawê Pîrê

Kurdên ku ji xwe û ji niştimanîya xwe hayîdar, bêguman ji navê Roger Lescot ji hayîdar in.

Jiber ku Lescot hevalê Celadet Bedirxan û kedkarê ziman û çanda kurdî ye.

Sedsal berê, karê ku nehatîye bîra kurdan, ku ji bo xwe bikin, Lescot ji bo wan kirîye.

Ji bo ku di karê xwe da bi ser bikeve, bi kurdan ra bûye heval...

Kurdî hînbûye û bi wan ra bi zimanê wan axifiye...

Çîrok û destanên kurdî, gotinên pêşîyan û têderxistinokên kurdî berhev kirîye...

Ew çîrok û gotinên zêrînên li gund û bajarên kurdan berhev kirîye, di sala 1940î da wek Textên Kurdî Cîld I û II li Parîsê weşandîye.

Weşanxaneya Avestayê ji Tekstên Kurdî-I, bi navê Lawê Pîrê-Tektên Kurdî, îsal li Stenbolê çap kirîye.

Di pirtûkê da 5 çîrok, 308 gotinên pêşîyan û 51 têderxistinok-tiştanok cih digrin, ku herwiha Lawê Pîrê ji navê çîrokeka ku ji wan pênc çîrokan e.

Çîroka yekemîn, Çîroka Kunderê ye...

Jina Gavanê gundekî ducanî ye û roja ku diwelide, dêla zarokek va kundirek diwelidîne. Roj tê, kundir bi lêv dibe û ji bavê xwe yê gavan ra daxwaz dike, ku ew here qîza hakimê welat jê ra bixwaze...

Gavan pêşîra xwe ji kundir xilas nake, bêçare radibe berê xwe dide mala hakim û dibe xwezgînîyê qîza wî...

Hakim ji bo dayîna qîza xwe hinek şert û mercan datîne ber gavan û jê

ra dibêje, „ger ku tu wan şert û mercan bînî cîh ez dê qîza xwe bidime lawê te...”

Gavan vedigere mala xwe, şert û mercên ku hakim daye ber wî, ji kundirê xwe ra vedibêje. Kundir ji bo ku şert û mercên hakim bi cîh bîne, xwe amade dike, ku çîrok ji bi kirin û kiryarên kundir va didome, heta ku ew dê bigihîje mirazê xwe...

Çîroka duyem, Çîroka Keçelokê Lawê Pîrê ye...

Lawê Pîrê ji rojan rojek çivîkek digre, ku dû ra baskê wê jê bike. Çivîk tê ziman û ji lawê Pîrê ra dibêje, „dinya zivistane û ez jî rût û tazî me. Ne di min da goşt he ye, ne jî ez teyrêkî rind im ku tu min xwedî bikî ya jî bigrî û ji xwe ra bifroşî... Min berde, ez ji te ra Teyrê Sîmir bînim û bikim dafikê, wî bigre, bibe bide paşayê bajêr û ji xwe mikafateke mezin bi desto bixîne...”

Lawê Pîrê gotina çivîkê dike, çivîk çawa ku gotûye Teyrê Sîmir dixapîne û tûne dike dafikê... Lawê Pîrê ji Teyrê Sîmir bi dafikê va digre û ji paşê ra dibe... Lêbelê daxwazên Paşa û Wezîrê wî kêmbûn. Daxwaz li hev zêde dibin, Lawê Pîrê jî ji bo ku daxwazên wan bîne cîh, derdikeve serê rê û dirban, li pey fil, li pey hespê behrê û qîza hûtê behrê dikeve. Bi dêw û hûtên li bin behrê ra şer dike, hemû astengiyên ku Paşa û wezîrê wî derxistine pêş, ew yekoyek wan ji holê radike. Di encamê da Keçelokê Lawê Pîrê bi ser dikeve, dibe paşayê bajêr û digihîje mirazê xwe...

Çîroka sêyem, Çîroka Silêmanê Zindî ye...

Silêmanê Zindî lawê mirovekî feqîr e, ku ew şev û roj diçe ji çîya û banîyan dar û beran berhev dike, tûne wan li bajêr difroşe û debara xwe pê tûne cîh...

Rojekî ji rojan di newalake kûr da dûyeke reş bilind dibe... Bavê Silêman xwe li dû digre û dimeşe, tere di şikeftê da rastî xezîneya Hût û her sê lawên wî tê. Ji xezîneya Hût hebana xwe tîji zêr dike û şûnda vedigere... Ji rojan rojek careke din dîsa berê xwe dide şikeftê, lê wê cara dikefe dafikê û tê kuştin. Dû ra lawê wî, Silêmanê Zindî li şopa wî digere, Hût dîl digre û davêje binê bîrê... Her sê lawê Hût jî dîkujê û bi dîya xwe ra di şikefta wan da bi cîh dibe...

Dê, rojek di tûnebûna Silêmanê Zindî da ji hebûna Hût hayîdar dibe, Hût jî binê bîrê derdixe û wî wek Reşê Pişt Kewarê bi nav dike... Dû

ra ew û Reşê Pişt Kewarê dibin yek, biryar didin ku ji Silêmanê Zindî xilas bibin. Dê, bi aqilê Reşê Pişt Kewarê xwe diavêje nexwaşiyê û ji lawê xwe ra dibêje, „ji bo ku ez ji nexwaşiyê xilas bim, divê tu herî Şîrê şêr, di eyarê şêr da û li ser piştê şêr bînî... Te anî anî, neanî ez dê bimirim...”

Silêmanê Zindî ji bo ku ji dîya xwe ra şîrê şêr, di eyarê şêr da û li ser piştê şêr bînê, bi rê dikeve... Çîrok jî bi şer û astengiyên ku derdikevin pêşîya Silêmanê Zindî va didome...

Silêman jî wek paşnavê xwe, li dijberî şêr û dêwan şer dike, di her şerê xwe da bi ser dikeve û hergav zindî dimîne. Di encamê da daxwaza dîya xwe bi cîh tîne û digihîje mirazê xwe...

Çîroka çaran ji Çîroka Herzemê Kolan e...

Qîza hakimê Şamê xwîşka sê bira ye... Rojek ji rojan Dêwê Sor tê û ji xwe ra qîza Hakimê Şamê dixwaze. Dêw ji hakim ra dibêje; „ya qîza te ya jî ez serê hersê lawên te...”

Dêwê Sor qîzîkê dibe, dû ra hersê birayên wê li pey dêw dikevin û wenda dibin. Jina hakim xwe diavêje serê çol û çîyan û li şopa her sê law û qîza xwe digere. Tî û birçî dibe, ji Xwedê ra dua dike, ku ji tîbûna wê ra çareyek bibîne. Ê de çîrok e, ji nişkava ewr guj dibin baran dibare, di şûna simê kerê da av kom dibe, jinik wê avê dixwe, dû ra ducanî dibe. Ne meh, ne roj, ne saet, ne xulek şûnda jê ra lawek dibe, ku navê wî Herzem lê dike. Di şeş salîya wî da nav û dengê Herzem di nav bajêr da belav dibe... Piştî gîlî û gazinên xwecîhîyan Herzem bajêr terk dike û ji benî Ademan dûr dike. Di rê da, rastî Tîravêj, Gavdirêj û Gurzavêj tê û bi wan ra dibe heval...

Çîrok bi hurguliyên şerên ku Herzem bi dêw û hûtan ra kirîye, didome. Li dijberî dêw û hûtan her carê bi ser dikeve, lêbelê rû bi rû îxaneta hevalên xwe dibe. Demek di bin bîra bêbînî da tî û birçî berxwe dide, ji rojan rojek xwe di nav welatê cinan da dibîne. Li mala pîrejinek dibe mêvan û tasek av jê dixwaze...

Pîrê tere li pişt kon mîz dike û di şûna avê da mîza xwe ji Herzem ra tîne. Jiber ku Dêwê Heftserî, serê kanîyê girtîye û ji bo ku di heftê da rojek pêşîya avê vebike, qîzeke azeb dixwaze. Wê hefteyê jî dor hatîye qîza hakimê bajêr, hakim qîza xwe nade, dêw jî avê bernade... Çîrok bi şerê Herzem û Dêwê Heftserî va didome...

Çîroka pêncan, Çîroka Beyrim-el Hec e...

Li welatek hekimek û pênc lawê wî hebûne. Hekim biryar digre, ku hekimeke mîna xwe bibîne û pênc qîzên wî hebe, wan pênc qîzan jî bi her pênc lawên xwe ra bizewicîne. Hekim radibe berê xwe dide bajarê Erzurume, li wir paşayeke mîna xwe û pênc qîzên wî hebe nabîne, jî wir berê xwe dide bajarê Bidlîsê, jî Bidlîsê jî berê xwe dide Diyarbekirê... Çîrok bi vî rengî dest pê dike û didome...

Ev pênc çîrokên ku Roger Lescot nêzikî sed sal berê berhev kirine û heta roja îro hatine, jî alî kurdên ku zarokatîya wan li gundan derbas bûne, tên zanîn. Min jî di dema zarokatîya xwe da ev pênc çîrok, jî mezinên xwe guhdarî kiribû, di ew şevên zivistanê yên sar û dirêj da û li dora tendûrê...

Wek hemû çîrokên kurdî, di van her pênc çîrokan da jî leheng bi piranî zarokên sêwî ne...

Lawê gavan û şivanan, nebîyê kal û pîrekan...

Lehengên qîz jî, qîzên axa û began, mîr û hakimanan in...

Ew zarokên ku di civaka axa û began, mîr û hakimanan da wek mirov nayên hesibandin, roj tê bi awayekî dibin xwedî hêz û quweteke şîndarî...

Nav û dengê wan, mêranî û mêrxasîya wan di civakê da deng dide...

Ew dibin evîndarê qîzên mîr û hakimanan.

Rastî şerê giran tên, astengîyên mezin derdikevin pêşîya wan.

Lê ew li dijberê dêw û hûtan, axa û began, mîr û hakimanan şer dikin, di encamê bi ser dikevin û digihîjin mirazên xwe...

Jiber ku ev çîrok jî aliyê gel va hatine afirandin û lehengên çîrokan jî di kesayetîya lawê şivan û gavan, ya jî sêwîyê kal û pîran da gel bixwe ye.

Şerê ku ew dikin jî, di kesayetîya axa û began, mîr û hakimanan da, şerê heq û neheqîyê ye...

Loma mirov di çîrokên kurdî yên ku jî alî gel va hatine afirandin da rewşa civakê û nakokîyên civakî jî bi zelalî dibîne. Di dawîya her çîrokê da leheng bi ser dikeve û gel jî bi serkeftina wî ra digihîje daxwaza xwe.

Loma di dawîya hemû çîrokan da çîrokbêj jî vê daxwazê dubare dike û dibêje, “ew gihîştin mirazê xwe hûn jî bigihên mirazê xwe...”

Di nav pêşgotanan da jî, gotinên ku tu car jî rastî û watedariya xwe tu tiştekî wenda nekirine û nakîn jî hene, ku ez jî wan ra dibêjim, gotinên zêrîn...

Ji wan çend gotinên, ku Lescot 100 sal berê berhev û qeyd kirine:

– Derew sêwî ne...

– Kara gavanan suwarbûna kera ye...

– Ez hêdî diçim, bela digihîje min, ku ez zû diçim, ez digihîjim belayê...

– Heta Adem em pê zanin, jî wî pê da tiştek li cem te heye, bêje

– Ji jinê pirsîne, di demsalan da çi xweş e? Gotîye: Buharê, pez, Payîzê rez, Zivistanê jî ez...

– Mêrê kurmanc têr bixwe, ya mêrekî dikuje ya jî jinekî direvîne...

Ji têderxistinokên ku di pirtûkê da cîh digrin, min jî wan jî tenê sê heb hîlbijart, ku cara yekem ez di vê pirtûkê da rastî wan hatim û jî hebûna wan hayîdar bûn. Ez bawer im, ew kesên ku hê ev pirtûk nexwendine, wan jî ev têderxistinok nebihîstine û bersiva wan jî nizanin...

– Mêrga neçêrandî, zarokên nemêjandî, kerê jî garanê veqetandî...

– Reş e wek e qîr, spî ye weke çira şîr, sor e weke qapûtê jina mîr...

– Kumsor e, ne efendî ye; dikeve qulan, ne rovî ye; ebareş e, ne sêrî ye; vedîrêşe, ne tawî ye...

Bêguman bersiva van têderxistinokan di pirtûkê da he ye, lê ez li vir nanivîsim...

Jiber ku ew kesên ku ev pirtûk xendibin jî xwe bersivan dizanin, yên ku hê nexwendine, bila ew jî bo bersiva van hersê têderxistinokan be jî, vê pirtûkê bikin û bixwînin...

Bi hînbûna bersivan va hem jî xemla zimanê xwe yê şîrîn hayîdar bibin, hem jî jî bo ev karê wî yê pîroz jî Lescot ra spas bikin û deynê xwe bînin cîh...

01.09.2023

Gurên Devbixwîn...

Çend roj e pirtûka nivîskarê Kurd Riza Çolpan dixwînim, ku ez wî wek xortê 85 salî bi nav dikim. Xortê 85 salî dibêjim, jiber ku Riza Çolpan, di vî salê xwe da mîna xortekî 18 salî kar û xebata nivîsandinê dike, nivîsandina bi zimanê dayîka xwe, ew zimanê ku mîna şîrê dîya wî zelal û şêrîn...

Riza Çolpan bi berhemên xwe yê giranbuha, xizmeteke mezin tîne cîh û zimanê li ber mirinê zindî û jîndar dike.

Navê pirtûka wî ya dawîyê, ku nuha di destê min da ye û ez dixwînim; „Gurên Devbixwîn, Ên Çar Ling û Ên Du Ling“e.

Pirtûk ji serpêhatîyên bav û bapîr, xal û apanên wî pêk tînin û her serpêhatîyek jî di heman demê da parçeyek ji dîroka kurd û Kurdistanê ye. Jiber ku serpêhatîyên Riza Çolpan, bi kedeke bêhempa û bi peyv û hevokên zelal û vekirî nivîsandîye û anîye ziman, ne tenê serpêhatîyên bapîrên wî, jîyana kurdan ya dused salên dawîyê bixwe ye jî...

Di wê jîyanê da feqîrî û belengazî, şîn û şahî, şer û pevçûn, têkçûn û koçberîya kurdan cîh digre. Mîrov tê da ji sedema kirin û kiryarên Axa û Şêx û Seyîdan, jihevduketina kurdên Elewî, Sunî û Ezdî, bêtifaqî û dubendîtîya wê demê di civatê da rû daye, dibîne û ji halê xwe ra digirî, axîneke kûr dikişîne û di ber xwe da dinale.

Serpêhatîya bapîrê nivîskar Ap Simoyê mezin, li Gundê Xelanê Gazê dest pê dike. Nivîskar bi vegotin û nivîsandina xwe, merîya bi Ap Simo ra dike rêwî û di nav erdnîgarîya Dêrsimê da gund bi gund digerrîne Dibe Kepûrê, Dala Mistê Balan û Deştê Aşan, ji Newala Oxîyê ra berê merîya dide Gundê Delîkan. Hinek li ber devê Çemê Pêrê radiwestîne, dû ra derbasî wîyalî avê dike û di binê Goman da dibê, li Coşîkê dike mêvan.

Mirov li Coşikê, di mala Hesenê Misrî da Zîn a bedew nas dike û ji çîroka zewaca wê ya bi Brahîm ra hayîdar dibe. Di daweta wan da dibe xwezgînî û xwandî, di govendê da direqise û di şahîya dawetê da dibe qasid û hespê xwe dibezîne...

Di jîyana kurdan da şîn û şahî kêr nabin û ew di her deme da bi hev ra girêdayî ne, yek biqede, ya din dest pê dike.

Ap Simo piştî dîtina mirazê lawê xwe yê piçûk Brahîm, dinya xwe duguherîne û mirov bi mirina wî va xemgîn dibe.

Piştî mirina Ap Simo, Ezraîl ku carê ketîyê nav malê, pêşîra malbatê bernade, ji kal û pîran derbas dibe û bere xwe dide bêmirazan. Brahîmê ku bi mirazê xwe û Zîn a bedew ra têr şa nebûye, di bihara emre xwe da dimire. Bi mirina wî ra, mirov bi Zîn a serbixêlî ra dike-wice, mîna Simo û Mamê piçûk xwe sêwî dihesibîne û di kurahîya dilê xwe da digrî.

Dû ra dibe hevparê belengazî û bêçaretîya Zînê, destê Simoyê heftsali û Memê du salî digre û berê xwe da Coşîka xopan...

Zînê di nav newal û gelîyan ra derbas dibe û rastî Gurê devbixwînê çar ling tê. Zîn bi Memê piçûk ra hildikişe serê darê û wî di paşîla xwe da vedişêre. Mixabin, bedena Simoyê sêwî di nav lepên gur da, goştê canê wî jî di deve gur da dibîne, bi herdu çavan. Li çokên xwe dixê, porê sere xwe dirûçikîne, bi axîn û girî bi rê dikeve û bi zor û zehemetî bi Memê ra xwe diavêje ocaxa bav û kalan...

Gotineke pêşîyan e; “qedera ku reş hatibe nivîsandin, nayê guhartin”.

Bi xwendin û qulubandina rûpelan pirtûkê va, mirov dibêjê qey qedera Memê jî di serî da reş hatiye nivîsandin. Zînê bûyera ku li serê wê û sêwîyên wê qewimîye, tu car jibîr nake û gurê devbixwînê ku Simoyê wê bi saxî xweribû, ji ber çavê wê tu car wenda nabe. Ji kul û kesera dilê xwe roj bi roj dihele û can dide.

Bi mirina Zînê ra Memê jî li ber destê dapîr û papîra xwe sewî dimîne. Di neh salîya xwe da dibe berdestîyê Gêdûk Axa û li Gundê Mastan dibe berxivanê kar û berxan.

Dem û demsal li pey hev derbas dibin, Memê piçûk jî bi nav û nûçikê xwe va mezin dibe. Dest bi karê şivantîyê dike û bi navnûçîka wî ya Memê Gur ra şivanîya wî jî tê girêdan...

Memê di qonaxa Gêdûk Axa da, Axa û Seyîdên ji herêmê nas dike û dibe guhdarê civata wan... Ji axaftin û sohbeta wan, ji şerê nav dewletan, ku li ser axa Kurdistanê diqewimin, dibihîze. Bi bihîstina şer û kuştin û xwînrijandina wan va, mîna gurê çar lingê ku Simoyê birayê wî xweribû, wan bi çavê sere xwe nebîne jî, Gurên du ling jî nas dike û ji kirin û kiryarên wan hayîdar dibe.

Dem tê, Seyîd Suleyman bi riza Gêdûk Axa, Memê Şivan ji xwe ra zirkur digre û dibe li Kûpikê, di nav mala xwe da bicîh dike.

Memê Şivan li Kûpikê ye û êdî xortekî ezeb e. Rojek ji rojan rastî Zerîfe ya bedew tê û bi evin û evîndariya wê rojên xwe derbas dike...

Memê xortekî sêwî û şivan, Zerîfe jî qîzek ji qîzên Seyîdan e.

Bi evîna Mêmê ya yekalî ra, cara yekem qedera wî ya reş jî reng du-guhurîne û bi saya zirbavê xwe, Seyîd Suleyman, bi Zerîfê ra dizewice û mirazê xwe dibîne...

Lê serpêhatîyên bav û bapîr, xal û apên nivîskar naqedin, bi demê r ali hev zêde dibin û didomin.

Çar lawên Memê Şivan, Ali, Husên, Brahîm û Mamud dibin, ku dû ra serpêhatîyên wan dest pê dikin.

Alî û Brahîm wek milîsên kurd bi leşkerên Urîz ra şer dikin.

Husên di dema xortanîya xwe da Yado nas dike û pê ra dibe heval û hogir. Mamud jî dibe nêçîrvanê kewan dema xwe din av mêrg û zevîyan, li sere çol û çîyan derbas dike...

Di deman da, Împaratoriya Osmanî hildiweşe û li ser mirata wê Komara Tirk tê damezrandin.

Şer û pevçûn dest pê dikin, serhildan û komkujî li pey hev diqewimin, li Palu û Koçgiri, li Gelîyê Zilan û li Agirî, herwiha li Dêrsim...

Xwîn diherike, xwîna keç û xortên bêmiraz, bi rengê sor û gewez dixemile ava çem û kanîyan...

Dema ku dawî li serpêhatîyan tê û pirtûk diqede, mirov di nav 200 salên dawîyê da guhartinên ku di civaka kurd da çê bûne, tên ber çavan...

Bi hêsanî dibîne, ku şîn û şahîyên berê ji binî va guhurîne û hatine jibîrkin.

Ziman helîya ye û îro êdî di gundan jî nayê axaftin.

Kurd, di demên berê da bi şûr û xençeran, modolî û gulê domdomê hatine kuştin, îro bi bombe û çekên kimyewî va koka wan jî binî va tê qelandin.

Mixabin, mirov di serpêhatîyên Riza Çolpan da tiştên ku hêta roja îro hê nehatine guhartin jî dibine...

Ku ew jî xizanî û belengazî, dubenditî û bindestîya kurdan e...

20.04.2020

Sînem a Sehîdê Îbo

Berî Sînemê divê ez bi kurtayî qala Sehîdê Îbo bikim.

Sehîdê Îbo, di 8ê Gulana sala 1924an da li Ermenîstanê, li gundê Qarxûna Jorîn, ji dayîk bûye. Li Rewanê Kolej û Enstîtûya Bijîşkîyê xwendîye.

Di sala 1971ê da ew serokê Pêdiatrîyê li Enstîtûya Bijîşkîyê ya Rewanê ye. Di sala 1974an da li Waşîngtonê endamê Komeleya Gurçiknasîya Zarokan a Navnetewî ye.

Di derbarê Gurçiknasîya Zarokan da ji sedî zêdetir kitêb û berhemên îlmî nivîsiye.

Ji bilî kar û xebatên xwe yên îlmî, ronakbîr, wergervan, nivîskar û helbestvanekî kurd e.

Mixabin ev lawê kurd ê serkeftî, roja 17ê Kanûna Pêşîn a sala 1991ê li bajarê Rewanê ji alî kesên „nenas“ hatiye kuştin.

Sînem yek ji çar pirtûkên wî yên helbestan e. Ev pirtûk di sala 1975an da li Rewanê, salek berê (2022) jî li Stenbolê ji alîyê weşanxaneyê Avestayê hatiye weşandin.

Ev pirtûk, ji helbest û du poemên wî yên, ku wek Miqamê Şerê Wetenîyê û Sînem bi nav kirîye, pêk tê.

Helbestên Sehîdê Îbo kin û kurt, lê peyv û gotinên zêrîn û watedar in. Mîrov di naveroka helbestên wî da hest û helwesta kurdayetîya ku bi evîndarîya Kurdistanê va hatiye xemilandin, dibîne.

Di helbestên wî da Kurdistan yar e, evîn e, kilam û strana zarokatîya wî ye...

Di vê helbestê da yara wî, Gulê ye.

Gula xwe di sala 1964an da nivîsiye, ku ez wê demê hê du salî me...

Shêhîdê Îbo jîbo Gula ber dilê xwe wiha dibêje:

Navê yara min Gulê

Ew bedewê jî gulê

Lê biharê çî kirye?

Wê ev nava deyn kirye

Û li meheke xwe kirye.

Jî gulanê bipirsîn,

Gulê danê gul, sosîn

Di vê helbestê da jî jîyaneke kurdewarî tasvîr dike, jîyan kilam, dengbêj jî Kurdistan e. Shêhîd ilorine û dibêje:

,Emrê min kilam e,

Mîshîd û miqam e.

Dayê ber colanê

Rûnişt û got: – Lûrî,

Bona Kurdistanê

Mertal î û şûr î.

Nebî bindest û dîl

Pe'ra, xezna, kanê

Cim'et mêş e, tu zîl

Li çîyayê Kurdistanê

,Emrê min kilam e

Dengbêj Kurdistan e...

Jixwe ev helbesta wî, kurdên ku gotinên vê bi deng û awaza Aramê Tîgrîyan nebihîstibin nîne. Ez bawer im jî wan gelek kes hê jî nizanin, ku xwedîyê wan gotinên ku merîya digre û di nav xewn û xeyalên xwe yên zarokatîyê digerin, Shêhîdê Îbo ye...

Gerku derfet hebe, li vir bikevin Youtube, bi dengê Aram ra xwe bi-hecînin û di dilê xwe da jî gotinên helbestê bilorînin...

Xwezîl dîsa zar bûma

Sibê zu hişyar bûma

Pêxas, başeval bûma,
Ling terikî, lêvê za
Xwezîl dîsa zar bûma.
Çewa berx bêzar bûma
Bêmal û bêpar bûma
Ruhî sade, dilî can
Xwezîl dîsa zar bûma.
Li bin kon sitar bûma,
Li çîya xizmetkar bûma,
Pot ritilî, kiras caw
Xwezîl dîsa zar bûma.
Hespê kumeyt siyar bûma.
Û bajêr berwar bûma,
Bimama bédeng û nav,
Her tek tenê zar bûma.

Poema ku Sehîdê Îbo navê wê Sînem lêkirîye, dirêj e. Helbestvan di vê poemê da, li ser mêranî û mêrxasiya kurdan çîrokek dihûne û vedibêje. Sehîd di destpêka poemê da, ji bo Sînem a xwişka heft birayên mêrxas, wiha dibêje:

Heft bira bûn, xuşkek her,
Ew Sînema gerdenzer,
Avka lêvê axê bû,
Dilê wî bû, ruhê ber.
Sînem usa bedew bû,
Mîna ronga rû'ezmîn
Dev, dirane şekir bûn,
Gulî zirav û zêrîn.
Bejne bilind, spindar,
Navkêlk zirav û kever

Sûretê sor ça hinar,

Ser gerdana wê ye zer.

Şerê ku di vê poemê da Sehîdê Îbo tasvir dike, di navbera Kurd û Er-
eban da derbas dibe. Di şer da Sinem û heft birayên xwe jî bi mêrxasî
şer dikin û tên kuştin.

Helbestvan di dawîya poema ku di salên salên 1969-70yî da nivîsye,
wiha dibêje:

Şer bû, şerekî giran

Heznî bibû Kurdistan,

Lawê wê ye ter û can

Boy namûsê ruh didan.

Li du vê çarînê êdi gotina ku mirov bike, nîne.

Jiber ku şer hê didome...

Kurdistan jî hê bindest û heznî ye...

22.08.2023

„Rû û Kûr“

Wêje, hunera listîka bi peyvan ra ye.

Wêjekar di nav bêdengîya peyvan da dijî.

Ji bo ku xewn û xeyalên xwe bixemilîne, li peyvên xas û bedew digere...

Dema ku bibîne, bi wan ra dilîze, çep û rast bi hev ra girê dide, bi deng xwe wan jîndar dike û vedibêje.

Ew vegotin dibe çîrok û roman, dibe helbest û stran, di guhê xwendevan û guhdarvanan da olan dide.

Rû û Kûr, navê pirtûka Alî Duran Topuz e.

Pirtûk ji çîrokên kin û kurt, ku wek çîrokên minîmal tên binavkirin, pêk tê.

Jiber ku Alî Duran Topuz di vegotina çîrokên xwe da bi peyvan ra zêde nalîze.

Bi hunera vegotina xwe ya kin û kurt wê listikê ji xwendevên xwe ra dihêle.

Qasî xewn û xeyalên xwendevan, çîrok kûr û dirêj dibin û dixemilin.

Rû û Kûr, pênc sal berê, di sala 2018an da, li Stenbolê hatiye çapkirin, di nav weşanên Avestayê da...

Lê piştî pênc salan be jî, min çîrokên Alî Duran Topuz xwend û ji zimanê wî jî, ji çîroknivîsîya wî hez kir.

Alî Duran Topuz çîrokên xwe yên kin û kurt, bi Kurmancîya Koçgiriye û bi tewneke cuda nivîsîye.

Çîrok kin, hevokên wî jî kurt in.

Lê bûyerên ku di wan çîrokan da cih digrin, bûyerên dirokî û mezin...

Û nalîna ji êş û jana birînên kûr û bêdawî ne...

Ji wan çîrokan sê mînak, wiha ne:

-Royên qirkirinê

Hemûyan kincên reş li xwe kiribûn.

Wekî şevê.

Nîviyê şevê da derketin hatin. Bêdeng. Te digo têrên xofê ber çavan fir didin.

Bedeng rûniştin. Bedeng berê xwe dan çîya û gazan.

Me paşê bihîst. Hindikan zarên xwe pêşkêş kirine, gotine ji we ra dibin şivan û gavan û xulam. Hindikan nanên kufikî ra zêr û zîv û morîyên bûk ên teze rijandine. Ê feqîr jî ziman û hêstir barandine binê di wê bêdengîyê da.

Bin hîvê da gur û kutî dîn-har bûne, dane deştan, piştan, gaz û çîyan...

Tav û hîvê xûya nekiriye ji têr û tûrên girtînok...

Ji şerma qurîn û zîbîn û ax û nalînan, dengê pepûgê hatîye birrîn.

Sala dîn bax û bostan û zevîyên wan hatin ajotin.

Te digo qe nehatine vê dinê, qe li van deran nebûne.

Sala ku File qirkirin me zanî aşê nefse çî aşikî heram e!

-Birîna Dêsim

Sala ku esker rabû ser Dêsimê, camêrên gundê me jî winda bûbûn.

Hindik çûyîbûn Dêsimê, hindikan xwe avêtin hundure mixaran.

Qerbelek û huliyan jî perên xwe yên heram dan hêla Dêsimê. Xof li cîqer, hesret li dîl, çav li rêyan mabûn.

Şevik jî şevan qupurtîk derket wek sala zelzelê.

Kilamên Dimlî ku me bihîstin, ar xist dilê'di me. Dêsimî hatibûn.

Wistîxwarbû. Me jê pirs kir: Ne lo çî bû?"

Wan got:

"Win mezanin, Bavê Duzgin dizanî, Xizir dizanî, me ra bes e.

Hêfa genkan, hêfa gencên'di me. Hêfa têr û tûr û ax û warên me.

Winê barên heyata me helgirin, bar û birînên rihên me bila me ra bimînin.”

-Xebera Alîşan Beg:

“Xeber gêşt gundan ku Alîşan Beg li Maciran hatîye kuştin.

Zûrezûr ket nav çîyan û goman. Mora mirinê ket nav hemû devan.

Piştî bêdengîyek dirêj Pîra Zerbo serê xwe rakir û got; „Hêfa Qoçgirî.

Kî ma ku tora Alîşan Begê caba hikumatê?”

Wek her sê mînakên li jor, hemû çîrokên ku di pirtûkê da cîh digrin, kin û kurt...

Lê bi wate û peyama xwe kûr û dirêj in.

Mîn doh êvarê, dest bi xwendina pirtûkê kir û di nîvê şevê da dawî lê anî.

Xwendina min qedîya, lêbelê çîrokên kin û kurt, kûr û dirêj bûn, bi xewn û xeyalên min ên bê dawî ra hê dixemilin...

10.10.2023

Çar Yek û Dublinî...

Ji vir çil sal berê ez li Stenbolê û xwendekarê zanîngehê bûm.

Wê demê navê zimanê kurdî, “Zimanê Çîyayî- Dağ Dili” û qedexe bû.

Çend pirtûkên kurdî yên ku li derveyê welat hatibûn çapkirin, ji wan hinek ji sînorên Tirkîyê hatibana derbaskirin jî, ew di bin erdê sar da gorkirî û veşartî bûn.

Di demeke wusa da „Jiyana Bextewar“ a bavê romana kurdî Erebb Şemo bi awayek ketibû destê min.

Weke nave xwe Jiyana Bextewar, ji bo min û çend hevalên derdora min xezîneyeke zêrîn bû. Ji bo ku kes nizanibe em pirtûkeke kurdî dixwînin, me bi nixamtina ji kaxizên kovareke rengîn va navê wê veşartibû. Wek pirtûkeke bê nav, di hefteyekê da carê dest duguhart û dorbidor dihat xwendin.

Li Setenbola wê demê û di salekê da ji alî çend kesan va hatibû xwendin, sedîsed neyê bîra min.

Lê ez dikarim bibêjim, ku hêjmara xwînerên wê yên ku ew bi dizî xwendibûn, ji hêjmara romanên kurdî yên ku îro herî zêde tîn firotan, zêdetir bû.

Tew zimanê kurdî îro azad nebe, qedexe jî nîne.

Li Bakûrê Kurdistanê û metropolên Tirkîyê bi dehan weşanxaneyên kurdî hene û ew di sale da bi sedan pirtûkên wêjeyî çap dikin, ku piraniya wan jî roman in.

Ne ku pirtûkên nivîskarên kurd, herwiha bi dehan romanên kilasîkên ku bi kurdî û ji bo kurdan hatine wergerandin jî bi serbestî tîn weşandin û firotan...

Lêbelê, siyasetvanên kurd jî, kurdên ku hê zimanê xwe jibîr nekirine û

daw û doza perwerdeyîya bi zimanê zikmakî dikin jî, li rûyê wan pirtûkan mêze nakin, nakirin û naxwînin.

Ev çend roj bûn min bi rêhevaltiya dengê Şakiro va du pirtûk li pey hev xwend...

Ji wan “Çar Yek”, pirtûka nivîskar û wergervanê kurd Ciwanmerd Kulek e û wek nave xwe ji çar çîrokan pêk tê.

Ya din jî “Dublinî” ya James Joyce, ku ew jî dîsa ji alî Ciwanmerd Kulek va hatiye wergerandin. Dublinî ya James Joyce jî ji 15 çîrokên civakî pêk tê û mirov di wan çîrokan da dibîne, ku Dublinî 100 sal berê çawa jîyan e û bi çi karî va mijûl bûne...

Çar Yek, çawa ku di kurtenivîsa li ser berga pašîn da hatiye gotin, bi rastî jî herçar çîrokên ku di pirtûkê da cîh digrin, wek çar şaxên çemekî diherikin û di dawiyê da dibin yek...

Çîroka yekemîn bi tevlehevîyek dest pê dike, di nav wê tevlihevîyê da mirov carinan wenda dibe, ji bo ku têbigihîje mijara çîrokê çî ye û tê da qala kî û kê tê kirin, vedigere û careke din li paş xwe dinihêre...

Lê bi çîroka duyemîn ra mijar zelal, vegotin jî herikbar dibe.

Tewfo xûya dike, ji dûr va...

Tewfoyê ku di kilam û stranan da bi mêranî û mêrxasîya xwe derbas dibe û wek bavê Behcet û siwarê seglawîya qer tê bi nav kirin... Bi qulubandîna rûpelan ra çîrok dibe kilam, kilama Bavê Behcet...

Vegotin jî bi deng û awazên Şakiro va dixemile, di guhê merîya da olan dide û mîna ava çemê çarşaxî bi hev ra diherike.

Şakiro di kilamê da dibêje; “... Dilşê li çokê xwe dixist digot, lolo Behcet berxê hînga mi dizanîbû ûrt û ocaxê mala bavê Behcê min qeliya...”

Ehmedê Zorê jî di çîrokê da, bi ribaba xwe dengê xwe bilind dike û dibêje;

‘Axa yê me Tewfîq Îsa

Xilaskir Kurdistan dîsa...”

Mirov bi dengê Şakiro ra xemgîn, bi gotinên Ehmedê Zorê ra jî ber xwe dide...

Bidawîbûna kilamê ra mirov bixwe tê, ku pirtûk jî qedîyaye û dawî li çîrokê hatîye.

Dublinî ya James Joyce jî ji alî Ciwanmerd Kulek va û bi kurdîyeke zelal hatîye wergerandin. Joyce di 15 çîrokên ku di pirtûkê da cîh digrin da, jîyana civakî ya li Dublinî ya sed sal berê bi hunera xwe ya wêjeyî hunandiye...

Ger ku di çîrokan da kêmasîyek hebe, ew jî zêdebûn û nêzîkbûna navan in. Nav û lehengên ku di çîrokan da derbas dibin, hem zêde hem jî bi awayek dişibin hev. Mirov carinan wan navan tevlihev bike jî, bi wergera Ciwanmerd Kulek va ji vegotina Joyce jî tahma zimanê kurdî digre.

Dema ku Joyce ev çîrok nivîsîne, wê demê jî Îrlandî weke kurdan miletekî bindest in û di bi desthilatdariya Îngilîzan da dijîn. Joyce di nivîskariya xwe da her çiqas zimanê Îngilîzî bi kar anî be, wek Yaşar Kemal, mijara berhemên wî jî bi piranî Îrlandî û jîyana wan e.

Loma di çîrokên Joyce da mijara ziman jî qasî giranîya xwe cîh digre. Heta pîrsa ku kurd îro ji bo bikaranîna ziman ji hev dîkin, Dublinî wê pîrsê 100 sal berê ji hev dîkin, ku ew çima bi zimanê xwe napeyivin?

Ciwanmerd Kulek jî di pêşgotina vê pirtûkê da qala zimanê Joyce û bikaranîna zimanê zikamakî dike û dibêje; “bi kurdî nivîsîn, bi kurdî raman, bi kurdî berhemdayîn, bi kurdî xwendin şerek e, şerê avakirin û bilindkirina şaristanîyekê ye...”

Loma ew qasî nivîskariya xwe, bi vê wergerê jî di qada şerê edebîyatê da çok daye erde û gulên xwe yên ji peyv û hevokan pêk tê, dide ber hev û li pey hev dibarîne...

Di vî şerî da serkeftina wî û şervanên wek wî jî, bê guman bi piştgirîya kurdên ku hê dev ji zimanê xwe bernedane û pê dijîn va girêdayî ye...

18.11.2023

Sêxiştîyên Kurmancî

Ev cara yekemîn bû, ku ez rastî peyva „sêxiştî“ hatim.

Sêxiştîyên Kurmancî jî navê pirtûka Prof. Dr. Celîlê Celîl û Gulê Şadkam e.

Celîlê Celîl û Gulê Şadkam sêxiştî ya jî bi navên xwe yê din sêrêz li Xorasanê berhev kirine û weke pirtûk weşandine.

Di pirtûk ji 1701 sêxiştî cîh digrin.

Gor gotina Gulê Şadkam, wê û Celîlê Celîl li Xorasanê 2000 sêxiştî berhev kirine, dû ra li bêjîngê xistine û ji bo çapkirinê ji 1701 heb hilbijartine. Ji yê mayîn hinek ji alî zarbêjan va zelal nehatine gotin, hinek jî tevlihev bû ne.

Celîlê Celîl di pêşgotina xwe da qala çîroka berhevkirina sêxiştîyên kurmancî dike û ji bo sêxiştîyan jî wiha dibêje; „Sêxiştî di nava zargotina Kurdî da, li seranserê Kurdistanê û dîyasporaya wê da hunereka pir hezkirî û belavbûyî ye. Di hin heremên Kurdan da ji wan ra dibêjin, heyranok, dîrok, sêxiştî, sêrêzî, dilok, manî, bend, çarîn û hwd...“

Wek tê zanîn, zargotina kurdan zargotineke dewlemend e.

Zimanê kurdî jî bi saya wê dewlemendiye wenda nebûye, herwiha bi dewlemendiya xwe ya xwezayî heta roja îro hatiye.

Binavkirina Kurdên Xorasanê sêxiştî ya jî sêrêz, stranên kin û kurt in. Her rêz jî bi heşt lîngan e, bi teqîl tê vegotin.

Gulê Şadkam jî di pêşgotina xwe da sêxiştîyan wiha tarîf dike û dibêje; “Sêxiştî beşek herî girîng ji edebiyata devkî ya Kurdên Xorasanê ye. Ji 5ên heta 15 heceyan, ku bi heşt heceyî jî yê din pirtir hatiye gotin.

Sêxiştî, gêpên dilê jinan û mêran e li bêdilî û cudayî, li şadî û xem, li xerîbî û hêsrî û li omîdî û naomîdî. Her sêxiştî, çîrokek biçûk û şîrin

e ji jîyana xelkê, geh hîkayeta demekê ye û geh mîna birûskekê li dilê asîmanan vediberiqe û geh mîna kanîyeka zelal, aram ji dilê çîyayan dikele û dere. Sêxiştî gepek ji dilî rabûye û loma li dilî jî xweş tê...”

Bi gotina Celîlê Celîl; sêxiştî ya ji sêrêzî, bi naveroka xwe wek neynika dîroka Kurmancên Xorasanê ne. Di naveroka sêxiştîyan da koçberî, tehlî û tengîyên jîyana wan a ji axa bav û kalan dûr cih digre. Mirov di naveroka sêxiştîyan da rastî hemû êş û jana wan, xem û xeyalên wan tê. Di sêxiştîyek da bi xem distirên û wiha dibêjin:

Va çîyana çîyê me nîn in

Merxê çîyê me hêşîn in

Kew li çîyê me dixwînin

Dîsa mirov di naveroka sêxiştîyan da dibîne, ku Kurmancên Xorasanê li zimanê xwe xwedî derketine û dîroka xwe winda nekirine. Bi hesreta welatê xwe jîyane, di xewn û xeyalên xwe da ew welatê xwe yên jê bêpar mane, xemilandine û bi sêxiştîyan va ew hesreta xwe anîne ziman:

Welatê me Erzîrûm e

Wî çîya û gul û tûm e

Heft sal in ez ji cî bûme

Welat û koçberîya wan a dijwar, rêya wan a dûr û dirêj ji bîra wana neçûye. Li ser neheqîya li wan hatîye kirin, strane, bi gazî û lomeyên ji bêrçaretîyê ji halê xwe ra lorandine û gotine:

Xelko can, le me çi kirin

Malê me le gan bar kirin

Ji welatê xwe em dûr kirin

Di jîyana Kurdan da koçberî û xerîbî, dûrketina ji axa bav û kalan, zilm û zordarî ti car kêma nebûye.

Kurdên Xorasanê jî li ser jîyana xwe ya li koçberîyê sêxiştî derxistine û vegotine, ku ji wan ra dibêjin stranên cudayê.

Stranên xerîbîyê jî di nav Dzargotina kurdan da dengbêjî û stranbêjî xwedî cîheke girîng e, ku di nav dengbêjîyê da jî stranên li ser xerîbîyê xaleke taybet e, ku wek stranên xerîbîyê hatine binavkirin.

Mînamek ji sêxiştîyên li ser xerîbîyê hatine derxistin:

Merxê çîyê Serhedê me

Berindirê dûr je dê me

Ez umreke çav le rê me

Herwiha wek stranên li ser mêranî û mêrxasîyê, sêxiştîyên li ser mêranî û mêrxasîyê hatine derxistin jî hene. Ev sêxiştîya jêr jî li ser şer û şervanîya kurdan e:

Uris hatiye nav kwîna ne

Ekişînî ew bîna ne

Žîwe-žîwê wan jîna ne

Gulê Şadkam, di dawîya pêşgotina xwe da qala jîyana Kurdên Xorasanê, jîyana wan a ku bi êl û êşîrtî derbas bûye, dike û wê jîyanê bi sêxiştîyek va wiha dixemilîne:

Nika koç û rêkoça mîna berê tune, ku li biharê bînen Kurmanc bi hezar xeml û refşê malan hilînin, deveyan bixemilînin û keçikên bi refşê Kurmanc bi cil û libasên sor û zer û boz bi pêşîya qeterdeveyan bikevin û serê heft qeter nêr û meya ji nav gul û gîyayan, bikişînin û ro li çîyayan herin, ta cahilek bi dil, bi hesret û erman yara xwe bibîne ku tev li koçê dere û ji dilî da bixwîne:

Sîsebozê xwe niqîşand

Serê meya boz dikişand

Min wî dûra erman kişand

Çapa Sêxiştîyên Kurmancî ya yekem di sala 2012an da, ya duyem jî di sala 2018an da ji alî Weşanxaneya Wardozê va hatiye çapkirin.

Ev pirtûk bi pêşgotina Celîlê Celîl û Gulê Şadkam, bi 1701 yek Sêxiştîyên Xorasanê va çavkanîyeke zêrîn e.

Sêxiştîyên Kurmancî jî, ji bo her evîndarê zimanê kurdî, hêjayî xwendinê ne...

24.04.2024

„Bavê min Şêx Said“

Dîrok, çîroka serdestan e.

Tiştên ku di wê dîrokê da cîh digrin, di wan da bi qilûlikên bê bîngê pesnê mêranî û mêrxasiya serdestan tên kirin.

Dîroka rast, dîroka ku hê nebûye çîrok jî, di sitranên dengbêjan da, di bîranînên bav û kalan da veşartî ye.

Kurd ti car nebûn serdest...

Loma ji çîrokên serdestiyê jî bêpar man.

Lêbelê dîroka me ya ku ji têkçûyînan pêk tê, bi deng û awazên dengbêjan va hatiye xemilandin û bûye sitran.

Her çiqas kêmbin jî di bîranîn û vegotinên bav û kalan da jîndar ma ye û heta roja îro hatî ye.

Ji bîranînên ku bi xwediyê xwe ra neketine gorê û wenda nebûne, jî wan yek jî bîranînên Şêx Elî Riza ne.

Bîranîn ji alî nebîyên wî, Dilşad û Dilhat Fîrat va hatine berhevkirin û wek pirtûk bi navê „Babam Şeyh Said – Bavê min Şêx Said“ hatiye weşandin.

Hefteyek berê pirtûk gihîşte destê min.

Pirtûkeke zirav, lê belê bi naveroka xwe va jî giranbiha û watedar...

Bi kêf û kelecana min dest bi xwendina pirtûkê kir û di nav rojekê da qedand.

Gor agahîya ku di pêşgotina pirtûkê da cîh digre, dengê Şêx Elî Riza di sala 1967an da hatiye qeyd kirin.

Di wê demê da Şêx Elî Riza 69 salî ye û li Enqerê, mêvanê Şêx Melîk Fîrat e, ku ew hem birazî hemjî zavayê wî ye.

Qeyda ku bi axaftina Şêx Elî Riza dest pê dike, bi pirsên Melîk Firat û Doxan Kiliç ra kûr û dirêj dibe û didome.

Mijar kurd û dîroka kurdan e...

Melîk Firat û Doxan Kiliç bi taybetî di derheqê Serhildana Şêx Saîd da pirsên xwe dipirsin, Şêx Elî Riza jî wek şahid û aktorekî wê demê, bi bersivên xwe yên zelal, rewşa kurdan ya 100 sal berê û têkçûyînen wê demê dinirxîne.

Di nirxandina xwe da li sedemên ji derveyî kurdan pêk hatine, nagere û wan dernaxe pêş. Berevajî bi mînakên balkêş û bi bûyerên jîyayî, sedemên hemû têkçûyînen ku di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an da qewimîne, bi hest û helwesta kurdan va girê dide.

Di nav mînakên ku wek sedemên têkçûyîne dibîne û derdixe pêş da, du mînak bêtir bala min kişandin.

Yek di derbarê têkilîya kurd û „ingilîzan da, ya din jî di derbarê têkilîya kurd û ûrisan da ye.

Gor gotina Şêx Elî Riza, di destpêka sedsala 20an da hinek nûnerên îngilîz û kesayetîyên kurd li bajarê Silêmanîyê civînek li dar dixin. Ji kurdan Şêx Mahmud, Seyyîd Taha, serokê eşîreta Gerdîyan û Xoşnakan, ji Amedê Selîm Axa û Mahmûd Axa, Simko û gelek kesên din beşdarî wê civînê dibin.

Di civînê da kurd jî îngilîzan daxwaz kirine, ku ew li ser soza xwe bisekinin û çek û sîlehan bidine wan...

Nûnerên îngilîz bersiva kurdan didin û dibêjin; “Em çek û sîlehan bidin we û hûn jî careke din dîsa werin, bi çek û sîlehên me şerê me bikin... Hûn herin bi tirkan ra şer bikin, ku em jî bizanibin hûn ne dostên tirkan in...”

Şerê Osmanî û Êrisan şereke domdar e. Li qada şer kesên ku li dijberî Êris şer dikin dîsa tenê kurd in. Generalekî Êris rojekê ji mirovên xwe ra dibêje; ”Herin ji kurdên ku li hemberî me şer dikin yekî bigrin û bînin huzura min, ez dixwazim ji zar û zimanê wan bibihîzim ku derd û kulen wan, daw û doza wan çi ye, ji bo çi li dijberî me şer dikin?”

Gor gotina Şêx Elî Riza leşkerên Êris kesayetekî kurd digrin û derdixin pêşberî generalên xwe. Dema ku kurd û general tîr û hev general jî

kurd ra dibêje; “Ez bi mîletê we ra şer nakim. Jixwe ez leşker nebama beşdarî şer jî nedibûm. Ez leşker im û jî bo karê xwe jî mûçe distînim. Loma heta ku leşkerîya min biqede, ez mecbur im beşdarî şer bibim. Lêbelê ez we fam nakim.

Me şerê we nekirîye û hûn jî ne leşker in. Hûn xelkê vê herêmê ne û pêwîstiya Tirkan jî, ya Osmanîyan jî ya me jî bi we he ye. Kîjan dewlet ya jî hukumet bi ser bikeve, jî bo we ferq nake. Jixwe ra li cihê xwe bisekinin û li dijberî me şer nekin. Dawxazeke we ya din hebe, bejin ku em alîkarîya we jî bikin...”

Kurd li general guhdarî dike û bersiva wî jî wiha dide; “Em li dijberî we şer dikin, jî ber ku hûn kafir in, em we bikujin sedem kuştina we li wê dinê bi çûyîna bihuştê va tên xelatkirin, hûn me bikujin, em şehîd dikevin û dîsa di bihuştê da cihê xwe digrin...”

General bi van gotinên kurd ra matmayî dimîne û jî mirovên xwe ra dibêje; “Qezenca du alî, gelo kê kurd wisa xapandine û ev tişt kirine serê wan...”

Bê guman Şêx Elî Riza di derbarê têkiliyên navxweyî da jî gelek mînakên balkêş dide, ku piranîya wan jî heta roja îro nehatine bihîstin.

Kurdên ku dixwazin jî dîroka xwe ya rasteqîn hayîdar bibin, divê biranînên Şêx Elî Riza bixwînin, ku jî rastî û kêmasiyên dîroka xwe sûd bigrin.

Mîn jî bi vê helwestê pirtûk xwend û jî bo para xwe qasî ku jî biranînên Şêx sûd girt, ewqas jî xemgîn bûm.

Jiber ku Şêx Elî Riza di biranînên xwe da qala têkçûyînen sed sal berê dike û sedema herî sereke jî hest û helwesta kurdan ya wê deme nîşan dide.

Piştî sed salên dirêj, dinya jî binî va guherî.

Bê guman kurd jî di şûna xwe da nesekinîn û çê ya jî xirab, di gelak xalên jîyanê da rewşa wan jî hate guhartin.

Mixabin tiştê ku jî kurdan ra wek mîrateke dîrokî ma ye û nehatîye guhartin, ew jî, hest û helwesta ku jî yekîtîyeke neteweyî dûr e, ye.

Loma kurd îro jîo hê jî hev dûr, welatê wan Kurdistan jî hê bindest e...

19.07.2022

„Ji Heysivê heta Stockholmê“

Ev, navê pirtûka Kazim Budak e. Pirtûk ji bîranînên Budak pêk tê û di sala 2015an da ji aliyê weşanxana Apec, li Stockholmê hatiye weşandin.

Bîranîn, beşek ji edebîyatê ye. Lê ji beşên edebîyatê yên din cudatir, bîranîn bi awayekî belgeyên dîrokî, civakî û siyasî ne.

Jiber ku di bîranînan da bûyerên ku di serê xwedîyê bîranînan da derbasbûne û ya jî lê şahidî kirîye, cîh digrin. Xwedîyê bîranînan herçiqas dîroka xwe ya şexsî nivîsandibe jî, ew bi awayekî parçeyek ji dîroka civaka wî ne. Bi tecrûbe û çavderîyan qasî ku jîyana xwe tîne ber çav, ewqas jî rewşa civaka xwe jî bi pîralî tîne ziman û digihîne nîfşên nû.

Di civakên bindest da zimanê gel qedexe, edebîyata nivîskî jî paşketî û qels e.

Loma nivîskar û rewşenbîr û siyasethêderên ku di civakên bindest da dijîn, bîranînên xwe nanivîsin û tenê bi nas dostên xwe, heval û hogirên xwe ra parve dikin, ku ew jî bi demê ra difirin û wenda dibin.

Di nav kurdan da jî nivîsandina bîranînan kêr in. Yên hatine nivîsandin, ew jî pîrranî bi zimanê Tirkî, Farisî û Erebî ne.

Bîranînên ku ji alî siyasethêderên kurd va bi Tirkî hatine nivîsandin, ew jî di bîranînên xwe da bi rewşa siyasî û bi bûyerên xwe yên siyasî va mijûlin. Xwe wek dêw ên heftserî dibînin û tenê qala xwe dikin. Di bîranînên xwe da jî di ser pozê xwe ra ne kesî ne jî tiştên ku ji derveyî wan qewimîne, dibînin. Loma bîranînên wan jî yekalî, mîna nanê tîsî bê tahm û bê avî ne.

Qasî ku dizanim, jînanîgerîya Cegerxwîn, bîranînên Osman Sebrî û çend kesên din bi kurdî hatine nivîsandin, ku ew jî ji kurdên binxetê ne û bîranînên wan jî di vî warî da mînakên herî berbiçav in.

Ji kurdên bakurî yê ku bîranînên xwe bi kurdî nivîsandîye, ez bawerim tenê Kazim Budak e.

Kazim Budak jî sîyasetmedarekî kurd e, lêbelê di bîranînên wî da gelek bûyerên bi qewimandina xwe piçûk, lê bi wateya xwe giranbûha çih digrin. Mirov di bîranînên wî da xizanî û belengazî, astengî û zehmetiyên demê dibîne, ku ew jî reng û dewlemendiyek cuda didin bîranînan.

Heysiv, bi navê wê yê din Mezra Budan, li qiraxa Çemê Gêxîyê-Perê û girêdayî nahîya Moxindîyê ya Dêrsimê ye. Jiyana Kazim Budak jî Heysivê dest pê dike, xortanîya wî li nav navçe û bajarên Kurdistanê û Tirkîyê, navsalîya wî li koçberîye, Stockholmê derbas dibe.

Kazim Budak di destpêka bîranînên xwe da dibêje; „Mîna gelek kurdan dema ji dayîkbûna min jî nediyar e. Li gorî di nasnamê da hatîye nivîsîn 20ê Çile ya paşîn, meha yêkê sala 1944an da li Heysivê ji dayîk bûm e...”

Ew dûr û dirêj qala dema zarokatîya xwe ya ku di mezrayeke piçûk da derbas bûye, dike. Navên lîstikên ku wê demê lîstine, ku îro jî alî gelek zarok û xortan va nayê zanîn, tîne ziman û rewşa wê demê li ber çavên merîya radixîne.

Di derbarê zarokatîya xwe da wiha dibêje, „Dinya me tenê der û dora gundê me bû. Em bê xem bûn û ji rewşa xwe razî bûn. Meh û sal li pey hev zû derbas dibûn. Mîna zarokên îro leyîstokên me tunebûn. Em, zarokên gund bi hev ra li ser bêderan, zivistanê jî di axur û goman da dilîst. Lîstikên me yên sereke jî, çavçirtonek, kap, keradirêj, simsimikî, gog, birr û hwd, bûn. Me di wan salan da ji mezinan çîrok guhdarî dikir û di derbarê kirin û kiryarên dewletê yên li serê gelê kurd hatibûn kirin, dibihîst. Mîna Tarta Şêx Seîd, Seîd Riza û berxwedana Alê Gax...”

Budak, dibistana seretayî li gundê Hulmanê dixwîne, ku herdu mezrayên bi navê Heysiva jêrîn û ya jorîn girêdayî Hulmanê ne. Di heft salîya xwe bi çend zarokên hemsalê xwe va her roj ji Heysivê bi rê dikeve û bi peyatî tere dibistanê û piştî nîvro yê jî şûnda vedigere, ku navbera Heysiv û Hulmanê 4-5 km ye.

Di derbarê dema xwe ya dibistanê da dibêje, „Me qapût, kincên taxim û gîzme nas nedikir. Di serma û seqema zivistanê da jî, ji bin ra ji cawê

sipî derpêyekî dirêj û jor ra jî kirasekî dîsa ji caw û mîntanekî kevn bêtir li ser me tişteki din nebû. Di lingê me da goreyên rîs û çarixên ji çermê dewar dihatin çêkirin, hebûn. Di baranê da em şil dibûn, me mecal nedidit ku em xwe zuha bikin û bi kincên şil diketin dersxanê û heta dawîya dersê rûdiniştin...“

Piştî pênc salan dibistana seretayî diqede. Birayê wî yê mezin, Mistefa, li Xarpêtê xwendekar e. Rewşa malbatê jî bo xwendina du kesan a li bajêr bixwînîn, dest nade. Sedem wê yekê jî bo xwendinê tenê şansekî wî he ye, ku ew jî qezençkirina azmûna jî bo dibistanên leylî ne. Loma ew jî jî bo dibistana leşkerî û mamostetîyê serî lê dide. Mixabin jî bo beşdarbûna azmûna dibistana leşkerî rapora bêqisûrîya fizîkî û xweşhelîyê pêwîst e. Ew jî divê li nexweşxaneyê leşkerîya li bajarê Erzîrumê ya jî li bajarê Amedê bê girtin.

Ew bixwe hê zarokekî 12 salî, rê dûr, kesê ku karê xwe bihêle û pê ra biçe jî nine. Bavê wî bi hesabekî gilover heqê rêya çûyîn û hatina wî, jî bo 4-5 rojan jî heqê otêlê û xwarina wî, pereyeke kêmtir dide wî û di berbanga sibeyeke sar da bi rê dike. Ew di wî sale xwe da jî heysivê heta Kovancîyan 30 km peyatî dimeşe û di nav daristan û newalên kûr ra derbas dibe. Ji Kovancîyan li erebê sîwar dibe û diçe Xarpêtê, jî Xarpête jî li Tîrenê sîwar dibe û diçe Amedê. Li Amedê hefteyek derbas dike, lê karê wî naqede. Lêbelê di berika wî da 2,50 pere tenê jî bo heqê rêya wî ya vegerê dimîne.

Ew û çend hevalên ku di rewşa wî da ne, biryar didin ku herin Şaredarîya Amedê û alîkarîyê bixwazin. Radibin û bi hev ra berê xwe didin avahiya şaredarîyê diçin, daxwaza xwe jî memûrek ra tînin ziman. Memûr wan li erebeyekê sîwar dike û dibe li xweytûxana şaredarîyê bi cîh dike. Çend roj şûnda kare wî diqede, memûrê şaredarîyê bilêta wî ya tîrenê jî jê ra digre û wî bi rê dike. Êvarê tîren jî Amedê bi rê dikeve û saet 6ê sibê da digihîje Xarpêtê. Kazim Budakê 12 salî jî tîrenê peya dibe û bere xwe dide garaja Kovancîyan, li erebê sîwar dibe tere Kovancîyan, jî wir jî di 30 km peyatî dimeşe û saet 18ê êvarê da xwe digihîne ber derê mala xwe.

Budak di derbarê vegera xwe ya malê da wiha dibêje; “Dema ku dê û bavê min ez li ber derî dîtîm, gelek kêfxweş bûn. Xûya bû, derengîketina min ew kiribûn fikaran û bawerîya xwe jî vegera min birîbûn...”

Tam 55 sal şûnda, di sala 2011an da ew û lawê xwe Zinar dixwezîn bi

hevra herin welêt. Ji bo wê ji bileta xwe ya ji bo balafirê digrin, ku ew ji Stockholmê bifirin Amedê. Di wê navbeynê da diya wî nexweş dikeve û ew mecbûr dimîne, berî plankirina xwe tenê bi rê dikeve. Berîya çûyîne ji Zinar ra dibêje; “Zinar tu 17 salî yî, ziman dizanî û tene jî dikarî heta Amedê, bi balafirê, ji wir jî bi erebê werî gund...”

Dû ra qala çîroka rêwîtiya xwe ya Amedê, ku di 12 salîya xwe da bi çî zehmetî çûye û hatîye, dike...

Zinar li çîroka wî guhdarî dike û jê ra dibêje; “Bavo, hûn 11 xwişk û bira bûne, loma kalik û pîrika min tu ji çav derxistine û tu tene şandine. Usa nebe meriv zarokokekî 12 salî çawa dişîne rêyeek wusa dûr...”

Ser vê yekê ew jî ji Zana ra dibêje; “Ger ku tu nikarîbî tene werî ezê ji te ji çav derbixînim...”

Budak azmûna dibistana leyli ya ji bo mamostetîyê ya li Akçadaxê qezenç dike. Di sala 1962an da dibistanê diqedîne û di heman salê da li gundê Mîralî ya Çoligê dest bi kare mamostetîyê dike.

Dema çûyîna wî ya eskerîyê tê, eskerîya xwe wek mamoste li gundekî girêdayî Antakyayê dike û piştî 20 mehan şunda vedigere. Mamostetîya wî ya li gundên herêmê çend sal dîsa dikudîne.

Si sala 1968an da ew beşdarî azmûna zanîngehê dibe, di encamê da Enstîtutî ya Gazîyê qezenç dike û dibe xwendekarê zanîngehê. Di wan salan da bayê sosyalîzmê rabûye û li seranserê dinyayê belav bûye. Ew ba li Enqerê jî lê dixê, Kazim Budak jî xwe di nav kar û barê şoreşgerîyê da dibîne. Di nav çalakîyên xwendekaran da cîh digre, bi gelek rêvebirên xortên wê deme ra dibe heval û bi wan ra çalakîyan lidar dixê.

Di sala 1969an da DDKO tê damezrandin, ew jî wek xwendekarekî kurd dibe endamê DDKOyê û di xebat û çalakîyên komelê da cîh digre.

Di dawîya salên 60î da ji bo şoreşgerên Tirk çûyîna kampên Flistînê nîşaneya şoreşgerîyê ye. Dilê Kazim Budak jî ji bo çûyîna Filistînê lêdixê, ku ew daxwaza xwe bi çend hevlên xwe ra jî parve dike. Di encamê da ew û sê hevalên xwe, biryar didin, ku ew jî berê xwe bidin Filistînê û karê xwe yê etnasyonalîstîyê binin cîh. Ji bo çûyîne amadekarîya xwe dikin, li kesên ku heta wê rojê çûne û hatine digerin û dixwazin ji pratîkên wan tecrûbeyan bigrin.

Di derbarê daxwaza xwe ya ji bo çûyîna Filistînê Budak wiha dibêje; “Rojek ji rojan em sê heval li Ulusê bi Mistefa Kemal Çamkiran ra hatin ba hev, ku ew ji çûbû Filistînê û hatibû. Gor me mirovekî mezin û xwedî tecrûbe bû. Me hinek pirs jê pirsin, wî jî ew bersivandin. Piştî pêwendîyeke dirêj Mistefa li min vegeyîya û got; ‘Kazim nebe ku tu li wê derê qala pirsgrêka kurdî bikî, jiber ku ew ji kurdan hez nakin’. Piştî ev gotina wî, min jî got, madem ew ji kurdan hez nakin ez çima ji wan hez bikim û herim alîkarîya wan bikim. Min li wir biryara xwe da û dest ji çûyîna xwe ya Filistînê berda...”

Hevalên wî berê xwe didin Filistînê, Budak jî li Enqerê dimîne, di sala 1971î da Enstitûya Gazîyê diqedîne û di demsala payîzê da jî li Er-qenîyê dest bi kare mamostetîyê dike.

Wê deme Cunta 71î li ser texte û ew jî mîna gelek şoreşgeran para xwe ji zordariya cuntayê digre û tê girtin. Piştî berdanê ji Erqanîyê sirgûnî nav bajarê Amedê dibe û li lise ya Baxlarê mamostetîya xwe didomîne. Lê carek navê wî we çepgir derketîye, loma dewlet pêşîra wî bernade, di sala 1973an da careke din dîsa li Amedê tê binçavkirin. Li wir, ji polês û leşkeran tade û zulmê dibîne, lê di demeke kin da serbest tê berdan.

Li Amedê di damezrandina Töb-Derê da cîh digre, di sala 1975an da tayîna wî derdikeve Dêrsimê û li wir şaxa Töb-Derê ya Dêrsimê saz dike û dibê serokê komelê.

Di wan salan da, di nav kar û barên xwe yên sîyasî da firsenda zewacê dibîne û dizewice. Budak di derbarê zewaca xwe da jî wiha dibêje; “Ji bo mahra fermî em bi çend hevalan ra çûn û derketin hizûra hakimek jin. Dema ku li belgeyên me meze kir, hakima jin li min vegeyîya got, ‘Kazim Budak di binê her keviyekî da tu derdikevî...’ Min jî bersiva wî da û got, hakime xanim di bine keviran da karê min tune, ez li ser erdê, serokê Töb-Derê me û nuha jî dixwazim bizewicim.”

Di sala 1976an da ew dest ji mamostetîyê berdide û li Şaredariya Amedê dibe midûrê îqtisadê.

Di sala 1977an da hîlbijartinên şaredariyê tîn li dar xistin, di wê hîlbijartinê da Mehdi Zana jî wek berendamê serbixwe beşdarî hîlbijartinê dibe û bi rêjeyeke mezin wek Şaredarê Amedê tê hîlbijartin. Kazim Budak jî hevalek ji hevalên Mehdî Zana ye û piştî hîlbijartina wî jî, karê xwe yê li şaredariyê bi serkeftî bi rê va dibe.

Lêbelê salekî şûnda ji şaredariyê îstifa dike û di sendika Genel-İş ya şaxê 7an da wek perwerdekar dest bi kar û xebatê dike. Li navçe û bajarên herêmê digere, bi perwerdeya karkeran va mijûl dibe û şev û rojên xwe bi wan ra derbas dike.

Piştî Cunta ya 12ê Îlonê ew ji mina gelek kurdên şoreşger û welatperwer zar û zêçên xwe li paş xwe dihêle û derbasî binxetê dibe. Bi salan li bin xetê dimîne, lingekî wî li Beyrûtê, lingekî wî li Başûr û Rojava ye. Kar û xebata xwe ya siyasî li wir jî didomîne.

Di destpêka 1984an da derbasî Swedê dibe û li Stockholmê bicîh dibe, lêbelê li Swedê jî jîyana wî naguhure. Armanc tekoşîna ji bo mileteke bindest be, mirov li ku dibe bila bibe, karê merîya zêde, bar jî her dem giran dibe.

Loma mala Kazim Budak li Stockholmê ye, lêbelê lingekî wî li Rohilata Navîn, lingekî wî jî li Rojavayê Ewropayê ye.

Dem diguhure û bi guhartina demê ra rewşa Kazim Budak jî tê guhartin. Piştî 24 salan şûnda, di Nîsan a 2004an da cara yekemîn vedigere welatê xwe...

Di navbera, Ji Heysivê heta Stockholmê, da bûyer û bîranînên ku mirov jê sûd bigre, gelek in, lê belê bila ew jî ji bo xwendina pirtûkê bimînin.

Min bîranên Kazim Budak xwend û tahm jê girt, ez bawerim kesên ku bixwînin, dê ew jî qasî min tahma zimanê xwe jê bigrin...

15.08.2020

„Tebinî ya ji bo dîrokê...”

Navê pirtûka Bedirxan Epozdemir, bi tirkî „Tarihe Not Düşmek“ e û min jî ew wek „Tebinî ya ji bo dîrokê“ wergerand. Çiqas rast û di cîh da ye, nizanîm, lê ji bo kurdîya wê min navek ji vî navî baştir jî nedît.

Bedirxan Epozdemir ev pirtûka xwe çend meh berê ji min ra şandibû. Di demeke kin da min jî bi kelecana dest pê kir û heta dawîyê xwend. Piştî xwendinê min dixwest, ku ez nêrînên xwe yên di derbarê pirtûkê da wek germagerm binivîsim. Mixabin hinek kar û bar ketin navberê û ev nivîsa min jî heta roja îro ma.

Ez ji pirtûkên bîyokrafîk û yên ji bîranînan pêk tên zêde hez dikim û wan bi kêfxweşî jî dixwînim. Ew bi tewna nivîsê beşek ji edebîyatê, bi taybetî bîranîn bi naveroka xwe jî pirtûkên civakî û dîrokî ne. Mirov bi xwendina wan ne tenê xwedîyên bîranînan, di kesayetî û jîyana wan da rewşa civakê ya dema ku ew tê da jîyane û bûyerên ku wê demê qewimîne jî dibîne.

Mixabin di vî warî da jî Kurd teral û qels in.

Dibe ku ji dewlemendiya edebîyata Kurdî ya devkî be, Kurd heta ku bikaribin zêde diaxifin û guhdarî dîkin, lêbelê kêma dixwînin û zêde nanivîsin. Heta mirov dikare bi hêsanî bibêje, ji xwendin û nivîsandinê dûr in û jê hez jî nakin. Loma kurdên ku bîranînên xwe nivîsîne kêma in. Ji bilî çend mînakên, xwedîyê bîranînan jî bi piranî sîyasetvan in û zimanê bîranînên wan jî bi tirkî ne.

Dema ku naveroka bîranînan sîyaset be, mijar berovajî dibe û hinek ji rastî yê jî dûr dikeve. Sererastkirina mijarê jî di histûyê kesên ku di nav wan bîranînan da derbas dibe da dimîne.

Bingeh û naveroka pirtûka Kek Bedirxan jî bi piranî ji nivîsên ku di derbarê bîranînan Kemal Burkey da hatine nivîsandin, pêk tên.

Bîranînên Burkay weke 5 cîldên qalind û di nav 20 salan da li pey hev hatin weşandin, ku min ji wan du cîldên ewil tenê xwendin û li yê mayîn ji negerîyam. Min nêrînên xwe yê di derbarê bîranînên Kemal Bûrkay da berê jî nivîsibûn, loma pêwîst nîne ku careke din li vir jî dubare bikim. Lê dikarim bi kurtayî bibêjim, ku bîranînên Burkay ên ku her cildeke wê nêzikî hezar rûpel dirêj û qalind, ji bîranînan zêdetir, ji pesn û tawanbarîyan pêk tê. Burkay di her warî da bêpîvan pesnê xwe û hinek hevrêyên xwe yê Tirk dide. Heval û hogirên xwe yê ku demek bi hev ra rêwîtiya siyasî kirine û bi hev ra xebitîne, wan yekoyek û dorbidor di bin erdê ra dike.

Bedirxan Epozdemir jî di vê pirtûka xwe da qala kar û xebatên xwe yê siyasî, ku pîranîya wan bi Burkay ra kirine, dike û tawanbarîyên wî dibersivîne. Sedem vê yekê ye, ku pirtûk weke navê xwe ji bîranînên Kek Bedirxan bêtir, ji bo sererastkirina bûyerên ku di bîranînên Burkay da çeporast cîh digrin, têbinîyeke ji bo dîrokê ye.

Ji bo vê yekê di vê pirtûkê da gelek belgenome û çend nivîsên kesên ku bi Burkay ra rêwîtiya siyasî kirine û dû ra ji hev qetîyane jî cîh digrin. Xwedîyê wan nivîsan jî Faruk Aras, Kazim Budak û Îhsan Aksoy in, ku wan ji tawanbarîyên Burkay qasî hevaltiya xwe ya bi wî ra para xwe girtine.

Bi xwendina pirtûkê ra, hinek bîranînên min jî di ber çavên min ra derbas bûn, ku ji wan yek bi mijara vê pirtûkê va jî girêdayî ye û dixwazim bi kurtayî qala wê bikim.

Sal 2000, demsal payîz bû.

Ez û çend heval li bajarê Darmstadê, li restauranta Îhsan Aksoy, li Araratê rûniştibûn.

Mijar weke naveroka vê pirtûkê bîranînên Burkay bû.

Rikberî û jihevduketina rêvebir û serokên partîyan, rewşa kesên ku rûbirû tawanbarîyên Burkay bibûn û hwd...

Hevalek nêrînên xwe bi minakek xemiland û got; „Ew kesên ku ji PSKê qetîyane îro werin ba hev, hêzeke du-sê qat ji PSK bihêztir derdikeve pêş. Çima ew nayên ba hev û partiyeke nû danamezrînin?“

Çavê herkesî li Kek Îhsan û li ser min bû, jiber ku di nav kesên li wir da, em herdu tenê di nav refên PSKê da xebitîbûn.

Kek Îhsan kesê ku herî ewil ji PSKê qetîyayî, ez jî di wê demê da yê herî dawîyê bûm.

Hê Îhsan tişt negotibû, min hewl da xwe û wek bersiva hevalê ku pirs li me kiribû, got; „Ji Îhsan Aksoy heta ez, kêsen ku ji PSKê qetîyane, sedema dîrketina hemûyan kême zêde wek hev e. Lêbelê em bixwazîn ji nikarin werin ba hev. Jiber ku rûyê me nagre. Dema ku Îhsan qetîya, yê mayîn Îhsan di bin erdê ra kirin, rûyê xwe jê gûhartin û silavên xwe jî lê birîn. Ev yek dorbidor hat serê me hemûyan.

Tu kesek li sedemên kesê veqetîyayî negerîya, hemûyan bi çav û gotinên Burkay li pirsgerîkê mêze kirin û Burkay rast û mezin, yê çûyî jî şaş û piçûk dîtin. Hevalên ku bi salan bi hev ra hevaltiyeke ji dil û xebateke hevpar kiribûn, di şev û reojekê da ji hev ra bûn neyar. Ne tenê hevaltî û xebata wan a hevpar, bîr û bawerîyên wan ên hevpar jî ser û binê hev bûn.

Loma sedema veqetîyayîbûna hemûyan Burkay ba û di nêrînên kesên veqetîyayî da hevparîyek bîngêhîn heba jî, ew nedikaribûn li rûyê hev binêrin û bi hev ra dest bi karekî hevpar bikin. Îro jî sedem wê yekê nayên ba hev û loma bixwazîn ji nikarin bi hevra karekî hevpar bikin...”

Hêvalê ku pirs li me hemûyan kiribû pîrsa xwe şûnda girt, Îhsan Aksoy û hevalên din jî gotinên min pejirandin û mijar jî guherî.

Burkay jî di bîranînên xwe da tu cudahiyeke nake navebra hevalên xwe yê kevn. Îhsan Aksoyê ku herî ewil veqetîyaye jî, yê dîr jî bi heman sedeman piçûk dixîne û di bin erdê ra dike.

Ew kesên ku bersiva Burkay dane, ew jî di derbarê hest û helwesta wî da heman tiştan dibêjin, ku gotinên wan jî sedî sed rast in. Lêbelê ji hev dîr in û bi pişatî rastî hev werin jî, ji bo ku neyên rûyê hev, carcaran rêya xwe jî ji hev diguherînin. Jiber ku piştî gotinên ku ji bo xatirê Burkay jî hev ra gotine, rûyê wan nagre li çavê hev jî mêze bikin...

Piştî vê bîranînê, ez dixwazim di derbarê pirtûkê da hinek rexneyên xwe jî bînim ziman.

Di warê estetîk û teknîkî da hinek kêmasî hene, ku Lokman Polat jî di nîrxandina xwe da qal kiribû. Kêmasîyên di berga û rûpelsazîyê da cîh digrin, kêmasîya nivîskar nînin, ku ew nîşaneyên rewşa weşangerîya Kurdî ne.

Weşangerîya me jî wek sîyaseta me tewşo mewşo bi rê va diçe. Jiber ku weşangerî beşeke xeternak e, sermîyan û pisporî dixwaze.

Kesên ku xwedî sermîyan û pispor jî karên xeternak dûr disekinin, weşangerîya bê sermîyan û ji pisporîyê dûr ji bê kêmasî nameşe.

Lêbelê ji bo min kêmasîya herî mezin, bêguman zimanê pirtûkê ye.

Ez Kek Bedirxan ji nêzîk va nas dikim, ku ew qasî kurdperwerîya xwe ewqas jî zimanperwer û kurdîzan e. Jixwe di pirtûkê da jî qala xebata xwe ya di derbarê ziman da kirîye, dike, ku bêguman ew kara û xebat hêjayî pesinandinê ye. Heta Burkay jî di derbarê zimanzanîna wî da pesnê wî nede jî, heqê wî teslîm dike.

Lê dîsa jî Kek Bedirxan têbînîya ku xwestîye di kurahîya dîrokê da çik bike, şûrê xwe bi Tirkî li ba kirîye û anîye cîh...

Hergav bala min dikişîne, ku bila biborin di vî warî da Kek Bedirxan tenê jî nîne. Gelek siyasetmedar û rerwşenbîrên hemsal û ji nîfşên wî jî heman tiştê dikin, ku ji bo wê yekê jî du sedeman nîşan didin.

Ji wan yek dibêjin; „em bi tirkî dinivîsin, jiber ku Kurd bi piranî nikarin Kurdî bixwînin.“

Ya duyem jî dîsa dibêjin; „em bi Tirkî dinivîsînin, ku dixwazin bila Tirk jî dengê me bibihîzin û me fam bikin...“...

Herdu sedem her çiqas maqûl xûya bikin jî, gor raya min di encamê da cîhê xwe nagrin. Jiber ku tu tîrkek pirtûka kurdek, bi Tirkî jî hatibe nivîsandin, nagre destê xwe û naxwîne. Ger ku hinek ji bo xatirê hevaltî ya jî dostanîyê bigrin û bixwînin jî ne xwediyê pirtûkê fam dikin ne jî di bin tesîra nêrînên wî/wê da dimînin...

Ya duyem jî, Kurd jî xwendinê hez nakin û jî pirtûkan jî dûr disekinin. Lê firsendê bibînin, heta ku zimanê wan bigere, bê navber diaxifin...

Loma Kurd ne tenê pirtûkên bi Kurdî yên bi Tirkî jî zêde naxwînin.

Heger mebest dîroka me û têbînîya jî bo sererastkirina bûyerên ku di dîroka me da bi çewtî cîh girtine be, divê zimanê têbînîyên me jî bi zimanê me be...

Jiber ku dîrok hişê neteweyî yê hevbeş, berdevkê wê jî zimanê netewî ye.

22.12.2022

„Lepên Tarî...”

Xwendin û nivîsandin bi tena serê xwe karên pîroz in.

Her çiqas bi xwendina zêde ra ronîya çavên merîya kêr bibê jî, nêrîna merîya fireh, rêya merîya jî ronî dibe.

Nivîskar jî bi xwendinê ra rêya xwe, bi nivîsandinê jî rêya li ber xwendevanên xwe ronî dike.

Ger ku nivîs bîranîn be û jî bûyer û serpêhatîyên jîyayî pêk hatibe, bi xwendin û nivîsandina wan tecrûbeyên merîya jî zêde û dewlemend dibe.

Bîranîn bi nivîsandina xwe binetarên wêjeyî, bi naveroka xwe jî belge-nameyên civakî û dîrokî ne.

Nivîsandina bîranînan di wêjeya Rojava da xwedî cihekî girîng û dewlemend e. Her çiqas Anabasis a Ksenophon wek mînakê yekemîn were qebûlkirî jî, nivîsandina bîranînan di sedsala 17an da û li Rojava dest pê kirîye.

Ji dema Ronensansê pê va gelek nivîskar, rewşenbîr û siyasetvanên rojavayî bîranînên xwe nivîsandine. Îro jî di sa herî zêde rojavayî bîranînên xwe dinivîsin û weke bav û kalên xwe, serpêhatî û tecrûbeyên xwe bi hunera ziman dixemilînin û jî nîşan nê ra wek mireteke mayînde dihêlin.

Jiber ku bîranîn her çiqas jî serpêhatîyên şexsî pêk werin jî, ew bi bûyerên civakî ra girêdayî ne û parçeyek jî dîroka civaka wê demê ne. Xwedîyê bîranînan jî, bi tecrûbeyê çavdêrîyên xwe, bi awayekê rola xwe ya ku di dîroka civaka xwe da listîye, dinivîsin.

Mixabin wek hemû xalên jîyanê, di xalên çand û huner da, bi taybetî nivîsandina bîranînan da jî civakên rojhilatî li paş û peya ne.

Leheng û rêvebir, ronakbîr û rewşenbîrên civakê jî bîranînên xwe neni-vîsîne û ew bi xwe ra birine gorê.

Di warê xwendin û nivîsandinê da rewşa kurdan ji civakên rojhilatî jî xirabtir e. Kurd îro jî, ji xwendin û nivîsandinê hez nakin û ji herdu karên pîroz jî dûr disekin. Lêbelê kurd ji axaftinê hez dikin û zêde ji diaxifin, bê pîvan û bê westan...

Bêguman ev taybetmendîya kurdan jî bêsedem nîne, heta sedemên wê jî ne yek e û zêde ne. Ji wan sedeman yên herî girîng, ez bawer im yek bindestîya civakê be yek jî qedexebûna zimanê kurdî ye.

Loma wêje ya devkî di gundan da û bi rêya dengbêj û çîrokvanan va pêşda çûye, heta roja îro hatîye û hê jî dewlemend e.

Lêbelê wêjeya nivîskî ya ku warê wê bajar in, bi rêya pişafînê pêşî lê hatîye girtinê û ew jî kêm û qels e.

Ronakbîr û siyasetvanên kurdên ku ji xwendin û nivîsandinê dûr disekin, dema ku bi heval û hogirên xwe ra tên ba hev, bîranîn û serpehatiyên xwe yên vik û vala jî dixemilînin, mîna çîrokbêjek xwedî huner, li hev zêde û bi hev ra parve dikin. Heta ne yek carê, bi caran û bi heman peyv û hevokan va bîranînên xwe dubare û sêbare dikin, ku dîsa jî ne gotarvan diwestin, ne jî guhdarvan eciz dibin.

Loma wêje ya kurdî ya nivîskî qels û feqîr, beşa bîranînan jî bêtir qels û feqîr e. Di nav kurdên bakûrî da kesên ku bîranînên xwe nivîsandine, ew jî bi gelemperî siyasetvan in û zimanê bîranînên wan jî bi tirkî ye. Jixwe ew jî di bîranînên xwe da tenê bi rewşa xwe ya siyasî û bi bûyerên xwe yên şexsî va mijûlin. Xwe wek dêw ên heftserî dihesibînin û tenê qala xwe dikin.

Di bîranînên xwe da jî di ser pozê xwe ra ne kesî ne jî bûyerên ku ji derveyî wan qewimîne, dibînin. Loma bîranînên wan feqîr û yekalî, xwendina wan jî mîna nanê tisî bê tahm û bêwate ye. Qasî ku ez dizanim, di 40-50 salên dawîyê da Cegerxwîn û Osman Sebrî bîranînên xwe bi kurdî nivîsîne, ku ew jî şair û nivîskarên ji binxetê ne.

„Jînenîgarî“ya Cegerxwîn û „Bîranînên“ Osman Sebrî, di vê beşa wêjeyî da minakên herî balkêş û serkeftî ne.

Ji kurdên bakûrî yê ku bîranînên xwe bi kurdî nivîsîne, ji wan yek Kazim Budak yek jî xwedîyê vê pirtûkê Mehmet Ozalp e.

Min bîranînên Kazim Budak, ku bi navê „Ji Heysivê heta Stockholmê“ hatiye weşandin, çend sal berê bi kêfxweşî xwendibû û sûd jê girtibû.

Bîranînên Mehmet Ozalp, „Lepên Tarî“ jî her çiqas salek berê hatibe weşandin jî, di demeke nêzik da gihîşte ber destê min.

Bi hatina pirtûkê ra min bi kêf û kelecane dest pê kir û xwend. Bêguman sedem hinek bûyerên ku di bîranînên wî da cih digrin, xemgîn bûm, ku ji wan yek jî kuştina Parêzerê Kurd Şewket Epözdemir e. Lê dîsa jî ji xwendina pirtûkê, bi taybetî ji vegotin û zimanê nivîskar ê zêlal kêfxweş bûm.

Mehmet Ozalp şaredarê kevn yê bajarokê Tetwanê ye.

Di hîlbijartina herêmî ya sala 1989an da, jibo pênc salan hatiye hîlbijartin. Mixabin, hê dawî li dema şaredariya wî nehatiye, sedem qewimandina bûyerên ku di vê pirtûkê da cih digrin, di destpêka sala 1994an da Tetwan terk kirîye û koçberî Ewropayê bûye.

Ozalp li Swedê bi cih bûye û bîranînên xwe yên ku ji dema şaredariya wî pêk tên, li wir nivîsiye û di bin navekî balkêş da berhev kirîye.

„Lepên Tarî...“

Lepên Tarî di nav weşanên Doz da, li Stenbolê hatiye weşandin.

Mehmet Ozalp di bîranînên xwe da ne tenê bûyerên ku di wê demê da qewimîne, rewşa cîvakî ya Tetwanê jî bi hûrgulî li berçavan radixîne û dîroka Tetwanê ya wê demê jî dinivîsîne.

Loma naveroka pirtûkê jî qasî navê wê balkêş e.

Lêpên Tarî...

Ev nav, ji navê pirtûkê bêtir wek pirsê ku li benda bersiva xwe sekinîbe, bala merîya dikişîne.

Gelo ew lep, lepên kî û kê ne?

Ev tatêla ku bi vê pirsê va dest pê dike, merîya digre û di nav rûpelên pirtûkê da digerrîne.

Bi qulubandina rûpelan va mirov bi xwedîyê bîranînan ra xwe di nav rêwîtiyeke dûr û dirêj da dibîne.

Ger derdikeve serê Çîyayê Sîpanê Xelatê, ger ji kaş û newalan ra dadikeve xarê û li pelavên Behra Wanê pêgermokê digerrîne.

Bi wê ger û pêgermokê va bersiva pirsê ku ji nave pirtûkê tê, nêzîk,
kelecana ji xwendinê jî zêde dibe.

Kelecana min jî zêde bû.

Jiber ku Tetwan jibo min jî bajarokeke nas û nêzîk, ew kesên ku di
pirtûkê da qala wan tên kirin, piraniya wan jî Tetwanê jî bêtir nas û
nêzîk in.

Ji xwendina Lepên Tarî min kêfeke bêpîvan girt, jiber ku birêz Mehmet
Ozalp, wek nivîskarekî serkeftî, bîranînên xwe bi kurdîyeke zelal û bi
vegotineke herikbar nivîsîye.

Hêvîdar im ev ked û xebata wî ya giranbûha, dê di civaka kurd da
ciheke mayînde bigre...

01.06.2022

20 Nameyên Keça Stalîn...

Navê pirtûka Swetlana Allilujewa, 20 Nameyên ji hevalekî ra ye.

Swetlana Allilujewa jî keça Stalîn e û ev pirtûka wê jî cara yekem di sala 1967an da hatiye weşanadin.

Çapa wê ya Almanî (20 Briefe an meinen Freund-20 Nameyên ji hevalekî ra) çend roj berê kete destê min û bi kelecana min dest pê kir û xwend.

Jiber ku pirtûkên bîyografîk û ji bîranînan pêk tên, bêtir bala min dikişînin.

Ev pirtûk jî bi çavdêrî û bîranînên keça wî va, bi awayekî kurtebîyografîya Stalîn e.

Heta roja îro min di derbarê Stalîn da bi sedan pirtûk û makale û helbest xwend, ku helbestên Cegerxwîn jî di nav da...

Cegerxwîn di helbesta xwe ya „Bijî Stalîn“ da, jî dûr va pesnê Lênîn û Stalîn dide û dibêje:

“Tîrêj dane me şefeqa ronak û şefeqa Lenin

Şewqa xwe da Kurd, bijî Stalin, bijî Stalin....,,

Ev hest û helwesta Cegerxwîn a ku wî di derbarê Stalîn'da nîşan daye, heta roja îro jî alî gelek kesan va hate nirxandin.

Lê çîroka nivîsandina vê helbestê jî heye, jî bo ku nivîs dirêj nebe, wê jî ji careke din ra dihêlim.

Ew kesên ku di derbarê Stalîn da pirtûk, makale ya jî helbest nivîsîne, jî wan hinek wek Cegerxwîn, jî dûr va û bi sedemeka ku xwîna wan li Stalîn keliyaye, rûniştine û pesnê wî dane. Ji bilî wan, piraniya çepkir û sosyalîstên li rû dinyayê, dîktatoriya Stalîn jî wek pênaseyeke pîroz dîtine û bi wî rengî nirxandine...

Muhafazakar û liberal, heta demokratên ji her miletî û ji her welatî jî, Stalîn wek dîktator dîtine û zilm û zordariya ku wî kirîye, rexne kirine.

Di bingeha nirxandin û rexneyên herdu alîyan da her çiqas rastîyek hebe jî, qasî wê rastîyê bingeheke yekalî jî cih digre.

Ev yek jî taybetîyek jî taybetîyên însan e.

Leheng û dildarên xwe difirîne...

Leheng û dildarên dijberê xwe jî devûrû li ser sergo dixîne...

Ew leheng û dildar gor demê û li weltên curbicur şah û qiral, rêvebir û serok, şêx û meşaiq, axa û beg in...

Şah û qral, rêvebir û serokên ku leheng û dildar nehesibîne, hebin, ew jî yên taxa jêrîn in.

Stalîn jî gor kesên taxa jor hê jî serokekî şoreşger û sosyalîst...

Gor kesên taxa jêrîn jî wek dîktator û kujer tê bibîranîn.

Lêbelê tu kes ne di zikê dixya xwe da, ne jî bi gotin û îlankirina „ez dîktator im” va dibe dîktator.

Mînakên dîrokî bi zelalî nişan didin, ku her dîktator jî alî dorhêla xwe va tê afirandin, dû ra dîsa bi alîkarî û piştgirîya wê dorhêlê va tê îlankirin...

Loma her dîktator berî ev pênaseya xwe, mêr e, jin e, dost û yar e...

Li welat û ji gelê xwe ra qasî ku dîktator be, ewqas jî bi dorhêla xwe ra heval û hogir, di mala xwe da jî dê û bav e, xwîşk û bira ye. Stalîn jî wusa ye.

Keça wî Swetlana Allilujewa jî di 20 nameyên xwe da, ne tenê qala dîktatoriya wî, ew bi jina xwe ra mêr hevalekî çawa, bi zarokên xwe ra bavekî çawa bûye, tarîf dike, jî nêzik va û bi bûyerên jîyayî...

Mirov di nameyan da, herdu rûyên Stalîn jî dibîne û wî bêtir baş nas dike.

Stalînê bavê zarokên xwe û dîktatorê welatê xwe...

Jiber ku mirov di nameyan da ne tenê rexne û pesandayîneke rasterast, hest û ramanê zarokeka ku di derbarê bav û dîktatorê welatê wê da cih digre, dibîne.

Nameya yekemîn jî dema mirina Stalîn va dest pê dike...

Swetlana Allilujeva di wê nameyê da, ji bilî wê rêvebir û giregirên Rûsyayê, parêzvanên bavê wê û karekerên malê çawa bi dengê bilind girîyane û şîna bavê wê kirine, bi hûngulî dinivîse.

Di nameyêke din da jî qala xwekuştina diya xwe dike, ku dema diya wê di oda xwe ya razanê da xwe dike, bavê wê Stalîn li mal û di odeyêke din da, hê di xewê da ye.

Karker û parêzvanên wî yên herî nêzik jî ji tirs û xofa Stalîn a ku di dilê wan da cih girtiye, newêrin Stalîn ji xewê hişyar bikin, ku jê ra bibêjin jina wî xwe kuştîye...

Swetlana Allilujeva di nameyên xwe yên din da jî dîsa bi bûyerên jîyayî û bi mînakên balkêş hest û helwesta bavê xwe dinirxîne...

Ew bi kîjan taybetmendîya xwe qels, bi kîjanî va bihêz bûye, dîsa bi mînak û bûyeran va li ber çavan radixîne, bi ziman û vegotîneke zelal, bi xem û xemgîniyeke hestîyar...

Salan berê min romana Anatoli Ribakov a ku bi nave “Zarokên Arbatê” hatibû weşandin jî bi kêf û kelecana xwendibû.

Ribakov jî bi hunera xwe ya wêjeyî, dîktatoriya Stalîn bi mînak û bûyerên dirokî hunandibû û di romana xwe da bi cih kiribû.

Mirov bi van text û vegotinên wêjeyî jî careke din dibîne, ku her şah û qîral, rêvebir û serok, şêx û meşaiq, axa û beg bi tena serê xwe nikare bibe dîktator...

Ew berê jî alî dorhêla xwe va wek dîktator tên afirandin, dû ra jî dîsa bi alîkarî û piştgirîya wan dibin bela serê gel û miletê xwe, ku ew dorhel jî di nav da...

19.09.2023

Welatê Aslikê: Kurdistan

Kurdistan welatê me ye.

Lêbelê herî zêde yê Aslikê ye, Aslika Qadir...

Jiber ku Kurdistan, bi dengê wê yê xweş û zelal va xemilî, bû stran, li çarnikalê Kurdistanê belav bû, di guhê hemû kurdan da olan da û hê jî dide...

Niha jî Kurdistan bi bîranînên Aslikê va xemiliye, bûye pirtûk û merîya di nav rûpelên xwe da digerîne...

Bîranîn, beşek ji edebîyatê ye.

Ji beşên edebîyatê yen din cudatir, bîranîn herwiha belgeyên dîrokî û civakî ne, ku ji serborîyên kesên ku nivîsîne, pêk tên.

Aslikê jî jîyana xwe, dîroka xwe ya şexsî nivîsiye, ew dîroka ku bi êş û jan, bi berebezîya xemgînî û bextewariyê va kemilî ye...

Jiber ku Aslik jin e...

Hunermend e...

Rewşenbîr û zana ye...

Ji zarokên xwe ra dê û bav...

Koçbera li ser rê û dirban e...

Bi gotina Wezîrê Eşo, yekemîn hunermenda jin a kurd a siyasî...

Bi gotina Kinyazê Îbrahim bilbila Kurdistanê...

Bi gotina Temûrê Xelîl, ew êdî nivîskareke kurd a serkeftî ye.

Loma bîranînên Aslikê herçiqas jî serborîyên wê yên şexsî pêk werin jî, ew di heman demê da parçeyek jî dîroka civaka wê ne. Ew di bîranînên xwe da qasî jîyana xwe, bi tecrûbe û çavdêriyên xwe va rewşa kurdên

Ermenîstanê ya berî û piştî hilweşandina Sovyetê jî bi hûngulî li berçavan radixîne.

Welatê me Kurdistan, welateke bindest û parçekirî ye.

Ziman qedexe, edebîyata nivîskî jî paşketî ma ye û qels e.

Loma hunermend û nivîskar, rewşenbîr û ronakbîrên kurd zêde bîranînên xwe nanivîsin.

Bi nas û dostên xwe ra, bi heval û hogirên xwe ra bêpîvan diaxifin, bi ken û henekên bêdawî qala bîranînên xwe jî dikin. Lêbelê ger ku ew neyên qeydkirin, bi demê ra difirin û wenda dibin.

Heta roja îro kurdên ku bîranînên xwe nivîsîne, ew jî bi piranî siyasêvan û li bakûr zimanTirk, li başûr, rojava û rojhilat jî zimanEreb û zimanEcem in.

Di bîranînên xwe da jî bi siyaseta xwe ya têkçûyî ra mijûl, qure û poz-bilind in. Tenê qala xwe dikin û pesnê xwe didin, ku mirov di bîranînên wan da heval û hogirên wan ên herî nêzik jî nabîne.

Herwiha kêmin jî, hinek mînakên baş û bi kurdi hatine nivîsandin jî hene, ku bîranînên Aslikê jî ji wan kêmbîranînan yek e û gor nêrîna min ya her serkeftî ye.

Çima ya herî serkeftî ye?

Jiber ku Aslik hunermend e, bîranînên xwe jî bi hunera xwe, bi kirin û kiryarên xwe va xemilandîye.

Ew mîna siyasêvanên kurd, di bîranînên xwe da pesnê xwe nade.

Jîyana wê li kû dest pê kirîye û çawa jîyaye, xewn û xeyalên xwe, êş û jana xwe, xemgînî û bextewariya xwe, wek rewşenbîr û hunermendeke kurd bi kî û kê ra, kar û xebateke çawa kirîye, zelal û vekirî nivîsîye...

Xwe sinordar nekirîye, wê guh daye denge dile xwe û çîroka xwe vegotîye.

Jîyana wê ya ku li Elegezê dest pê kirîye, piştî Êrivan, Moskova û Afagîstanê îro li Ewropayê berdewam dike.

Ew wek hunermendeke kurd a hezkirî li çarnikalê Kurdistanê gerîyaye, bi hunermend û nivîskar, rewşenbîr û siyasêvanên kurd ra hevdiîn, kar û xebat kirîye.

Ji taybetmendîya bîranînan Aslikê yek jî ew e, ku wê bîranînên xwe bixwe

nivîsiye, ku qasî ku ez dizanim di vî warî da jî ew hunermenda jin a kurd a yekemîn e.

Wek denge wê, ziman û vegotina wê jî mîna ava çemê Erez zelal û herikbar e.

Naveroka bîranînên wê têr û tijî...

Pevgirêdana bîranînan jî bi tewna romaneke serkeftî hatîye hunandîn, ku min tahma zimanê xwe yê şîrîn û dewlemend jê girt.

Loma min „Welatê me Kurdistan e“ hêdî hêdî xwend û xwendina min nezîkî mehekî kudand, jiber ku min nedixwest dawî lê were...

Di her danê êvarê da, di destê min da bîranînên Aslîkê, di guhê min da jî dengê û awazên hunermendên Radyoya Êrîvanê...

Li alîkî bîranînên Aslîkê xwend, li alîkî jî li stranên ew hunermendên ku navê wan yekoyek û bi rûmet di nav bîranînên wê da cîh digrin, guhdarî kir.

Bi vegotina Aslîkê ra her roj çûm dema zarokatîya xwe, bi deng û stranên hunermendan ra jî di nav xewn û xeyalên xwe da gerîyam.

Bûm hevparê bîranînan û çûm dema zarokatîya xwe. Di kesayetîya pîrika wê ya Gewrê da, min pîrika xwe ya Gozê dît. Zilm û zordariya ku pîrika wê ya Gewrê li wîyalî Erez dîtîye û lê şahidî kirîye, pîrika min Gozê jî di heman demê da li wîyalî Erez dîtibû, ku bi girîyên xwe yên veşartî dinalîya û ji min ra vedigot...

Herwiha di nav bîranînan da rastî dewlemendîya peyv û qalibên kurdî yên xas hatim, ew gotin û qalibên ku ziman dixemilînin û bedew dikin...

Aslîk di nav bîranînên xwe da qala Henrik Hovhannisyan dike, ku wî gotîye, „ziman tenê di zarê mirovên zana da bedew dibe..."

Ez jî dewlemendî û bedewîya kurdî, bêtir di nivîs û pirtûkên kurdên Ermenîstanê da dibînim. Jiber ku ew bi zimanê bav û kalên xwe mezin bûne. Ew qalibên ziman, ku mirov tenê ji dê û bavê xwe hîn dibe û werdigre, di nivîsên wan da bi dewlemendî cîh digrin û di zar û zimanê wan da bedew dibin.

Sedem vê yekê ye ku dema ez pirtûkek ji pirtûkên kurdên Ermenîstanê bixwînim, li kêleka min pênûs û defter kêr nabe. Ew peyv û qalibên kurdî yên xas yekoyek dinivîsim û di arşîva xwe da bi cîh dikim.

Di xwendina bîranînên Aslîkê da jî min wisa kir, ku ji wan peyv û qaliban çend mînak:

Dilê min di destê min da bû...

Reva jinê edetê dinê...

Jina wî poz pê nake...

Nigê xwe kiribû soleke teng...

Çavên min li derî qerimî...

Dinya li ser qûna wî meşk bû...

Çi bêjim kevirê min giran e...

Zebeş dide bin çengên wî...

Pişika wî diwerimîne...

Ez bibûm darik û derzî û hwd...

Qasî ev qalibên xas, gelek anekdotên watedar jî di bîranînên Aslîkê da cîh digrin. Ez ji wan anekdotan qala yekî nekim, nabe û ew dê di dilê min da bimîne..

Rojbûyîna hevaleka Aslîkê ye. Keçîka Ermenî û bavê xwe pêşwazî li mêvanên xwe dikin. Keçîk têdigihîje, ku zincîrka (fermûar) şalê bavê wê vekirî ye. Li bavê xwe vedigere û bi dengeke nizm jê ra dibêje, ku ew fermûara xwe berjor bikişîne û pêşîya şalê xwe bigre.

Bi gotinên wê ra bav di ber xwe da hinekî dikene, dû ra bi rûken li keça xwe dinihêre û bi dengekî jixwe bawer jê ra wiha dibêje: Qîza min di mala ku tê da mirî hebe, derê wê malê her tim vekirî ye û li ser piştê ye...

Jibo ku ez di vê nivîsa xwe da qal bikim, min gelek têbinî qeyd kiribû. Ger ku ez qala wan hemûyan bikim, nivîs dirêj, ji xendevanan ra jî êdî tiştek namîne.

Wek gotina dawîyê, ez gotina Têmûrê Xelîl, ku di pêşgotina pirtûkê da gotîye, careke din dubare dikim û dibêjim; Aslîk ne tenê hunermend, ew bi vê berhemê va êdî nivîskereke kurd a serkeftîye jî...

Kesên ku dixwazin tahma zimanê dayîka xwe ji nivîskariya wê bigrin, fêrme, „Welatê me Kurdistan e“ û li benda we ye...

Çend gotin jî ji bo Avestayê

Jîyan û bîranînên Aslika Qadir, „Welatê me Kurdistan e“ li Stenbolê û di nav weşanên Avestayê da hatîye weşandin.

Berî çapê min ji Aslik Xanimê ra pêşnîyar kiribû, ku ew bîranînên xwe ji Avestayê ra bişîne.

Jiber ku Avesta karê xwe baş û bi helwesteke pisporî dike, ev yek jî di nav weşangerîya kurdî da zêd nayê dîtin.

Piştî çapê dema ku pirtûk gihîşte destê min, ez jî qasî Aslikxanê kêfxweşbûm, ku çapa pirtûkê jî qasî nav û naveroka wê baş û xweş bûye...

30.06.2023

„Kurd – Merivên Royê“

Miletê bindest berê zimanê xwe, dû ra çand û hunera xwe, bi demê ra jî hemû kevneşopîyên xwe wenda dike.

Bi dûrketina jî zimanê xwe va, hiş û hişmendîya xwe...

Bi dûrketina jî çand û hunera xwe va, netewîtiya xwe...

Bi guhartina cil û bergên xwe va jî kesayetîya xwe wenda dike.

Îro Kurd ne tenê di warê ziman da, di her xalên jîyanê da jî hatine pişaftin û dipişifin...

Wek mînak:

Ji vir 40-50 sal berê jinên Kurd, bi kofî û kitanên xwe...

Qîzên xama, bi bisk û gulîyên xwe...

Xortên ezeb jî bi tuncik û temelîyên xwe dihatin nasîn.

Di şahîyan da jin û mêr, keç û xort diketin destên hev û wek cergûbez govend digerandin.

Di milê hev da dilîstin, bi hev ra distiran û dikenîyan.

Her qîzek xama xwedî kofîyeke taybet bû. Qîza ku biba bûk û kofîya wê tunebûya, ew bûkanî jî mala bavê wê dernedixistin.

Bisk û gulî, kofî û kitan xemla qîz û jinan bû.

Derdora kofîyê bi hebên zêran, morî û mircanan dihat xemilandin.

Kofîyên li serê qîzên xama, bi rengînîya xwe, wek nîşaneyê xeml û bedewiyê bal dikişand.

Piştî zewacê jî kitanek sipî davêtin ser kofîya xwe û heta roja mirinê ew jî serê xwe dernedixistin. Mixabin ev kevneşopî jî wenda bû ye. Îro ne ku li bajaran li gundan jî jineke Kurd a bi kofî û kitan nayê dîtin.

Jixwe bisk û gulîyên keç û bûkan hebin jî, êdî tu kes wan nabîne...

Hûnê bibêjin, „ji me kêma kofi û kitan, bisk û gulî bûn, te jî di destpêka vê salê da ew kirîye mijar û danîye ber me...”

Rast e, xwezila kêmasîyên me tenê ev bana.

Lêbelê her kêmasîyek bi yeka din va girêdayî ye.

Bingeh ziman e, dema ku ziman ber bi mirinê biçe, tiştên bi xwe va giradayî jî bi xwe ra dibe û dikuje.

Di dawîya salê da pirtûka Torinê Torinî, „Kurd – Merivên Royê (Bîr-bawerî, rê-rizm, xemil-timtêl, sîmvolên bi siruşt Kurdistanê morkirî)” jî min ra wek diyarî hatibû.

Pirtûkeka zirav, lê bi navê xwe yê kin û dirêj bala merîya dikişîne.

Wek jî navê pirtûkê jî tê famkirin, ku nivîskar di pirtûkê da qala bîr û bawerî, rê û rizm, xemil û timtêlên kurdan yê bere dike. Wan hemûyan wek sembolên bi siruşt Kurdistanê va morkirî bi nav dike û di derbarê wan da agahîyên ku hatine jibîrkirin û îro êdî nayên zanîn, bi berfirehî dide.

Ew sembolên bi siruşt Kurdistanê morkirî gelo çi ne û jî alî kurdan va çiqas tên zanîn, ya jî di jîyana kurdan ya îroyîn da çiqas cîh digrin?

Divê berî her tiştî mirov jî wan sembolan hayîdar be û dû ra jî wan bi rewşa îroyîn va muqayese bike.

Di pirtûkê da tiştên ku bala min kişandin, jî wan yek jî bisk û gulîyên jinan û wate ya hêjmara wan e.

Nivîskarê pirtûkê Torinê Torinî, di derbarê bisk û gulîyên jinan da wuha dinivîsîne; „Anegorî bîr û bawerîyên kurdên Roparêz, Royê merivên Kurd jî nûr û tirêncên xwe çêkirîyê. Xwezma gulîyên jinê wek ta û gulîyên dara, ku ber dide, şax vedidin û dibin usa jî sembolên bext û mirazên xweyî û xudanên wê yê jî tirêncên Royê çêbûyî. Hêjmara gulîyên jinê weke hêjmara bav, ap, bira û kurapan bû ye. Sembola mêrê jinê jî biskên jinê bû ne. Li herêma Serhedê jinan gulîyên sembola xweyî û xudanan li ser meytên wan a, lê bisk li ser meytê mêrê xwe kem kirine û pêra spartine. Heger mêrê jinê kurapê wê bû ye, jinê xêncî biskê xwe gulîkê xwe jî li ser birî ye.”

Gor agahîya ku nivîskar dide, bisk û gulî ne tenê xemla qîz û jinê, her yek xwedî sembolek bû ne.

Bi derbasbûna ser ola Îslamê va, di nav kurdên misilman da ev kevnosopî hatibe guhartinê jî, wek zargotineke çandî, îro jî di şîn û kilamên li ser mêrxasîyê da cih digrin.

Torinê Torinî ev zargotina wek, „dayê dêranê, porkirê, gulibirê“ ku di kilamên li ser mêranî û mêrxasîyê tên gotin da derbas dibin, bingeha wan bi vê yekê va girê dide...

Bêguman Torinê Torinî di pirtûka xwe da qala gelek sembolên din jî dike, sembolên olî, dîrokî û hwd...

Wek mînak:

Sûmeran nivîsîne, ku welatê wan ê pîroz Kurdistana kevnar e. Mêr û Xwedawend li ser çiyayên Kurdistanê li cem hev berav bûne, cema xwe pêk anîne. Şaristanî jî ji wir ber bi der pêl daye û belav bû ye...

Bêguman tê da şik hebe jî, mirov bi agahîyên ji dîroka xwe ya kevnar dilşad dibe.

Lêbelê rûyê xwe ji dîrokê vegeirîne û li roja îro temaşe bike, rewşa ku tê da ye, bi çavê serê xwe bibîne, wê gavê jî xemgîn dibe û xwe histuxwar dihesibîne.

Jiber ku welatê qedîm hê bindest...

Ziman li ber mirinê...

Kevnosopî jî ji binî va wenda bûne.

12.01.2021

Kurd û Gul

Bi navê xwe yê orjînal “Kürtler ve Güller I-II” pirtûka Mucahid Ozden Hun e.

Pirtûk ji sê cildan pêk tê.

Du cildên wê hatine weşandin, cîlda sêyê jî di rê da ye.

Mucahid Özden Hun di destpêka herdu cildên weşandi da û bi sê zimanan -tirkî, kurdî û îngilîzî- wiha dibêje:

Ev pirtûk;

Bi tene ji bo Aşitîyê

Her dem ji bo Aşitîyê

Û bi inyard ji bo Aşitîyê hatîye dîyarkirin.

Her çiqas pirtûk bi sê zimanan dest pê bike û tê da hinek nivîs û helbestên bi kurdî cih bigrin jî, zimanê wê bi gelemperî tirkî ye.

Lê dîsa jî ez nêrînên xwe yên di derbarê pirtûkê da bi kurdi dinivîsim û tînim ziman.

Mucahid Ozden Hun kurdekî zana û jêhatî, nivîskarekî baş û berhemdar e.

Di pêşgotina xwe da bi hevoka “Ronakbîrên min!..” dest pê dike û dibêje; “ew di heps û zindanan da, di sirgûnê da li herî pêş in.

Carinan cezayê ku li wan hatîye birin, bi bêdengîyek qebûl dikin, carinan jî serî ra dikin û heqê serîhildanê didin. Weke gulên rengîn û tahmdar, bihîstiyar û qurfbar in...

(...) Di nav baxçê gulên da ba tê. Gulên ku ji her reng û her tahm û nexşan pêk tên, li ba dibin û disekin. Dibêjin ku dê gulên nû li baxçeyê Kurdistanê bîn çandin...

(...) Ev lokomotiv gav bi gav diçe... Rê asê û xil û xwar e... Dem dema bêhevîtiyê nîne! Ser çavan hatî, baxçê gulan!”

Gelo çima kurd û gul?

Nivîskar di pêşgotina xwe da bersiva vê pirsê jî dide û dû ra dibêje; çar armancên vê pirtûkê hene, ku ew jî:

- 1- Di nav nîfşên kurd da avakirina pireya ku hatîye hilweşandin e.
- 2- Ev pirtûk bibe alîkar ku kurd ji alî kurdan va...
- 3- Dîsa bibe alîkar kurd ji alî tirkên va bînin naskirin.
- 4- Tevkar be ku kurd ji sîyaseteke hestîyarî dûr bikevin û bi hişmendî tevbigerin...

Pişî pêşgotinê pirtûk bi helbesta Rizalîyê Reşîd a bi navê Kurdistan, dest pê dike, ku du çarînên wê wiha ne:

Hezar hezar sal û zeman

Hat dabirîn, çîyayên me man

Hezar hezar av û tofan

Kişyan û çûn, kanîyên me man

(...)

Hezar hezar sed sal herin

Merd û namerd ser bigerin

Tê bernadin em jî destan

Welatê me xweş Kurdistan.

Dû ra Mucahit Ozden Hun kûr û dirêj qala proje û amadekirina xwe ya jî bo vê pirtûkê dike, ku ez jî ji destpêka vê xebatê hayîdar bûm. Ez bawer im, di roja dawîya sala 2018an bû. Birêz Mucahit Ozden Hun bibû mêvanê min û jî bo amadekirina vê xebatê bi min ra jî axivî bû. Lêbelê çawa ku di pirtûkê da jî tê qalkirin, di navberê ra demeke dirêj derbas bû. Dema ku cilda yekem hate weşandin û ez jê hayîdar bûm, bi rastî ez fikrim ku birêz Mucahîd li ser gul û sosinên ku li Kurdistanê hêşîn dibin, kar û xebat kirîye û xebata xwe jî weke pirtûk weşandiye.

Bi weşana cilda duyem ra, min li ser medya civakî pîrozbahî lê kir, birêz Mucahîd jî bersiva min da û di bersivê da jî got, ku ez jî di nav wê cildê da me. Bi vî rengî ez têgihîştim, ku ew gulên ku di pirtûka Mucahit

Ozden Hun da cîh digrin, ne gulên xwezayî, kurdên ku ew wan wek gul dibine, bixwe ne.

Cilda yekemîn bi jînenîgarîya Îhsan Aksoy va dest pê dike û bi Arşîva Rojhilat a Taybet I û II, Qazî Muhamed û Abdurrahman Qasimlo va diqede.

Cilda yekem, ji 1306 rûpelan pêk tê û 43 ronakbîr û rewşenbîrên ku Mucahit Ozden Hun wan wek gulên kurd bi nav dike, bi jînenîgarîya xwe û bi kar û xebatên xwe yên ku ji bo azadî û serxwebûna kurd û Kurdistanê kirine, cîh digrin, ku ew jî ev in:

1-Îhsan Aksoy, 2-Kerim Aksoy, 3-Rohat Alakom, 4-Mahmut Alınak, 5-Kovan Amedi, 6-Ahmet Aras, 7-Nizamettin Arıç, 8-Mustafa Arslan, 9-Mehmet Ali Arslan, 10-Şükrü Barlık, 11-İsmail Beşikçi, 12-Eyüp Bischof, 13-Joyce Blau, 14-Mehmet Emin Bozarslan, 15-Cüneyt Bozkurt, 16-Sertaç Bucak, 17-Kemal Burkay, 18-Adil Çalbay, 19-Veysi Çamlıbel, 20-Mehmet Çetinkaya, 21-Dengir Mir Mehmet Fırat, 22-Ümit Fırat, 23-İbrahim Güçlü, 24-Mücahid Özden Hun, 25-Cihan İpek, 26-Aziz Kaya, 27-Cevat Korkmaz, 28-Feride Laçın, 29-Recep Maraşlı, 30-Ahmet Melik, 31-Kendal Nezan, 32-Sırrı Özbek, 33-Ahmet Özer, 34-Haluk Öztürk, 35-Fevzi Paydaş, 36-Sait Pektaş, 37-Ayhan Sakçak, 38-Hüseyin Saraçoğlu, 39-Enver Sezgin, 40-Kazım Taş, 41-Aydın Uçar, 42-Sedat Yurtdaş, 43-Mehdi Zana.

Cilda duyem jî dîsa mîna ya yekem, bi 1312 rûpelên xwe va qalind û tê da 37 kurdên bakurî û gelek kurdên Sovyetê cîh digrin, ku ji wan yek jî ez im.

Birêz Mucahit Ozden Hun di vê cildê da, (rûpel: 991-1036) cîh daye kar û xebatên min û nivîsek min a di malpera <https://navkurd.net/> ê da hatiye weşandin, ku ez ji cenabê wî ra spasdar im.

Kurdên ku di vê cildê da cîh digrin, ew jî ev in:

1-Süheyla Aksoy, 2-Mehmet Emin Adıyaman, 3-Mehmet Ali Agatay, 4-Mehmet Ali Akagündüz, 5-Ömer Akat, 6-Dicle Anter, 7-Faruk Aras, 8-Ruşen Arslan, 9-Süleyman Atay, 10-Yüksel Aşar, 11-Bayram Ayaz, 12-Osman Aydın, 13-Mehmet Bayrak, 14-Hamit Bozarslan, 15-Faik Bulut, 16-Bahattin Cengiz, 17-Çeto Çamlıbel, 18-Derviş Ferho, 19-Kasım Fırat, 20-Mehmet Gültekin, 21-İbrahim Gürbüz, 22-Necdet

Îpekyüz, 23-Ahmet Kan-İbrahim GÜÇLÜ, 24-Mehmet Kaya, 25-Naim Kılıç, 26-Musa Konyar, 27-Orhan Miroğlu, 28-İkram Oğuz, 29-Sıraç Oğuz, 30-Nihat Öner, 31-Mustafa Özer, 32-Feridun Süphan-dağ, 33-Haluk Tan, 34-Mesut Tek, 35-Celal Temel, 36-Temûrê Xelîl, 37-Mehmet Yardımcı, 38-Kurdên Sovyetê.

Berga herdu cildan jî wekhev û li berga pêşîyê Çîyayê Agirî û çend gulên sor bi zindîbûna xwe cîh digrin.

Li ser berga paşîyê jî Mucahit Ozden Hun di derbarê xebata xwe da çend hevokên xweş û watedar nivîsîye, ku bi kurtayî wiha dibêje:

We qet baxçeyê gulan dîtî ye?

Pelên wan ên sor û zer û spî di nav hev ra derbas dibin û bi rengînîya xwe aramîyê didin ruhê mirovan.

Merîya dawetî dinyayeke din dikin, ku li wir her gulek bi bêhn û reng û tevînek cuda cîh digre...

Erdnîgarîya Kurdistanê jî mîna baxçeyê gulan û bûka baranê rengîn e. Bedewîyên navxweyî jî dil û mîna nexşên xalîçeyek bi hev ra girêdayî ne. (...)

(...) Di vê pirtûkê da hûn dê hevpeyvînên ku min bi 140 ronakbîrên kurdên kurmanc, zaza û êzdî ra kirine, bibinin. Ew kurdên ku li çarnîkalên dinyayê belav bûne...

Di vegotîna her yekê da reng û nêrînek cuda he ye. Di warê sîyasî û civakî da qutbûnek tê dîtin, ku sedem wê yeke her nîş tekoşîna xwe ya sîyasî jî nû va dest pê kirîye.

Ya ku jî berê da û bi zor û zehmetî hatîye kirin, jî bîr va çûye û di nav pelên dîrokê da wenda bûye.

(...) Ez bi vê xebata xwe têgihîştîm, ku Axa Kurdistanê xwedî dîrokeke rewneqdar e, mîna ava Firat û Dicleyê, bê seknan diherike, mîna Araratê jî xwedî dileke mezin û bilind e, lêbelê di nav xwe da şikestî û belavbûyî ye...

“Kürtler ve Güller” bi naveroka xwe ya dewlemend, bi van gotinên xweş û watedar xemilîye û bi rastî jî bûye gulîstaneke rengîn.

Bi herdu cildên xwe yê weşandî û bi ya ku hê di rê da ye, “Kurd û Gul” ya jî bi navê wê yê orijînal “Kürtler ve Güller” xebateke giranbûha, çavkanîyeke baş û berfireh e.

Ji bo ked û xebata ku birêz Mucahîd Ozden Hun kirîye û hê jî dike, ez wî jî dîl û can pîroz dikim.

Lêbelê piştî vê pîrozbahîyê be jî, gotina ku di dile min da ma ye, ez wê neynim ziman û nebêjim jê xilas nabim.

Gulistana ku birêz Mucahîd me tê da digêrîne Kurdistan, gulên ku tê da cîh digrin jî kurd in...

Xwezila ziman jî kurdî ba...

05.01.2023

Jinên Kurd di Serdema Osmanî de

Özgür Gelecek, bi navê xwe yê Kurdî Pêşeroja Azad, dibistan, Mehmet Bayrak jî damezranêre wê û mamosteyeke berhemdar e.

Mehmet Bayrak dîroknas, lêkolîner û nivîskar e...

Kurd e, Elewî ye, ronakbîr û zana ye.

Bi kar û xebateke bênavber û bêwestan, li çavkanîyan, di nav çakanîyan da jî li belgeyên veşartî digere. Ew belgeyên ku ji alî dewletên dagirker va hatine veşartin. Belgeyên ku bi dest dixîne, bi tewneke zanyarî wan berhev dike, bi nêrîn û şiroveyên xwe dixemilîne, dike pirtûk û di nav weşanên ÖzGe da diweşîne.

Mehmet Bayrak di warê Kurdolojîyê da lêkolînerekî herî jêhatî û berhemdar e. Jiber ku di her salê da berhemeke nû amade dike û wek pirtûkeke qalind û arşîveke mayînde, diweşîne.

Ev pirtûka wî ya bi navê, „Osmanlı’da Kürt Kadını – Jinên Kurd Di Serdema Osmanî de“ xebatek ji xebatên wî yê taybet û dîrokî ye.

Mehekî berê gihîşte destê min û niha jî di pirtûkxaneyê min da cîhê xwe yê taybet û mayînde girtiye.

Kingê ku mêvanek min were û li pirtûkxaneyê min binêre, pirtûkan Mehmet Bayrak bala wan dikişîne. Jiber ku refekî ji refên pirtûkxaneyê min jî pirtûkên wî pêk tê, ku her yek jî ji 500 rûpelî kêmîr nînin û hemû jî bi formên mezin hatine çapkirin.

Sedem vê yeke, dema ku mêvanên min pirtûkên wî yê qalind û mezin dibînin, hinekî xwe şûnda dikişînin û bi matmayî dipirsin; “Tu van pirtûkên qalind çawa dixwînî, qalindîya wan çavên te natirsînin?”

Bi rastî ew kesên ku vê pirse li min dikin, neheq jî nînin. Gîrbûn û qalindbûna pirtûkên wî bi rastî jî çavên mirovan ditirsînin.

Lêbelê dema ku mirov wan digre nav destê xwe û dest bi xwendinê dike, mirov xwe di rêwîtiyeke kûr û dirêj da dibîne, bi qulubandina rûpelan va rê li hev zêde dibin. Tirs û xofa ji qalindiya pirtûkê direve, kêf û kelecana rêwîtiya di nav dîrokê da dest pê dike û di şiveriyên bihevgerêdayî ra didome

Carinan rê diqede ya jî bi şiverêyek va tê girêdan...

Astengî derdikevin pêş...

Astengiyên ku bi çîrokên serdestan va girêdayî û bêbingeh...

Di dawîya rêwîtiya dirêj a di nav pelên pirtûkê da rê ronî, çîroka rasteqîn ji zêlê dibe....

Mirov dikare bi hêsanî bibêje, ku ev pirtûk jî di derbarê Jinên Kurd da lêkolîneke berfireh û di warê xwe da yekemîn e.

Pirtûk di Hezîrana sala 2018an da ji alî weşanxaneyê ÖZGe va û li Enqerê hatiye çapkirin, ji 240 rûpelan pêk tê û her rûpeleke wê da wêneyek ya jî gravûrek cîh digre.

Wêne û gravûrên ku di pirtûkê da cîh digrin, bi pirranî ji çavkanîyên bîyanî hatine wergirtin, ku ew bi tena serê xwe di derheqê Jinên Kurd da agahiyên berfireh û bêhempa didin...

Pirtûk ji şeş beşan pêk tê, ku ew jî alî Mehmet Bayrak va wiha hatine binavkirin:

„Bi Gravur, Wêne û Kartpostalan Jina Kurd“

„Ji Duh Hattê Îro Jina Kurd.“

„Ji hêja Meraşê Amazoneke Kurd Fatareş.“

„Bi Gravuran Jinên Kurd“

„Di Wêneyên Osmanî û Rojava de Jinên Kurd“

„Di Kartpostalên Osmanî de Jina Kurd“.

Di dawîya pirtûkê da Çavkanîyeke Hilbijartî, ku Gravur, Wêne û Kartpostalên ku di derbarê Kurdên di Serdema Osmanî hatiye berhevkirin, cîh digre...

Mehmet Bayrak di pêşgotina pirtûkê da ji bo vê xebata xwe wiha dibêje; „... Bingeha vê xebatê `Di serdema Osmanîyan de Jinên Kurd` e. Ku dû ra jî me cîh da hinek afirandinên balkêş yên wênekêş, lêkolîner û

gerokên rojavayî. Divê em careke din bêjin, ku ew diyardeya `Jinên Rojhilatî` ku ji aliyê ronakbîrên rojhilatî va qet nehatîye bahskirin, pêşekî rojavayîyan anîye rojevê.“

Ez naxwazim di vê nivîsê da dûr û dirêj pesnê vê pirtûkê bidim. Jiber ku pirtûk û naveroka wê li ber çavan e, ku ne pêwîst e mirov dûr û dirêj qal bike û pesnê wê ji bide.

Mehmet Bayrak di destpêka pirtûkê da wiha nivîsiye, „Ez vê berhemê ji bo pêşniyara nivîsandina vê pirtukê diyarî xanima xwe Gulay û hemû jinên kurd dikim.“

Di vê nivîsa xwe ya kin û kurt da dixwazim careke din dubare bikim û bi hêsanî bibêjim, Mehmet Bayrak ev pirtûk diyarî xanima xwe Gulay û hemû jinên Kurd kiribe, ez ji kirîn û xwendina vê pirtûkê pêşniyarî hem û jin û mêrên kurd dikim. Û dibêjim bila qalindiya vê pirtûkê çave we netirsîne. Pirtûkê bikirin, bigrin nav destê xwe, li wêne û gravûrên ku tê da cih digrin, temaşe bikin. Di wan wêne û gravûran da li xwe, li koka xwe binihêrin, ku ji xwe û ji dîroka xwe ya qedîm hayîdar bibin...

01.12.2018

„Nasnameya Kurdî û Tekoşîna min”

Zagonek ji zagonên dagirkerîyê ye. Dagirker dema ku welatek dagir bikin, wek gava yekemîn zimanê miletê ku li wî welatî diji, qedexe dikin, dû ra jî bi çand û hunera wî ra, bi kok û dîroka wî ra dilîzin, ku wî bipişîfînin û ji kokê va biqelînin.

Dewleta Tirk jî li Bakûrê Kurdistanê gor vê zagonê tevgerîya û wek gava yekemîn zimanê Kurdî qedexe kir, dû ra bi çand û huner, bi kok û dîroka kurdan ra list û hê jî dilîze...

Dagirkerên Tirk bi dizî û çîlpizîyeke bêpîvan kilam û stranên Kurdî berhev kirin, ew wergerandin zimanê xwe û tapuya wan li ser navê xwe qeyd kirin.

Bi siyaseta ku hîmê wê li ser red û înkarkirina kurdan hatiye avêtin, bi berevajîkirina bûyer û belgeyên dîrokî û bi zilm û zordariyeke bêsînor li tunekirina serê kurdan gerîyan.

Bi armanca avakirina civakeke yekreng û yekdeng, bi pergala civakê ra listin. Bi derxistina Qanûna Yekgirtina Perwedeyî yê va zarokên Kurd ji perwerdeyîya bi zimanê xwe yê zikmakî bêpar man û bi zimanêke bîyanî hatin pişafîn.

Lêbelê wek çeka ku di destê xwedîyê xwe da biteqe, fêl û fêlbazîya dagirkeran jî gor daxwaza dile wan neçû serî û di nivî da ma. Ew zarokên Kurd ên ku li dibistanên dewletê û ji alî ziman va dihatin pişfatin, di heman demê da jî hebûn û dîroka gelên cihanê hayîdar bûn. Di wê dîrokê da xwe jî dîtîn û li kok û esaleta xwe ya veşartî gerîyan. Bi hiş û hişmendîyeke têkûz, li dijberî zilm û zordariya dagirkeran derketin, bi bîr û bawerîyeke xurt û bi belgeyên dîrokî fêl û fêlbazîyên wan pûç kirin û hê jî dikin.

Ji wan kesan yek jî bêguman Lêkolîner û Nivîskar Mehmet Bayrak e,

ku ew jî di vê pirtûkê da bi berfirehî qala çîroka tekoşîna xwe ya jî bo nasnameya Kurdî kirîye, dike...

Ev pirtûk jî wek pirtûkên wî yên din ji alî weşanxaneyê ÖZGe va, li Enqerê hatiye çapkirin û 712 rûpel e. Naveroka wê, jî wêne û belge, ji nivîs û xweparastinên wî yên ku di dadgehên dewletê da kirîye, pêk tê.

Wî çawa dest bi tekoşîna jî bo nasnameya xwe ya Kurdî kirîyê, di wê pêvajoyê da rê û dirbên ku li ber wî hatine girtin, astengiyên ku derketine pêşîya wî, zext û rextên ku lê hatine kirin, hemûyan bi bûyerên jîyayî û bi belgeyên dîrokî va li ber çavan radixîne û yekoyek vedibêje...

Di pêşgotina pirtûkê da jî ew bi kurtayî tîne ziman, ku sedem kar û xebatên wî yên di warê Kurdolojîyê da, zexta û rexta ku ji alî dewletê va lê hatiye kirin, ti car kêr nebûye û herdaîm kudîya ye.

Loma ne pêwîst e, ku ez di vê nivîsê da qala hemû bûyer û belgeyên di pirtûkê da cîh digrin, bikim. Lê dixwazim li vir qala bîranîneke xwe bikim, ku ew jî bi mijara vê pirtûkê, bi taybetî jî bi pêvajoya weşana Özgür Gelecekê va giradayî ye.

Dema ku ev pirtûk gihîşte destê min û min bi kêf û kelecana li berga wê ya pêşîyê temaşe kir, çawa ku bi straneke dengbêjan ra mirov xwe di nav deşt û zozanên welatê xwe yê rengîn da bibîne, min jî bi dîtina wêneyê bergê va xwe li Stenbola xopan dît û di nav bîranînên xwe yên wê deme da wenda bûm...

Dawîya salên 80yî, di ser darbeya leşkerî ya 12ê Îlonê ra jî sal û demsal derbas bibûn. Bi destpêka darbeyê ra Kurd û Tirk ên ku hatibûn derdestkirin û di bin lepên dewletê da pelixibûn, jî wan bi deh hezaran kes hê di heps û zindanan da dinaliyan. Herwiha yên ku jî dest û lepên dewletê filitûbûn û xwe avêtibûn welatên bîyanî, ew jî jî welat û hezkiriyên xwe dûr, di şert û mercên koçberîyê da ber xwe didan. Bi seranserê xwe va Tîrkiye bibû zîndaneke servekirî, civaka ku bi salan bêdeng mabû, hêdî hêdî jî binî va dikeliya, jî tirs û xofa domdar difiltû û deng dida. Di dem û rewşeke wusa da wek çend keç û xortên Kurd, me li Stenbolê komeleke çandî damezrandibû. HKD, bi navê xwe yê dirêj, Halk Kültür Derneği- Komela Çanda Gel. Çîroka damezrandina vê komelê jî çîrokeke kûr û direj e. Lê mijar ne komel e û bila çîroka wê jî ji nivîseke din ra bimine.

Di heman deme da Mehmet Bayrak jî li bajarê Enqerê dest bi kar û

xebateke pîroz kiribû. Wek xwedî û edîtorê wê yê giştî, bi navê Özgür Gelecek, kovareke mehane ya sîyasî û çandî amade dikir û diweşand.

Jibo rêvebir û endamê komelê navê Mehmet Bayrak naveke bîyanî nebû, me navê wî ji kar û xebatên wî yên berîya 12ê Îlonê ji bihistibû. Ji dûr va be ji me hemûyan ew nas dikir, pêşwazî li kar û xebata wî ya pîroz dikir û dişopand.

Jiber ku me kovara Özgür Gelecek û weşana wê ji gor nêrînên xwe yên sîyasî ji xwe ra nêzik didît, piştgirîya wê dikir û jê ra dibûn alîkar. Bi weşana her hêjmarê va, me gor hêz û quweta xwe kovar dixwest, ew li Stenbolê belav dikir û difiro.

Di wan salan da çapkirina kovar û pirtûkan jî, qasî amadekirin û weşana wan pîrgirêkeke mezin bû. Kovar û pirtûka ku bêhna kurd û kurdayetîyê jê bihata, her çiqas qedexe neba jî, ji tîrs û xofa dewletê ew jî alî çapxaneyan va nedihat çapkirin. Qasî ku tê bîra min, piştî weşana çend hêjmaran, li Enqerê derfeta çapkirana Özgür Gelecekê êdî nemabû. Ji bo ku kovar di dema xwe were çapkirin, Mehmet Bayrak jî hatibû Stenbolê. Ji bo çapkirina her hêjmarê ew li çapxaneyek digerrîya, em jî di dema çapkirinê da dibûn alîkar, ku me kar û barê wî yê giran û astengiyên ku derdiketin pêşîya wî, bi çavê sere xwe didît.

Wê demê li derdora me jî hinek kesên ku xwe wek sîyasetvan û rêvebirên gîregir dihesibandin, peyda bibûn. Ew di kuncikên tarî da, bi peyv û gotinên tûj û tund diaxifîn, lêbelê dema ku derbiketana kûçe û kolanan, ji sîya xwe jî diketin şikê û vediciniqîn.

Cîhê ku ji bo xwe ewle didîtîn û li cem kesên ku bawerîya xwe pê dianîn, xwe rêvebirên binerd, xwedîyê kar û barê giran nişan didan. Bi vegotina çîrokên ezber, mêranî û mêrxasîya xwe derdixistin pêş, kêmasî û newêrekiya xwe vedişartin. Lêbelê kesên ku wek Mehmet Bayrak kare weşangerîyê dikirin û tekoşîneke bêhempa didan, kesên pasif û jî rêzê, kar û xebata wan jî piçûk û sivik didîtîn.

Ew ji sîya xwe ditirsîyan, jiber ku kes nebîne, rîya xwe dirêj dikirin, di nav kûçe û kolanên teng ra difitilîn û xwe diavêtin komelê. Dû ra bi şêwaza kesên ku di ser pozê xwe ra mêr û mêrxasek nabînin, diaxfin û ji me ra digotin; “Özgür Gelecek di weşana xwe da qels e. Mehmet Bayrak jî ji bo ku nekeve heps û zîndan, di weşana kovarê da zi-manêke nerm bi kar tîne.

Dema ku hat komelê, hûn bi tundî wî rexne bikin, ku bila ew zimanê xwe yê nerm terk bike. Di nivîsên xwe û di weşana Özgür Gelecekê da tûj û tundiyê derbixe pêş, ku bayê me jî di nav kûçe û kolanan da lêbixe û olan bide...”

Ji alî dewletê va Mehmet Bayrak kurdekî xeternak, jî alî hinek siyasetvanên kurdên ku jî siya xwe ditirsîyan jî mirovekî pasif dihat dîtin. Ji alî dewletê va ew di heps û zîندان da dihat darizandin, jî alî hinek kurdan va jî ew dihat rexnekrin.

Tevî vê nakokiyê, hinek gotinên tûj û tund, li me jî xweş dihat. Loma dema ku bihata rojevê, me jî bi dilê xwe yê pak û bi mebesta xwe ya paqij, helwesta Mehmet Bayrak û zimanê ku wî di weşana kovarê da bi kar dianî, rexne dikir.

Jiber ku em wê deme xort bûn, xwîna me dikelîya... Me aqilê xwe danîbû alîkî, di nav xewn û xeyalên şoreşgeriyê da, bi kelecana dilê xwe tevdigerîyan.

Li alîkî şerê çekdarî dest pê kiribû, li welat... Dengê ku jî lûleyên keleşan derdiket û li serê çîya û banîyan bilind dibû, di nav gund û bajaran da olan dida...

Li aliyê me jî, “kovareke mehane û weşana wê ya bi zimanê nerm”, têra me nedikir û xewn û xeyalên me yên wê demê nedixemiland...

Çima ev mînak û Mehmet Bayrak?

Ji wê deme pê va têkiliya min û Mehmet Bayrak ti car neqetîya, di her dem û rewşê da, bi hezkirin û rêzdarîke taybet kudiya û hê jî dikude.

Di vê pêvajoya dûr û dirêj da, min di sekn û helwesta wî ya ku di kar û xebata xwe ya pîorz û mayînde da anîye cîh, dît ku gotin bi tena serê xwe çiqas tûj û tund be jî, anîna wê ya ser zar û ziman karekî hêsan û sivik e.

Ger ku di cîhê xwe da neyê gotin û neyê qeydkirin, kîngê jî zar û ziman derbikeve, wek bayê bezê difire û wenda dibe. Her çiqas tûj û tund be jî, ti car cîhê xwe nagre û jî wendabûne jî nafilite.

Kar û xebata Mehmet Bayrak jî, sekn û helwesta wî ya xwedî îstiqrar jî vê rastîyê careke din li ber çavan radixîne û bi zelalî îspat dike.

Ew kesên ku 40 sal berê xwe siyasetvan û rêvebirên giregir dihesibandin, kî bûn?

Xêncî çend gotinên ezber û dubarekirî çi kirin û li paş xwe mîrateke çawa hiştin?

Ne kes navê wan dizane, ne jî ji kar û xebata ku binerd û nedîtbar hayîdar e.

Lê Mehmet Bayrak û Özgür Gelecek, ya jî ba navê xwe yê Kurdî Pêşeroja Azad?

Piştî hêjmara 8an dawî li weşana kovarê hat, lêbelê îro di xala Kurdolojîyê da Özgür Gelecek êdî wek dibistaneke zanyarî tê dîtin û naskirin.

Mehmet Bayrak jî wek damezranê û mamosteyê wê dibistanê, di berhemên xwe yên domdar û mayînde da, qasî ku rûreşîya dagirkeran li ber çavan raxist û radixîne, ewqas jî dîroka kurdan zelal, pêşeroja wan jî ronî kir û dike...

Ev pirtûk, “Kürt Kimlikli Mücadelem - Nasnameya Kurdî û Tekoşîna min“ jî çîroka tekoşîna Mehmet Bayrak e, ku divê her kurd wê çîrokê bixwîne û ji hebûna wê bêpar nemîne...

30.01.2024

Gotinên Zêrîn...

Gotinên pêşîyan, gotinên zêrîn in.

Di zimanê hinek miletan da wek gotinên bav û kalan jî tên binavkirin...

Lêbelê kîjan bav û kal û kîjan gotinên wan?

Gelo mirov dikare ji her gotinên bav û kalên xwe ra bibêje gotinên pêşîyan?

Ez bawerim, na. Jiber ku, bav û kal pir in û gotinên ku wan di jîyana xwe da anîne ziman jî zêde ne.

Loma ji her gotinên bav û kalan ra, gotinên pêşîyan, nayê gotin.

Weke ku dibêjin; “gotin e, ji dev derdikeve û difire...”

Bêguman ev rastîyeke bê şik e. Lêbele ger ku gotin di wateya xwe da girîngîyek bihebinê, bifire jî ti car wenda nabe, berevajî dibe zargotin û di nav jîyana civakê da cîhekî mayînde digre.

Di nav civakê da mîna zêrên zer tê parastin, dibe mîrateke çandî û dû ra wek gotinên pêşîyan tê binavkirin.

Gotinên pêşîyan, di gotinê da kin û sivik, di naverok û wateya xwe da jî giranbûha nin. Jiber ku di bingeha gotinên pêşîyan da temî û hosîyên bav û kalan cîh digrin, ku ew bi tecrûbeyên salan hatine cêribandin û bi wateya xwe va kemilîne.

Ew bi demê ra biriqîne û bi çirûskên xwe, di tariya şevê da jî rêya merîya ronî dikin. Di tilîyan da bûne gustîl, bi pelikên guhan va zeliqîne û bûne guhar. Loma wenda nebûne û heta roja îro nehatine ji bîr kirin.

Gotinên pêşîyan bi wate û zelaliya xwe mîna xêlîya serê qîz û bûkan, jîyana civakî xemilandine û dixemilînin.

Ew gotin weke teorîyên nûjen ji alî zanyaran va nehatine kirin, loma di nav pelên pirtûkan da zêde cîh negirtine û nagrin.

Lêbelê di nav civakê da, bi deng û wateya xwe olan dane û bûne zargotin û wek hîmê jîyanê, ji nîfşên kevn derbasî nîfşên nû bûne.

Ev gotinên zêrîn di jîyan û zimanê her miletî da cîh digrin, ku bi navên cuda werin binavkrin jî, di wateya xwe da hevpar in.

Jiber ku, di dîroka mirovahîyê da, her milet gor şert û mercên xwe, xwedî taybetîyên cuda ne.

Mirov wan taybetîyan, di dîroka wan da, di çand û hûnera wan da, di jîyana wan a civakî û zimanê wan da bi zelalî dibîne.

Çawa ku dîrok, çand û huner, ziman û jîyana civakî ya her miletî ji hev cuda be, gotinên wan ên pêşîyan jî ji hev cuda ne.

Hevparîya wan, cêribandina rastîya wan e, ku sînorê wê rastîyê jî, bi dîrok, çand û huner û jîyana civakî ya her miletî va girêdayî ye.

Loma mirov dikare bi hêsanî bibêje, gotinên pêşîyan wek neynikin. Di mala kî û kê da hebin, tenê bed û bedewîya ew kesên ku di wê malê da dijîn, nîşan didin.

Çawa ku neynik xil û xar hatibe daliqandin, mirov xwe tê da xil û xar, bilind hatibe daliqandin jî, mirov xwe tê da kin û qelew bibîne, di gotinên pêşîyên her miletî da jî, mirov rengê jîyan û fikr û ramanên wî miletî dibîne.

Wek mînak:

Şêr şêr e, çi jin, çi mêr e!

Gotineke kin û zelal...

Bi kurtayî mirov dikare bibêje, ev pêşgotin di civaka kurd a kevnar da cîhê jinê, bi zelalî nîşan dide. Di derbarê têkiliyên mêr û jinê û rûmeta jinê ya di civakê da agahîyeke berfireh li ber çavan radixîne.

Herwiha mirov dikare naverok û wateya vê pêşgotinê di gelek xalan da û bi şiroveyên kûr û dirêj jî binirxîne.

Ger ku di navbera rastîya vê gotinê û jîyana kurdan ya îroyîn da nakokîyek hebe, sedemên wê jî hene, ku ji wan sedeman yek bandora olî be, ya din jî encama pişafînê ye.

Mirov li van gotinên zêrîn xwedî dernekeve û di jîyana xwe da ji wan

sûd negre, ew ji binî va wenda nebin jî, dixeyîdin, ji dil û ji ber çavan dûrdikevin û bêxwedî dimînin.

Pişafkerên xêrnexwaz wan didizin û diqulubînin zimanê xwe, dû ra weke mîrata ku ji bav û kalên wan ji wan ra ma be, li ser nave xwe qeyd dikin...

Jibo ku pêşgotinên kurdî bêxwedî nemînin û nekevin destên xêrnexwazan, lêkolînerê kurd Mehmet Oncu bi ked û xebata salan, qasî 50 hezar pêşgotin berhev kirine. Weşanxaneya Sîtavê jî ev pêşgotin wek çar cild weşandîye.

Mehmet Oncu gor naverok û wateya wan xebateke balkêş kirîye û di nav 235 beşan da jî ew bi cîh kirine...

Wek mînak, gotinên pêşîyan yên li ser mêranî û mêrxasîyê, yên li ser jinan, yên li ser qencî û xirabîyê, yên li ser evîn û evîndarîyê, yên li ser ar û debara jîyanê û hwd...

Bêguman di vê xebatê da qasî berhevkirina gotinan, bi hezaran çîrokên ku li ser gotinên pêşîyan hatine vegotin jî bi giringîya xwe va cîh digrin. Herwiha bi hezaran peyvên ku îro zêde nayên zanîn û bikaranîn, gelek peyvên ku di ferhangan da nayên dîtin jî, di vê xebatê da cîh digrin û ew bi têbinîyên berfireh hatine şirovekirin.

Dema ku mirov li van herçar cildên ku her yek jî hezar rûpelan zêdetir pêk tên, dinêre, xwe wek xewdîyê xezîneyeke çandî dihesibîne û dilşa dibe.

Çawa ku, di Încîl a pîroz da hatîye gotin; „Di destpêkê da gotin hebû. Gotin bi Xwedê ra bû û Xwedê bixwe bû...”

Mrov dikare bibêje, di destpêka me da jî gotin hebû, ew bi pêşîyên me ra bûn, ew pêşîyên me, çavkanîya çand û hunera me bixwe bûn...

Ev çar cildên ku tê da xezîneya me ya çandî cîh digre, niha li ber destên min in.

Ez ketime navê û jixwe ra li para xwe digirim.

Ger ku hûn jî naxwazin ji vê xezîneyê bêpar bimînin, derengî nekevin, bigrin ber xwe, têkevin nave û li para xwe bigerin.

Qasî ku ji we ra ket, bigrin û pê dilşa bin...

22.11.2020

Jan, li koka xwe ya veşartî digere...

Jan, serlistikvanê filma Kazim Öz ya bi navê Zer e.

Film di sala 2017an da hatiye çêkirin.

Mixabin, çend roj berê min li ser înternetê dît û lê temaşe kir.

Ji destpêka filmê heta dawîyê, qasî 2 saetan ez di cîhê xwe da wek ker û lal bûm û di dilê xwe da bi serlistikvanê filmê Jan (Nik Xhelilai) ra derketim rêwîtiyê.

Jan, li koka xwe ya veşartî gerîya, ez jî bi wî ra gerîyam û di kûrahîya dilê xwe da girîyam.

Heta roja îro min di derbarê Komkujîya Dêrsimê da bi dehan pirtûk, bi sedan gotar xwendin û jî gelek kesên Dêrsimî li serpêhatîyên bav û kalên wan guhdarî kir.

Bi xwendina her pirûkek û gotarek, bi guhdarîkirina her serpêhatîyek jî êş û jana ew kesên ku di wê komkujîyê da hatibûn kuştin, ew zarokên ku sêwî mabûn, ew qîzên ku wek berdestî hatibûn girtin û jî koka xwe hatibûn qetandin, xemgîn dibûm.

Piştî xwendin û guhdarîkirinê, gotin difirîya, xemgînîya min jî kêr, bi demê ra jî wenda dibû.

Piştî temaşekirina Zerê girîyên min hatin birîn, lê xemgînîya min çend roj e didome.

Ez jî mîna serlistikvanê filmê hê di rêwîtiyê da me. Ne rêwîtiya min diqede, ne jî xemgînîya min kêr dibe...

Ji sedeman yek, cudahiya ji dîtî û xwendinê be, ya din jî hunera çêkerê filmê, ya Kazim Öz e.

Ji saya wê hunerê ye, ku mirov dema lê temaşe dike, xwe di nav filmê da dibîne û dibe hevparê kul û keserên Zerîfê ya 80 salî.

Dibe hevrêyê Jan û bi wî ra li ser koka xwe vedigere û bi hêvîyek xurt dibe şopînerê êş û jana veşartî...

Kazim Öz di filma xwe da ne tenê êş û jana 70 sal berê qewimîye, bi hunera xwe jîndar dike û li ber çavan radixîne, ew di heman demê da û di kesyetîya Dêrsimîyan da rewşa civaka Kurd ya îroyîn jî li ber çavan radixe û merîya dinuqûîne.

Bi çîrûskek hevîya merîya jî xurt dike, ku ew çîrûsk jî Janê 19 salî bixwe ye.

Jan li Firansayê hatiye dine û mîna êş û jana dapîra xwe ji rastîya navê xwe jî bêhayîdar e. Navê xwe navekî Fransî û lêdanîna wî navî jî bi bûyîna xwe ya li Fransayê va gire dide.

Li Newyorkê dijî, qasî ku ji alîyê xwe yê Kurdî bêhayîdar, ewqas ji alîyê xwe yê Tirk jî dûr e.

Xwendekarê beşa muzîknasîyê ye.

Di odeya nexweşxaneyê li Newyorkê da refaquetvanê dapîra xwe ye.

Dapîra wî Zerîfe, dixwaze ji Jan stranek guhdarî bike, ew jê ra stranek bi îngilîzî distirê, dapîra wî tu tiştê jê fam nake. Dû ra Jan daxwaza stranek ji dapîra xwe dike, dapîra wî strana Zerê jê ra distirê.

Jan zimanê stranê meraq dike û ji dapîra xwe dipirse...

Zerîfe, mîna êş û jana xwe kurdûna xwe jî ji nebîyê xwe vedişêre û jê ra dibêje, straneke Kurdî ye û wê ev stran ji hevaleke xwe ya Kurd hînbûye...

Dû ra li ser daxwaza Jan, Zerîfe çîroka hevala xwe jî wî ra vêdibeje.

Melodîya stranê bala Jan dikişîne û dixwaze careke din li dapîra xwe guhdarî û stranê jî jiber bike.

Mixabin dapîr dinya xwe diguhêrîne û çîrok di nivî da dimîne.

Ew dibe sedema rêwîtiya Jan, ku ew rêwîtî jî bi termê dapîra wî va ji Newyorkê dest pê dike.

Li rawesgeha yekemîn, li Afyonê piştî merasima definkirinê, Jan ji kesên ji malbatê strana Zerê dipirse.

Bavê wî bi bertekeke tund dibêje, “te hişê xwe xwarîye kurê min, Zer û strana Kurdî çî ye, te ev ji ku derxistin” ...

Lê bi bertekê ra şîrmaqeke xurt jî li bin guhê Jan dixîne.

Jan di cîhê xwe da nasekine, li pê çîroka xwe dikeve û rêwîtîya xwe didomîne.

Bi awayekê ji meta xwe ji surr a dapîra xwe ya veşartî hayîdar dibe û ji Afyonê bere xwe dide warê êş û jana veşartî...

Jan dema ku di rêwîtî û di nav bajarê Dersimê da li şopa strana Zerê digere, bi pirs û axaftina xwe ya xerîb, rûbirû qîlf û henekên Dersimîyan dibe.

Yek dibêje, “ev dîn e, ji Amerîkayê rabûye, heta vir li pey straneke kin jibîrkirî ketîye...”

Yekî dîn dibêje, “dibe ku, ev casûsek ji casûsên CIA yê be...”

Dema ku Jan qala çîroka dapîra xwe dike, ew kesê ku qîlf û henekên xwe pê kiribûn, bi hev ra dikenin û yek ji wan; “min ji we ra negotibû, ev jî dînek ji dînen me yê Xozatê ye” dibêje û rîya Xozatê nîşanî Jan dide.

Jan ku ji Newyorkê rabûye û ketîye şopa strana Zerê, ne ji qîlf û henekan ne jî ji astengiyên ku derdikevin pêşîya wî, bêzar nabe û gera xwe dikudîne.

Şev û roj derbas dibin, lê Jan bîr û bawerîya xwe wenda nake û li şopa strana Zerê digere.

Di encamê da Jan digihîje armanca xwe û strana Zerê ji pîrejineka gundî guhdarî û jiber dike.

Ew pîrejîn ku, mîna dapîra Jan di dema komkujîya Dersimê da sêwî ma ye, bûye berdestî û piştî salan şunda, bi dizî vegeerîya ye warê bav û kalên xwe.

Dema ku film diqede, qasî ku mirov bi çîroka Zerîfe ya sêwî û keça wendayî ya Dersimê ya bi êş û jan, ewqas jî ji xemsarîya Dersimîyan xemgîn dibe.

Civak ewqas hatîye çilmisandin, ku ew kesên kesên k udi wê civatê dijîn, ne tene ji stranek, ji bîra xwe ya dîrokî jî hatine dûrxistin.

Loma ew, kesên ku li bîr û bawerîya xwe xwedî derkeve, wan mîna Jan dîn dibinin û qîlf û henekên xwe pê dîkin.

Lêbelê mirov bi şopenêrîya Jan va, ku ew bi melodîya stranek va li ser

koka xwe vedigere, ji bo pêşerojêke ronahî û bi hêvîyeke xurt mirov
dişad dibe...

Hevî û xemgînîya merîya bi hev ra dikevin berebezîyê...

Xemgînî carcaran zede bibe û derbikeve pêş jî, hêvî xurt dibe û merîya
li pey xwe digerîne...

Jiber ku heta çiqilek zindî bimîne, kok namire, ji nû va jîndar dibe û şax
dide...

02.06.2020

Dil Leyla

Mehekî berê, li Akademiya Sînemayê ya li bajarê Ludwigsburgê li belgefilmeke bi navê „Dil Leyla“ temaşe kir.

Rejîsorê belgefilmê Keça Kurd Asli Ozarslaner e.

Belgefilm ji salên 1990'î vir da bûyerên ku li Cizîra Botan qewimîne, di şexsiyeta Şaredara bajêr Leyla Îmret da nîşan dide.

Belge film ji keda sê jinan pêk hatî ye.

Rejîsora wê Asli Ozarslaner, Çêker Sabrina Proske, Kameraman ji, Carina Neubohn e.

Heta çend sal berê Kurdên Welatparêz gilî û gazinên xwe dikirin û digotin, „dîroka me jî ji aliyê neyarê me va hatiye nivîsandin“ û xemgînîya xwe dianîn ziman.

An jî bi pirtûka Harold Pinter û Henry Muller a bi navê „Zimanê Çîya“ nivîsandibûn, şa dibûn, kefxwaşîya xwe bi der dora xwe ra parve dikirin û digotin, „êdî dinya me nas dike, ji îro şûnda va êdî ti kes nika-re pêşî li me bigre!“

Di nav pênce salên dawîyê da, dinya bi hêzekî dijiwar guherî.

Bi bayê guhartina dinê ra, Kurd jî guherin, ji xewa mirinê hîşyar bûn û bixwe hatin.

Zarokên ku di nav van pênce salên dawîyê da, ji dayîk bûn, xwendin, çand û hunera xwe, dîroka xwe, kul û keserên bav û kalên xwe naskirin û bi wan ra mezin bûn.

Îro jî dest pê kirine, ku dîroka xwe ji nû va bi xwe dinivîsînin.

Dîroka bi şer û kuştin...

Dîroka bi xwîn û girî...

Dîroka bi şîn û şahî...

Asli Özaslaner jî ji wan yek e, ku bi filma xwe ya bi navê „Dil Leyla“ rûyê neynika destê xwe vegerandîye Cizîrê, Cizîra Botan, ji salên 90î vir da, zilm û zordariya dewletê ya li bajarê qedîm qewimîye, di kesayeta Şaredara Cizîrê Leyla Îmret da nîşan dide û li dinyayê dide temaşekirin.

Mîrov dema ku bi filma Asliyê ra derdikeve rêwîtiyê û berê xwe dide nav Cizîra Botan, xwe di nav salên 90î da û di nav Şahîya Newrozê ya bist sal berê da dibîne...

Bi şahîyê ra dîlşad...

Daxwazên kurdan yên wê demê dibihîze û xemgîn dibe.

Bi kuştina keç û xortên kurdan va dikewice.

Bi hincirandina kal û pîr û zarokên ku di nav lepên panzerên dewletê da can didin, dibîne, digrî û hêsiyan dibarîne.

Bi berxwedan û serkeftina kurdan, ku di şahî û hîlbijartinan da tên dîtîn, kêfxweş dibe# hêsiyên xwe paqij dike û dikene.

Bi dîtina xaniyên hilweşandî û wêranbûna bajêr va, neyarê xwe nas dike û cîhê seknana xwe kifş dike.

Wek kurdekî, ku li bûyerên ji pence salî vir da qewimîne, şahidîtiyê dikim, dikarim bi hêsanî bibêjim, Asli Özaslaner bi vê filma xwe, ji bûyerên ku li Cizîra Botan qewimîne, tenê ji sedî yekî nîşan bide jî, dîroka Kurd a nêzik qeyd kirîye û bi zindî li ber çavan raxistîye.

Ez îro bi xebata Asli Özaslaner û yên keç û xortên weka wê ra kêfxweş û serbilind im.

Ew bi xebatên xwe va dîroka gelê xwe, ji nû va dinivîsînin û li ber çavan radixînin...

13.05.2017

Atlantic Crossing û xewna min...

Virûsa Covîdê careke din guhê xwe vît kirîye û di kûçe û kolanan da li merîyan digere.

Kîngê û li kûderê bikeve pêşîra kê, ti kes nizane.

Loma çûyîn û hatina di civakê da kê, têkilîyên mirovan jî ji hev qut bûye.

Pêwîst nebe, ne kes jî mala xwe derdikeve, ne jî derê mala xwe ji heval û hogireke xwe ra vedike.

Jibo ku Covîda guh-vît bi pêşîra min nekeve, ez jî zêde ji mal dernakevim. Di nav rojê da dema min bi xwendin û nivîsandinê, êvaran jî bi litemaşekirina film û rêzefilman va derbas dibe.

Carcaran liser Netflixê, carcaran jî li ser kanalên Alman li film û rêzefilmên dîrokî digirim. Ger ku gor dilê xwe tiştek bibînim, pal didim û lê temaşe dikim.

Du roj berê min di MagentaTV da rêzefilmêke nû dît, Atlantic Crossing - Xaçerêya Atlantîkê. Rêzefilmeka dilşewatî û şer e, şerê cîhanî yê duyemîn...

Rêzefilm jî 8 beşan, mijarê wê jî ji serpêhatîya Prensê Mārthayê pêk tê. Prensê Mārtha bûka Qralê Norvegê û birazîya Qralê Swêdê ye.

Wek tê zanîn, di destpêka sedsala 20an da pirranîya dewletên Ewropa bi rejîma qralîyetê dihatin îdare kirin. Qralên hemû dewletan jî bira, pismam, ap û birazî û xal û xwarzîyên hevbûn.

Di destpêka şerê cîhanî yê duyemîn da, Qralê Norvegê Haakonê VII. birayê Qralê Danîmarkayê, xwarzîyê Qiralê Swêdê, pismam ya jî lawxaltîyê Qralê Îngilîz Georgê VI e. Bûka wî Prensê Mārtha jî dîsa birazîya Qralê Swêdê yê wê demê Gustavê V e.

Di sala 1940î da Hitler berê Danîmarkayê dagir dike, dû ra berê xwe dide Norvegê. Berî dagirkirina Norvegê Prens Mārtha bi sê zarokên xwe va derbasî Swêdê dibe û tere di mala bavê xwe da bicîh dibe. Mixabin Apê wê yê Qral Gustav ji hatina wê neraziye û dixwaze hê Hitler berê xwe nedaye welatê wî, Mārtha vegere Norvegê, ew jî ji bela Hitler xilas be. Prens Mārtha herçiqas nexwaze jî, bêçare dimîne û berê xwe dide Amerîkayê. Bi alîkarîya Serokê wê demê Franklin D. Roosevelt bi keştiyek di ser Atlantîcê va derbasî Amerîkayê dibe. Mêrê wê Prens Olav û xezûrê wê Qral Haakon jî direvin û berê xwe didin Londrayê.

Dema keştiya ku Mārtha tê da digihîje NewYorkê, li wir bi merasimeke fermî tê pêşwazîkirin. Mārtha salek berê jî bi mêrê xwe, Prens Olav ra serlêdana Amerîkayê kirîye, herdu bi hev ra li Koşka Sipî bûne mêvanê Rossevelt û di navbera wan da hevalbendîyek çê bûye. Jibo xatirê wê hevalbendî û nêzikayîyê, Roosevelt pêşniyar dike, ku ew bi her sê zarokên xwe va, qasî ku bixwaze, dikare di Koşka Sipî da bicîh bibe û bimîne.

Roosevelt jî, di xortaniya xwe da nexwaşîya felcê derbas kirîye û ji navê jêr va lingên wî nalive, bi kursiyê pêçke digere. Her sê zarokên Mārthayê wek nebîyên xwe dihesibîne, jî wan hez dike û bi wan ra mîna zarokek dilîze.

Herçiqas di Koşka Sipî da bijî jî, Prens Mārtha xemgîn e, jiber ku ji mêrê xwe, ji welatê xwe dûr e. Penaber e û çavê wê hergav li rêya vegeêrê ye.

Mixabin alava şer roj bi roj zêde dibe û hemû Ewropayê dişewitîne. Londra jî alî firokeyên Alman va tê bombebarankirin.

Îngiltere di tengasiyê da ye û li dijberî êrişa Alman, xêncî parastinê tiştê ku bike, nîne.

Amerîka jî destpêka şer va bêalîbûna xwe îlan kirîye, ne têkilî şer dibe, ne jî çek û silehan difroşe welatên Ewropayê.

Qral û hukumetên hemû welatan bang li Amerîkayê dikin, ku dixwazin ew çek û silehan bifroşe wan. Lêbelê Roosevelt bi navê dewleta Amerîkayê bêalîya xwe îlan kirîye û jî şer û jî firotina çekên dûr disekine.

Prens û balyozê Norvegê jî Prens Mārthayê rica dikin, ku ew daxwaza alîkarîyê ji Roosevelt bike. Di destpêkê da Mārtha vê yekê qebûl

nake, lê piştî rasthatina wê ya bi birîndarekî Norvegî, ku di şer da herdu lingên xwe wenda kirîye, biryar dide û ji Roosevelt alîkarîyê dixwaze.

Roosevelt jibo ku cara sêyemin were hilbijartin, di nav kar û xebateke giran daye. Li pêşnîyara Mārthayê guhdarî dike, lêbelê biryara dewletê ya bêalîbûnê tine bîra wê û helwesta xwe naguherîne.

Mārtha demek şûnda bi sê zarokên xwe va avahîyek kirê dike û ji Koşka Sipî derbasî mala xwe dibe.

Hilbijartina serokatîyê çê dibe û Roosevelt cara sêyemin jibo serokatîya Amerîkayê tê hilbijartin. Sedema hilbijartina Roosevelt ya herî girîng, siyaseta wî ya jidûrsekinandina şer e.

Piştî hilbijartinê Prensese Mārtha careke din berê xwe dide Koşka Sipî û serlêdana Roosevelt dike.

Di hevdîtînê da ji Roosevelt ra dibêje, „Ez îro ne Prensese wek balyozê Norvegê alîkarîyê ji we dixazim, ku hûn hewl bidin û ev agirê ku li seranserê Ewropayê belav bûye, bitemirînin...”

Roosevelt, careke din helwesta dewleta xwe tine bîra Mārthayê û dibêje; “Jibo ku ez bêalî bimînim, hemwelatîyên min, ez careke din hilbijartim...”

Lêbelê Mārtha, çawa ku du heval ji hev biqahirin û bi dengê bilind bi hev ra biaxifin, dengê xwe bilind dike û ji Roosevelt ra dibêje; “Herkes dikare di Koşka Sipî da rûnê. Lêbelê tenê yekî xwedî kesayeteke bi hêz dikare biryareke rast bide... Ewropa dişewite, wê şewatê ji dûr va temaşe neke û alîkarîya welatê min bike...”

Mārtha gotina xwe dibêje, li benda bersiva Roosevelt nasekine û ji Koşka Sipî derdikeve. Dû ra Roosevelt xwe di bin bandora gotinên Mārthayê da dibîne, jibo alîkarîyê, li rê û rêbazan digere.

Bi cîgir û şêwirmendên xwe ra dişewire, her çi qas ew nerazîbûna xwe nişan bidin ji Roosevelt li gotinên wan guhdarî nake.

Jina wî, Eleanor, Roosevelt rexne dike û dibêje; “sedem siyaseta te ya jidûrsekinandina şer gelê Amerîkayê te hilbijartin. Tu çawa ji wê siyaseta dîr dikevi û hêvîya wan dişikî...”

Roosevelt li gotinên Eleanorê jî guhdarî nake û di encamê da firotina çek û sîlehên ku Ewropayî jê dixwazin, bi awayekî ji Kongreyê jî derbas dike.

Bi şandina çek û sîlehan ra, Îngiltere ji dagirkirinê difilite û reng û rewşa şer jî duguhre.

Di encama şerê ku, bi salan kudîya, Almanya têk diçe, ew welatên ku ji alî rejîma Hitler va hatibûn dagirkirin, ew jî yekoyek ji zilm û zordariya faşîzmê xilas dibin...

Rêzefilm herçiqas gor senaryoyek hatibe kişandin û tê da pevxistin hebe jî, di bingeha wê da rastîyek heye û pevxistin jî gor bûyerên ku wê demê qewimîne, hatiye kirin.

Bêguman sedemên guhartina siyaseta Amerîkayê ya di derbarê şerê cihanî yê duyemîn da cîh digre, zêde ne. Lê çawa ku di vê rêzefilmê da jî tê dîtin, ji wan sedeman yek jî hevalti û dostaniya Roosevelt û Prenses Märthayê ye.

Cîhê bila bê sebeb nabêjin, dema ku mirov têk here, bêçare bimîne, bavê merîya jî li merîya xwedî dernakeve. Lê heval û hogireke merîya yê dilsoz û bi hêz hebe, mirov dikare xwe bavêje ber bextê wî û ji tengasiyê xilas be.

Prenses Märtha jî wê demê wusa dike... Li welatê xwe yê ku lê jidayîk bûye, li mala bavê xwe û koşka apê xwe nasitire, loma berê xwe dide Amerîkayê û xwe davêje ber bextê heval û hogirê xwe yê ji dûr û ji dil.

Roosevelt jî jibo xatirê dost û hevala xwe, helwesta Amerîkayê ya bêalî diguherîne û bi awayek daxilî şer dibe. Bi guhartina helwesta Roosevelt va berê qedera şer, dû ra jî qedera Ewropa û dinyayê diguhure...

Şeva min a dirêj bi temeşekirina vê rêzefilmê va qedîya. Ez ji cîhê rabûm, xwe amade kir û ketim nav nivînan. Çavên min girtû, mêjûyê min bi rêzefilmê ra mijûl... Li ser gotina ku Biden salan berê ji Barzanî ra gotibû, difikirîm. Ew hevdîtînen wan ên ku bi rûken dest pê dikir û bi dilşayî diqedîya, mîna rêzefilma ku lê temaşe kiribû, di ber çavên min ra derbas dibûn...

Xewa min direvîya, fikar û kelecana tevlihev û li min zêde dibû. Çawa ketibûm xewê û dem çiqas derbas bibû, nayê bîra min. Lê ya ku tê bîra min ev bû, ku ez li ser paldanka xwe rûniştibûm, li ekranê televîzyonê temaşe dikir.

Li ser ekranê televîzyonê, NewYork, Monûmenta Azadiyê, Waşington, Koşka Sipî li pey hev derbas dibûn. Li ber deriyê Koşka Sipî, Biden pêşwazî li Barzanî dikir. Bi rûken hevdu hembêz dikirin û dûra derbasî

hundur dibûn. Li ofisa hêkanî da rûndiniştin û wek du hevalên ji dil, bi hev ra diaxifin.

Barzanî bi kelecana diaxifi û digot:

- Heval û dostên min ê hêja, tê bîra te, te salan berê gotibû emê Kurdistanê serbixwe bibînin. Ew dem îro ev dem e. Hewldan ji min, alîkarî ji te...

Biden:

- Rast e, min ew pêşbînîya xwe bi te ra parve kiribû. Lêbelê dewleta me îro jî hê ne amadeye û wê gave wek gaveke zû dibîne...

Barzanî:

- Salên te bûne 78, yê min jî bûne 74. Bizanibe, ku em roj bi roj ber bi dawîya emrê xwe diçin. Ez jî dizanim, ku dewleta we serxwebûna Kurdistanê hê gaveke zû dibîne. Lêbelê ger ku tu bixwazî, dikarî wê helwestê jî biguherîn...

Biden:

- Bêguman ez jî dixazim ew pêşbînîya min rast derkeve û em bihev ra Kurdistanê serbixwe bibînin. Mixabin, pîrsgirek ne tenê bi helwesta dewleta me va, berî her tiştî bi helwesta kurdan va girêdayî ye. Bi dîyarkirina pêşbînîya xwe, min xwestibû ez îşaretek bidim kurdan, ku ew jibo xwedîdewletbûnê xwe amade bikin. Lêbelê xêncî lidarxistina referandûmê ti amadekarîyek nehate kirin. Enîyeke milî û artêşeke milî nehate ava kirin. Hê hîm nehatîye avetin, ku em jî jibo danîna banê wê alîkarîya we bikin...

Biden kêmasîyên kurdan yekoyek dianî ziman û li hev dirêj dikir.

Ez di cîhê xwe dipirpitîm, bi kelecana min guhê xwe dabû gotinên wî, ku gelo ewê hê çi bibêje... Dawî li rexneyên wî nedihat, dirêj û li hev zêde dikir.

Bêhna min teng dibû û diqahirîm, ku jî nişkava jî cîhê xwe qîlbûm. Çi bibînim, di nav nivînan da me û li arikên odê mêze dikim...

Di şereşê şevê da ne arikên sipî xûya dikir ne jî Biden û Barzanî...

24.11.2020

Belgeya dîrokî: Mîro

Memo Şahin

Mîro, nave pirtûka Îkram Oğuz e. Romanek li ser dîroka sed, an jî sedûpencî salên dawî ye. Ji şerê Osmanî û Rûsan destpêdike û digîhêje îro. Dibe pirek di nav dem û dewranan da. Her wisa di nav nîşên berê û yên niha da. Ji aliyekî ve jî pirtûkek fêrbûn û hînbûnê, famkirin û şîrovekirina civaka Kurdistanê ye. Pirtûkek bo nîşên nû ye bo têgîhiştina pergal û sistema eşîrtiya çavkor û nasîna dewlemendiya çand û zimanê Kurdî ye...

Wek niha, wê demê jî dê û bav cenazeyê zarokên xwe, delaliyên xwe radikin, dîxin bin axa sar. Wek niha, hinek xeberek reş digirin, ne cenaze, ne beden, ne jî hestî dikevin dest. Wek niha, koçberî, berdana warê bav û kalan, koça ber bi warên nenas û neyar ve...

Kurd di nav du împaratoriyan mezîna da tîna perçiqandin. Yek jî rojhilatêrîş dike, yek jî jî başûr û rojava va. Ermenî cih û warên xwe terk dikin û ber bi rojhilat ve direvin, Kurd jî ber bi rojava va. Şer, ne şerê Ermenîyan e, ne jî ya Kurdan e. Lê yên ku êş û ezayê dikşînin ew in. Yên ku birçî û tazî dimînin ew in. Yên ku di bin pençe û postalên her du dewletan da tîna perçiqandin ew in.

Bi wan gotinan rol û nêrîna dewletê di romanê de tê şîrove kirin: „Gor şênîyên Goma Mîro, dewlet jî du beşan pêk dihat, jî wan yek cendirme, yê din jî tahsîldar bû. Cendirme canê wan digirt, tahsîldaran jî mal û milkê wan. Kê dest bi çîrokeke bikira, di destpêkê da wiha digot; „car jî caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, xêncî cendirme û tahsîldaran...”

Roja ku xebera reş a bavê Mîro tê, ev jî tê dinê û çavên xwe di nav şînê da vedike. Bavê xwe nabîne û hên di şeş mehiya xwe da dikeve ser rê û dirban, dibe koçer û derbeder. Di ber destên bapîrê xwe, di nav civînên rûspîyan da mezîna dibe û paşê jî dibe rêberê gundê xwe. Dibe şahidê

berxwedana Şêx Said, dibe qaçax û firar. Dû ra jî dibe qûrbaniya çavbirçitî û çavkoriya eşirtiyê.

Ziman û hûnandina serkeftî

Her pirtûk bi ked û xebateke gelek dûr û dirêj, lêkolîn û xwendin, kûrbûn û hûrbûn pêk tî. Hinek ji wan dîsa jî tîsî û bê tam dimînin. Meriv piştî xwendina çend rûpelan eciz dibe û berdide. Lê hinek jî hene, mîrov naxwaze dest jê berde.

Zimanek zelal û şîrîn, hûnandin û lihevkirina bûyer û rûdanan, hilbijartina qehreman û lehengan bala te dîkşîne ser xwe. Êdî tu ne aktor e, tu pasîf e û hefsarê te di dest leheng û bûyerên pirtûkê da ne. Mîro jî, romanek wisa ye.

Zimanek gelek baş û paqij, Kurmanciyeke gelek rehet û sivik, tûrika tîjî ya hevok û sînonîman, tesfîrek xurt û bi hêz, Mîro dewlemendir dike.

Dema min dest bi xwendina romana Mîro kir, min çend rûpel şûnde qelem û penûs, qaxiz û defter girt destên xwe. Gelek hevok, peyv, bêje, sînonîm, gelek leheng û bûyer min not girtin. Min bîryara xwe da, ez ê çend hevokan li ser vê pirtûkê binivîsînim. Min îskeletek jî amade kir.

Bo dawîya nivîsara xwe jî min çend rêz wek reşbelek hûnandin. Lê hatim dawîya pirtûkê û min dît ku kekê Îkram dawîya romana xwe jî, wek min niyet kiribû, girêdayîye:

„Kurd jî vala nesekinîn, bi dehan caran li dijberî dewleta ku li ser mîrata Osmaniyan ava bibû, serê xwe rakirin, li ber zîlm û zordariya dewletê derketin. Di wan serhildanan da xwîna wan wek avê çeman rijîya.

Kurd di her carê da tîk diçûn, tî û birçî diman, xwe şûnda dikişandin, di derawa xizaniyê da bi salan li ber xwe didan, xwe amade dikirin û careke din û li hêleka din serî hildidan.

Wek gotina Tirkan, bist û neh caran îşyan kirin, bist û neh caran jî bi ser neketin û tîk çûn. Serhildana dawiyê, sî sal berê destpêkir, di nava sî salan da bi hezaran gund û bajar şewitîn, bi milyonan Kurd koçber bûn, xwîna qîz û xortan rijîya. Piştî sî salan, îro, rêvebirên Kurd û berpirsiyarên dewleta Tirk, tîkîliyên xwe bi hev ra danîn, şer rawestandin, dest bi danûstandinê kirin.

Ew şer ê ku bi salan berê, di navbera Mîro û Resûlê pismamê wî da

derketibû, hê jî didome, hê jî xwîna herdu aliyan dirije û wek ava derê biharê diherike. Şerê wan kengî disekine û çîroka wan bi çî awayî diqedê, tenê Xwedê dizane“

Dest xweş kek Îkram Oğuz, bo romana te ya bi navê „Mîro, çîroka şer û koçberiyê“, bo zimanê te yê şîrîn.

Mîro ji aliyê weşanxaneyê „do“ va hatiye weşandin û hên bêhna boyaxê jê tê. Min xwend, tûrika min hên jî dewlementir, eşq û evîna min bo Kurmanciyê jî dubare bû.

06.05.2014

Pirtûkek nû: Rêwî

Memo Şahin

Ger wext hebe li ser kar bi rojan pirtûkên dîrokî, pîrtûkên bi mijar, pirs û meseleyên kêmnîetewan, mafên mîrovî û demokrasiyê va girêdayî mêze dikim, çend rûpel dixwînim û datînim alikî. Evaran jî ger bi dest bikevin pirtûkên cûda, pirtûkên sivik, roman, helbest, çîrok û bîranînan dixwînim.

Bi rojan tûrika xwe bi pirtûkên bi pirsgerêkên kurdeyê ve girêdayî tijî dikim û bi şev û evaran jî bo tama jiyanê dest davejîm pirtûkên cûda.

Wê dawiyê du pirtûkên Bextiyar Ali ku bi zimanê Almanî derketîbûn min xwend. Lê Kurdiya wan nikarim, ber ku bi soranî ne û bi alfabeya erebî derketîne. Ev jî nişan dide ku her çiqes em xwenda jî bîn, hên jî cahil û analfabet in û jî zimanê xwe bêpar in. Nikarin gor dilê xwe berhemên jî perçeyek, beşek din a Kurdistanê bixwînin û fêmbikin.

Sed sal in rewş ûsa ye. Ne em Kurdên Bakûrî dikarin pirtûkek Kurdî bi alfabeya erebî bixwînin û tê bigên, ne jî Başûrî û Rojhilatî dikarin tama helbestên Cixwerxwîn an jî romanên Memed Uzun ku bi alfabeya latînî hatine nivîsandin, bigrin. Bêkes û Pêşew bo me Bakûriyan „biyanî“ ne, ber ku helbestên wan yên şîrîn û dewlemend, bi alfabeya erebî ne.

Pirtûkên biyanîyan, yên Îngilîz û Almanan bo zimanek din an jî bo Kurdî tên wergerandin. Ev hewce ye. Lê çawa dibe ku pirtûkên Kurdî bo Kurdên perçeyên din bên wergerandin?

Edebiyat, wêje, dîrok û siyaseta me bi sê (3) alfabeyan tên nivîsandin û bi rêwa diçin; bi alfabeyên erebî, latînî û kirilî. Ma neteweyek kû bi sê alfabeyên cûda tê perwerdekirin, wê çawa bibe yek û jî hevûdu fêmbike û zimanê xwe standarderize bike?

Rewşa ku em di nav da ne ev e. Em biyanî û xeribên ziman û xwişk û birayên xwe ne. Sed sal e, rewş hên jî nehatiye gûhertin.

Paşê di heman rûjê de du pirtûk bi postê ketin destên min. Yek ya Nadia Murad ya din jî ya kek Îkram Oğuz bûn. Dû wan jî min pirtûka Seher ya kek Selahattin Demirtaş peyda kir.

Di vê nivîsê de mijara me, pirtûka kek Îkram e, Rêwiyê sed salên dawî ye û hên jî di dirb û rêyan da ye; ne rê qût dibe, ne jî rewş tê gûhertin.

Mijara Rêwî bo Kurdên me yên Bakûrî nas e û her yek jî me di vê pêwajoyê, prosesê da jî derbaz bûye. Ev çîrok, çîroka me hemûyan e; çîrok û dîroka me xizan û belangazan e; çîroka şeş-heft nîfş û generasyonên şikestî ye, ku sed sal in di bin lepên Jon-Tirkan de, di bin nîrê Kemalist û nijadperestên Tirkan da dinalin e. Li aliyekî perwerdeyek bi zimanek biyanî û xerib li aliyê din jî dîn û baweriyek hezarûpencsed sal berê ku xeynî kitêbek, pirtûkek qet tiştek din nasnake û dixwaze bi vê civak û jîyanê dizayn û kontrol bike û ser da jî bi zimanek jî me dût û nenas.

Dema em çîroka Rêwî wergerin zimanek Ewropî, dibe ku kes li me bawer neke. Wê bên, ewqas jî nabe? Çawa dibe zarokek ku bi zimanê diya xwe heya heft an jî heşt saliya xwe mezin bûye jî nişka va, bi rojekî va li ser erda xwe, di nav bajar û gundê xwe dest bi perwerdeya bi zimanek xerib û biyanî bike?

Lehengên me xeynî Nazmî Çawîş hemû jî Kurd in. Hinek şêx, melle û mixtar in, hinek jî wek mamosteyê me yê jî Qersê, ku bi eslê xwe Kurd e, lê jî Tirkan jî xirabtir û zalim e, jî eslê xwe fedî û şerm dike, di nav psikolojiyek û komplekseke şikestî da ye.

Lehengê me yê pirtûka kek Îkram, Tajdîn e. Lê ne tenê Tajdînê belangaz e, em hemû ne, yên ku jî çerxa perwerdeya bi zimanê Tirkî derbaz bûne.

Kîjan jî me, jî bîst û bîstûpenc milyon însanan rojek bi zimanê xwe di dibistanekî Bakûrê Kurdistanê da perwerde bû ye? Kîjan jî ewqas însanan bi darê zorê, bi cetwelên ku li ser tiliyên destên me bi hovane hatin û çûne, canê me jî me birine, Tirkî fêr nebûn?

Her çiqas ev çîrok bi lehengê me Tajdîn va hatiye girêdan jî, çîroka me hemûyan e. Ne tenê ya me Bakûriyan, ya Kurdên Rojava û Rojhilatî jî, yên ku rojek jî rojan bi zimanê xwe perwerde nebûne û bi destpêka

dibistanê bi darê zorê zimanek biyanî hînbûn e û di nav travmayek bê mînak da mane.

Xwendina vê pirtûkê hem bo nîfşên me yê ku hatine pêncî, şêst an jî heftê saliya xwe hewce ye, ji vê jî bêtir bo keç û xortên me yê ku nû bêjn dawêjn elzem e. Ne tenê aliyê perwerdeya bi zimanê Tirkî, her ûsa jî bo fêmkirin, têgihîştina bûyer û rûdawên salên şêstî heya darbeya leşkerî ya sala 1980an jî pêwîst e, bê xwendin. Ev jî ne bes e, bona ku hîssiyata, hesta Kurdên ku ji Kemalîst û nijadperestên Tirk jî bêtir Tirk in, bê fêmkirin, hewceye ku ev pirtûk bê xwendin û bê belav kirin.

Li ser darbeya 1980ê dora 40 sal derbazbûne. Wê demê bi sedhezaran Kurd û demokratên Tirk hatin girtin, ji dezgehên êşkendeyan da derbaz bûn. Bi sed hezeran Kurd ji welatê xwe rewîyan û xwe avetin Ewropa. Niha jî, ev çend sal in, em di pevajoyek ûsa da derbaz dibin. Niha jî girtigeh û zindanan dewleta Tirk bi welatparêzên Kurd va tijî ne. Duh Kemalîst li ser erk û hikûm bûn, îro nijadperestên Îslamîst. Kiryar heman kiryar e, qurbanî jî her Kurd in.

„Di şikbeyê da, di nav sedan kesan da, sê kesên ji sê neslên cûda...

Qasî ku nêzikî hev, ewqas jî ji hev dûr.

Qasî ku nas, ewqas jî ji hev ra xerib...

Şêx...

Mîrovekî oldar...

Karmendekî bajarî...

Mamosta...

Elî Riza...

Xizmetkarê dewletê...

Mîrovekî kin û qelew û pencê salî...

Û Tajdîn...

Xortekî karker...

Xortekî welatparêz...

Xortekî bist û du salî...“

Wek duh îro jî sê-çar nîfş, generasyon di zindanan da ne. Ev e qedera me Kurdan. Dem û dewr derbaz dibin, lê zilm û zordariya dewleta

Tirk li hemberî Kurdan her dimîne û berdewam dike.

Min rêwîya kek Îkram xwend û jê tama hezar bostanan girt. Çûm salên şestî û heftê, bûm şahidê çandina tovên niştimanperweriyê. Zimanek zelal ku her însan dikare bi hêsanî bixwîne; zimanek paqij, kurmanciyeke sivik, tesfireke xurt û bi hêz rêwî xemilandiye.

Dest xweş kek Îkram Oğuz, bo romana te ya nû. Rêwiyê te em hemû ne. Bi sedan salan diçîn, rê kêr nabe. Bona ku rê kêr bibe, pêwîst e em, ji dîroka xwe ders û ezmûnan derxin û bibin pire, di navbera neslên cûda da. Ev jî bi riya nivîsandin û xwendinê dibe.

Rêwî ji aliyê Weşanxaneyê Doz ve hatiye çapkirin. Ger du însan jî Rêwî peyda bike û bixwîne, mijar û naveroka wê li dor-berê xwe belav bike, Tajdîn jî, kek Îkram û ez jî wê gelek bextewar bin.

„Dengbêjên bavê min“

Memo Şahin

Pirtûk hene, meriv dixwîne û paşê jî datîne pirtûkxaneyê xwe û carek din jî nagirî destên xwe. Lê hinek jî hene, sal û dem derbazbin jî, însan car caran digire destên xwe û di nav rûpelan de digere, beşek, an jî carek din dixwîne û sûdê werdigere.

Paşê sal dibihûrin, însan kaldibin, hinek pirtûk jî kevn dibin. Êdî ne hewceye ku meriv wan pirtûkên han, ku dewra wan bihûriye, bihêle û weşêre. Bi kalbûnê ev proses, sal bi sal tekerûr û dûbare dibe, tê ceribandin. Destên te nerin jî, mecbûr dibe di pirtûkxaneyê xwe de cih veke û hinekên jî wan diyarî dost û hevalên xwe bike, an jî bavêje.

Romanên klasîk her çiqas dem û dewran li ser wan de derbazbin jî, kevn nabin û herdem bêhnê biharê jê tînin. Ansîklopedî, antolojî, pirtûkên dîrokî, atlas û xeriteyên serdemên borî jî ûsa ne.

Dizanim niha internet û wîkîpêdiya êdî hewcedariya ansîklopediyan kêmtir kirine û meriv dikare agahiyên li ser dîrok û erdnîgariyên welat û dewletan, li ser mijar û bûyerên cûda di heman demê de peyda bike. Lê li ser agahiyên di internetê de jî di navbera welatên pêşketî û şûndamayî de ferqek mezin û di nav wan de neval û dolên kûr hene. Rewşa gelên ku bindest in, dewlet û dezgehên wan yê taybetî nîn in, jî welatên şûndamayî jî xirabtir e. Navbera gelên xwedî dewlet û yê bê dewlet de ne tenê neval û dol, lê belê behr û okyanûs hene.

Bo neteweyên dewletbûyî, dema xwedî derketina ziman, perwerdahiya bi zimanê zikmakî, berhevkirina nav, çîrok, stran û destanan derbaz bûye. Lê bo netewên bindest û bê dewlet, jî her tiştî girîngtir e û rolek taybet dixwe ser stûyên rewşenbîr, hûnermend û welatparêzan.

Rewşenbîr, hûnermend û nivîskarên gelên bindest hem têkoşer in, bo

rizgariya welat û bo azadiya gelê xwe xebatek bê westan dimeşînin, zindanî dibin, canê xwe didin û hem jî di heman demê de bi kar û xebata çand, ziman, zargotin, dîrok, hînbûn û hînkirina zimanê xwe barek giran hildigirin ser milên xwe.

Yek ji wan têkoşer, xebatkar û mamosteyan kekê min ê hêja, Îkram Oğuz e. Di panzdeh saliya xwe de ketiye rêyeke dûr û dirêj. Sal gîhiştibe şêstî jî, şopa westanbûyîne jê dûr e. Di heftê de çend caran nivîsên nîrxbiha belav dike, malperek bi rê dibe û ber da jî pirtûkên bi zimanê qedexekirî dinivîsîne û diweşîne.

Pirtûka kek Îkram ya dawî „Dengbêjên bavê min“ e. Dengbêjên bavê min, antolojiyek dengbêjan e. „Dengbêj bi peyvan ra dilîze“, kek Îkram jî rih û can dide dengbêjan, wan jîndar dike û nahêle ku ew bîrkin û wenda bin. Şakiro, Eyşa Şan, Meryem Xan, Mihemed Şêxo, Seid Gabarî, Egidê Cimo, Karapêtê Xaço, Kawis Axa û Evdalê Zeynikê yên naskirî ne ji antolojiya dengbêjan de. Ferzê, Reso, Huseyno, Tahiro, Mihemedê Canşah, Seyidxan, Huseynê Farê, Cemilê Horo, Sûsika Simo, Fatma Îsa, Mecidê Silêman û Şêx Silê jî cih digrin di vê antolojiyê da.

Her rûpela vê Antolojiyê da bêhna Radyoya Rewanê tê. Ne tenê bêhn, her ûsa deng û nota jî ji çiyayê Agirîyê bilind dibin, difirin û belav dibin.

Em dixwînin:

„Hezkin û guhdarkirina dengbêjan ji bavê minö ji min ra wek mîrateke çandî ma. Herçiqas di dema xortaniya xwe da zêde nêzikî dengbêjên bavê xwe nebama, îro ez jî mîna wî şev û roj li dengbêjan guhdarî bikim, dîsa jî eciz nabim.

“Jiber ku di kilam û stranan da dewlemendî û zelaliya zimanê xwe yê şîrîn dibînim û kêfxweş dibim.

“Biranînen min jîndar dibin û yekoyek tên ber çawên min...

„Xewn û xeyalên min dixemilin...

„Bi dengbêjan ra dikevim rêwîtiyê û di nav kilam û stranên wan da digirim.“

Di vê Antolojiyê de ne tenê kurtejiyana dengbêjan cih digre. Her ûsa stran, kilam û destanên wan dengbêjên nemir yên herî naskirî carek din

olan didin û di nav civat, dol û çiyayan de bilind dibin û xwe digêhênin Şevîn û Kejê yên li Ewropayê.

„Dengbêj bi peyvan dilîze... Bi hest û helwesta xwe, bi deng û hûnera xwe rih û can dide peyvan û wan dixemilîne,“ dibê kek Îkram.

Dema ku meriv pirtûkên mamosteyê zimanê me yê şîrîn dixwîne, şahidê dewlemendî û kûrahiya zimanê Kurdî dibe û nivîskarê me, kek Îkram jî peyvan wek serafek di xelekekê da bihevra dihûne û jê mucewherek derdixe meydanê.

Wek mînak. Kî dikare girîngiya wan gotinên zêrîn înkâr bike û paşguh bihêle?

„Dengbêj ne tenê xwediyê gotina xemilandî, ew, çavkaniya hiş û hişmendiya civakê, parêzvan û pêşvebirên zimanê Kurdî û herweha hilgirên dîrok û wêje ya devkî ye...”

„Zargotina Kurdî zargotinek dewlemend e.

„Lêbelê ew dewlemendî, rê li ber neyê girtin, bi demê ra dihele û wenda dibe.

„Jiber ku ziman sêwî, zargotina zimanê sêwî jî bêxwedî ma ye, pirraniya wê nehatiye nivîsandin û qeydkirin...”

„Gelê ku li ser xaka xwe û azad neji, berê zimanê xwe, dû ra jî her tiştên xwe yên bi endametiya miletbûnê va girêdayî, wenda dike û ji kok û esaleta xwe jî diqete.

„Himê miletbûnê jî li ser axa ku jê ra dibêjin welat û bi zimanê ku li ser wê axê tê bi kar anîn, bilind dibe.”

„Milet bindest be, dengbêj û hunermendiya dengbêjên wî miletî jî di şert û mercên bindestiyê da derbas dibe...

„Ziman di jiyaneke azad da neji û li ber mirinê be, dengbêj û dengbêjî jî roj bi roj kêmtir dibe û ber bi mirinê diçe...

„Ziman azad û serbest nebe, dengbêj sêwî û bêxwedî, bê mal û milk, tî û birçî ye.”

„Dengbêjên bavê min“ jî aliyê Navkurdê va çapbûye. Meriv dikare ji Navkurdê peyda bike, wek e-book.pdf. Belê bê pere. Bona ku bê xwendin, bona ku belav bibe û bikeve destên însanên ku bixwazin bi Kurdî bixwînin û an jî diyariya zarokên xwe bikin!

„Ziman azad û serbest nebe, dengbêj sêwî û bêxwedî, bê mal û milk, tî û birçî ye.“ Ûsa dinivîsîne kek Îkram di antolojiya xwe de. Lê kêma dibê. Her ûsa nivîskar jî bê mal û milk, tî û birçî ne.

Hem diçin rojane bi kemasî heşt saet bo nanê malê di karên zehmet da dixebitin, hem jî bê westan bi mehan, salan li ser mijarekî radiwestin, xwe diêşînin û dinivîsin; ser da jî rêzdikin, mizampaj û şêveya pirtûkê amade dikin û paşê jî bi pereyên ku jî malbat û zarokên xwe didizin, çap- û belavdikin.

Gotinek Mamoste Mustafa Reşîd heye: “Baxevan û bostanvan dikarin fêkî, balcan û xiyarên bexçe û bostanên xwe bi hêsanî bifiroşin, lê nivîskarek nikare pirtûka xwe bavejê ser tableyekî û bifiroşe. Bo vê dezgeh divê.”

Ne tene ev. Çend malperên bi nirx di nav bîst salên dawî de li Ewropa û Kurdistanê dest bi weşanê kirin û şûnda jî hatin girtin. Bi girtina malperên Kurdî, ewqas nivîs û lêkolîn jî wendabûn û çûn. Ne arşivêk, ne jî bibliothek û pirtûkxaneyek me yê netewî heye. Lê dema berhemek, pirtûkek bê çapkirin, yek heb be jî, dimîne û wenda nabe.

Ev jî rastiya me ya sar û tehl e û bal dikişîne ser rewşa nivîskarên me yên sêwî û bêxwedî.

Min xwend û jê sûd wergirt. Bawer dikim hûnê jî bi kêfxweşî bixwînin û di nav kûrahiya nostaljiyê de demek baş derbazkin.

Her hebe kek Îkram û hezar car spas bo xebata te ya nirxbiha û giring.

20.05.2022

Mîro...

Welî Sebrî

Ew û Dinê li ber agirê gurr rûniştibûn.

Dîno, ji nav agir çîkek girt û pê çixareya xwe vêxist û pêre jî got:

“Romana Mîro qediya. Qediya, lê Mîro û hespê xwe jî neman û wek şîmayê heliyan. Na, ne ew ma û ne jî hespê wî... Ew, bi hev ra qeliyan...”

Çavên wî li agirê gurr bû. Bêdeng û ji xwe dûr bibû, Dîno.

Dînê li wî mêze kir, lê tu maneyek neda bêdengiya wî.

Bêdengiya demê bi dengê Dînê xira bû û wî got:

“Çi bû mêrik. Çi bi te hat û te xwe daye kerriyê. Dîno, tu jî dizanî ku çaxa meriv ji xeribîyê vedigere, ji merivan tê pirsîn; tu çûyî û hatî. Ka te qet çi ditiye? Hema te çi ditiye tu qala wê bike û wê bibêje, de fermo.

Mêriko! Eha, te jî romana Mîro xwendiyê û divê tu li ser xwendina xwe jî tiştêkî bibêjî. Ma ne wiha ye, gelo...?

Ka tu dikarî li ser romana Mîro çi bibêjî. Eha, wayê min dengê xwe birî û li benda te me...”

Dit Dîno ji xwe dûr û dûr e, pêwistî bi axaftinê dît û carekê din got:

“Lo, ka tu çima deng nakî...! Çima tu min di meraqê de dihêlî...?

Weyyy mal ava, ji te pîrsekê hat kirin, ha...!”

Çavên Dîno li elawa agir bû. Wî serê xwe ranekir, lê dest bi axaftinê kir û got:

“Dînê, heta nuka min ne yek, lê bi sedan roman xwendiyê. Erê, min xwend, lê ew berê bû. Di piraniya xwe de roman jî bi zimanê Tirkî û min di wê zimanê de pirtûk diqedand. Wek îro tê bîra min, çaxa min

dest bi xwendinê dikir heta min neqedanda ji destên min nediket. Min dixwend, diqedand û wer radikir û dida alikî.

Wek nuha tê bîra min min di esrê de dest bi xwendina romanekê kir û roman bi navê xwe Kizil Kayalar û zêdeyê 900 rûpelê bû. Şev qediya û ber bi nîvroyê min ew pirtûk qedand û wer serê xwe da ser balgiyê.

De nuha jî ne wek berê me û çav ji xwendinê xeyîdiye û êdî berxwe nade. Eha, xwendina min a berê wiha bû.

Mîro, 139 rûpel û min jî herroj 9- 10 rûpel xwend û iro jî qedand. Erê, min xwend û divê ez çend gotinan jî li ser romanê bikim. Na, nabe nekim...

Naverok:

Li ser jiyana kurdekî û camêr bi navê xwe Mîro ye. Mîro, ne mîr e. Ew jî wek min û te belengazek ji belengazan e. Eş û kul û mereza Mîro, mereza me gişkan e. Tu çaxa romanê dixwînî, tu di romanê da xwe, bav û kalên xwe, xal û xaltika xwe, mal û malbata xwe, çiya û banî û newal û neqebên welatê xwe dibînî. Roman te digre û bi xwe ra dibe. Di qalkirina Mîro da tu rewşa welatê xwe, jiyankê kesirî dibînî û dixwînî. Mîro, êşa canê me û hesiriya welatê me bixwe ye.

Ziman:

Ziman sivik û dewlemend e. Wek ava Çemê Muradê bi zelaliya salên berê diherike û rê digre. Bê qisûr û bi tehma dilê min bû. Wek meriv çawa guh bide dengê Keremê Seyad û jê têr nebe bi wê awayê merivan bi xwe r digre û berê merivan dide salên berê û dibe û tîne. Wek çawa tu guh bidî stranên Evdalê Zeynikê û jê têr nabî bi wê şiklê Kek Îkram, hevokên xwe yek bi yek hunandiye û bi wê pênûsa destên xwe ristiye. Di hevokên wî da sura zozanên Bingolê dililîne. Û di dengê gotinan da jî tu kalîna xezalên welatê xwe dibihîzî.

Xwendin, bi coş û meraq û hewasa dilê te ye.

Xwendin te bi xwe ra digre, dibe û li newal û neqebên welatê te diqelîbîne û çiya bi çiya digerine. Geh li ber kanika zozanê te dide radiwestin û geh te li hespê kûmêt siwar dike û zozan bi zozan digerîne...”

Ji çixereya vêxistî li ser hev çend gurmik girt û paşê jî axaftina xwe domand û di axaftinê de wiha got:

“Sed sal buhuriye, Dînê. Ne hindik, lê sedsalên xwînî û hîn ji Romî jî

pêşira me neketine û aqilê me jî nehatiye serê me. Salên nuha jî, ji wan salên berê ne çetirî ne. Eş û elem û derd û kul wek salên berê û tu guhartinek di vê jiyana kanbax da nebûye û bi vî aqilî jî ne pêkane, bibe. Hema bikurtî bibêjim bila Mala Îkram Oğuz ava be”

Dîno piştî vê axaftinê yekem ber bi elawa agir û piştîre jî li çavên Dînê mêze kir û jî pirtûka destê xwe parek ji romanê xwend:

“ Pismam li min rind mêze bike. Tu bixazî jî ji vir şûnda rûyê min nabînî. Min dixwest berê hespê te bişewitînim, lê ez qemîşê te nakim, li vê dinê jî, li dinya wîyalî jî naxwazim te û hespê te ji hev biqetînim. Ez naxwazim kar û barên zebaniyên cehenemê jî zêde bikim. Heger, wek kuştina hespê te sê gulê legana Êris berî eniya te bidim û te bikujim, hem barê te û hem jî karê zebaniyên cehenemê giran dibe. Bi agirê guniyên Girê Reş va te dişewitînim ku, hem tu li dinya wîyalî jî agirê cehenemê xilas bibî, hem jî zehmetên şewitandina te...”

Dîno, çavên xwe jî xwendina romanê kişand û li agirê gurr mêze kir û got:

“Resûlê pismamê Mîro, Mîroyê pismamê xwe bi zîn va girê dide û bi hesp va dişewitîne û herdu bi hev ra wek şimayê dihelin û têne xwarê.”

Wî axaftina xwe qedand û Dînê jî got:

“Wax û wax û heywax...!!!”

Nivîsandina bi Kurdî Şoreşgerî ye!

Bayram Ayaz

Du romanên Îkram Oguz „Mîro“ û „Rêwî“

Di têkoşîna doza gelên bindest de, parastina ziman armanceke sereke ye. Jiber ku ziman û çanda bi wî zimanî pêkhatî, bingêhên nasnameya wî êlî, wî gelî ne.

Ne hewce ye mijara girîngiya ziman dirêj bikim, wekî em her car dini-vîsin: Ziman hebûn û nebûna nasnameya civakêkî ye, ya gel e.

Wekî di romana Rêwî de jî pîrika Tajdîn jê re dibêje: „Her darekî li ser koka xwe hêşîn dibe, şax û gulî dide.“

Dev ji darê berdin, qirş û qalekî jî bê kok (rah) nabe. Dara kokê xwe hişk bibe, dibe êzinga agir, dawîya wî darî xwelî ye. Qirşa bê rah jî nikare xwe li ber bayeke sivik jî rabigre.

Rahê gelan, neteweyan ziman e.

Ziman zemq û çimentoya êl û civakan e, gel bi hevdu ve dizeliqîne, pev girêdide. Demê xelkekî zimanê xwe nepeyive û nenivîse, rahê wê hişk dibe û êdî nikare xwe li ber bayê zimanekî din rabigre, hêdî hêdî, piştî du sê cîlan dibe parekî ji civaka zimanê nû.

Yanî eger Kurd bi Kurdî nepeyvin û wekî nuha li bakurê Kurdistanê û li rojavayê Turkiyê ev bela bi ser me re hatiye, bi Tirkî biaxivin, dê piştî cîlekî din ji Kurdbûna xwe bi temamî dûr bikevin. Wekî nuha jî li Turkiyê bi milyonan kes dibêjin: „Em esil Kurd in“. Lê ji ber ku ziman nizanin, sermiyanê wan tenê ev hevoka bê talih „esil kurd“ maye ji Kurdbûna wan. Bi milyonan „esil Kurd“ êdî eslê (koka) xwe jî jibîr kirine û bûne Tirk. Ev bi siyaseta pişafînê (asimilasyonê) bi serê Kurdan anîn. Serê her tiştî hêrişê zimanê me Kurdî kirin, Kurdan ji Kurdî dûrxistin, koka darê birîn, dibirin û dixwazin „darê“ bi temamî hişk bikin.

Numûneyên me gelek in! Em her yek ji malbatên xwe, ji dorberên xwe dizanin, dewleta Tirk çi bi serê me aniye!

Rê û dirbên xwe parastinê, çeka berxwedanê diyar e: Kî naxwaze Kurd di nav rûpelên dirokê de winda bibin, divê zimanê Kurdî biparêze, ser axa xwe bimîne, bi ziman û çanda xwe bibe serwerê xwe!

Ji bo vê divê em zimanê Kurdî biparêzin.

Bi Kurdî biaxivin, bixwînin, binivîsin!

Îro roj li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyê şorişa herî mezin li dijî siyaseta pişaftinê bi her cureyî parastina zimanê Kurdî ye.

Bi Kurdî nivîsandin, bi taybetî bi Kurdî berhemên wekî çîrok, roman, serpêhatî, helbest nivîsandin kar û xizmetekî zêde zêde bi qîmet û bi rûmet e.

Nivîsandina Kurdî, danan û xebitandina “karxaneyêke cebilxaneyê” ye li dijî siyaseta asimilasyonê. Her berhemeka bi zimanê Kurdî, eger Kurd bixwînin, pûsat û çek û sîlaha herî bi bandor e.

Naxwazim ferq û cudahiye bêxim nabeyna cûrên nivîsînê, lê nivîsên bi cureyê çîrok, roman û serpêhatî hem hebûna ziman diparêzin, hem ji ziman pêşve didin. Jiber ku ziman pêvejoyêke guherbar (û dînamîk) e, ziman bi derbasbûna demê re qalikê xwe diguherîne. Çîrok, serpêhatî û bi taybet roman wekî “raporên” derbarê ziman, çand û zargotinê de ne. Ev berhem serçaviyên bêje, zargotin û folklore ne.

Ez bi xwe gelekî giringiyê didim çîrok, roman û bîranînên bi Kurdî.

Ji vana her berjemekî bo min mamosteyê zimanê Kurdî ne. Demê ez dixwînim, ev “mamoste” her yekî goreyê mijara xwe ji min ra bi Kurdî qala jiyana civaka Kurd dikin, bahsa welatê me yê bindest Kurdistanê dikin, bahsa diroka me dikin. Ez ji van mamosteyan gelekî tişt hîn dibim.

Qasî mehekî berê min romana hêja Îkram Oguz ya duyemîn ji xwend xilas kir. Romana wî ya ewil “Mîro” min berê xwendibû. Spasiya wî dikim, birayê kekê Îkram, kekê Sîrac bo min “Rêwî” ji rêkir.

Mijara “Mîro” ser jiyana Kurdên Serhedê di demê destpêka sedsala bîstan de ye. Şerê nabeyna Êris û Osmaniyan, pevçûnên nabeyna Ermenan û Kurdan, nefîya Kurdan, Ermenan, êş û elema xelkê êrî kişandî, koç û reva ji ber Êris û çekdarên Ermenan mijarên romana

yekemîn e. Kurdên bisilman yê nêzîkî sînurê Êrîs û Ermenan jiyane ji ber şer û xelayê gund û şênîyên xwe berda ne, berê xwe dane rojavayê welêt hatine li nêzîkî Tatosê wan dera cîh û war bûne. Jiyana Mîro balkêş e. Serkêşê êlê Xalê Suleyman, kurê xwe mezin winda kiriye, nave kurê xwe li neviyê xwe kiriye. Mîro hêj qûmatek mecbûrî ji cîhê xwe koç kirine. Li rê diya Mîro wî li bin darekî hêştiye. Xalê wî Xalîl vegeriyaye, wî dîtiye û aniye daye hemêza diya wî. Tê gundekî nû ava dikin. Piştî mirina kalikê xwe Mîro dibe, serokê wî êlê. Romana Mîro romana jiyana êl û eşîrên Kurd li Serhedê demê destpêka sedsala buhûrî û li destpêka rejîma kemalîstan e. Derbarê agehiyên zargotinî vebêjîyê de helbet tiştên balkêş hene. Ez dixwazim van hurgiliyan ku romanê balkêş dikin, nuha ji xwendevanan re bihêlim û derbasî roman duyemîn Rêwî bibim.

Rêwî romana cureyê herikîna jiyana gundekî Kurdan li hêla Erzurimê deverê qeza Tatosê ye. Jiyana civakî, olî, folklorî di Rêwî de bi devoka Kurmanciya Serhedê dem bi dem hatiye nivîsîn. Destpêkê nivîskar romana xwe bi agehiyên serhildana Şêx Saîd û zor û zilma Romê bi salên destpêka dewleta Turk ya nû ve ji girêdide û ji wê derê tê ser jiyana pêşengê romana xwe Tajdîn ku ew ji bêhtir jî bi salên şêstî destpê dike. Li gundê wan çêkirina dibisitanê, helwestê gundiyan, hatina du mamosteyan, mamosteyê yekemîn yê Sînopî, yê duyemîn Elî Rîza yê esil Kurd ê Qersî. Kudandina dibistana pênc salî, koça mala wan ji gund bo Erzurimê, naskirina Tajdîn xwendevanên zankoyê, hînbûna bîr û hîzrên çepîtî, guherîna ramanên wî ber bi Kurdîniyê, girtina Tajdîn ji aliyê polîsan ve, lêdana kesên Tirkî û îşkenceya polîsan... Di salên heftîyê de helwestên kesayet û tebeqeyên civakî yê Kurdan beramberê rewşa wan dema... hemî van mijaran nivîskar radixe ber me. Evên wan sala di nav wan bûyeran de jîyan, dikarin gelekî ji wan bûyeran bibîrbînin. Demê min rêwî xwend, bi xwe gelekî bûyerên wisa hatine bîra min, min jî xwe di nav wan qirûciran de dît.

Navê romanê jî gotineka nenika Tajdîn Kewê dertê. Di rûpela 162an de pîrika Tajdîn, wî wekî rêwî, yekî ji rêwîtiyê hezdike binav dike. Em dikarin bêjin roman bixwe nivîsîna rêwîtiya Tajdîn e. Romanê nave xwe jî vê RÊWÎ-tiyê girtiye.

Vebêj û zargotina romanê de tiştên balkêş jî hene. Wekî çîroka ku li nabeyna jinên gundê Tajdîn derbas bûye, mijara “doxînsist û solîsist”iyê.

Tajdîn carekî li Erzurimê tê girtin. Xeberên wisa zû belav dibin û pêşî digihîn gundê ew kes jê tê. Vêca jinên gund çûne qeraxê çem beravê, û carek jî ser kaniyê. Tê zanin ku li gundan cîhê xebergerandinê berav û serê kaniyan e. Wisa jî bûye. Jinikek ji ya din re dibêje, dibêjin Tajdîn “solsist” e ka çi ye, ji ber wê yekê cendirman wî girtine, lêdane. Senem a miroveka Tajdîn bi ser xebera wê jinikê re tê aciz dibe, lê hers dibe, dibêje, şûna tu li ser “solsistiya” biraziyê min qise bikî, li doxîna xwe haydar be doxînsistê!

Vêca ez dirêj nekim, bi têra xwe dirêj bû. Vê gotina “solsist” çi ye, çi nine, ji kerema xwe hûn ji romana RÊWÎ bi dest bixin, bixwînin û bizanin ev çîroka û şerê “doxîsistiyê û solsisistiyê” çi ye.

Li vê derê gotinê dihêlim bo xwendevanan û dibêjim dest sax birayê hêja Îkram Oguz.

15.10.2020

Rêwî – “Romana zimanê bê xwedî!?”

Dr. Celalettin Kartal

Min bi sedan pirtûkên zaniest(î) bi zimanê biyanî li ser mijarên cewaz xwendin e. Bi dehan pirtûk û romanên di derbarên dîroka (=mejû) gel û kêmina de guftûgo kirin e. Sîyaset ya dewletên rojhilat, zagon û bi taybetî jî ya Komara Tirkîyê û pê re jî ya navdewletî beşekî pêzanînên min in. Di san jî kêma pirtûk û romanên naskirî ji min re bûne serin-crakêş û ciyê sersamiyê!

Ya rast ji wan jî tenê hinek romanên girîng, “fêrker” û tijî trajêdî her di bîra min de mane. Ew jî ev in: Cengiz Aitmatov: Rêya pale; Lêo Tolstoyî: Şer û Aştî; Franz Werfel: Çil rojî li Çiyayê Musa; Yaşar Kemal: Mihemedê Bejinzirav; Bernhard Schlink: Xwîner.

Lê herçend bo min ciyê daxê be jî min kêma berhemên bi zimanê dayikê (kurdî) wek roman xwendin e! Û romanên min bi kurdî xwendine jî wek “Şivanê Kurd” û “Kela Dimdim” ne wek dilê min in.

Bes li gor hemû pêzanînên min pirtûka birêz Îkram Oğuz ya bi nave “rêwî” bi babet û zimanê xwe, bi mînak û şikariya (analîza) xwe, hîç ne kêma romanên nivîskarên biyanî ye! Ew nîşana dîrok, hebûn û belgename ya azarkêşî û trajêdiya Kurd e; berhema zimanê netewê “bê xwedî”, bê dewlet û “bê şivan e”.

Heger mirov destên xwe deyne ser wijdanê xwe û berhevkirineke (=berawirdkirineke) bê layen (=bê aligirtin) di derbarê wê de bike, wê derê hole ku keda birêz Îkram ya di romana bi nave “rêwî” de hêjayî xwendin, belavkirin, nirxandin û pesindanê ye! Ew hem bi kurdiyeke zelal, dewlemend û balkêş (kurmancî) û hem jî bi mijar û mînakên ronkirina xwînerên kurdî hatiye amadekirin.

Ev pirtûk ji rûpela pêşî heta ya dawîyê (288 rp.) bi zimanekî bedew û

bawerîyeke (=mitmaneyeke) kurdawerî hatiye nexweşekirin. Loma di her rûpelî de hem pisporî û hem pêzanînên romannivîs jî dertên ber çavên xwîner.

Xwîner wê dibe şadê siyaseta dewleta zordest ya Tirk! Wê, Tirkîyê, hêj di despêka damezrandinê ve hem bi dek û dolaban hem bi zorî û destdirêjiyê û bi taybetî jî bi rêya perwerdekirinê siyaseteke tund û navbirdinê (=asîmîlasyonkirinê) li dijî Kurd, çand û zimanê wî, bikaraniye û tîne. Loma “rêwî”, zîrek û lehengê berhemê, dibe şadê desthilatdariyeke despot, bê sînor û hem jî siyaseteke tîjî nijadperestî! Xwînerên romanê jî bi pirtûka “rêwî” dibin şadê tekoşîn, şer û pevçûna nava çep û rastgiran.

Di mînaka şer û pevçûna nava xwendevanên çepgir yên Kurd û rasgir yên Tirk de hem refgiriya “dewleta despot” û hem jî perîşaniya Kurd bi giştî tîne ber çavên xwîner û xwîneran. Xwîner dibîne, ku Kurdên Bakur jî aliyê Tirkîyê ve jî mêj ve hatine tevzandin; “xesandin”, ketine nava baznekî betal! Di dawiyê de lehengê romanê Tajdîn jî dibîn e, ku dewlet di dijberiya xwe de ti cewaziyê naxwe nava şêx û mela, gundî û xwendevanan, şivan û gavanan:

Her û tenê neyarê wê Kurd e!

Bi rêya xwendina „rêwî“ hem malwêranî û hem şikestina Kurdên Bakur di mînaka hinek gundiyên neçar û hinek jî xwendevanên zankonyan de tîne ber çavên xwîner û xwîneran. Dewlet bi rêya „mamost yên bi eslên xwe Kurd“ zimanê Kurdî û çanda wî li ber Kurd reş û qedexwe dike. Siyaseta ku mamoste yên bi eslên xwe Tirk hîç nakin û nikarin bikin jî, mamoste yên bi eslên xwe Kurd li dijî gelê xwe rîjd û tund bi kartî in. Bi ya min ev mezintirîn (=gewretirîn) sedema serketina dewleta Tirk û navbirdina Kurdên Bakur e! Loma di romanê de jî tê gotin, ku „kurmê darê ne jî darê be, dar na rîze“!

Ev romaneke hêja ye!

Balkêşe ku nivîskarê pirtûkê bi kedeke dûr û dirêj û bi dilovanî ew amade kiriye. Ez bi xwendina wê sersam mam! Min hîç nizanibû ku romanên Kurdî yên wiha nirxdar jî hene! Ma çima ev romana wiha girîng heta roja me jî aliyê Kurdan ve bi giştî ne hatiye xwendin!? Wextê mirov li bîra xwe tîne ku di roja me de bi milyon Kurdên Bakur dev jî zimanê bav û kalan berdane û ew herroj kêmtir zimanê dayikê bi kartînin, girîngiya wê hêj bêtir diyar dibe. Loma bi ya min romana

“rêwî” bo têgihiştina pirsgirêkên Kurd baştirîn berhem e! Heger ev roman ne bi Kurmancî, anjî Kurdiya Bakur bûya, bê guman ewê bi milyonan bi hata xwendin. Dîsan renga nivîskarê romanê bi xelateke bejeyî jî bi hata pîrozkirin!

Bo min tiştê gotinê ne maye. Bila destên nivîskar birêz Îkram Oğuz sax be. Bila serkeftin para wî be û ew her berhemder û xwediyê temenekî dirêj be!



Nivîsên li dîwar...
Ev dîwar, dîwarê kurd û kurdîyetîyê ye...
Ji çep û rast va hatiye dorpeçkirin...
Bi êrîşên dagîrkeran va diêşe û dilerîze...
Lê dîsa jî ji hîmê xwe yê dîrokî naqete...
Ber xwe dide û hilnawese...
Jiber ku ew bi kîlam û stranên dengbêjan va xemilî...
Bi çîrokên çîrokvanan va dewlemend...
Bi lorîyên dayikan va bilind...
Bi temîyên bav û kalan va bi hêz bû ye.
Ji ba û bahozê...
Ji berf û bagerê naxurufe...
Ji koka xwe dûr nakeve...
Di her têkçûyîna xwedîyên xwe da...
Di bin destên dagîrkeran da bîmine û bînale jî...
Ber xwe dide û hilnawese...
Min li vî dîwarî nivîsi...
Bi zîmanê ku ew jê fam dike...
Û pê ra jî nû va jîndar dibe...